

# NÛDEM

No 24 1997

Kovara Hunerî, Edebi û Çandî



# NÛDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî



Xwedî û berpirsiyarê giştî

Chief Editor

## Firat Cewerî



Hejmar 24, sal 6

Zivistan: 1997



Şerdên abonetiye (salek)

Swêd: 240 Sek

Skandinaviya: 280 Sek

Ewrûpa: 80 DM

Amerîka, Austaralia,

Kanada: 50 \$

Institution: 290 Sek



Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964



Wêneya bergê:

Thomas Gainsborough

Çapa bergê:

Jakosbergs Tryckeri AB



Pergala bergê û rûpelan:

Nûdem



Adres: NÛDEM

Termov. 52 2tr.

176 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-58356468

# NAVEROK

- 4 Jlyana surgunê ◆ **FIRAT CEWERÎ**
- 6 Du şîr ji ◆ **ARJEN ARÎ**
- 8 Hefteya Dotmîrê ◆ **CATULLE MANDÉS** Werger: **S. ROŞAN**
- 12 Ronî mîna evînê, tarî mîna mirinê, beş: 5 (Roman) ◆ **M. UZUN**
- 24 Charles Perrault ◆ **FAWAZ HUSÊN**
- 29 Hevaltî ◆ **MIHEMED DEHSIWAR**
- 39 Rezê gewr de tişt nema ◆ **ROJEN BARNAS**
- 40 Hewî, Beş: 3 ◆ **XEMGÎNÊ TEMÊ**
- 43 Xezal li kurê xwe digere ◆ **SIDQÎ HIRORÎ**
- 50 Merheba hêviya min ◆ **ZEYNEL ABIDÎN**
- 52 Kûtîkerî û etik ◆ **ROJAN HAZIM**
- 75 Du şîr ji ◆ **JACQUE PRÉVERT** Werger: **CAN GULŞENOGLU**
- 78 Çima Stalinîzm ◆ **ŞEREFXAN CIZÎRÎ**
- 87 Eyşe Şan ◆ **MUSTAFA ALADAG**
- 93 Xatûna şertê xwe ◆ **TÊMÛRÊ XELÎL**
- 95 Daxwazên min ji edebiyatê çi ne ◆ **ARTUR LUNDKVIST**  
Werger: **MUSTAFA CIZÎRÎ**
- 99 Ez bî xeyalan şiyar dibim ◆ **SUZAN SAMANCI**
- 103 Bi Mehdî Zana re hevpeyvîn ◆ **NÛDEM**
- 111 Edebiyat û ziman ◆ **N. ZAXURANÎ**
- 118 Werin birano ◆ **ÛSO KURDMAN**
- 119 Mirovan ji helbestvanan hez kirine ◆ **SÛLEYMAN DEMIR**
- 125 Çend şîr ji ◆ **XEBAT ARIF**
- 127 Sê kurteçîrok ◆ **HELÎM YÛSIV**
- 133 Vate ◆ **MAHMÛD LEWENDÎ**
- 139 Efûkirin ne karê herkesî ye ◆ **ZINARÊ XAMO**
- 144 Ronakbîrek û rojnameyek ◆ **MUSTAFA AYDOGAN**

# Jiyana surgunê



**FIRAT CEWERÎ**

Dêrika Çayê Mazî / Welatê bav û kal e  
Lê sed hawar û gazî / Jê dûr ketim çend sal e  
Ez li wê hatim dinê / Wê dergûşê hejandim  
Heywax hey mala min-ê / Dijmînan jê revandim

**Qedri Can**

**D**îroka surgun û koçberiyê gelekî kevin e. Yên ku hatine surgunkirin, yê ku ji cihên xwe hatine bidûrxistin, ew kes bûne ku serî li ber zordestiyê netewandine, ya xwe gotine û di ber gotin û ramanên xwe de mecbûrtî jiyana surgunê (mişextiyê) bûne. Di nava yê surgunkirî de hejmara mezin nivîskar û rewşenbîr bûne. Ji ber ku nivîskar û rewşenbîrên rastî, yê dûrbîn û yê sadîqê zanyariyê hertim alaya rûmetê bilind kirine û ji bo mirovatiyê xwe feda kirine. Ji Ovidius bigire he-

ta roja me şair û nivîskar ji ber sebebên dînî, nijadî û siyasî ji cih û warên xwe hatine bidûrxistin, mecbûrtî jiyana dûrî welatê xwe, dûrî av û hewa welatê xwe hatine kirin. Gava mirov li dîroka edebiyata dinyayê dinêre, mirov dibîne ku edebiyat ji ber êş, eziyet û bêrîkirina nivîskarên surgunê hatiye xemilandin. Nivîskarên surgunê, êşa xwe ya surgunê, bêrîkirina welêt, ji xwe re kirine mijara edebiyatê û pê berhemên nemir afirandine.

Di nava vê surgunê de, nivîskarên rûsan cihêkî mezin digirin. Hem di dema desthilatdariya Çar de serê nivîskaran bi desthilatdaran re di belayê de bû, hem jî piştî şoreşa Bolşevîkan, serê nivîskaran bi desthilatdaran re ketiye belayê. Du nivîskarên ku mohra xwe li dîroka edebiyata rûsan xistine; Dostoyevskî û Çernişevskî bi awa û armancên cihê mecbûrtî jiyana girtîgeh û surgunê bûne. Çernişevskî piraniya berhemên xwe yê edebî, di dema xwe ya girtin û surgunê de nivîsandine. Jiyana surgunê mîna xencerekê li dilê Dostoyevskî ketibû. Ew ji ber jiyana surgunê ya li Ewrû-

payê diheliya. Tê gotin ku wî piraniya caran qîma xwe bi jiyana surgunê ya li Sibîryayê aniye, lê bi ya Ewrûpayê neaniye. Wê jiyana dojhê berhemên mîna *Sûc û Ceze*, *Qumarbaz*, *Gêjik* û hwd. bi Dostoyevskî daye nivîsandin.

Piştî ku li Rûsyayê Bolşevîk bi ser dikevin û diktatoriya proleterya ava dibe, di huner û edebiyatê de jî guhertinên bingehîn çêdibin. Êdî ji nivîskarên berhemên bi raman û motîvên realîzma civakî tîr xwestin. Ev fikra han jî mekanîzmeke zordestiyê li ser nivîskarên dûrî wê tevgerê ava dike. Ew nivîskar bi xayîntî û antî-şoreşgerî tîrê sîcdarkirin. Loma ew rîya azadiyê di bazdanê de dibînin û çî bigire nişkek nivîskar baz didin û xwe dispêrin welatên Ewrûpayê. Herçiqas jî wî nivîş gelek nivîskar tîk diçin jî, dişan ew nivîskareke mîna Nîna Berberova derdixe.

Jiyana surgunê ji bo nivîskarên polonî jî ne tiştêkî nû ye. Çî bazdana nivîskarên cihû ya di dema desthilatdariya Nazîstan de, çî jî surgunbûyîna nivîskarên muxalîf û sosyalîst ya di dema desthilatdariya Stalîn de. Ji nava van nivîskarên jî, hejmareke mezin navê xwe di dîroka edebiyatê de nemir kirine. Ji wî nivîş Witold Gombrowicz û Czesław Miłosz piraniya berhemên xwe li surgunê nivîsandine û bûne du navên nemir.

Herçî Emerîka Latîni ye, hem di dema ji aliyê spanyolan de kolonyalîzekerîna wê, hem jî di dema nêzîk de bi hatina cûntayên leşkerî, nivîskarên van welatan mecbûr mane ku welatê xwe terk bikin û li surgunê bijîn. Xelatgirên Nobelê Nerûda, Marquez û Oktavio Paz hinek jî wan nivîskarên in.

Herweha bi hatina Hîtler ya ser hukûm re, gelek nivîskarên demokrat û sosyalîst jî ber karbidestîya Hîtler baz didin û ji xwe re jiyana surgunê hildibijêrin. Wî nivîş jî di pêvajoya jiyana surgunê de gelek berhemên heja afirandine.

Nazîm Hikmetê ku jî ber karbidestîya Tirkîyeyê mecbûrî jiyana surgunê bûbû, piraniya berhemên xwe li surgunê nivîsandine.

Niha nivîskarê çekî Milan Kundera, şairê lubnanî Adonîs, nivîskarê fasî Tahar Ben Jon, nivîskarê esilkurd Selîm Berekat û bi sedan nivîskarên dinyayê jî mecbûrî an jî bi rîza xwe li surgunê dijin.

Surgun, jî bo zîman û edebiyata kurdî jî bûye hêlînek. Çî bigire hertîm tevgera rewşenbîriya kurdî li derveyî sinorên Kurdistanê bûye. Rojnama *Kurdistan*, kovarên mîna *Jîn*, *Rojî Kurd*, *Hawar*, *Ronahî*, *Roja Nû* û bi sedan weşanên weha û birêvebirên wan her li surgunê bûne. Jiyana surgunê jî kurdên kevnesovyetê re jî bûye çavkaniya nivîsandinê û li zîman û edebiyata kurdî xwedîderketinê. Îro, dişan zîman û edebiyata kurdî li surgunê geş dibe. Ji ber ku jiyana surgunê mirov ber bi cîhana zarotiyê ve dajo, cîhana zarotiyê mirov diltenik dike, diltenikahî xwe davêje hemêza zimên, bi zimên mirov êşên xwe yê hundurî dide der.

Bi hêviya bikaranîna jiyana surgunê, ez nûsala we jî dil pîroz dikim! ✍

# Ji bîr nebûbe

## ARJEN ARÎ

Zik î zuwa  
dûrketinek im ji wê,  
navê wê  
dibe ku Bedo be,  
dibe ku indeko be,  
qutbûnek im jê  
û  
ji silavan.

Miçiqîbin kaniyên çavan  
li rû negere li şopa êşê,  
dakeribe kezêbê,  
xwe berdabe hinavan...

Çil sal e va!  
nebûbe  
ji bîra nebûbe  
bûbe Bedo ew Hewwa...

## Çarîn

çavên min di hidûd de  
du kanî ne li dû te,  
diherikin ji zû de,  
ava Bûnisra ez im...

## Heta ferwerdîneke din

ramûsanan rêz bikim li gerdena te morî morî  
dû re te himbêz bikim, te  
biner, ferwerdîn hat û buhurî li min û te  
û berê me li payîza umr e,  
temen di buharê de xweş e, evîn di buharê de...

hij te kiribim  
şewitîbim li ser te, peritîbim parî parî  
bihêl, sayên xewrevîn bila bikin zûrîn  
kundokên denghejar bila bixwînin şevê  
gund li dihise, bajar dibihîze  
daxuyaniya evîna me, li devê derî

pê dikevin çirayên korik  
pê re ewan-ewan dertên kolanan rohnîyên mirî  
dest pê dike kurtepestî, çavnebarî  
ketibî ser zimanan tu bi Zînî  
û Memê te ez bim heke  
şerm neke  
veke deriyê dubask  
paxila xaxask li min veke  
û pişteke bide pişt derî  
heta ferwerdîneke din  
ve-neke.

*95 Amed*

# Hefteya Dotmîrê

## CATULLE MANDÉS\*

Ew kesên ku dotmîr Rosalindesê nas dikirin; û nailê payebilindî û bişerefbûna derûdora wê ya nêzik bûn, gelek caran ecêb diman û meraq dikirin; gava dotmîrê organên laşê xwe –çi yên li ber çav çi yên bi kirasên zêrneqîşandî veşartî– bi gotinên ecêb bi nav dikirin ku çu têkiliya wan bi navên wan yên eslî û rastî ve tunebûn.

Êvarekê, gava dotmîr, ji sînga xwe, ji ber sermayê, diêşiya, weha got:

– Bi xwedê ya ku lîstikên nav nivînan yên dilxweşiyê diparêze, êşeke pîrr giran xwe berra ser çarşemê daye.

Rojekê, dema ew li parîsê digeriya, mêşeke hingivî di ber devê wê re derbas bû, wê bi acizbûn û lome got:

– Tiştêkî ji wê asabîtir tune ye, eger li kêleka sêşemê lekeyeke sor der bê.

Di dawiyê de, li qesra dotmîrê, li nav nas û xizmetkarên wê, şaşbûn û mehcûbiyetê rû da. Ma gelo hukumdara piçûk ya herî dilovan, dotmîra ciwan dîn bûye ku hertim guhdariya dengê ûd û bilûrê dike û fêkiyên hişkîrî yên aqîdekîrî, dixwe? ... Helbet, ew tişt hemî, dema ku dotmîr ne bi dilketiyê xwe re ye –ango wextê ku ji ber wextê kêfxeşî û evînê li cem şaîrekî bi navûdeng yê ku helbestên evîndariyê dinivîse, dimîne– rû didin; şaîr yê ku par buharê, li meha nîsanê, rojekê bê alîkariya dîplomatan, wê, bi wî re şerânî xwar û destgirtina xwe êşkere kir. Li serayê biryar hate girtin ku ji bo pîrsgirêk bête famkirin û çareserkirin, markîsîna ya Ruremonde, ya ku derheqê tecrûbe û jîrekiya wê de, herweha di çareserkirina pîrsgirêkên giran û tevlihev de baweriya herkesî pê hebû, di derbareyê vê xalê de, –ya ku çi jin çi mêr herkesê serayê bêhuzur dike– bi dotmîrê re hevpeyvînekê pêk bîne.



Grevîna, li serayê, li şahiyê qedirbilind ku heybeta qedirbilindiya şahiyê, li ber bişêrîna wê ya dilsade û bi hejîna şaxeylakek di nav porê wê de, nerm dibû; wê sebebê hatin û ziyareta xwe ji dotmîrê re eşkere kir. Ev tişt, di bexçeyê serayê yê zivistanî û muhteşem de, qewimî. Xwendewarên delal, eger hûn li wê derê bana, bêşik hûn dê gelekî kêfxweş bibana, heke we, kenê dotmîrê yê ku bi gotina markîsîna ya ewil, bi pirqînî, bêserûber, bêsinor û hema bêje bê tefîn bibihîsta.

2

– Baş e, ez dê sira xwe, ya ku we welê bêhuzûr dike, bêjim. Lê ewilê ez dê tişteki ji te bipirsim, markîsîna delal. Tu, perwerdara bêhempa ya ku xanimên dinyayê yê herî rafînekirî ji te re spasdar in; çu tişteki yê ku bişkerêbûnê qedexe ye, ji bo wan ne nihênî ye; tu, ya ku Helene Courtisols jê re spas dike; ya ku ew hîn jî carîna rûsor dibe; tu, ya ku Zo, Jo û Lo, te wek serekmamosteya xwe dizanin; tu dê, markîsîna delal, karibî bersîva vê pîrsa min bidî: Heke gencîneyê te, ya efsanewî û giranbiha heba ku te karibû bihêla an jî wek xêrat belavbikira, heke te bi dilxweşî û daxwaza xwe biryar bida da ku tu gencîneyê bidî yekî ku bi rastî hêjayî wê be, tu dê gencîneyê ji nişkê ve û bi carekê, bêtedbîr û bêşert wek diyarî bidî?

Xanim, de Ruremondêyê got:

– Bêşik na. Ji bo nîrx û bihayê gencîneyê zêde be, ez dê wê dabeş bikim...

Dotmîrê got:

– Pirr xweş hate gotin. Her ez jî welê dikim. Nuha bi îtîna û baş guh bide! Tu dizanî, ez bi evîneke nazik, bi şaîrekî ve, yê ku helbestên evînî dinivîse hatime girêdan; bêşik tu dê ji min bawer bikî gava ez bêjim ez bi cazîbeyên tebiî hatime xemilandin û ez wî ji wan xweşiyên mehrûm nahêlim; gava ez û ew, em di şevên kêfxweşî û evînî de li cem hev in. Lê ez pirr bi diqet im da ku ez bi carekê, gencîneya xwe nedim wî. Min, şexsa xwe ya giranbuha, bi qasî rojên hefteyekê dabeş kirine...

Markîsînnayê bi kenîneke tesvîpkar weha got:

– Aha, nuha ez fam dikim, baş e, roja duşemê...?

– Roja duşemê, ez îzin didim –yê ku ez heyranê wî me– ku destên min yê delal û piçûk yê ku wek kulîlkên bin berfa nûketî, spî û terr in, ramûse.

– Û sêşemê?

– Roja sêşemê, ez wî ji lêvên xwe yê ku ji bo hilçînîna têrgehîştî û li ber bişkivîna ne, mehrûm nahêlim.

– Çarşemê?

– Roja çarşemê, ez du gilokên berfê pêşkêşî wî dikim; ew gilokên ku hertim li serê wan du çîlek bi heraret dibiriqin.

– Pêncşemê?

– Pêncşemê wî îzin heye da ku her du lingên min yê xweş lihev û spî, piştî ku min goreyên xwe yê hevrişimî danîne, bibîne. Ew her du stûnên ji mermerê yê ku alîkarê deriyê perestgeheke spehî û muhteşem in.

– Roja Înê?

– Ewil roja îne, ez ruxseta wî didim da ku kembera min veke; –wek te bi hunera xwe fêrî min kiriye, ez nuha xwe di rewşeke bêhuzûr û nerehet de his dikim;– û nava min ya spî û nerm, cihê ku navika min mîna sikeyekî ji dewra antîk xwe nîşan dide, bibîne.

Xanim de Ruremondeyê ya ku di çavên wê de îfadeyên heyranîyê xuya dibûn, xwe ranegirt û got:

– Û roja şemiyê?

– Roja şemiyê yê ku ez heyranê wî me, bi nihênîyên min yê herî veşartî re dibe yek. Roja şemiyê piştî ku ew hin seremoniyan pêk dihîne; wek nimûne li pêş stûnên mermerî çok dide û bi ramûsanên bi heraret û pêtî wan radimûse; wê gavê ew xwedî ruhsat e da ku bikeve gulşikefta li Trofoniasê.

### 3

Piştî bêhnvedaneke xewnî dotmîrê lê zêde kir:

– Markîsînna delal, nuha tu dizanî, çima ez yek caran vê an wê organê laşê xwe bi gotinên tuhaf û nebihîstî bi nav dikim. Ji min re bûye edetekî xweş ku ez van parçexweşiyên xwe; wek roja ku ez wan ji bo şairê giranbiha diyar dikim, bi nav bikim; ew şairê ku bi helbestên xwe yê letîf û şehane, dil ji min biriye.

Piştî ku bêhnê fikirî, xanim de Ruremondeyê got:

– Hezreta we bêşik pîr tebiî û vekirî bersîva pîrsên min da. Hertişt sebebê xwe, bi şeweyeke herî tebiî li dunyayê, êşkere dike. Lê du xal ne êşkere ne, ez dixwazim tu bersîva wan bidî, êşkere bikî.

Dotmîrê bi heyirîn pîrsî:

– Kîjan xal?

– Hefta ji heft rojan pêk tê, Madam. Tiştê ku ez fêm nakim, piştî roja şemiyê ku sertaca kêfxweşiyê ye; gelo, tu, roja yekşemê çi pêşkêşî dostê xwe dikî? Roja şemiyê

tu gencîneya xwe ya ku hêjayê heyranbûnê ye; ya ku te pêktîne tu pêşkêşî wî dikî, ez ténagehim, aya ji bo yekşemê çi dimîne.

Dotmîrê got:

– Bi îzna te be em yekşemê derveyî van tiştan bihêlin. Ez insanekî xwedî bawerî me, ez itaatkarê fermanên dînî me û bi wan ve girêdayî me. Yekşem roja bêhnvedanê ye.

– Ez fêr dikim, ji lewre tişteki nabêjim. Lê xaleke din heye.

Hezreta wê got:

– Ji dil û serbest bêje.

– Belê, tiştê ku ez ji dil nikarim pê bawer bim, dostê te yê şair, gava roja yekşemê tê cem te û herweha rojên din yên dirêj, yên beriya şemiyê ku tu wê rojê xelata herî hêja diyarî dikî; bêşik bi hisên ji agir û pêtî tê şewitandin; çawa ew dikare heya şemiyê xwe ragire?

Bi bişêrînek şêrîn û xweş dotmîrê weha got:

– Ax, markîsîna delal, çu qaîde bê istîsna nabin. Yek caran, hefte tenê ji rojên şemiyê pêk tê. □

Ji swêdî: **SERDAR ROŞAN**

\* Catulle Mendès, (1842–1909) nivîsevanekî fransî ye.

Ev çîrok ji pirtûka »Upplagd för Kärlek« hatiye wergerandin. Min navên kesên wek ku li teksta swêdî bûn, nivîsî.

# Ronî mîna evînê tarî mîna mirinê

(Roman) Beş: 5



MEHMED UZUN

**K**evok. Niha jî Kevok. Niha jî em nêzîkî li Kevokê bikin. Em dîsan li payitextê Welatê Fireh in. Dîsan şev e. Dîsan stêr li esmanan û li ser ava boş a çemê bajêr diçirûsin. Lê ji navbera wê şeva zewaca Baz a bixwîn û vir ve deh sal bihurîne. Wext bihuriye, kes cihê ne, lê tariya şevê û ronîya stêran eynî ye.

Belê, tariya şevê û ronahiya stêran. Belê, tarîhî û ronahiya ruhê însanan. Hundirê Kevokê, îşev, bi ronahiya evîn û hezkirinê tijî ye. Lê li milê din, hindirê Kevokê, îşev, bi tarîhiya zîz a veqetîn û tirsê tijî ye. Şev, şeva weda û veqetînê ye; şeva agirê beden û ruhan e; şeva seqema keser û xizînê, germahiya şehwet û hezkirinê ye. Em li oda biçûk û peregende ya Kevokê ne. Niha umrê Kevokê li dora bîstane e, ya rastirîn, hinekî di ser bîstane re ye. Ji sê salan û vir ve ye, Kevok li xaniyê xwendevanên unîversîta payitextê welêt, li odeyê xwendevanan ku em niha lê ne, dijî. Kevok, yek ji wan çar hezar xwendevanan e ku li vê sîta mezin a xwendevanan dijî. Sîta xwendevanan ji sîta leşkerî ku mala Baz tê de ye, bi qasî sê taxan bi dûr e. Kevok û Baz bi qasî sê taxan ji hev dûr dijîn, -bêyî ku ew hevûdu binasin, haya wan ji hev hebe.

Di oda Kevokê de Kevok ne bi tenê ye. Hevalê wê yê xwendinê, destgirtiyê wê yê jiyane ku em ê jê re bibêjin Jîr, pê re ye. Kevok û Jîr xwendevan in. Herdu jî li

zanîngeha Ziman û Edebiyata Fransîzî dixwînin. Jîr di sinîfa çaran, Kevok jî di sinîfa sisiyan de ye. Xwendina Kevok û Jîr a fransîzî ne bêsebeb e. Ziman û edebiyata fransîzî ji bo Welatê Fireh ku berî niha bi qasî şeş salan, kêr-zêde, koloniyekê fransîzî bû, gelekî girîng e. Dûzan û sazûmana îdarî, siyasî û civakî ya welêt, hema çî bigire, li gora ya Fransê hatiye pê. Bandûra ziman, çand, edebiyat, fikir û rêzikên fransîzî, pir eşkere, dixuyê. Tevî ku welat azad bûye û ji mêj ve ye ku fransîzan xwe ji welêt vekişandine, di kûrahiyên reh û rêçên gerandina karên curbicur ên welêt de siya fransîzî diyar e. Têkilî bi Fransayê re, pêwendî bi ziman, çand û edebiyata fransîzî re, nîşanên pêşketin, bilindahî û zanîne ne, riya biserketinê ne. Ji lewre ye ku Kevok, keça awîqatekî nas û dewlemend û Jîr, lawê serekeşîrekî mezin ê Welatê Çîyan li zanîngeha Ziman û Edebiyata Fransîzî dixwînin.

Niha, di vê şeva zelal a payîzê de, bajarê mezin, bi perda tarî ya şevê ve pêçayî, razaye. Lampayên cade û kolanên bajêr ku mîna pêt û çirûskên êgir dibiriqin, nobedarî li şeva bajêr dikin. Çemê ku niha gelekî sakîn diherike, di bin ronahiya lampayên bulwarên kêlekan de dibiriqe. Stêr li ser ava çem diçirûsin. Bulwar, cade û kolan, eger em segên tiral ên kuçan nehesibînin, vala ne. Deng hatiye birîn. Jiyan, tevger, lebat ji bajêr bi dûr ketine. Ro, tav, germahî hê dûr in. Şevgura sibê, berbang, rojê nû hê dûr in. Şev e, bi tenê şeva ronî ye. Û di vê şeva ronî de, dilê kesekî, dilê Kevokê zîz e, tijî xem û keser e.

Kevok ecêb ziravbihîstiyar e.

Di oda biçûk de, ku bi du findan ronî dibe, li ser textê razanê yê teng, Kevok û Jîr tazî ne. Ew bi hev re, di nav hev de ne. Jîr dirêj bûye, Kevok li ser Jîr e. Kevokê bisk û guliyên porê xwe yê dirêj vekirine, herdu şeşên xwe di ser bedena Jîr re birine, dirêjî enî û çavên Jîr bûye û li rûyê Jîr dinihêre, mîna ku wê dil heye hemû dil û ruhê Jîr, bi hemû kitekitan, bibîne û binase. Çavên Kevokê mîna du stêrên stûr dibiriqin. Lê ne ken, ne jî kêfxweşî li ser çavan dixuyin. Bi tenê ew bi nêrîneke gelekî kûr li bîbikên, li kûrahiyên çavên Jîr dinihêre û wî, heta ku jê tê, dîsan, dixwe nava kûrahiyên xwe yên şil. Kevokê, herdu destên xwe di ser serê Jîr re birine, tilî û pêçiyên wê di navbera yên Jîr de, herdu destên Jîr, pihêt, pêgirtine û wan diguvisîne. "Jîr" Kevok, bi dengê zahf nîzm, bi nalîn, dibêje, "Jîr, oxira te ya xêrê be..."

Jîr, di nav kûrahiyên Kevokê de, bêdeng, li Kevokê dinihêre, -ne bersîvekê dide, ne jî awîrekî xuya nîşan dide ku dikare bibe bersîv. Ew, bi tenê, bi hêz û coşa hezîkirinê, bi kelkela germahiya kûrahiyên teng ên Kevokê, bi çavên vekirî, li yara xwe dinihêre; bi lava, bi mîhnet, lê dinihêre. Deng ji Jîr dernakeve, heke ew bixwaze jî,

deng nikare jê derkeve. Gewriya wî zuha, heşê wî jê çûye. Bedena wî, dilê wî, ruhê wî, hemû hebûna wî ketiye ber pêlên giran, kûr û qehîm. Reh û damarên wî yên ciwan vekişiyane, mêjîyê wî yê xurt û têkûz niha pêl dide. Jîr di nav pêlan de, mîna hêlekaneke, dere û tê, dere û tê.

"Jîr" Kevok, dîsan, kelgirî, bi nihirîn, dibêje, "Jîr, hişyar be, gotina min ji te re ye. Guh bide min... Oxir be, ez dibêjim... mîna ku dapîra min digot; oxira te ya xêrê be, bila Xwedê bi te re be... min seh bike Jîr... mîna ku di destana herî kevn a însaniyetê de hatiye gotin; bila lingên te, te zîndî û saxlem vegeŕîne malê... here Jîr, here... û niha jî ez bi dil û canê xwe, bi ruh û bedena xwe, bi hezkirin û evîna xwe, oxira te dixwazim... here..."

Jîr bersîv nade. Dewsa bersîvê, ew hewl dide xwe, bêyî ku ji nava Kevokê derkeve, destên xwe ji tilî û pêçiyên Kevokê rizgar dike, hinekî hêz dide xwe û bi hêdîka xwe diqulipîne ser Kevokê. Jîr cîh li xwe rast dike, şeqên Kevokê vedike û mîna ku ew bixwaze xwe bi binê kûrahiyên Kevokê bigihîne, bi quwet, li ser Kevokê dirêj dibê. Bê lebat, bê tevger, ew welê, çavgirtî, bi qasî çendekê, di nav wê germahiyê de dimîne. Destên Kevokê, bi ûsil, li ser pişta wî, hêtên wî, digerin. Dilê kevokê, pihêt, hildavê, zik û berzikê wê, ji ber kela hezkirinê, dilivin. Bedena Kevokê ku mîna cawekî hewreşimî nerm, tenik û zelal e, bi hêdîka, dilive.

Di nava kûrahiyên Kevokê de, Jîr bi deng û pejnên sivik û kûr ên hez û hezkirinê dihese. Berê jî wî ev deng û pejn hîs kiribûn, bi wan hesiyabû. Lê ne evçend xurt û kûr, ne evçend ronî. Ronî? Belê, ronî, mîna ku niha di hundirê Jîr de birûskêkê lêdabe, welê bi xurtî, hemû bedena wî, bi ronahiyeke zahf xurt, pêl bi pêl, tê vegirtin. Gelo jixweveçûyîn ev e? Mirin ev e? Ya na, ev zayin e? Lûtkeyên çoşa evîne ev e? Binê kûrahiyên hezkirinê ev e? Piştî vê vedana birûska hundirî, piştî van pêlên ecêb xurt, ew dikare, bi hêsanî, bi rehetî, bimire. "Êdî mirin ne xem e, Kevok" Jîr, di bin guhê Kevokê de, bi nermahî, dibêje û guhê wê dimêje.

Kevok, çavgirtî, hinekî ji xwe ve çûyî, mîna ku di xew de be, "bimire" dibêje, "di hambêza min de, di nav min de bimire." Kevok bi destên xwe yên ku pişta Jîr difirkîne, pihêt, hêtên Jîr, hinekî din ber bi zik û berzikê xwe yê xwîdandayî, dike. Eger niha mumkin bûya, wê dê hemû bedena Jîr bixista nava xwe. Wê dê bedena xwe û bedena Jîr bikira yek. Lê nabe, ew çî jî bike nabe. Berê jî çendîn caran ew û destgirtiyê wê li ser vî textê teng dil û bedenên xwe dabûn ber agirê hez û şehwetê. Lê îşev, ecêb e, îşev, şeveke awerte, şeveke nedîtî ye. Tu carî hîsên weha kûr ew dil negirtibûn, tu carî wê bi daxwazeke weha bêpîvan nexwestibû ku Jîr tê de bûya. Îşev tişteki nû, nedîtî bi serê wê de tê. Di kûrahiyên beden, mêjî û ruhê wê de tişte-

kî bêtaswîr diqewime. Hûnikahiya rûbarên meha nîsanê, serma kurşeyên çilê, germahiya tîrêjên tîrmehê, bi hêz û quwera berfendeyên Welatê Çiyan, nava wê tevîhev dikin. Ev zîzî, ev zelalî, ev germahî! Mîna ku lehiyeke boş di hundirê wê de çûv dide, mîna ku gîhayekî nûhêşînhatî tê de, bi xurtî, bor dibe. Mîna ku birûsk di hundirê wê de vedidin. Kevok dişewite, rehên wê, bedena wê, rûyê wê, dil û canê wê dişewite. Dinya êdî nazivire, wext nema diherike. Dinya, wext, heyam, hawirdor, ev bajarê mezin, ev oda biçûk, ev bedenên zirav û ciwan, her tişt, herkes dişewite. Her tişt di nav ronahiya şewatê de, bi gulokên êgir, winda dibe. Kevok winda dibe.

Lê lehî jî radîbin. Bedena Kevokê niha avzêya hemû kahnî, çem û lehiyên cîhanê ye. Hemû ava cîhanê, niha, ji bedena Kevokê dizê. Çi dibe? Çi diqewime? Kevok tînagihê. Belê, ev evîn e, hez e, hezkirin e. Naxwe evîna ku tarîxan dihûne, qederan diresîne, merivan dişîne mirinê, ev e! Belê, Kevok tîdigihê, evîna man û nemanê ev e. Kevok hem tîdigihê, hem tînagihê. Di nav tîkeliyeke rengîn a şewetê de, Kevok dere û tê. Pêlên ronahiyeke bêpayan niha di hundirê Kevokê de jî radîbin. Pêl, yek bi yek, gav bi gav, bedena wê vedigirin. Bedena wê, bi hêdîka, dest bi hezî-nê dike. "Bimire" Kevok, ji nişkekê ve, bi qîrîn dibêje, "niha bimire" û mîna ku bedena wê bi zelzeleyekê ketibe, mîna ku birûskê di dilê wê de vedabe, hemû bedena wê radibe û dadikeve. Carek, du caran... car bi car... bêdawîn. Kevok herdu destên xwe dibe rûyê Jîr ku ji jor re li Kevokê dinihêre û rûyê spehî yê xwîdandayî mist dide. Kevok, pesdeng, bisemt, li çavên vekirî yên Jîr dinihêre.

Ev hezîn, ev pêl, ev lezîn, ev vedan, ev vegirtin divê bêdawîn be, dewam bike, xelas nebe. Car bi car, cardin... cardin...

Lê Jîr di ser Kevokê re, bi hêdîka, diqulipe kêlekê. Sînga wî, pihêt, radibe û dadikeve. Destê wî yê rastê li ser memikên Kevokê yên şil, li kêleka Kevokê dirêjbûyî, "ez ê bimirim" Jîr dibêje.

"Lê li vir, li nik min bimire" Kevok dibêje û ji nav nivînên peregende radibe, di ser Jîr re gav dike, destê wê yê rastê di navbera şeqên wê de, ber bi serşoka gelekî biçûk dere.

Piştî kêliyekê, gava Kevok, di destan de destmaleke fireh û dirêj, bi niyeta xeberdanê, tê ber textê razanê, êdî Jîr di xew re çûye. Çavên wî girtî, rûyê wî, mîna rûyê zarokêkî biçûk, sakîn, paqij û ronî, Jîr radizê. Bi qasî bîstekê, li piyan, bi alîkariya ronahiya qels a heyv û stêran, Kevok li Jîr dinihêre.

Evîndarê razayî... Dilê Kevokê yê hingavî pihêt hildavê.

Jîr; ev çavên xweş ên mîna du lib tiriyên reş ku hundirê Kevokê dihêlinin, ev be-

dena xurt, zirav û lihevhatî ku êdî hîn bûye û bi bedena zirav a Kevokê ve dibe yek, ev dest, mil û pazûyên xurt û spehî ku bi zexmî bedena Kevokê hembêz dikin, navtenga wê ya zirav radipêçin, ev lêvên tenik û jîndar ku bedena Kevokê hişyar dikin û di hundirê wê de birûskan vedidin, ev însanê xort ku dil ji Kevokê dibe, Kevokê digihîne lûtkeyên hez, coş, şehwet û kêfxweşiyê.

Jîr; lawê eşîran, lê ji zimanê xwe yê zikmakî yê eşîran bidûrketî, loma jî li hember ziman, çand û rêzikên welatê xwe fehîdkar, şermdar; kûpê hêrs û zezebê, tîmsala xîretê; mîna navê xwe jîr, rêgihîştî û dûrbîn, lê sergerm, serhildar, biheyecan, niha ev însan ê here, ji Kevokê veqete, Kevokê li pey xwe, li vî bajarê mezin bi tenê bi-hêle û here. Rojên wan ên ku bi baranê şil dibûn, heyamên wan ên ku bi berfê spî dibûn, wextên wan ên ku bi tîna tavê dikizirîn, şevên wan ên ku bi silavên heyv û stêran ronî dibûn û jiyana wan a ku bi nalîna hezkirinê dihate rengandin ê, niha, li pey bimîne.

Jîr.

Kevokê vî xortê ku niha bi hêdfîka xurexurê dike, di destpêka xwendina zanîngehê de, rojekê ku ew bihteng bû û xwe gelekî tenê hîs dikir, bi tesadufî, li aşxana zanîngehê nasî. Ew li kêleka eynî maseyê rûniştibûn. Li kêleka Jîr du hevalên wî jî hebûn. Ji xeberdan û devoka Jîr, Kevokê fahm kir ku Jîr jî, mîna wê, ji Welatê Çiyana bû. Tevî ku Jîr bi zimanê resmî yê Welatê Fireh dipeyivî, şopa zimane Welatê Çiyana jî di devoka wî de dixuya. Pêşî çavên reş ên germ hevûdu nasîn, paşê jî gotin û zimanê delal ê Jîr rê li hevûdunasîna wan vekir. Ecêb bû... hema çî bigire ji bo her tiştî, li ser her tiştî ew mîna hev difikirîn, mîna hev his dikirin, mîna hev ji tiştan hez dikirin, mîna hev dikeniyan, mîna hev li ber tiştan diketin. Vê wekhevîya balkêş û tijî heyecan rê li yekbûna bedenên vekir. Şevokê, dîsan li vê odê, dîsan di bin ronahiya qels a findan de, bi best û coş, lê bi tirs û sûzenî, dilê wê -mîna pîl-pilingekê ku ketiye ber bayê gur- hingavî, Kevokê xwe û keçtiya xwe teslîmî dest, beden û ruhê Jîr kir. Û careke din wê xwe teslîmî wî kir, û careke din... Her tişt di nav wekhevîyê delal de ku Kevokê pê sermest dibû, dewam kir, heta ku rojekê Jîr, bi awirekî welê tûj ku Kevokê hîç nedîbû, teqîya û mîna ewrên reş guriya. Niha baş nayê bîra Kevokê ka ji ber çî sebebî bû ku Jîr ewçend hêrs bûbû, lê Kevokê ew aliyên nû yên Jîr ku di tarîhiyên dil û mêjiyê wî de veşartîbûn, nasîn. Belê aliyekî Jîr ê tarî jî hebû... Kevokê fahm kir ku aliyên wan ên ne mîna hev jî hene. Wê dît ku wekhevî, hertim, di her mercî de, ne mumkin e. Lê ne xerî bû, ma jiyana jî ne di nava hêlekana wekhevî û newekhevîyan de diçû û dihat? Ma pergala dinyayê jî ne li gora vê qayidê dizivirî? Ya girîng hez bû, evîn bû. Kevokê bi vê yekê bawer bû;



hez û evîne dikarîbûn kilîdên herî zingarî jî vekin...

Hez û evîn; zelalî û paqijiya yekta ya hemû cîhanê...

Di zanîngehê de, Jîr salekê li pêş Kevokê bû. Jîr alîkariya dersên Kevokê dikir, êvaran di vê oda loş a biçûk de, piştî esiran li rexên bulwarên herdu kêlekên çem, şevan di bin ronahiya lampeyên bajêr de, di nav mij û dûmana rojên şilî yê payizê de, di bin tîna qijqijî yê rojên havînê de, jê re, her û her, şihîrên fransîzî dixwendin. Piştî firavîn û şivên basîd ên xwendevanan, piştî demên dirêj ên hezkirinê yê saetên dereng ên şevan ku êdî stêran jî xatir dixwestin û diçûn, ew li ser şoreşên fransîzî, medeniyeta tarîxî ya Fransayê û nivîskarên navdar ên fransîzî dipeyivîn. Ew dipeyivîn, hertim dipeyivîn. Bi van sohbetan ew diketin xew, bi van gotinên edebî coşa ruhê wan bilind dibû û kela bedena wan radibû. Ew; du ruhên ciwan, şên û lêger. Belê, lêger. Ruhê wan ê kekel li riyên rast, li îdealên mezin û bilind, li pîvan, bîr û nêrînên ku jiyan, cîhan dikirin wekhev degeriyan.

Li ser riya lêger û gerînê, qonaxek ji qonaxên herî girîng, bê guman, welatê wan ê bav û kalan, Welatê Çiyan bû. Wan, ji Welatê Çiyan dûr, li payitextê Welatê Fireh dixwendin. Ev der jî welatê wan bû. Lê welatê wan ê zikmakî, warê wan ê ku kesaniyek, şexsiyetek, huwiyetek dabû wan, li dûr, li bakûrê welêt, di nav çiyana de bû. Ew, keç û kurên wan çiyana û wî welatê dûr û tenê bûn. Û halê welatê wan ne tu hal bû, -ne do tu hal bû, ne jî îro. Welat, welatevîni, welatparêzî, welatperwerî û gotinên wekî van, di keft û lefta riya lêgerîna rastiyan de, ji bo wan, gotinên hem bilind, hem jî bedew bûn. Heye ku loma wan, geh Kevokê, geh Jîr, şihîra Victor Hugo ku li ser welatparêziyê bû, bi sê zimanan, bi zimanê wan ê bav û kalan, bi zimanê Welatê Fireh û bi fransîzî, hertim, di demên keser û xizîn, şadî û kêfê de, digotin. "Şan û mezinahî bi te dikeve / Welatê delal û abadîn / Şan û şeref bi wan dikeve / Yê ku qurbana te bûne..." Niha, Kevok, çavên wê yê kesertijî li ser Jîr, dîsan, hin rêzên şihîra dirêj, mîna lorînekê dinihwirîne.

Şan, şeref, mezinahî, qurbanbûn... Kevok, piştî rêzên şihîrê, hê li pê, difikire, şan û mezinahî û welatê wan... û ewana... Û lêgerîna wan... Ew li çi digerin? Tiştê ku ew lê digerin li kû ye? Ew ê kengî bikaribin xwe bi wî tiştî bigihînin? Çima bala ruhê wan ê xort tim û tim li tarîx û dewranên bihurî, li wext û demên nediyar ên bê ye? Di nav çîrok, serpehatî, rîwayet û tecrubeyên tarîxî de, ew li çi digerin? Ew ê, di nav rûpelên kitabên erzan de ku bi çapên gelekî basîd weşiyane, çi bibînin? Çima koç, qetliyam, çuyin, veqetîn, keser, jan, mirin, xwestek, hêvî, heyecan û têkoşîn evçend bala wan dikişîne? Çima awirê sar ê jinên neçar, xwîdana eniya mêrên bîndest, girîna zarokên jar, stranên dengên kal, pistepista neyînî ya şênîyên bêgav, qî-

rîn û berxwedana însanên belengaz evçend, evçend bi xurtî bala wan dikişîne? Û ev fikrên nû yên şer, têkoşîn, liberxwedan, serîhildan û şoreşan ku ji vir û ji wir, nîvçe û kêr, lê pêl bi pêl bi ser wan de tên? Çima ew ku ji malbatên têr û dewlemend tên, evçend ji van fikiran re vekirîne? Çima dil û ruhê wan bi heyecana van fikiran ji xwe ve dere? Çima heşê wan hertim li ser deverên dûr, mekanên nediyar, çûyin û rêwîtiyên bi tehlîke ye?

Tiştên ku ruhê wan lêdigere, li kû ne? Li dûr, li nêzik? Li dûmahika rêwîtiyan? Heye ku li hiç derekê, heye ku ew bi tenê li pey xewnekê ne?

Jîr ê ku niha, piştî demekê, xwe bide ser riya lêgerînê û here, wê çi bibîne, pêrgî çi bê? Lê Jîr ê here, here welatê bav û kalan, here hembêza çiyayên abadîn, bikeve nava talde û stariyên tarîxî yên gelî û newalên Welatê Çiyan. Kevok dizane, ew çi jî bike, tewş e, Jîr biryara xwe daye. Welat, bi tenê welat û çûyina welêt di heşê wî de ye. Welat, ku Jîr, car bi car, bêwest, bi heyecaneke boş, digot; welatê bedew; ronahiya çavan, spehîtiya li ber çavan; çiyayên bilind, geliyên kûr, avên zelal, lehiyên boş, dar û dahlên hêşîn, çem û golên gewher; rengên keskesorê, pûşiya spî ya berfê, devî û giyayên hêşîn ên şîfayê; xuşexuşa kahnî û avên herikî, dengê sivik ê pelên darên bî û spîndaran; berfende, ba û bahozên bêpayan; berbangên aram, hingûrên sor, şevên sayî, stêrên çirûsî yên sor; ziving û şikeftên hûnik, berî û deştên zer, her tişt, her tiştê ku bang li dilê kesên lêger dikin, li wir e, Jîr digot, li wir, li welatê bav û kalan e.

Jîr; evîndarê dilbir, dildarê evîna Kevokê, evîna welêt...

Di nav fikr û hîsên têkel de, Kevok ji Jîr bi dûr dikeve û tê ber pencera biçûk ku li çêrî dinihêre. Find xelas bûne, findank vala ne. Kevok, tahzî, bedbîhn, serê xwe dide perwaza pencerê û bi qasî kêliyekê li der dinihêre. Stêr kêr bûne, ji dûr ve, di ser xaniyên bajêr re, sorahiyeke tenik dixuye. Ava çêrî dibiriqê û pelên darên li kêlekên çêrî, bi bayekî sivik dilivin. Dengê sivik ê bayê sivik, bi hêdîka, bi guhê Kevokê dikeve. Gelo dinya weha kesertijî ye yan keser û tirsê ser dilê wê dinya weha kesertijî dike? Kevok nizane, ne girîng e ku ew pê bizanibe jî. Lê ew zîz e, hîsên wê ewçend zirav bûne ku bi dengêkî, bi lebarekê ew dikare, bi qîrîn, bigirî.

Jîr ê here. Jîr ê here serê çiyân, here şer û têkoşînê. Li Welatê Çiyan, di kûrahiyên zixur, gelî û newalan, di quntar, çeper û lûtkeyên çiyân de serîhildaneke nû li dijî desthilatiya dewleta Welatê Fireh û hukimdariya General Serdar dest pê kiriye. Mîna do, mîna pêr. Welatê Çiyan û serîhildan; qederek ku bê rawest her berde-wam e. Dîsan şerekî xwînî, şewateke kambax dest pê kiriye û xort û ciwan, yek bi yek, kom bi kom, mîna ku ew herin dîlanê, derin û xwe digihînin wê. Niha jî Jîr ê

here. Niha, belê niha, gava piştî bîskekê berbangê lêxist, êdî dengê stranan, zimanê şihîran, kêf û heneka bedenên ê bête birîn. Êdî ew ê hew, destên wan di nav hev de, li kêleka bulwaran bigerin û behsa felsefe, nivîskar, kitab, bend û nivîsaran bikin. Êdî Kevokê hew bikaribe guhê xwe bide ser dengê stranên Jîr ên bav û kalan ku bi zimanê bav û kalan tên gotin. Ew daxwazên wan ên zewacê, jiyaneke bi hev re, mesûdî û bextiyariya jiyana malbatî ya rojên pêş... ew hemû dê êdî, niha, li pey bimînîn, bibin mîna nivîsarên ku li ser qûmê hatine nivîsîn.

Jîr ê here.

Di oda bêdeng de ku bi pejnên rojên bihurî yê Kevok û Jîr tijî ye, Kevok, bê hemdê xwe, dest bi girî dike. Bi qasî çendekê, ew welê serê wê xwar, çav li derve, bêlebat, digirî. Rondik, yek bi yek, ber bi jêr dibin. Gelo ew ê bikaribin, dîsan hevûdu bibînin? Çawan? Kengî? Ev çi qeder e! Qedera reş a welatekî çawan dikare, weha, qedera însanan jî bihûne. Qedereke girtî çawan dikare, weha, qedera kesan jî bike girtî, bike dîl? Ev heyama ronî ya payizê dê, niha, weha bi veqetîne, weha tarî biqede? Bi huznekê ku dibe girî û nefes li Kevokê diçikîne, Kevok ber bi masa koşe ya odê dere, ji çavîkekê du findên nû yê dirêj û sor derdixe, wan tîne, datîne ser findankan û pêdixe. Find dişewitin, pêşî mîna du çirûskan, paşê mîna du gulokên zirav ên êgir. Ode hinekî din ronî dibe û siya findan li ser dîwarê spî û têkberên kêr û basîd ên odê dilive. Bi qasî demekê, li pê, Kevok, bi çavên şil, li findan dinihêre. Ronahî û germahiya qels a findan, libabûna êgir, siya wê û yekîtiya wan hemûyan, mîna ku ew deng û pejn, bîr û xeyal bin, bala wê dikişîne.

Bi dû re Kevok, dîsan, vedigere ber pencerê. Şehêkî dirêj û reş li ber devê pence-reyê ye. Kevok, bi hêdika, mîna ku ew di xew de be, radihêje şeh û pê porê xwe yê dirêj û reş şeh dike. Bêdeng, bisemt, bi ûsil. Porê wê yê dirêj li bal û bejna wê ya dirêj tê. Bihna wê teng, çavên wê tijî girî, Kevok porê xwe şeh dike. eh tayên nerm ên porê dirêj, hêdî hêdî, ji hevûdu vediçirîne.

Ew ê here, Kevok, mîna ku ew şihîrekê bixwîne, ji nişkekê ve, dibêje, ew ê here wî welatê bêyewm, warê mirin û windabûnê. Ew welatê ku kesî jê xêrek nedîtiye, hertim di nav mij û dûmanê de ye, hertim wekî çiyayekî ku li ber teqînê be, esebî û şidayî ye, hertim tê de pevçûn, şer û xwîn heye. Ew welatê ku hertim bi xufexufa ba û bahozê, bi xuşexuşa baran û zîpikê dinale. Ma Jîr, ev xortê ku niha wekî melelekekî, razaye, nizane ku çûyina wî welatê heye, lê jê vegeer nîn e? Jîr, Jîrê bîrbir û têgihîştî, çima tu nizanî ku dûmahîka rîya çûyina wî welatî gor e, goristan e, goristana kavil a bêkesan e? Jîr, evîndarê dilbir, çima tu ezîyetê li dil dikî? Tu nizanî ku ev evîn, ev hezkirina bêdawîn, ev nalînên abadîn, ev gotinên te yê evînê, ev ger-

mahî û heyecana evînê dê, bi çûyina te, xelas bibin? Tu nizanî ku kenê te yê wekî gul bişkovî, çavên te yên wekî du lib yaqûtan biriqî, bedena te ya wekî xwedayên efsaneyên kevintirîn ên însaniyetê lihevhatî dê, bi çûyina te, bibin xatirayek? Ma tu bi van yekan nizanî?

Kevok, dîsan, lê îcar, bi deng digirî.

"Kevok..."

Pêşî Kevok deng nabihîse, paşê bi xwe vardiqile û serê xwe dizivirîne. Jîr, li pê, li ber textê razanê, tahzî, bi çavên xewtijî, li Kevokê dinihêre. "Kevok... çima tu digirî? Tu çi dibêjî? Were ba min..."

"Na" Kevok, çavên wê sor û qerimî, esebî, bîhnteng, dibêje, "na, tu were... were, ez ji te re bibêjim ka ez çi dibêjim..."

Jîr dere nik Kevokê, destê xwe di stûyê wê re dibe û wê hembêz dike, "heval û hogira jiyana min" ew, bi ken, dibêje. Gava memikên Kevokê yên vekîşiyayî bi sîng û pîrçên sînga Jîr dikevin, dîsan, germahiyeke boş bi ser Kevokê de tê. Lê ew xwe radigire, hinekî xwe dide hev û "mere, tu divê nerî" dibêje. Bi dengê hinekî bilind û esebî.

"Kevok", Jîr, bi nermahî, mîna ku ew lava bike, dibêje.

"Na, na û na, divê tu nerî... Piştî pênc, şeş mehan, êdî tu dê xwendina xwe bibî sêrî. Ev salên me yên xwendinê ku me şev û roj kirin yek da ku em bi ser kevin, ev tiştên ku em hîn bûn, ev hemû dê niha vala herin? Na, te çûyin navê..."

"Kevok..."

"Me behsa dol û zarokan, mal û malbatan dikir. Law û keçên me dê bi stranên zimanê me, bi şîhîrên me mezin bibûna. Te ev yek hemû ji bîr kirine? Tu nizanî ku çûyin, mirin e? Çûyin! Yanî terk kirin, veqetîn, keser, jan û mirin... Ma tu bi vê nizanî?"

"Kevok!.." Jîr, îcar, ji nişkekê ve, diqîre û dibêje. "Kevok, sistî li te nayê, şerm e, xwe bigire... Kevok!.. Ma mirin ji vê jiyânê ne çêtir e? Bibêje, ne çêtir e? Ma em çendîn caran li ser çûyinê nepeyvîne, me gotina xwe nekiriye yek? Bibêje! Azadiya me û welatê me heye? Na. Serbestiya me heye? Na. Em dikarin, bi rehetî, bi misogerî, bibêjin ku jiyana me, pêşeroja jiyana me û zarokên ku em lê difikirin, ronî ye? Na. Vê dewletê, van generalan, ev generalê ku xwe serdarê herkesî dizane û bi fortan çêla edalet û yekîtiyê dike, jiyaneke adîl, bi edalet û wekhev dane me? Na. Na, na û na. Hingî? Bibêje Kevok, hingî?.."

Hêrseke boş Jîr vegirtiye. Ew hêrs û teqîna tarî ku Kevokê, çend caran li ser bîbikên çavên Jîr dîtibûn, niha, dîsan dixuyin. Kîn û nefret, niha, dîsan hatiye û li ser

çavên wî venîştîye. Çavên wî yên mezin vekirî, rehên qirika wî hema çî bigire li der, bi qîrîn, ew dipeyive. "Meqîre", Kevok, bi hêdîka, ji Jîr ê ku niha hinekî jê bi dûr ketiye û li navenda çavên wê dinihêre, dibêje.

"Na, Kevok, na! Bibêje! Evana me nakujin, pêr nekuştin, do nekuştin, îro nakujin, ew ê sibê nekujin? Em, her û her namirin? Her roja ku em dijîn, ji mirinê kirêttir nîn e? Welatê me di bin lingan de nîn e? Zimanê me yê bav û kalan, çanda me, hebûna me ne di bin tehdîtên xedar de ne? Ew winda nabin? Ma em, ez û tu, niha bi zimanê wan napeyivin? Çima, bibêje çima? Wan em ji reh û rêçên me bi dûr nexistine? Zept û repta wan, wekî nîrê stûyê me, hertim, li ser me hilawestî nîn e? Wan cîhên herî baş ên welatê me venegirtine, qesr, qonax, war, şar, ji bo xwe, ava nekirine? Em jî, li welatê xwe dîl, wekî xerîbên vî welatî, ji derve, bi tirs, bi xof, li wan nanihêrin? De bibêje na! Êdî tu behsa kîjan mirinê dikî? Tu bihesibîne ku min xwendin kuta kir, ew ê çî bibe? Çî biguhere? Tu tişteki, Kevok, tu tişteki..."

"Baş e, here, tu çî dikî bike, lê meqîre" Kevok, çend dilop ji çavên wê gêr dibin û dibêje, "here..." Bîhna wê teng dibe. Di vê oda biçûk de ew bi kû de here, xwe bavêje kû derî? Şeh ji destê wê dikeve, ew ji Jîr rû badide û dere li ser textê razanê rûdine. Kevok digirî. Bi qasî demeke dirêj, ew welê ji hevûdu dûr, Jîr li ber pencerê, Kevok li ser textê razanê, di nav pêlên dinyayên xwe yên cuda yên hundirîn de, dimînin. Paşê Jîr, hêdî hêdî, gav bi gav, tê, li ber serê wê disekine, porê wê mist dide û bi dû re li kêleka wê rûdine.

"Ewrên reş bi ser welatê me de girtine" Jîr, bi nermahî, kite bi kite, dibêje, "welatê me yê bav û kalan, îro, tarî ye, bi perda tarîhiyê girtî ye. Aso, esman tarî ne, av, kahnî, çem, bîr, sarîç girtî ne, çiyayên serîgewher girtî ne, mal, war, gund, bajar bûne warê kundan. Welat bi tenê ye, em bi tenê ne, însanên me yên bêpişt, bêpişk ku kêf, henek, hez û hezkirinê ji bîr kirine, bi tenê ne... ew însanên me yên reben ku ji hemû xweşî, mal û kêfxweşiyên jiyan û cîhanê bêpar mane, destşuştî bûne, îro, stûxwar in û li hêviya me ne Kevok, li hêviya me..."

Kevok li Jîr nanihêre, serê wê li ber wê, ew digirî.

"Kevok, tu meke, jixwe bîhna min çikiyayî, esebê min xirabe ye. Ez rica dikim, tu meke, min hîn bêtir mexîne", Jîr dibêje, rûyê Kevokê ber bi xwe dizivirîne û bi tiliyan rondikên çavên wê paqij dike. Jîr dikene, lê Kevok çavê xwe jê badide. Jîr, bi herdu destan, rûyê wê, hinekî ber bi jor dike da ku ew li Jîr binihêre. "Ez ketime bextê te, tu meke"

"Pêşî tarî ye, Jîro, ma tu pê nahesî?"

"Lê ronahî li pey vê serîhildanê ye, Kevok, zincîr li wir, li bilindahiyên çiyayên

welatê me dişikiyên... lê tu xwe bigire, daxwaza min, bi tenê ev yeka ye.”

Jîr rûyê Kevokê ber bi xwe dike û rûyê wê, gumikên wê, stûyê wê radimûse û paşê lêvên xwe li ser lêvên wê digerîne. Bi qasî çendekê ew lêvên Kevokê dimêje. Kevok sist dibe. Ev ramûsanên ku destpêka birûskên hundirê Kevokê ne, dîsan, germahiya birûskan a berî vedanê, di hundirê wê de tînin pê. Kevok, dîsan, hêdî hêdî, ji xwe ve dere, dikeve nav derya şehwetê. Dîsan çirûskên ronahiyeke bêpayan di hundirê wê de vêdikevin.

Kevok, bi herdu destên xwe, Jîr, hinekî dahf dide û wî, serpiştê, li ser textê razanê, radizîne. Ji Jîr hinekî bi dûr, li ber lingên wî, li ser ejnûyan rûniştî, li ser têxt, Kevok li Jîr û bedena wî ya tazî dinihêre. Bi qasî kêliyêkê, bihust bi bihust, bi çavê nêreवानan. Jîr ê here, bêyî ku ji Kevokê pê ve, haya kesî jê hebe, bi dizî, bi rev, bi lez û bez, ew ê here. Ne gotinên wê, ne jî yên wî bikêr in. Gotin zêde ne, ne hewceyî wan e. Kevok dest pê dike, ji pêçiyên lingên Jîr heta jor, heta ser çavên wî, tîlî bi tîlî, Jîr radimûse, -bêyî ku ziman û lêvên xwe ji tenê ciwan ê Jîr hilde. Hêdî hêdî, qult bi qult. Her derê bedena Jîr, bi lêvên Kevok ên germ û mezin, şil dibe. Paşê jî Kevok, îcar bi porê xwe yê dirêj û şhkirî, ji jor heta jêr, li ser hemû bedena Jîr digerrîne. Tayên porê reş û nerm, mîna pelên guleke nûbişkovî, li ser bedena Jîr digerrin. Her tayekî zelzeleyekê di hundirê Jîr de tîne pê. Mîna ku bedena wî bi ceyeranê ketibe, Jîr diheze.

Jîr dinale.

Kevok bêdeng e; çavên şil, bîhna teng, coşa hezkirinê, deng û pejnên ku di dil û mêjîyê wê de olan didin wê, wê sermest dikin. Daxwazên bedena wê ya ciwan ku di bin ronahiya agirê findan de, bi ûsil, dilive, wê, dîsan, dike birçiya hezê, dike yara hez û hezkirinê. Kevok di xew de ye? Ew hişyar e? Wext rawestiyaye? Wext bi leza birûskê diherike? Pêlên kêf û hezê ne? Aramiya kaswet û keserê ye? Gelo ev yeka hanê mirin e? Gelo ev yeka hanê, bervajiyê mirinê, vejîn e? Kevok nizane. Kevok naxwaze pê bizanibe. Kevok, bi hêdîka, şeqên xwe ji hev ve dike û hêdî hêdî li ser Jîr rûdine. Bi germahiya goştê Jîr, tîrên ronahiyekê di hundirê wê de vedidin. Ji jêr, ber bi jor, heta qirikê, heta mêjî. Tîlî bi tîlî, pêl bi pêl. Porê Kevokê li ser rûyê Jîr, tiliyên herdu destên wê di nav tiliyên Jîr de, Kevok, bi hêdîka, xwe dilivîne. Her cara ku ew xwe dilivîne, hêza tîran zêdetir, germahiya ronahiya hundirê bêtir dibe.

Kevok enî û rûyê xwe yê germ ber bi Jîr dike, li rûyê wî, çavên wî dinihêre. Mîna ku Kevokê careke din Jîr nebîne, welê xurt, li kûrahiyên çavên wî dinihêre. Mîna ku Kevok dil dike, hemû ronahiya germ ku di hundirê wê de pêl dide, bi kûrahiyên dil û hundirê Jîr veguhezîne, welê germ û nerm, xwe dilivîne.

Jîr dinale, "tol divê, Kevok, tola miriyên me divê", dibêje û li çavên Kevokê dinihêre.

"Uuuşş, dol divê " Kevok, aliyekî beden û hêtên wê bi şewqa findan ronî, dengê wî dibire û dibêje, "piştî vê, tu jî bimire, here ba miriyan..."

"Ne dol, tol" Jîr, dîsan bi lava, di nav ronahiya tîrên ku di hundirê wî de vedidin, dibêje.

"Tov, Jîr, tov, bi tenê tov!.." Kevok, bi dengê ku ji nalînê xwe digihîne qara qîrînê dibêje. "Bimire, Jîr, niha bimire... Tov, ez ê bi evîna me tovê biçînim Jîr" Kevok, niha, bi qîrîn, mîna ku ew stranekê, yan jî destanekê bixwîne, dibêje; "bi ava te, ez ê biçînim. Bi vê germahiya hundirê xwe, ez ê tovê bihebînim, ew ê zîl bide, mezin bibe... Tov divê Jîro, tov" Kevok diqîre, -û heye ku dengê wê xwe digihîne aliyê derve yê pencera oda biçûk ku êdî bi lêdana berbangê ronî bûye;

"Tov divê." □

# Charles Perrault



**FAWAZ HUSÊN**

**Jiyana Charles Perrault (1628-1703)** Perrault (Pêro) li Parîsê tê dunyayê. Bavê wî yê ku bi eslê xwe ji bajarê Tourê ye di Parlemana Parîsê de parêzger e. Perrault di dibistanê de jîrîtiya xwe ji mamosteyên xwe re diyar dike. Ew hemû klasîkan dixwîne. Ew xwendina xwe li xwendegêha Orléans-ê tev dike

û wek bavê xwe, dibe parêzger. Ew di sala 1663an de nêzîkahiye li Colbert, wezîrê Louisê Çardehan, dike. Ew di sala 1671ê de dibe endamê Akademiya fransî. Ew dev ji karê xwe diqere û bi xwedîkirina zarokên xwe û nivîsandina çîrokên xwe xerîk dibe. Ew di sala 1703an de dimire.

Nivîsên Perrault *Çîrokên demên berê*, wek çîvanokên La Fontaine, di dema xwe de seraser ciyekî mezin digirin. Kêfa her kesî ji çîrokên Perrault re tê. Ew ne tenê ji bo zarokan in; mezin jî dikarin bi saya wan fêrî gelek tiştên giranbuha bibin. Armanca Perrault di çîrokan de kêfanînan mirovan e. Lê ew jibîr nake di dawiya piraniya wan de dersekê ji dersên sinc û axlaqê bide.

## Çîrokên dêw û periyan

Di salên dawîn ên sedsala hivdehan de, bayê çîrokên dêw û periyan radibe. Li gor



ku serdem ya klasîkê ye, tevgerine nû bi nûjeniyê bang dikin û rûmeteke mezin didin xeyalê. Di xirecir û şerê di navbera »Kevinan« û »Nûjenan« de, Perraut dibe parêzgerê demên nû. Ew dema xwe, ya Louisê Çardehan kêmî demên kevinare ên Yûnanistanê û Roma berê nabîne. Ew sersala xwe di ser wan re dibîne. Ew dema pêkanînen zaniyarî û pêşketina hunerî ye. Perrault wek klasîkan nake, tenê li demên rabirdû nanere; baweriya wî bi pêşketinê û bi mirovan tê. Eger piştivanên demên klasîk guh li Demên navîn nakin, Perrault di wan de dewlemendiyeke mezin dibîne. Perrault bêguman stûna nûjeniyê ye.

Di dawiya sedsalê de, xeyal û fantazî bi xurtî vedigerin. Di vî warê edebî de, Perrault bêguman nivîskarê herî xurt û navdar e.

### **Çiroka Kumsora Biçûk**

Hebû tunebû carekê keçeke biçûk ji Gund hebû û ew bêpayan xweşik bû. Diya wê li ser wê dîn dibû û dapîra wê hêna bêtir. Vê jinê jê re kumekî sorî biçûk çêkiribû. Ew kum gelekî lê dihat û wilo jî li her derê navê wê bûbû Kumsora Biçûk.

Rojekê diya wê nanê şîrîn lêxist û jê re got: »Here bibîne dapîra te çawa ye. Dibêjin ku ew nexweş e. Nanekî şîrîn û vî kwîzê biçûk yê nîvişk jê re bibe.« Kumsora Biçûk seraser berê xwe da mala dapîra xwe. Mal li aliyê din yê gund bû. Ew di nav dehlekê re derbas bû û wê gavê ew pêrgî Gurê devgirêzî hat. Wî xwest wê bixwe lê çend êzingvanî li daristanê hebûn û wî ceger nekir. Wî jê pirsî ew bi kuderê diçû. Zaroka belengaz ya ku nizanîbû ku xeberdana bi Gur re xeter e got: »Ez ê herim dapîra xwe bibînim û nanekî şîrîn û vî kwîzê biçûk yê nîvişk ku diya min jê re dişîne bidime wê. - Mala wê dûr e? Gur got. - Çawa ne dûr e? Kumsora Biçûk got, tu êş dibînî, ew li paş wî, li wê dera ku xaniyê pêşîn yê gund dest pê dike. - Ez jî dixwazim herim wê bibînim, Gur got, ez di vê reyê re û tu di ya din re. Em ê bibînin kî berî kê wê bigihêje wê derê.«

Gur ta jê hat dest bi bazdanê kir. Wî da ser rêya herî kurt û keça biçûk da ser rêya herî dirêj. Wê bi rê de ji xwe re lîst, bindeq dane hev, bi dû pinpinîkan bazda, kulîlk dane hev. Gelek wext ji gur re nevat ku ew xwe bigihîne xaniyê dapîrê. Wî li derî da. Teq, teq. »Kî ye? - Keça we Kumsora Biçûk e (Gur dengê xwe guherand) ya ku ji we re nanekî şîrîn û kwîzekî biçûk tije nîvişkê ku diya min ji we re dişîne anîye.« Dapîra belengaz hinekî nerehet bû û di nav ciyan de bû. Wê got: »Destik bikişîne ew ê ji qula dîwêr derkeve.« Gur destik kişand û derî vebû. Wî xwe avêt ser pîra reben. Sê rojên wî çê bûbûn wî tiştêk nexwaribû

û wî jina reben di çend kêlikan de daqurtand. Paşê wî derî girt û xwe di nav ciyê Dapîrê de ramidand. Wî xwe li bendî Kumsora Biçûk ragirt. Kumsora Biçûk piştî demekê li derî da. Teq, teq. »Kî ye?» Gava dengê qalind yê gur gihast Kumsora Biçûk ew pêşî tirsîya lê wê bawer kir ku Dapîra wî helmewtî bû. Wê vegerand: »Keça we Kumsora Biçûk e ya ku ji we re nanekî şîrîn û kwîzekî biçûk tije nîvişk ku diya min ji we re dişîne aniye.« Gur hinekî dengê xwe nerim kir û got: »Destik bikişîne ew ê ji qula dîwêr derkeve.« Kumsora Biçûk destik kişand û derî vebû. Gava ew derbas bû, Gur lihêf kişand ser xwe xwe û jê re got: »Nanê şîrîn û kwîzê nîvişk yê biçûk deyne ser sindoqê û were bi min re razê.« Kumsora Biçûk kirasê xwe ji xwe dike û berê xwe da nav ciya. Ew gelekî mat ma gava bi çavên serê xwe dît Dapîra wê bê kirasê razanê çawa bû. Wê jê re got: »Dapîra min, destên te çi dirêj in! - Ta ez tê çêtir hembêz bikim, keça min. - Dapîra min, nigên te çi dirêj in! - Ta ku ez çêtir bazdim, zaroka min. - Dapîra min, guhên te çi mezin in! - Ta ku ez çêtir guhdarî bikim, zaroka min. - Dapîra min, çavên te çi beloq in! - Ta ku ez çêtir bibînim, zaroka min. - Dapîra min, diranên te çi mezin in! - Ta ku ez te bixum. Û bi van gotinan, Gurê devbigirêz xwe avêt ser Kumsora Biçûk û ew xwar.

### **Mebesta çîrokê:**

Mirov li vê derê dibîne ku  
 Zarokên biçûk,  
 Nemaze keçên biçûk,  
 Xweşik û lihevhatî û qenc  
 Tiştêkî gelekî dijwar dikin  
 gava li her kesî guhdarî dikin.  
 Û ne tiştêkî seyr e  
 Ku gur gelekî ji wan dixwe.  
 Ez dibêjim gur, ji ber ku gur hemû  
 ne wek hev in.  
 Celebeke wan heye bi zimanekî şîrîn,  
 hêdîka, bê bêhtengî û bê riq  
 ew bi nazikî, bi nermî û bi xweşî  
 Didin dû keçên ciwan

Didin dû wan ta hundirê malan, ta di nav çarşiyên biçûk de.  
Lê mixabin ! Kî nizane ku  
Ev gurên nermoke  
Ji nav hemû guran ên herî xeterdar in.

Di çîrokeke din de, Perrault li ser ziyarên fizûliyê dinivîsine. Fizûlî tiştên dijwar bi xwe re tîne. Eger Hewa ne fizûlî bûya û sêva ku mar li ber çavên wê şîrîn kir nexwara, ji xwe mirov ê herdem di buhuştâ asmanî de bûya. Di vê çîroka »Rîşîn« de, Perrault nîşan dide ku fizûlî karekî ne baş e.

### **Rîşîn**

Hebû tunebû mirovek hebû gelek malên wî li gund û bajêr hebûn, sê nî û kevçiyên zêr û zîv, asbabxaneyên bi tentenan neqîşandî û faytonên giş bi zêr rapêçandî hebûn. Lê belê ji bexterşiya wî, riya wî şîn bû. Rîya wî şîn bû û vê yekê dihişt ku ew di çavê herkesê de pir nexweşik bibûya û nava herkesê jê diqetiya. Ne jin ne keçan nikarîbûn xwe li ber şikilê wî bigirin. Cîraneke wî hebû xatûneke qedirgiran bû. Du keçên wê hebûn tu kêmasî nedihatî ser xweşikbûna wan. Wî destê yekê ji wan xwest û ji dayikê re hişt ku ew bi xwe yekê ji wan helbijêre. Herduyan nedixwestin û yekê ew şand bi ser ya din ji ber ku wan nikarîbûn biryara kirina mirovekî rîşîn bidana. Tiştê ku bêtir jî ew jê aciz dibûn ew bû ku wî Rîşînê berê gelek jin anîbûn û kesekî nizanîbû çî bi serê wan hatibû. Ji bo hevnasîne, Rîşîn ew û diya wan û çend hevalên wan ên herî nêzik û çend cîranên navderê dewetî malekê ji malên xwe ên gund kir. Ew li wê derê heyşt rojên sax man. Wextê wan giş bi seyranan, bi nêçîr û masîvaniyê, bi dîlan û xwarin û vexwarinên giran û sivik derbas bû. Xew bi çavan nediket û şev giş bi lîstik û henekan derbas dibû. Her tişt wilo derbas bû û dawî, xuşka biçûk dest pê kir dît ku rêya xwediyê malê bi rastî ne wîqasî şîn bû, ku ew camêrek bû ji haziran kêman nedikir. Piştî ku ew vegeyriyan bajêr, dawetê seraser dest pê kir. Mehek di wê navberê re buhurî. Rîşîn rojekê ji jina xwe re got ku karekî wî ji nişkê ve li Provincê derketibû. Ew bêgav bû biçûya û bi kêmanî şeş hefteyan li wê derê bimaya. Wî jê tika kir ku di dema nebûna wî de wê li malê kêfa xwe bikira, bang hevalên xwe bikira û eger dilê wê bixwesta, ew bi xwe re bibirana gund û ku li her derê wê xwarin û vexwarinên xweş û pir çê bikira, bixwara û vexwara. Wî jê re got : »Vane kiltên herdu dolabên mezin, vane kiltên dolabên kevçî û sênîyên zêr û zîv ên ku her roj nayên bi kar anîn, vane kiltên qasên min, ên zêr û

zîvê min, vane yê sindoqên qaş û xişnan û vaye kilîta ku deriyê hemû xaniyan vedi-  
ke. Ev kilîta biçûk kilîta odeka biçûk e, oda ku li dawiya dalana mezin ya qatê jêrîn  
e: Hemûyan veke, here her derê, lê ez derbasbûna vê odeka biçûk li te qedexe di-  
kim. Ez wê wilo li te qedexe dikin ku eger hat û te ew vekir, ji xwe bizanibe ku  
qehra min ê bê payan be û hesabê tiştê herî dijwar bike.« Wê jê re sûnd xwar ku wê  
bi gotinên wî bikira û ku wê hemû fermanên wî bi cîh bikirana. Ew wê maç dike û  
paşê li faytona xwe siwar dibe û dide ser reya xwe. Jinên cîranan û hevalên wê xwe  
negirtin ta ku Bûk bişîne dû wan. Wek ku agir ketibûya wan, wan hema dixwesrin  
zû hemû dewlemendiya malê bibînin. Gava mêr li malê bû wan ceher nedikirin ji  
ber ku riwa şîn ew ditirsandin.»

Mirov bi hêsanî dikare tê bigihêje ku kevaniya ciwan ê bi xwe nikaribe û de-  
riyê odeka biçûk veke. Ew di wê de laşên hemû jinên berî xwe daliqayî û di nav  
xwînê de dibîne. Kilîr ji tirsê wê dikeve nav xwînê. Ew derî digire û paşê  
dike nake ew xwîn ji kilîrê naçe. Rîşîn zû vedigere û kilîrê jê dixwaze. Ew xwe  
giran dike lê bêgav dibe kilîrê lê vegehe. Rîşîn dizane û ê wê jî daliqîne lê bex-  
rê vê keçê heye. Ew hildikişe ser qesrê û gazî xwişka xwe dike ku ew gazî birayên  
wê bike. Bira tên. Rîşîn wan nasdike û direve lê herdû biran şûrên xwe di  
laşê wî de radikin û wî dikujin. Xuşka wan ji tirsê nava xwe li ber mirinê ye, ni-  
zane çawa birayên xwe maç bike. Hemû malên Rîşîn jê re dimînin ji ber ku tu  
zarokên wî tunene. Bi wan perên pir, jina Rîşîn xweh û birayên xwe dizewicîne  
û wan dewlemend dike. Çîrok tev dibe. Perrault di dwaiya wê de, wek hergav,  
dersekê dide mezin û biçûkan: ji ber fizûliyê tenê serêş peyda dibin.

Çîrokên Perrault li ber romana gelêrî xwe nagire. Ew paşê ciyê xwe di nav  
pirtûkên ji bo zarokan de digire. □

# Hevaltî



MIHEMED DEHSIWAR

Azad ji zû ve bêriya derketina derva kiribû. Der-sên wî û rewşa jiyana nû ya welêt ew westandibûn. Gelek caran xwestibû here li çolê bigere, têkeve avê û qasekî bêhna xwe berde, lê ne bûbû qismet. Her wiha bêriya hevalên xwe yên ji dervayî dibistanê jî kiribû û dixwest carina bi wan re jî biaxife û bileyi-

ze. Wê rojê bi wê kelewacê ji xwendegehê hat malê û çenteyê xwe danî ber textê razanê. Diya wî xwarin hazir kiribû lê pêwîst bû ku Azad û xwişkê xwe jî alîkariya wê bikin û firaq li ser maseya xwarinê rast bikin. Diya wî ji mutbaxê bangî Azad kir:

– Azad, lawê min mala apê te îşev mêvanê me ne. Tu û xweha xwe alîkariya min bikin ku şîva wan dereng nemîne.

Azad bi vê gotina diya xwe pîrîr kêfxweş bû:

– Bi rastî! Selman jî tê?

Diya wî bi kêf bersiv da:

– Erê lawê min, ew jî dê were. De ka bilezîne hê ku bavê te ji kar nehatiye.

Azad bi kêf bangî xweha xwe kir ku were xwarê û seleteyê hazir bike û wî bi xwe jî firaq li ser sifreyê rast kirin.

Wî ji kurapê xwe Selman gelek hez dikir. Gelek caran bi hev re derketibûn derva, geriyabûn û ketibûn avên çem û birkan. Her çiqas Selman bi temenê xwe bi çend salan ji wî mezintir bû û bi sê sinifan jî jê bilindtir dixwend, bi hev re ne weke kurapan lê weke du hevalan dijiyan. Gelek caran di hewşa taxê de bi hev re tevî hevalên taxê dileyistin û bi hev re di tîpa fûtbolê de jî cih girtibûn. Hevaltiya wan a herî xweş jî heyama ku bi hev re diçûn hewzên avê û avjenî dikirin. Azad jê fêrî avjeniyê û herî giringtir fêrî nuqoyê (xwe avêtina li ser serî) bûbû. Her wiha avjeniya li ser piştê, ya di bin avê de û şeklên din jî jê hîn bûbû. Îşev jî piştî şivê ji dê û bavên xwe destûr girtibûn da ku herin birka Serê Gir.

Birka Serê Gir nû vebûbû û gelekî sipehî bû. Ji bilî ku li dervayî bajêr dima, li cîhekî xweş û bilind hatibû avakirin. Hewz ji bajêr hinekî dûr û li ser riya Amedê, li serê girekî bilind bû. Dora hewz, bi dar û berên fêkiyan û gul û çiçekên têkel hatibû xemilandin. Çaraliyê wê bi diwarên fereh û bilind hatibû parastin û ji derva ve bi rengê şîn, ji hundir ve jî bi rengê qehweyî hatibû boyaxkirin. Nava birka avê û kêlekên ber hewz jî bi boyaxa plastîk î şîn hatibû xemilandin. Li serê her aliyekî birkê û kêlekên wê jî şeklên cuda ku ji rengên sor û qehweyî hatibûn danîn, erda hundirû bêtir sipehî dikir. Li hêla rastê bîst odayên biçûk ku ji textan hatibûn çêkirin, bi rêzê hatibûn avakirin. Mîrov li wir cilên xwe diguhart, derpiyên avjeniyê li xwe dikir û hê diket nav avê. Li hêla din jî nêzî deh odeyan ji bo jinan ava kiribûn. Deriyên odayên jinan weke yên mêran ji derva ve ne vekirî bûn; seranserê hêla wan bi dîwarekî hatibû parastin.

Deriyê avahiyê ji saceke qalind, mezin û dualî hatibû pê. Li pêşiya derî parkeke mezin a dar û beran û di nav vê parkê de jî parka trimbêlan hebû. Li aliyê hundir piraniya caran karkerek diman da ku pereyên mêvanan ji wan bigirin û wan berdin hundir. Avahiya xwaringehê û kafateryayê di quntara gir de ava kiribûn. Kesê bixwesta, dikaribû li vir xwarin bixwara yan jî tiştêkî cemidî vexwara. Ji bo xebata êvarê jî xwarinpêjekî navdar girtibûn daku xwarinheg êvaran jî baş kar bike. Her wiha dawiyên heftiyên jî grûbên mûsikê dihatin wir; mûsîka kurdî ya xweş şewq û evî-nê, hesret û şahiyê li dora xwe belav dikir.

Azad û kurapê xwe Selman çend caran tevî malbatên xwe bûbûn mêvanên vê xweşiyê û heta derengê şevê li mûsîka kurdî guhdarî kiribûn an jî şanoyên dîtrokî û civakî temaşe kiribûn. Karkerên avahiyê herdu jî nas dikirin û gelek caran ew bê pere berdidan hundir. Lewra jî gava wextê wan î vala hebûya, wan berên xwe didan wir. Dê sibê jî herdu biçûna wirê û têr avjenî bikirana û bêhna xwe berdana.

Roja din piştî xwarina nîvro, herdu hevalan hev li bajêr dîtin û berê xwe dan Serê Gir. Ji bo çûyina wir du alternatîvên wan hebûn: bi piya ku hinek dût bû yan jî ji dostekî xwe yê xwedî erebe rica bikirina ku ew bibirna wir. Li sûtê pismamê xwe Mûsa ku di şîrketêke taksîyê de kar dikir dîtin û jê rica kirin da ku wan bigihîne Serê Gir. Mûsa jî dixwest here qasekî têkeve avê û xwe hênîk bike. Ji xwe niha zêde kar jî tune bû. Mûsa piştî demeke kin vegeriya ser karê xwe, lê Azad û Selman heta ber êvarê li wir man; avjenî kirin û têr leyistin. Dema xwe ji Serê Gir ber bi xwarê ve berdan, herdu jî westiyabûn lê kêfa wan li cîh bû.

Mîna gelek bajarên Kurdistanê Hezyar jî rojên gulanê germ e. Tava nav rojê dora xwe germ dike, ruh û xwînê dide dora xwe. Dar û beran, gul û çîçekan geş dike. Wê rojê jî dema Azad û Selman xwe ji Serê Gir berdan xwarê, di nav gul û çîçekên rengîn, dar û berên curbecur de gihîştin genimê simbilbilind. Ji ber quntara gir ta keviya bajêr bi ceh, genim, nîsik, nok û berên mîna van hatibû çandin.

Azad û Selman ji nav dar û beran derketin û gihîştin sînorê genimê heşîn. Selman destê xwe dirêjî şitleke şoqileke (baqle) ku di kêleka genim de gihîştibû kir, ew jî nav axê hilkişand û dest bi xwarina berên wê kir.

Zeviyê genimê ku herdu heval di ber de dimeşyan, bi şiverêyeke teng ji hev bi du aliyên qetiyabû. Selman berê xwe da ser şiveriya teng û Azad jî da pey wî. Selman pêşî çend daran baqleyên kêleka zeviyê hilkişand, qaçilên wan ji wan kir û berên wan xwar. Piştî re hêdî hêdî bi nav genim ve çû û di nav genim de li baqleyan geriya. Azad ne dixwest têkeve nav genim û zerarê bidê lê Selman pê keniya:

– Ka tu jî were lo, meriv dibêqê tu ditirsî! Binêre çiqas gir bûne, tehma wan jî xweş e!

Azad careke din li dora xwe nihêrt û bangî Selman kir:

– De ka were em herin; niha xwedî were em dê bihetikin.

Selman bi ken ew bersivand:

– Ji bîr neke ku em genimê wan jî paqij dikin. Ji dêlîva xwe aciz bikin, bira kêfxweş bibin. De tu jî were hinekî bicivîne ku em zû herin.

Azad bêyî dilê xwe kete nav genim û di nav genim de xwe xwar kir ku hinek baqle bide hev. Hê xwe nû xwar kiribû, dengê çêr û kufriyan hat guhên wî. Azad rabû piya ku mêzeke ka ev dengê çiyê; bi rabûnê re, xwe li erdê dirêjkirî dît. Xortekî gir î bejîndirêj, bi kutekê ew xistibû erdê. Azad ji nişka ve xwe li erdê dirêjkirî dît. Çaxê bi xwe hisiya û serê xwe rakir ku lê mêzeke, xortê ku du daran ji wê girtir bû, vê carê bi pihîna kete ser dilê wî. Ji hêlekê ve jî berê xwe da Selman û pêçiya

xwe ber bi hêla wî ve dirêj kir:

– Tu qet xeber nede, neke ku li te jî vegerim!

Azad berê xwe da Selman. Selman di cîhê xwe de cemidî bû; ne gotin ji devê wî derdiketin û ne jî xwe tev dida. Di şûna xwe de piçûk bûbû, bûbû weke pisîkekê. Xortê ku Selman dinasî, bi pihîna li serê wî û nava wî dixist. Piştî têra xwe li Azad xist û ew bê hal hişt, berê xwe da Selman û wiha got:

– Belkî ev lêdan aqilê we bîne serê we ku hun careke din nekevin nav zadên kesî!

Piştî van gotinan bi çavên tiro– viro herdu hevalan bitenê hişt û ji wan dûr bû. Selman di rewşeke matmayî de, ge li xortê hevalê xwe yê dibistanê, ge jî li Azadê li erdê dirêjkirî dinihêrt. Nizanibû çî bike; bikene yan jî bigrî..

Çaxê Azad bi hişê xwe ve hat rabû rûnişt û li dora xwe nihêrt. Pişt re hêdî hêdî ji erdê rabû û bêyî ku berê xwe bide heval û kurapê xwe, meşiya. Lê taqeta wî tunebû; çokên wî fisiyan û dîsa bi erdê ve kil bû. Selmanê kurapê wî, bi ketina Azad re bi hişê xwe ve hat; ji cîhê xwe bazda ku bigihîjê û wî zeft bike. Lê negihîştê; Azad vê carê li erdê dirêj nebû. Destên xwe da ber xwe û di nav genim de çok da. Selman destê xwe avêt milên wî û ew rakir ser piyan. Azad bêyî ku berê xwe bidê, rabû piya û dest bi meşê kir. Bi meşê re jî milê xwe ji destê Selman rizgar kir û bi tenê berê xwe da malê. Selman dîsa gihîştê, kete milê wî û jê re wiha got:

– Çima ecele dikî? Ka rûnê û xwe hinek rihet bike; pişt re jî em herin dest û ruyê te bişon, ser û guhê te bidin hev û hê herin malê.

Azad bê axaftin di kêleka Selman de meşiya. Heta ku gihîştin kaniya nêzî malan, gotin ji devê yekî jî derneket. Çaxê gihîştin ser kaniyê, Azad dest û rûyê xwe şûst û pêşî îşlikê di xwînedemayî hinek şûst û paqij kir, pişt re jî şalê xwe û sola xwe paqij kir. Selman jî weke ku bixwaze ji xewê şiyar bibe rûyê xwe da ber çirika avê.

Rûyê Azad, dev û çavên wî di nava birînan de mabûn. Her derên wî weke ku ketibe nav cendereya êş, diêşiya. Hê jî dilopên xwînê ji dev û pozê wî dihatin; dev û bêvila wî di nav birînan de mabûn û ji ber derbeyan werimîbûn.

Lê ji xwîn û birînan bêtir ew li ber xwe diket; ne ji ber ku ji xortekî gir, bi qewet û bejindirêj lêdaneke pîrr û neheq xwaribû, lê ji ber ku di wê rewşa zor û kesnedîtî de, heval û kurapê wî bi hewara wî ve nehatibû. Azad dizanibû ku navê vî xortî – yan jî zilamî– Osman bû û di sinifa kurapê wî Selman de dixwend.

Azad jî ji dûr ve ew nas dikir. Osmanê ku wê rojê ew di nav birînan de hiştibû ji gundekî nêzî bajêr bû û her roj bi bisiklêtê ji gund dihat xwendegeha bajêr û êvaran jî vedigeriya gundê xwe. Ta niha di nava wan de tu nexweşiyeke wisan derneketibû. Li xwendegehê mirovekî di halê xwe de xwanê dikir û bela xwe di kesî ne-



dida. Di temenekî mezin de dest bi xwendinê kiribû û lewre jî ji piraniya hevalên xwe mezintir û bejimbilindtir bû. Ji ber di sinifa kurapê wî de dixwend, piraniya caran bi hev re dileyîstin, kêf û henek dikirin. Ji ber wê jî Azad ji wî tişteki wiha nedîpa. Ya herî girîng jî tu gotin ji devê Selman derneketibûn û qet xwe tev nedabû ku alîkariya wî bike, yan jî ji xortezilamê nasê xwe re »wiha neke!« bibêje.

\* \* \*

Vê yekê ew pirr aciz kiribû. Hevaltî ew bû ku meriv li hevalê xwe xweyî derkeve û hev li hember neheqî û xeteran biparêze. Hevaltiya herî girîng û bi qîmet di rojên xweş û yê tenge û nexweş de eşkere dibû. Mirov wê hingê dikaribû hevaltî û dostaniya xwe bidana nîşandan. Mirov di rojên xweş de, xweşî û kêfxweşiyê bi dost û hevalên xwe re parvedikir û di rojên tenge û xerab de jî derd û kulên hev an jî zorî, nexweşî û neheqiyên bi hev re himêz dikir. Li gorî bîr û raya Azad maneya hevaltiyê ev bû. Wiha fêr bûbû û wiha dizanibû. Ji bo wî hevaltî tişteki pîroz î pirr bi rûmet bû. Ji lewre jî pirr qîmet û rûmet dida dost û hevalên xwe; her tim piştgirî û alîkariya dost û hevalên xwe dikir.

Ew her wiha li hember neheqiyên jî pirr dijwar bû; zilm û neheqî qebûl û tamûl nedikir. Çaxê pê dihisiya ku li der- dora wî neheqî qewimîne, bi ser zilmdar û neheqan ve diçû û kesên ketî û bêçare diparastin. Bi vî umrê xwe yî biçûk, ev bawerî jê re bûbû felsefeyeke jiyane. Dîtin û baweriyên wî wisan şikil girtibûn û rê didan kiryarên wî. Ji xwe ne wiha bûna him wek şexis û him jî bi giştî wek welêt bi pêş nediketin. Serokên komar û dewletê jî ev yek wiha diyar kiribûn. Ne bi vî şiklî bûna, welat û millet bi pêş nediket, gotibûn wan. Ji dêûbavê xwe jî wiha fêr bûbû.

Azad bi van fikran nêzikayî li malê kiribû. Çaxê ew û Selman ketin hundir û diya wî rewşa wî ferq kir, qêrîn jê hat:

– Ev çi hal e lawo, çi bi te hatiye?

Selman xwest bi axife lê Azad berî wî bersîva diya xwe da:

– Ne tişteki girîng e dayê. Çaxê em ji Serê Gir peya bûn, lingê min şemitî û ez di gir de gêr bûm. Hinek xwîn ji pozê min hat û diranekî min xwîn bû.

Selman pêwîst nedît ku li ser gotinên Azad tişteki zêde bike; weke ku pirr li ber xwe ketibe, serê xwe xist ber xwe û li erdê mêze kir. Lê diya Azad ji gotinên kurê xwe baş emîn nebû, ber bi wî ve meşiya û xwest ji nêz ve lê mêze bike.

– Lawê min, ev ne halê ketin û gêrbûnê ye; birînen te dewsa derbeyan e. Mirov dibêje qey hinekan li te xistiye, diya wî got û berê xwe bi pirs da Selman.

Selman nexwest çavên wî bikevin pêşberî çavên jinapa wî, berê xwe da Azad û li

ser sendeliyê kêleka xwe rûnişt. Azad ji pirsên diya xwe aciz bû:

– Dayê wê kî li min bixe! Çima tu ji min bawer nakî? Ez şimitîm û gêr bûm, bi hêrs got û ber bi serşokê ve çû.

Diya wî ev car berê xwe da Selman:

– Selmanê min, ka tu bibêje lawê min; çi bi we hatiye? Qey tu ne pê re bû yî? Çawa wisan gêr bû û dev û pozê wî di nav birînan de man?

Selman ji ser sendelî rabû piya, bêyî ku li nav çavên jinmama xwe binihêre:

– Te gotinên wî bihîst, çima ji min dipirsî, got û bi rewşeke kelogirî ji hundir derket.

Diya wî hê bêtir şaş ma, fêm kir ku tiştê qewimî bû lê nizanibû çi.

\* \* \*

Azad rojên duşem û sêşemê neçû xwendegêhê. Ji bilî birînen serûçav, hundirê wî jî gelek êşiyabû. Du rojan di odeya xwe de bi nava xwe girtibû û di nava livînan de xwe dualî zîvirandibû. Dêûbavên wî car bi car li halê wî pirsibûn û xwestibûn esehiya bûyerê fêm bikin, lê bersiva wî ne guhirî; ew ji serê gir gêrbûbû. Diya wî xwestibû doktrerekî bîne malê ku li birînen wî mêzeke lê Azad xwe nedabû ber. Ji diya xwe re qet behsa derbeyên pihînan ku li nava wî û laşê wî ketibûn, nekir. Dizanibû heke diya wî pê bihisiya, wê li bûyerê bikola û rewş fêm bikira. Ji bo wê jî Azad di mahdê xwe de dernedixist ku çiqas diêşê.

Mamosteyê wî roja din ji bo ku Azad di dersan de ji hevalên xwe bi paş de nemîne, dersên ku xwendibûn û yên ku wê bixwendina bi herdu hevalên wî re şandibû malê. Wê rojê piştî dersê Mirad û Bêrî li ser daxwaza mamoste, çûn mala Azad; wê bi vê hincetê li halê hevalê xwe jî bipirsîyana û rewşa wî ji nêz ve fêrbûna.

Dema diya wî xeber dayê ku du hevalên wî hatine, Azad ji nav livînan derket, xwe hinekî ediland û li ser paljursiyekî rûnişt. Diya wî di pêş de, Mirad û Bêrî jî li pey wê, ketin odeyê. Azad devliken bixêrhatin da herdu hevalên xwe û ew dan rûniştandin.

Li ser pirsê Mirad, Azad bûyera ku di serê wî re derbas bûbû, bi şeklekî ku ji diya xwe re gotibû, ji wan re jî gotibû. Mirad li rewşa wî nihêrt, di ber xwe de keniya lê tiştê negot. Mirad ji çîroka wî bawer nekiribû. Her çiqas birînen rûyê wî werma xwe danibû jî, rewşa wî ne ya ku ji serê girekî ketibe. Azad fêm kir ku hevalê wî jê bawer nake, xwest axaftinê bibe ser tiştêkî din. Pirsê rewşa dibistanê û hevalên din kir.

Bêrî di bin çavan de li Azad mêze dikir û carina jî ku dor dihatê, behsa xwende-

gehê û dersan dikir. Heyama ku çavên wê diketin ên pêşberî Azad, hinarokên rûyê wê xwiya dikirin, rûyê wê bi giştî sor dibû û dilê wê dikir kute– kut. Azad ev hîssên wê ferq dikir û wî jî ji Bêriyê hez dikir, lê weke hevalekê. Hê ji bo wan pirr zû bû, difikirî Azad. Jiyanekê têr û tijî li pêşiya wan hebû û eceleya evîndariyê jî tune bû. Pêwîst bû xwendegeha xwe bixwîne, bibe xwedî kar daku bi kêrî xwe û welatê xwe bê. Her wiha pêwîst bû zarokiya xwe jî bijî.

\* \* \*

Azad herdu hevalên xwe di rewşeke ecêb de naskiribû. Xwendegeha wan î nû hê dest pê kiribû. Niha dest bi xwendeha bilindtir kiribûn û pirraniya şagirtên hevalên wî çûbûn dibîstanên din yan jî ketibûn beş û sinifên cuda. Pirraniya şagirtên sinifa wî ji xwendegehên curbicur hatibûn û hev ne dinasîn. Di nav wan de xortekî bi navê Mirad hebû ku pirr netebitî û belakir hebû. Ji bo ku mezinatî û mêraniya xwe bide îspatkirin û qebûlîkirin, kenê xwe bi herkesî dikir û bela xwe li der– dora dixist.

Hê heftiyek di ser destpêkirina dibîstanê de derbas nebûbû, Mirad bela xwe li çend kesan xistibû. Bi vî awayî tirsaxwe xistibû dilê pirraniya şagirtên sinifê. Niha jî dora sinifên din bû. Azad ji van kiryarên wî gelek aciz dibû lê ne dixwest ku niha têkil bibe. Roja îne tehemula wî qediya. Mirad vê carê bela xwe li du keçekan xist û xwest di nav hevalên wan de kenê xwe bi wan bike. Hevala Bêrî ku li kêleka wê dirûnişt, dengê xwe ji gotinên Mirad re nekiribû, lê Bêrî diyar kiribû ku ji he nekên wî hez nake. Xortê belakir ji bersîva wê aciz bûbû û dengê xwe bilind kiribû. Keçik jî bê bersiv nemabû. Xortê bêtir aciz bûbû, heta niha tu kesî wiha ew ne bersivandibû. Li ser vê, dengê xwe bêtir bilind kiribû û destê xwe, weke ku bixwaze lê xe, bilind kiribû.

Azad ji nêz ve bûbû guhdarê vê nîqaş û heqaretên xortê belakir û bersîva keçikê. Kêfa wî, ji roja pêşî ve ji rewş û kiryarên wî re nehatibû. Azad ji tiştên wiha hez nedikir. Belakirî û neheqî ne karê wî bû. Li belayê ne digeriya, lê neheqî jî qebûl nedikir. Ji berê ve tiştên wiha tehemul nedikir û niha jî dilê wî tunebû ku qebûl bike. Bi biryar ji cîhê xwe rabû, ber bi xortê belakir ve çûbû, berê xwe dabûyê û:

– Tu şerm nakî ku bela xwe li keçekê dixî! gotibû.

Xortê ji nava xwe razî, bersiveke wiha ji Azad nedîpa. Ev xortê han kî bû û ji ku derketibû? Kesî li hemberî wî wisa xeber nedabû; wî bi çî xwe û bi çî qewetê gotinên wisan jê re digot! Ji xwe ji bersîva keçikê pirr aciz bûbû, xwest acizbûna xwe di rûyê wî de diyar bike. Destê xwe bilind kir ku şeqamekê li Azad bixe. Lê tiştek di

hundirê wî de, ew dida rawestandî. Azad jê netirsiyabû û xwe ji ber destê wî nedabû alî. Ev hê bêtir li ecêba xortê bi bela hatibû û ew hê bêtir aciz bûbû. Êdî nizanibû çî bike. Azad ji wê rewşa wî îstifade kir û hê bêtir bi ser ve çû. Xeletiyên wî bi dengêkî bilind, lê bi zimanekî helîm jê re diyarkir. Ger pêwîstbûna, amadeyî şerkinî jî bû. Miradê belakir, ji hêlekê ve li vê mêrxasiya vî xortî ecêbmayî mabû û ji hêla din ve jî di hundirê xwe de dikir biteqiya.

Çaxê gotin jê çênebûbûn, Azad hê bêtir bi ser de çûbû û:

– Te destê xwe bilind kir, dawêşîne jî! Li min xe ku ez û tu ji hev re çend gotinan bibêjin! Tu wisa bawer dikî ku mirov bi dengbilindkirinê û bi lêdanê dibe leheng û peyayê xwendegehê?

Mirad bêbersiv mabû, nizanibû çî bike. Dawî pêçiya xwe ber bi Azad ve dirêj kiribû û:

– Tu bisekine, ger tu wisan dom bikî, wê belayeke mezin were serê te, gotibû û bi lez ji sinifê derketibû.

\* \* \*

Azad bi vê bûyerê Mirad û Bêrî naskiribûn. Piştî vê bûyerê di nava Bêrî û Azad de nêzikahiyek peyda bûbû; bûbûn dost û hevalên hev. Her wiha Azad çend roj pişt re, li hewşa xwendegehê çûbû cem Mirad û pê re xeber dabû. Mirad pêşî nexwestibû pê re xeber de, lê piştî ku Azad bi zimanekî xweş û helîm şaşîtiyên wî diyarkiribû û riya rast jê re nîşan dabû, nêzikahiyek ketibû nava wan. Piştî vê û çend axaftinên din, herdu xort bûbûn hevalên hev î herî nêz.

Mirad ji malbateke bi problem dihat. Bavê wî di dema tekoşîna rizgariyê, de ji teref polîsên sîvîl ve hatibû şehîtkirin û diya wî jî du sal şûnde bi mêrekî din re zewicî bû. Hê pênc salî dev ji diya xwe û zirbavê xwe berdabû û li cem bapîrê xwe bicîh bûbû. Ji ber ku zirbavê wî lê tadeyî neke, diya wî dengê xwe ji çûna wî re nekiribû.

Şehîdbûna bavê wî û jinûve mêrkirina diya wî, li ser Mirad tesîreke mezin kiribû. Li cem bapîr û dapîra xwe jî bi tenê û serberdayî mabû. Têkiliyên wî bi xortên serberdayî re çêbûbûn û şêklê jiyana wî ketibû riyeke cuda. Mirovekî sar, bêhîs û belakir jê derketibû. Tenê ji zor û lêdanê fêhm dikir. Jiyana bê xire– cir û bê bela, jê re jiyaneke bê tam bû.

\* \* \*

Bêrî dixwest zû rabe, lê heta wê rewanî nexwar, diya Azad ew berneda. Piştî şerbet

jî vexwar, Bêrî rabû û çû malê. Piştî herdu heval bitenê man, Mirad xwe nêzî wî kir û jê pirsî:

– De ka ji min re bêje; çi bi serê te hatiye?

Azad xwest ku çîroka xwe dubare bike, lê Mirad nehişt bipeyive:

– ... lê vê neqilê ya rastî bêje!

Azad hinek fikirî û berê xwe da Mirad:

– Ez dê bi şertê ku tu ji kesî re nebêjî ji te re bêjim, got û piştî soza ku ji kesekî re nebêje jê girt, bûyer ji hevalê xwe re got.

Mirad ji acizbûnê ge radibû, ge jî rûdinişt. Dikir ku laşê xwe bixwe. Diranên xwe diqiriçand û destên xwe li hev dixist. Dawî ji Azad re wiha got:

– Ger ev jê re ma, bira ji min re jî nebêjin Mirad!

– Ji bîr neke, te soz da min ku tu dengê xwe nekî, got Azad.

Mirad serê xwe di ber xwe de hejand:

– Belê, min ji te re soz da ku ez ji kesî re nabêjim, lê ez sozeke din jî didim ku ev jê re namîne!

Mirad li ser dawxaza Azad û diya wî bi wan re şiv xwar û hê çû malê.

Azad roja din vegeyabû xwendegeha xwe. Herkes bi hatina wî kêfxweş bûbû û dibistan dîsa şên bûbû. Wî jî bêriya dibistanê û hevalên xwe kiribû.

Selman stûxwarî û şermezarî li halê Azad pirsî, lê rûyê wî ne digirt ku zêde bi ser ve here. Ji bêdengmana xwe ya bûyera çend roj berê, pirr şerm dikir. Azad jî jê sar bûbû; Selmanê ku hewqas jê hez dikir û bi hêviyên mezin lê mêze dikir, ne li gora baweriyên wî derketibû. Tevî vê jî tu niyeta Azad tunebû ku meselê mezintir bike û ji kurapê xwe bixeyide. Azad biryar dabû ku ji niha pê ve Selman tenê kurapê wî bû, lê ne hevalê wî bû.

Sînor û berpirsîyariyên hevaltiyê bêtir fereh bûn. Lihevpirsîn û li ser hev qewimandin, piştgirtin û rûmetgirtin, bawerî û hezkirin diketin nav van sînoran. Azad hevaltiyê wisa fêr bûbû, wisa dizanibû. Ger ne wisa bûya, tu maneya hevaltiyê jî nedima. Ji lewre jî rûmet û qîmeteke pirr mezin dida hevalên xwe û hevaltiyê.

\* \* \*

Roja duşemê heyama ku Azad ji dersxaneyê derket û li hewşa dibistanê çend hevalên xwe dît, pê hesiya ku Osman îro nehatibû dibistanê. Li gorî gotinan, çend xortên ji dervayî xwendegehê di riya gund de ew zevt kiribûn û têra wî li xistibûn. Şagirtan fêm nekiribûn bê çima li Osmanê feqîr û bêdeng xistibûn. Ser û çavên wî

bûbûn birîn û destê wî yê rastê hatibû şikênandin. Piştî ku Azad bi bûyerê hisiya, bi milê Mirad girt û ew bir cîhekî nepenî. Ji hêlekê ve kêfa wî hatibû ku Mirad li ser wî qewimandibû, lê ji hêla din ve nedixwest ku ji bo wî mesele mezintir bibe. Her wiha li pey heyfê jî nedigeriya; heyfa li hember hevvelatîyên xwe, tu kesî negihîstandibû derekê û ji feyde bêtir, zerarê dida dora xwe.

Dema ku bi tenê man, Azad pê re xeyidî û:

– Te dîsa bi ya xwe kir; min ji te re negot ku tu têkilî wî nabî! got.

Mirad devliken bersîv da:

– Ez bi şerefa te sond dixwim ku min ew nedîtiye û destê xwe jî nedayê. Lê ji bir neke ku ger kî bi kê karibe û lêbixe, dê ev welat di xwînê de bixeniqe. Ez vê yekê ji te fêr bûme, ger ne rast be, bêja ne rast e.

Azad dengê xwe nekir. Bi madekî xeyidî ji cem Mirad dûr çû. Mirad li pey wî baz da û bi ken:

– Tu çima ji min dixeyidî! Tu bawer dikî ku dê ev jê re bimana? Tu hevalê min î û ez amadê me ku ji bo te, serê xwe bidim şikandin.

Azad li hevalê xwe mêze kir, pê re bişirî û herdu heval di kêleka hev de meşîyan. Mirad li ber derî destê xwe li piştê wî xist û herdu bi hev re ketin xwendegehê.

Jiyan pîrr ecêb bû, kurap û hevalê wî Selman ku her tim bi hev re bûn û weke du birayan bêyî hev nediqedandin, li ser Azad ne qewimandibû, lê Miradê ku demek berê bi hev re şer kiribûn, heyfa wî ji xortê bejinbilind hildabû.

Hevaltiya ku di serê wî de cîh girtibû, jinûve hat bîra wî. Bêhna wî derket, bevzê wî xweş bû. Hevaltî tişteki xweş, birûmet û qedirbilind bû. Dîsa baweriya wî bicîh bûbû û dilê wî xweş bûbû. Bi kêf û serbilind tevî hevalê xwe kete dersxaneyê; bi hêvî û devliken li dora xwe mêze kir û bibawerî li cîhê xwe rûnişt. □

# Rezê gewr de tişt nema

Rezê gewr de tişt nema  
Di payîza paşîn de  
Talanbûyî mêwa jar  
Dêlî tazî, perîşan  
Ne j' gûşiyên dilbij û  
Pelên hêşînên jînbexş  
Ku lê xeml û xişir bûn  
Ne nav ma jê, ne nîşan.

Çerxa zeman zivirî  
Di gera xwe, bê hay lê  
Ji evîn û hezî û  
Gihîştina kemalê  
Bêfam e, çawa fêma ke  
Ji hêvî û xeyalê  
Ew bi gera xwe bilî  
Wekî din tune l' balê

Rezê gewr de tişt nema  
Heywax! zemanek rez bû  
Hêvî bû di biharê  
Ji rezvan re merez bû.  
Çerxa zemanê bêfam  
Payîz anî bi serî  
Zeman bê fam û fikir  
Bê hîs û bê xerez bû.

## ROJEN BARNAS

Di hejmara 23'an de, di rêza dawî ya şîra R. Barnas de "û"yek ketiye. Rastiya rêza dawî ev e:  
"Dest bi dest û li nik te."

# Hewî

Beş: 3

## XEMGÎN TEMÊ

Cîh li ber kaniyê, piştî heftreyekê, roja desgîranê, Hemo li bin darê rûniştî ye, li bilûrê dixê, bi kul û derd e. Şêrîn tê ser avê, hênceta wê ya ku Hemo bibînê hebû, Hemo çav lê ket, bilûr danî erdê.

**Şêrîn:** Diyar e tu gellekî bi kul û derd î!

**Hemo:** Te kul û derdên min dijwar kirin, te birînê min sûtin.

**Şêrîn:** Ne bi destê min e, ma ez dikarim çi bikim?

**Hemo:** Dermanekî ji bo min peyde bike. (*Şêrîn li teniştê wî rûniştî û destê xwe danî ser serê wî û giriya.*)

**Şêrîn:** Dermanê te ez im, lê ez jî di behra kûr de wenda bûm.

**Hemo:** Çima tu wenda bûyî? Te çima qebûl kir?

**Şêrîn:** Çare nemabû, ez jin im, bê çare bûm.

**Hemo:** Min tenê nehêl, dûrî min nekev Şêrîn.

**Şêrîn:** Ma ka ez ê çi bikim? Ez bûme jina Şêxmûs Paşa, wê sibehî bên min bibin.

**Hemo:** Te ez kuştim, wê jîna bê te ji bo min bibe jehra silêmanî.

**Şêrîn:** Ne sûtê min e, sûtê bavê min e Hemo.

**Hemo:** Sûtê ku ez ji te hez dikim, ez jî insan im, lazime te qebûl nekiriba.

**Şêrîn:** Hemo ez jî ji te hez dikim, bawer bik Şêrîn, ji min bawer bik.

**Hemo:** Ez ji te bawer dikim Hemo, lê te ez bi tenê hiştim, min tenê nehêl. (*Ew maç kir, serê wê danî ser dilê xwe.*)

**Şêrîn:** Ez nikarim bavê xwe fedîkar derxim.

**Hemo:** Çima ew te fedîkar derdixê. Ew te dide ser hewiyê.

**Şêrîn:** (*Hinekî guhdar dike û bi dû re*) Hemo divê ez biçim, dê haziriya min bikin.

**Hemo:** Neçe, Şêrîn li nik min be.

**Şêrîn:** Ez nikarim, nikarim, divê ez biçim, divê ez haziriya xwe bikim.

**Hemo:** Neçe, ka em hevdu birevînin, ji vir dût bikevin.

**Şêrîn:** Na Hemo, na, dê me bikujin, dê me serjê bikin.



**Hemo:** Nexwe tu bi a min nakî, tu dê herî û em ê nema hevdu bibînîn?

**Şêrîn:** Em ê hevdu bibînîn, ji min aciz nebe, ji min nexeyîde, tu xort î, lê te ez pîr kirim.

**Hemo:** Na Şêrîn, na, neçe, bihêl ez bi te şa bibim. *(Şêrîn rawestiya. Herdu bi hev re giriyar û hevdu maçî kirin. Ji dûr ve du kes diyar bûn.)*

**Şêrîn:** Hemo, wa du kes ji vir ve tîn.

**Hemo:** Ha...ha, rast e, du kes diyar in.

**Şêrîn:** Ji bo ku me nebînîn, divê ez biçim.

**Hemo:** Waye nêzîk dibin, bi gumana min, Eslan û Xelo ne.

**Şêrîn:** Rast e, herdu ne, va ez çûm. *(Ew maç kir û rabû.)*

**Hemo:** Xezal... Xezalê delalê meçe avê weyî weyî

Wî li pey te têno delalê meçe weyî weyî

Wê ji te bistênin delalê siwarê Axê weyî weyî

Wê ji te bistênin delalê Kembera navê weyî.

*(Bi tenha xwe distira. Eslan û Xelo gihijtîn, zirne di destê Eslan de ye û def jî li milê Xelo ye.)*

**Eslan:** Qewet be Hemo.

**Xelo:** Qewet be Hemo.

**Hemo:** Xwedê qewetê bide we û rehmeta Xwedê li dê û bavê we be.

**Eslan:** Diyar bû ku bûk hatibû avê?

**Hemo:** Belê, hatibû avê.

**Xelo:** Çima wê avê nebe, dê sibehî wê buguhezin.

**Hemo:** Xêr e, qey hûn hatine dawetê?

**Eslan:** Erê, erê em hatine dawetê.

**Xelo:** Em ê îro têr goştê berx û mîhan bixum.

**Eslan:** Îro kêf û şahî li gundê we heye.

**Hemo:** Kêf û şahî ji xwediyê dawetê re ye, ne ji bo me ye.

**Xelo:** Çima? Gundê ku dawet û dîlan lê be, xelkê wî hemû kêfxweş in. *(Def ji milê xwe kir û danî erdê.)*

**Eslan:** Ehmed Axa karekî bê terî ye, çawa keça xwe da ser hewiyê?

**Hemo:** Xebera te ye. Şêrînê keçeke rind û ciwan e.

**Eslan:** Pîr delal û nazik e, dê çawa di ber wî meymûnê Şêxo de razê?

**Xelo:** Hezar keçê min hebûna û hemû jî bê mêr mabûna, min yek nedîda Şêxmûs Paşa.

**Hemo:** Heçê axa ne, tim û tim li bilindbûn û malbatê meyze dikin. Ji ber wê yekê Ehmed Axa keça xwe da Şêxmûs Paşa.

**Eslan:** Heger Şêxo bixin parîza terewulan, wê dinya hemû bê temaşekirinê. Ji ber

ku rengê wî wek ê meymûnan e.

**Xelo:** Ku werîsekî bikim stukura wî û bibim li gundan bigerim, ez ê çewalek pere bidim ser hev.

**Hemo:** Çawa be perên wî hene û Paşa ye.

**Eslan:** Keçên ciwan, xortan dixwazin, ne kalên diranketî.

**Xelo:** Her kezîzerekê, simbêlsorekî dixwaze, ne pîrevokêkî.

**Hemo:** Şensê wê rebenê wusa bû.

**Eslan:** Ku dabûna min çêtir bû, qet neba min ê jê re li zirnê daba. Ma wê Şêxo bi karibe bi çi dilê wê xweş bike?

**Xelo:** Na bira dabûna min çêtir bû. Ez xort im û ji te ciwantir im.

**Eslan:** Tu her tenê dizanî li defê bixî, lê ez dizanim li defê, zirnê, kemançê û temborê hemûyan bixim.

**Xelo:** Tu xwedî jin û zarok î, lê ez xort im.

**Eslan:** Zikê te mezin e, tu bê ser û ber î, lewra ez ji te xweşiktir im.

**Xelo:** Ez xwedî zend û bend im, keça ciwan, lawikê xort dixwaze.

**Eslan:** Ez çawa bim, ez dîsa ji Şêxmûs Paşa xweşiktir im.

**Xelo:** Ev rast e, lê ne ji min.

**Hemo:** Hûn li ber tava heyvê direqîsin. Hûn pev biçin, pev neçin, nema feyde dike. Şêrîn bû jina Şêxo.

**Eslan:** Rast e, tu rast dibêjî.

**Hemo:** Şêr, li ser jînê di şeran de tèn kuştin, kesên zane bi kul û xemên jînê dimirin, lê kesên nezan jîneke xweş û durist dijîn. Ji ber ku ew ji jînê fêhm nakin.

**Xelo:** Ax... Ax xezal...

**Hemo:** Ka Eslan ji me re bi zirnê stirana Xezal Xezal bibêje. Derd û kulên min pirrin, ji ber ku li gundê me evîne dikujin.

**Eslan:** Gundê ku evîne bikuje, dê ne serbest be.

**Hemo:** Hûn mitirb evîniyê fêm dikin, hûn tovê wê diçînin û li gundan belav dikin, hûn bi dengê def û zirnê evîndaran şiyar dikin.

*(Eslan zirne kir devê xwe, pif dayê û Xelo rahişt defê û danî ser zikê xwe. Dengê zirna Eslan bi ser kaniyê ket û stirana Xezal-Xezal bilind kir. Hêsrên Hemo bariyan. Xelo û Eslan rabûn û hêdî hêdî ber bi gund de meşîyan. Hemo rûniştî ma û guhdarî kir, digiriya, dilê wî bi kul û keder bû.)*

## Dawî

# Xezal li kurê xwe digere



SIDQÎ HIRORI

Pareyên wê jî nebûn mewlûdekê pê bide bona ku ew kurê wê yê dawîn bi saxlemî bizivre bo cem wê. "Mewlûd û bes! Dê rûha xwe pêşkêş bikim bes ew delalê min careka din bihêt ve bo ber çavên min", Xezalê ji dil ev digot û amade bû ku bicih bîne. Çi cih neman neçûyê û çî dergeh neman nequtan bo ku bizanibe ka kurê wê li kîderê ye û bona ku çavên xwe bi dîtina wî kil bide. Erbil û Mûsil û Kerkuk û Bexda rêkvedan û gire gir û kenkene neman neçû nik. Gor gotk û pis pisên dilgîr xema wê bêtir lêdikir û dinyaya mezin li ber çavên wê biçûk û tarî dikir. Ew Xezala wextekî bi ciwanî û giroviriya navçav û bejna xwe ya dirêj pê gotî bû niha pîr lawaz bûye û xeman qurmiçînên xwe yê diyar li ser dêmê wê çêkiri-ne. Hey pa wê jî çiyayên xewna di nav xwe de dihilpisartine serêk û digot xwe "dê belkî vê carê kes bela xwe li me nexe û bihêlin em bê şer û qerqeşe, hema çawa be bila bibe, jiyana xwe li vê derê bibin serî". Lê di çend gavekan de hemû qewmî. Ne babê Ûmêdî û ne jî hersê birayên wî û ne jî zelam û xurtên kempa Quştepeyê li mal û di kempê de hiştin, hatin hemûyên nêr girtin û birin. Ew çend rojek bûn Ûmêd li Erbilê bû, ji xwe re li ser avahiyekî paletî dikir. Babê wî gotê ku hukumer wenake ew li derveyî kempê bo demeka dirêj bimîne û bila zû vebigere mal. Xezalê

jî her çend rojekan çend gore û çend lîfkekên serşûştinê çêdikirin û dibirin Erbilê û li wê derê difirotin firoşgehan. Bi wî pareyî debara xwe û mala xwe dikir. Ne debara baş lê ji birsan nedimirin û xaz xazokî nedikir. Di rastiye de pirr kêfa Ûmêdî bi wî karî hatibû û ne di xema zehmetî û westiyane de bû. Ji ber ku wî dixwest bi wî awayî pareyekî bicemîne serhev û destê Şewnimê bixwaze û bike şahî û govend. Şewnim du salan ji wî mezintir e. Sal û meha ji dayikbûna wê û Ûmêdî baş li bîra Xezalê ne. Ûmêd sala 1961ê, di meha Îlonê de, çend rojekan piştî wê roja ku firokeyên Ebdulkerîm Qasimî tê de Derbendî Bazyan bombebaran kirî, ji dayik bû û hîngê babê wî pêşmerge bû digel Barzanî. Şewnim piştî bûna Ûmêdî bi du salan ji dayik bû û Xezalê roj jî li bîr e; meha tabaxa 1963ê, di eynî rojê de ku leşkerê Îraqê bi serkêşiya mirovkuj Sidîq Mustefayî bi sedan ji xurtên bajêrê Silêmaniyê girtin û 86 kes jê li ber çavên rûniştivanên bajarî bi saxî di çalekê de binax kirin. Xewna xezalê jî ew bû ku Ûmêd, ku ji hemû kurên wê mezintir bû, û Şewnim bibin jin û mêrên hevûdu û ew neviyên xwe, zarokên wan, bi çavên xwe bibîne.

Di salên 1976 û 1977an de gundên wan li devera Mêrgesorê ji aliyê hukumeta Îraqê ve hatin vala kirin û xwecihên wan bi darê zorê li kempên Herîr û Diyana û Behirk û Quştepeyê hatin niştecî kirin. Mêrê wê vê carê bi wê û zarokan re bû, ew jî ji ber ku pêyekî wî yê seqet bû. Di Şerê Rîzgarîxwazê Îlonê de gelek caran hatibû birîndar kirin û di carekê jî wan caran de pêyê wî yê rastê bi dijwarî hatibû birîndar kirin û ji gozikê hatibû firandin. Bi arîkariya gupalî bi kuttekî birêvedîçû. Nikarîbû karekî bike ku jiyana mala xwe pê birêvebibe û weha hemû barê malê ketibû ser milên Xezalê. her ji ber hindê jî Ûmêdî bizaveka mezin û berdeham dikir ku karekî bi dest xwe bixe ji bona ku hem bi birêvebirina jiyana xwe ya taybetê barê dayika xwe sivik bike û hem jî bikaribe arîkariya wan bike.

Xezalê gelek cara digot xwe "ma dê çawa kurê min vebigere mal, ma ka mal û dê ji kêve bizane dayika wî li kîderê ye". Piştî girtina mêrî û kuran û nemana zelaman di kempê de, Xezalê jî kemp berda. Li pêşiyê weku pirrrianiya jin û qîzan dihate Erbilê û li ser cehdeyan xaxazokî dikir. Lê xwecihên bajarî di pirrrianiyê de ji wan re arîkar bûn. Wexta destê xwe dirêjî kurdekî bikira qet destê wê yan destên hevalên wê vala nedihatine vegehandin. Lê rûniştivanên Erbilê bi vê jî qayîl nebûn û xwestin li wan bi xwedî derbikevin; evca çî li cihê karî û çî li mal kar dan wan bona ku bivehewyên û nekevin kûlanan û rezil nebin. Weha Xezalê jî cihê xwe di nav malbatekê de li bajarê Erbilê dît. Gelek kesan pirrs jê kir ka çima ew naçe bo nik Mehemed axayî û pirrrianiya xelkê ku wê nas dikir jê dixwest ku biçe cem wî jî, belkî ew bikare kurê wê bide berdan. Weha lê hat ku xwe hewceyî cheşkan jî bike. He-

ke Ûmêd yê saxba nedihîşt ku biçê nik çî axayekî, lê dayik e û dilê wê li dû kurê wê ye û dê biçê cem herkesekê be bila bibe bes kurê wê ji wê re vebigerîne.

– Eve ji kengî were kurê te berzebûye; Mehmed axayê zikmezin û bi şel û şe-pik ji Xezalê pirrîst.

– Ezbenî ne berzebûye lê hatiye girtin, Xezalê gotina axayî rast kir.

– Girtin?! Eve tu çî dibêjî hurmet, kî wî digire?

– Ma dê kî be ji bilî hukumetê?

– Hukumet! Ma heke hukumet kesekî bigre dê bo çî bi veşarkî wî bigire! Ma ew ji kesekî ditirse?!

– Li ber çavên min girt. Ez li mal bûm dema leşker hatî û ew birî û ez rahavêjtîm û nehêlayî ez pê re biçim û gotin ku karê wan pê heye û bêhneka din dê bizivire mal û heta niha nehatiye ve.

– Bawernakim wan girtibe û ew tiştên wilo nakin.

– Eza dibêjim te ku ez bi xwe li mal bûm dema revdeka polîsên asayîşê hatin bo nav mal û bangî wî kirî û ji wî pirrîst ka babê wî li kîderê ye. Roj jî 11 Çileyê Pêşîn ya sala 1983ê bû. Wî jî gotê ku we ew girtiye û wan bi guhlêbûna wê tawanbarkirina wî, xwe tingijand û xwe ji wî xeyidand û jê xwestin bibêje ka çawan hatiye girtin û wî jî rastî got ku digel wan çend hezaran hatiye girtin û weha dest dane çingilên wî û ew bi xwe re bir.

– Ew çî çend hezar in ku tu dibêji ku hatine girtin?

– Ma haya we ji vê dinyayê nîne?! Nê di navbera 1ê heta 10ê meha Tebaxa 1983ê de ji kempên Herîr û Behirk û Quştepe û Diyanayê nêzîkî 8 hezar zelum û xurt di navbera temenên 12 heta 70ê saliyê de hatin girtin û em nizanin ka kîve birine û ka çî hatiye serê wan.

– Hukumet ji qesta tişteki weha nake. Diyare wan tişteki kiriye yan bi xerabî qala hukumetê kiriye. Xuyaye li ber ezmanê xwe nerawestane û ezmanê mirovî darkokê serê mirovî ye.

Xezalê çîrok hemû bo axayî vegêra. Axayî xwe xişîm kir, her weku ne li vî welatî dijît û her weku ne xelkê van devara ne. Axayî ew bê hêvî kir û gotina wî ya dawiyê bo Xezalê ev bû "Se her se ye çî reş e û çî sipî ye." Dema ku axayî ev gotiyê Xezalê jî devê xwe li ber vekir û kula dilê xwe li wir bi ser axayî de rijand. Lê ma dê gehite kîderê, axa ye û xwefiroş e û dûvelankê Bexdayê ye. Hinek axa hene dilê xelkê xwe bi derewan xweş dikin, evî hema bi yekcarî agir berda dil û hinavên wê. Dibêjeyê "Nexêr, divê kurê te tişteki xerab kiribe bona ku li ser bihête girtin." Ma kurê min çî tiştê xerab kiriye?! Gote wan ku we bab û birayên min girtine? Ku min jî babek

hebû û navê wî filan bû, rojekê reşekên sultanî hatin û ew bir? "Me girtî kurê min Ûmêdî xelerî kiriye, ma kurên dî çî kiribû? Ma babê wan yê seqet çî kiribû? Babo, min girtî hemî binemala min ya xerab bû, ma ew çend hezar kes bi çî gunehê hatine girtin?" Axa dibêjeyê "Here mala xwe rûne xwarê û serê neêşe pêwîstî bi çî dersokan nîne" De vêca Xezalê were ji xeman ne peqe. Mal lê wêran bû û hemû kesên wê ji wê standin; mêr û kur û kes û kar û hevî bo jiyana û êmnahtî jê re neman û hê ya ji axayî ve ser ji bo van hemûyan na êşe. "Eve jî kulecergîbûn e." Kurê wê rast digot ku »mirin ji xweşikandinê bo axa û ziktilêr û çepelên weha çêtir û bi namûstir e«.

Rojekê hindeka jê re behsê Rêxistina Netewên Yekgirtî kir ku ew rêxistineke navnetewî ye û berevaniyê ji mafên mirovan li seranserî cîhanê dike û dewletên gire gir û mezin û xwedî hêz piştevaniya wê dikin. Xezalê çend rojekan hizra xwe di hindê de kir ka çawa pirrsa xwe bigehîne wêderê. Rojekê çû cem neviyê Xecîce xanimê ku cîranên wê malê ne ya ku ew di nav de kar dike û kaxezek bi kurdî pê da nivîsandin. Deqa kaxezê jî weha bû:

*Hêja Rêxistina Netewên Yekgirtî!*

*Ez Xezala Îsivê Gundî me. Eve salek e kurê min Ûmêd û berî wî jî bi du mehan bab û sê birayên wî li ser destên hukumeta Îraqê hatine girtin û ez çî jê nizanim. Min zanîye ku we gelek pê çêdibe û destên we dirêj diçin. Hûn bi Xudê kin ji hukumeta Îraqê bipirrsin ka çî bi serê wan hatiye, sax in yan mirine. Heke hûn bo mina bê xwedî vî karî bikin ez heta hetayê qenciya we ji bîr nakim.*

Xezala Îsivê Gundî

Xezalê xwest ew bi xwe, bi destên xwe, nameyê bibe postê lê neviyê Xecîce xanimê, her çende jiyê wî çarde sal bû, baş dizanî heke ew kaxez bikeve di postê de bêguman dê bikeve nav lepên asayîşa hukumetê û dê paşî û ji ber wê kaxezkê belayeke dîn jî bi serê Xezalê bînin. Lewma wî wenekir ku Xezalê kaxezkê bibe û wî ew qayîl kir ku ew li batî wê, nameyê bibe postê.

Xezal ma li benda bersiva nameya xwe ji Netewên Yekgirtî û wê nedizana weku kurd dibêjin "navê giran e û gundekê wêran e" û wê nedizana ku neviyê Xecîce xanimê piştî ku ji cem wê çûbû û li şûna ku nameyê bibe postê ew dirand û havêt bona ku nekeve nav destên desthilatdarên Îraqê û bo ku Xezalê ji destên wan yê çepel biparêze. Xezal rojekê ji bajarî vedigere mal û dibihîze ku hindeka pirrsyara wê kiriye û li dû wê geriyane, lê nexwestine bibêjin ka wan çî ji wê divêt û gotine

eger ew hat ve mal, bila biçe bingehê asayîşê ”emné”. Yekser Rêxistina Netewên Yekgirtî û nameya wê hatin bîra wê û gote xwe »diyar e wan nameya min standiye û xwendiyê û ji Bexdayê pirrsîne û ew neçar kirine ku nûçeyekê li ser kurê min bigehînin min«. Cîranan û gelek kesên ew nas dikir jê xwestin ku neçe bo nik asayîşê ji ber ku mirov nizane ka dê çi li wê derê bihête serê wê û neku wê ji weku kurî bigrin. Lê Xezalê biryara xwe dabû ku ji bo zanîna çarenivîsa kurê xwe, her dereka be bila bibe, biçeyê. Wê digote xwe ”ma min çi maye li ser darê dinê ji biltî wî kurê wan girtî. Ez her behsa bab û birayên wî nakim ji ber ku ew sed der sed nemane û hatine kuştin lê belkî Ûmêd hêj sax be. Ew hindê ji xwe şerim kirî û mit e, ez bawer nakim ew wî îza bidin. Ûmêdî xwe çi cara taloqetî siyasetê nekiriye li çi derekê jî ezmanê xwe ne li dijî hukümetê û ne li dijî çi terefekê din dirêj nekiriye.” Xezalê dizanî avahiyê asayîşê li kêderê ye. Ew gelek cara çûye ber derê wan û pirrsyara kurê xwe ji wan kiriye û wan nehiştiye ew çi cara bikeve hundurê wî avahî. Cara dûmahiyê bi dijwarî pê re peyivîn û gef li wê kirin û gotinê eger ew wê careka din li nêzîkî wî avahî bibînin, dê wê bigirin. Wê jî gote wan ”bila, baş e, min bigrin, lê min bibin wê girtîxaneyê kurê min tê de.” Wan jî henekên xwe pê kirin û gotinê ”ma girtin weku programa stiranên daxwazkirî ye” û gotinê ”hema me tu girtî tu bizane êdî tu bi saxî ji dest me dernakevî.”

Vê carê Xezalê berêxwedayê ku nehate derêxistin û polîsekê asayîşê yê kelex mezin û zik li ber şorbûyî û simbêl dirêj, weku hejmara heşt ya erebî badayî, ew bire di hundurê avahî de. Wê erebî nedizanî, evca wergervanekê kurd jê re anîn û ew jî asayîş bû û wî gotina yê ereb û ya wê diwergerandin:

- Te kurê xwe divêt, yê asayîşê pirrsyar kir.
- Belê qurban, min divêt, Xezalê ji keyfa bihîstina wê pirrsyarê xwe negirt û zû bersiv da belkî zûtir kurê wê bidinê.
- De baş e, lê bona ku tu kurê xwe bibî divê tu 60 dînanan bînî.
- 60 dînanan! Bo çi û ez ji kêve bînim!?
- Tu ji kêve dîtnî ew problema te ye, manê te kurê xwe divêt û bo ku tu wî bistî-nî divêt tu 60 dînanan bidî heke tu wî nabînî.
- Hema hûn kurê min bidin min ez dê çim 60 dînanan bi her çi rengêkî be peyda bikim.
- Heta ku pare nekevin nav destên me tu kurê xwe nabînî. Evca here pareyan peyda bike û em subehî êvarî wî dîtnin mal û tu jî heta subehî êvarî pareyên xwe durist bike.
- Hûn dizanin ez li kîjan malê dimînim?

– Ma kesek heye em nizanin ka çi dike û ka li kîderê rûdine û ka çi dibêje! polîst ev got û keniya xwe bi Xezalê kir.

Çi nemabû ji kêfan de şeper bi Xezalê ve çêbibin, kurê wê, Ûmêd yê sax e û subehî êvarî vedigere mal. Ev ji her kesekî re ku di rêyê de lê rast hatî got. Lê tişteki Xezal tirsand; ew jî ew xem bû ya di navçavên wî xelkî de yê ku di rêyê de bi wê re dipeyvîn û guhdariya wê û nûçeya wê ya nû dikir. "Lê kes derdê dayê nizane û xwe Ûmêd ne kurê wan e bona ku kêfa wan weke ya min bi vegeza wî xweş bibe" Xezalê ev gote xwe, lê her wisa jî gelek supasdara wî xelkî bû, ji ber ku her kesekê ew dîtî û guh li gotina wê bûyî jî wê xwest ku biçe mal û xema pareyan nexwe û dê heta subehî 60 dînar jê re bihêne peydakirin.

Êvara oja dîtirê seet çar Xezal bi tenê nebû û ne bes cîrana wê Xecîce xanim û neviyê wê li wir bûn, lê gelek hatibûn wê mala ew lê. Xezalê pirranî jî nas nedikir û hemûyan jî pare îrandibûn; her kesekî li gor pêçêbûna xwe. Lê 60 dînar xirvebûbûn û di destên Xezalê de bûn û wê her dihejmartin bona ku jê pişt rast bibe ku kêr nînin û paştî polîs ji ber dînareka kêr hêcetan lê nehilbêxin û paştî kurê wê bibin ve.

Xezal pirr bi kêf bû; dê kurê wê hêt û dê wî bi hemû dil û canê xwe himbêz bike, dê wî di dilê xwe de hilbigire û biveşêre bona ku êdî hevrûşî çi belayan nebe. Ev hemû xelke li ser xatira wê û kurê wê hatiye. Lê "çima ho bi xem in" Xezalê ji xwe dipirrsî. Wê biryar da ku yekser daweta kurê xwe û Şewnimê bike. Dibêjin ku gelek kes destê Şewnimê dixwazin lê "ew şû bi kesekî ji bilî Ûmêdî nake û ew li benda wî ye" Xezalê ji Şewnimê bi bawer bû. Dê paştî Ûmêd karekî bi dest xwe bixe û dê paştî xaniyekî di bajarî de bi kirê bigirin û dê neviyên wê hebin û dê çavê xwe bide wan neviyan û dê wan mezin bike. Xezal di van malxulyanan de bû dema revdeya zarokên cîranan ku li kûlanê bûn bi xardan hatine hundurê xanî û gazî kir:

– Xalêta Xezal tirimbêla "emnê" li ber derî ye û pirrsyara te dikin.

Xezalê jî her zû ji cihê xwe rabû, bi destekî 60 dînar û bi destê dî dehmanên fîstane xwe û bi wê pîratiya xwe weku keçeka çarde salî bezî. Kêfa hatina kurî, Ûmêdê wê, terzink anîn laşê wê û xwe li rûniştiyan negirt û çi nemabû pê bide ser kesekî yan çend kesekan ku wê ageh ji wan nebû û ber bi derî çû û gazî kir:

– Kurê min hat, Ûmêd hat, û tilîst ji devê xwe berdan û rondikên keyfê ji çavan barîn.

Li ber derî hemû tişt hatine guhertin û weku xwe neman. Xwecihên taxê bédeng û bi dêmên xemokî li pişt wê û li dewr û berên wê bûn. Zarok nêzîktir bûn û ew jî ne weku caran bûn, ne xende û ne qar qara wan bû, ew jî dêm melûl û stûxwar



bûn. Tirimbêlek li ber derî bû û çend şefelehekên ji dêmên wan xuya ku ereb bûn, rawestayî bûn û darbestek li ber pêyên wan li ser erdî bû û patekê sipî li ser bû. Yekî ji wan zebelean pate ji ser kelexî havêt û ji Xezalê pirrsî:

– Tu vî nas dikî?

Xezal di cih de hişîkbû û mîna amîrekî temaşayî cendekî kir. Çav lê qoqilandî, difin jê vekirî, dêmekê ji wê re neniya. Kurê wê du çavên reşên mezin hebûn û ev bê çav e. Difna wî di malê de ji ya hemûyan biçûktir bû û ev bê difn e. Pirrça wî ya reş bû û her dirêj dihêla û ev yê bê pirrç e û ser lê rût û pirrî birîn û xwîn e.

”Na , ev çî ji min dixwazin, eve henekên xwe bi min dikin.” Xezalê gote xwe.

Dema polîsî bo cara sêyem bi dengê dijwar û bilind pirrsyar ji Xezalê kirî ve, Wê yekser gotê

– Na, nexêr, ev ne kurê min e, ez vî nas nakim.

– Eve kurê te Ûmêd e û te viya eve me bo te îna, yê emnê bi zimanekê pirrr nexweş û çivêl ev gote Xezalê.

Bi bihîstina wan peyvên polîsî çawa elekerîk kesekî bigre weha laşê Xezalê ji serî heta binê piyan velerzî. Pare di destê xwe de givaştin, qirniçandin û ber bi kelexî çû û pare ji destên wê yên xav û sistbûyî ketin erdî. Yên asayîşê pare rakirin û ji wê derê livîn û çûn. Li nêzikî kelexî Xezalê hest bi hindê kir ku tiştê wê û wî kelexî digehîne hev. Daçemya ser, bona ku baş berê xwe bideyê, lê ji nişka ve xwe rast kir ve û kire qêrî ”na, nexêr...Ûmêd sax e û namire...Ûmêd nahête kuştin” digel wê qêriya xwe Xezala Îsivê Gundî kete ser kelexê kurê xwe û ranebûve û xwecihên taxê û rendekê û bajarî taziya dayikê û kurî, bédeng, li dûrî hêza desthilatdarî, di dilên xwe de kir. □

## Merheba hêviya min

### ZEYNEL ABIDÎN

Di rojke teng û bêkêş,  
Tu li ber dilê min hatî dinyayê.  
Êş bûn derman,  
Şev bûn ronahî  
Û min hemî bîranînên xwe ji bîr kirin,  
Tu bûyî sersala emrê min  
Û destpêka dilşahiyê...

Merheba hêviya min  
Bîrûbaweriya min,  
Janeke pêwîst û  
Dijwartir ji girîngiyên xwezayê,  
Hebûna te ye li ser tunebûna min,  
Xwe nûger dike, diafirîne û  
Diwelidîne wek bihareke tîr  
Wek zozanekî Evra!  
Tenê bî li nav çiyayên bilind  
Û hêşînayî bêdawî,  
Ne xem e,  
Bê guman  
Sîngên te wek çetelên agir  
Kenokiyên te zelaliya avê,  
Dizanim, dê biherike ji ewrên bişîn,  
Li ser axa Kurdistanê...

Lê helbet hêvî jî birîndar dibin  
Dişkên  
Digirîn û  
Bi ser de jî,  
"Hêsirên çavên êşên me hene;  
Wek latîniyan gotine,  
Lê dîsan jî hêvî,

Bawer bike, pêdivîtir e ji nan û avê  
Di vê cîhana bê mirovahî de.  
Ji ber vê ye, min  
Ji girîneke zer  
Û ji nêrîneke bi keder,  
Li ser tunebûna xwe te anî.  
Ji ber vê ye tu her tim,  
Hêviya serbilindan bû...

Merheba hêviya min  
Gotin wilo qewimî  
Wek zinarekî li ser dil,  
Cihê xwe vekiriye dilsozî  
Girîn û kenîn herdu çemên xwişkên hev,  
Ji binê erdê evîn û aram dişujî.  
Ev dem e, tirs perçebûn û  
Bi endamê xwe yê çeleng  
Hawara mirovahiyê ajda lê mêjî...  
Li mêjîyê zuha û gêjbûyî,  
Te ew mêjî qelişand  
Û ji ber vê ye ku  
Şitilên hişk û baxçeyên bi hezar salan mirî,  
Êdî avis in...  
Lê dizanim ku berî her tiştî  
Tu êş î  
Tu hesreta bêdawî,  
Li ser birfna min  
Janek î, dijî...  
Ne xem e,  
Kor nebim, ker nebim  
Radest û bindest nebim,  
Bila tu êş bî li ser jana min,  
Bila ser seran ser çavan  
Bêmiraz be jî mirina min...

*Berlin, 1997*

# Krîtîkerî û Etîk

**ROJAN HAZIM**

**K**rîtîk anjî rexne parçeyekî jîyana mirov e. Ji ber hindê jî, her ji destpêka jîyanê heta îro, di her gava jîyanê da krîtîk heye. Derece derece, reng reng, sivik anjî giran xwe nîşan dide. Ji demê jîyana mirovahîyê ya prîmîtîv heta îroya nûjen ev prosese dom dike û dê heta hetayê jî dom bike. Krîtîk ji gazindeyê dest pê dike. Ji xwe krîtîka herî “masum” gazinde ye. Carina mirov dibêje xwezî krîtîk her di derceya gazindeyê da maba! Ji ber ku gazinde zûtir û baştir encamê dide. Kesê ku dibê mihatabê gazindeya, dîsa zûtir û baştir li xwe vedigere û tiştên ku gazinde lê hatine kirin, ji ber çav derbaz dike û heke gazindeyên heq hebin xwe rast dike.

Kategoriyên reaksiyona mirov ya kiryarî û ramanî, mirov dikare wisa rave bike:

- gazinde
- gilî
- dev avêtin
- polemîk
- krîtîk

Eve hemû rengên reaksiyona mirov in û li goreyî şert û dem û mana û giraniya xwe, ji aliyê mirov ve têne nîşandan. Nîvekarîyeke hemûyan heye ku ew jî balkêşan e. Helbet ew balkêşan li goreyî şertên xwe encamê dide. Heke balkêşaneke heq, baş û qenc be; encameke baş, qenc û bikêr dide. Ji xwe heke balkêşaneke neheq, hişk, tahl û şikandinê be; helbet encameke bikêr nade. Li vê derê ton û awayê gotinê jî girîng dibe. Awa û tona gotinê heke baş neyêre pîvan û kêşan, tesîreke baş ya ku mirov li hevîyê dibe, nade. Lewma teraziya awa û tona gotinê jî divê baş bête danîn.

**Gazinde:** Mirov, di jîyana rojane da, her sanîye û her seet û her gavê, gazindeyê ca

an li xwe anjî li dora xwe dike. Tona gazindeyê jî li goreyî bûyer û xasyetên mirov reng werdigre û an nerm, an hişk, kêr anjî zêde têtê kirin. Wekî di her tiştî da, di gazindeyê da jî ekstremîzm û kronîkî heye. Gelek kes hene “gazindok”in. Gavê setê îş û karê wan gazinde ye û ji xwe gazindeyên wisa jî encamên baş nadin û ji xwe giranîya kesên gazindok jî namîne. Gazinde zêdetir balkêşaneke rû bi rû û devkî ye. Helbet nivîskî û îndîrekt jî dibe. Di gazinde kirinê da hewayekî xweşbînîyê heye. Lewma mirov zû bi zû ji gazindeya aciz nabin û “xêrekê”, qencîyekê tê da dibînin. Ji xwe piranîya gazindekeran jî awayên dilşikandinê bi kar nayînin. Carina wekî kesek dixwaze “krîtîkekê” li dost anjî hevalek xwe bike, ca an devkî anjî nivîskî, balkêşaneke wisa lê zêde dike û dibêje; “tu vê gotinê, gazinde qebûl bike”, ku dilmayînek nebe. Ji xwe di nav xelkê da bawerîyêke wisa heye; “mirovê anjî mirova dost, gazindeyê, hişk û tahl jî bîne ziman, guhê xwe bidê!” Helbet dost jî, divê bi rastî dost be! Gazindeya nav malê ji xwe çu cara kêr nabe!

**Gilî:** Hindî gilîye, ew jî derece derece ye û di tixubê gazindeyê da ye. Carina ji çarçoveya balkêşanê derdikeve û rengê “şikayî û ithamê” werdigire, ku hingê ji mexseda xwe ya qenc dûr dikeve. Gilî jî piranî rû bi rû û devkî têtê kirin. Helbet nivîskî û îndîrekt jî dibe. Di nav xelkê da carina gotinên “gilî” û “gazinde”yê bi hev ra jî têne gotin; wekî “gilî û gazinde”. Belêr wekî me gotî, di navbeyna wan da ji alîyê manayê ve cudahîyek kîvş jî heye.

**Dev avêtin:** Eve bi ser û binê xwe ve awayekî negatîv e, belêr mixabin dîsa mirov bi kar tînin! Eve jî hem devkî hem jî nivîskî dibe. Hindek kes hene dirêj diaxivin, anjî gelek rûpelan tijî nivîs dikin, belêr tinê dev diavêjin. Carina jî bi navê zanyarîyê, bi seetan têtê axivtin û bi dehan kaxez têne reşkirin, belêr dîsa ji dev avêtinê wêdatir mana û encamê nade. Bi navê “fikir”, temetî serê derzîyê tiştêk peyda nabe di “dev avêtin”ê da. Ev kare yê kesên reşbîn û reşker e. Çu tixub û normên etîkî yên “dev avêtinê” nîn in. Ji xwe kesek xwudanê normên etîkî be, dev na avêje.

**Polemîk:** Piranî riberiza nivîskî ye, belêr devkî jî têtê kirin. Polemîk, li ser her babetê, wekî ziman, edebîyat, kultur, huner, polîtîka, felsefe û mijarên dî yên zanyarîyên pozîtîv û herweha pirsên aktuel jî, têtê kirin. Polemîk, di navbeyna du anjî zêdetir alîyan da, awayekî “hişk” yê riberizê ye û di bin tansîyoneke bilind da derbaz dibe. Polemîker, li ser bûyer, mijar anjî dîtinekê, bi giranî bîr û bawerî û komentara xwe argumante û rave dike. Ji ber hindê jî, mirov dikare bêje ku polemîk

di çarçoveya normên etîkî yê xwe da, awayekî “şerê qelemî” ye. Di jîyana politîk û ronakbîriya cihanê da polemîkên gelek balkêş hatine kirin û îro jî têne kirin. Polemîk, di destên zana û bikalîte da awayekî germ yê jîmnastîka ramanî ye. Heke polemîk, di navbeyna du kes anjî aliyên zana û bikalîte da derbaz bibe, hingê encameke bikêr dide. Helbet polemîkên stewr û bêkalîte jî hatine kirin û îro jî mixabin, ku bi zêdehî ve têne dîtin.

**Krîtîk:** Rave kirina objektîv ya eserekê, babet an mijarekê anjî kesekê, ji aliyê başî û xirabî, kêmasî û zêdehî, şaşî û rastîyê ve ye. Taybetîya krîtîkê ya herî girîng; çavdêrî û lêkolîna ji hemû alî û dîmena ve ye. Berî her tiştî wêneyê eser, babet an mijar anjî kes, li ser dezgehî, di bin zirbîn û projektorê da tête kêşan. Di vî wêneyî da hemû dîmen divê bideray hebin û divê ev dîtina orjînal bête nivîsîn anjî gotin û paşê jî, di çarçoveya normên etîkî yê xwe da, ji aliyê bîr û bawerîya kesînê ve bête hilkolîn û ravekirin. Krîtîka bikalîte, jîmnastîka herî baş û biber ya ramanî ye.

Krîtîk jî zêdetir nivîskî tête kirin, belê helbet devkî jî dibe. Wekî her tiştî krîtîkên kurt, dirêj, baş û bikalîte û herweha yê xirab, bêkalîte û stewr jî hene.

### **Hewcetîya krîtîkê**

Mîrov, wekî jîndeyê herî bîaqil û zana, xwudanê gelek reng û tarzên refleks û reaksiyonan e. Mîrov, wekî ji bo paşeroja bi giştî jîndehî û mirovahîyê xebatên berfireh dike, helbet bi armanca serketinê kar dike. Di vê bizavê da dikeve çep û rastîya, evraz û nişîvîya, şaşî û kêmasîya. Belê herweha di vê prosesa ku bi zana hî li ser tête xebat kirin da, awayên xwe rast kirin û nûve kirinê jî peyda dike û wan jî bi kar tîne. Heke wisa nebe, şaşî û kêmasî nayên dîtin û pêşketin nabe. Ev mekanîzmaye, xwe, di pirskerîya xwe bi xwe, ji ber çav derbaz kirin û xwe nû kirinê da nîşan dide. Ev prosesa xwe nû kirinê ya domdar, li ser bingehê xwe ji ber çav derbaz kirinê didome. Mîrov, bi kar anîna vê mekanîzmayê hem xwe ber bi pêş ve diguhure, hem jî li ser guhartina derve ya ber bi pêş ve jî tesîrê dike û aktîv dibe. Helbet wekî her karan, heke ev fonksiyonên xwe nû kirinê jî bi zana hî bi kar bînin, hingê encamên bikêr didin. Mîrov wekî hebûnek civakî, bêtî van fonksiyonên xwe nû kirin û pêşve birinê, nikare pêşveçûn û serketinên mezin bi dest ve bîne. Jîyan bi timamî wisa ye. Mîrov her roj xwe nûve dike. Eve hewcetîyeke pêdivî ya mirov e. Ji aliyê axivtin, rabûn û rûniştin, hatin û çûyîn û hewcetîyên dî ve, xwe kontrol dike û bi xebitandina vê mekanîzmayê xwe her roj nûve dike. Guhartinên di jîyana mirov da, bi taybetî jî yê di warê normên etîkî da têne dîtin, di parzina jîyanê da têne palandin

û bi renekî nû xwe didomînin. Eve hemû ji wê sêhra xwe nû kirinê derdikevin, ku bingehê wê jî krîtîka li xwe bi xwe û li dora xwe kirina bi zanahî ye.

Krîtîka ku di jîyana rojane ya mirov da guhartina dike, pîranî ya bêdeng e. Mirov bêdeng û tinê, xwe bi xwe dihizire û jêdera wan krîtîka jî di xwe da bi kar tîne. Eve herweha berpirsiyarîya beramberî xwe ye jî. Mirovê beramberî xwe berpirsiyar, vê prosesa xwe nû kirinê, bi vî awayê xwe krîtîk kirinê pêktîne. Li vê derê tiştek derdikeve pêş: Ew jî; wekî mirov vê mekanîzamaya xwe nû kirinê anku xwe krîtîk kirina bi zanahî bi kar tîne, gelek bi baldarî li ser xwe disekine, her tiştê xwe yê ku dê li ser krîtîkê bike bi hessaşyêke mezin hildibijêre û bi nermî li xwe vedigere û hindî jê bêt xwe serast dike. Anku îtîna û sebrekî nedîtî bi kar tîne. Neheqîyê li xwe nake, her tiştî dikêşe, dipîve, diparzine û paşê bi encam dide. Eve gelekî girîng e. Heke mirov vî metodê îtîna, sebir, kêşan, pîvan û parzinê di krîtîka dora xwe da jî bi kar bîne, hingê krîtîk encameke baş dide. Ji xwe jîyana bê krîtîk nabe û krîtîk hewcetîya pêdivî ya jîyanê ye.

Mirov, ji bo encamên baş û qenc, divê di krîtîk kirinê da metodê empatîyê jî çu cara ji dest bernede. Anku heke mirov tiştekê, gotinekê anjî kiriyarekê layiqî xwe nebîne, divê li kesê anjî kesa hemberî xwe jî neke. Divê ev gotina “tiştê ku tu naxwazî anjî gotina ku tu naxwazî li te bête kirin, li kesekê neke”, anjî “tişt û gotinên min aciz dikin, dê kesê anjî kesa li hemberê min jî aciz bikin” neyête ji bîr kirin. Anku wekî mirov gotinekê li yêkê dike, pêşiyê divê xwe dane şûna wî anjî wê û paşê gotina xwe bike. Krîtîka bi van serwestîya bête kirin, dê hergav encamên pozîtîv bide û ji xwe krîtîka li ser bingehê zanyarî û normên etîkî jî divê ye wisa be.

## **Reaksiyona li hemberî krîtîkê**

Rastîyek jî heye; digel ku mirov dizane ku bi giştî krîtîk, ca an li xwe anjî li dora xwe, karekî pêdivî û hewceye, lê dîsa ve beramberî her reng gazinde anjî krîtîkan, di serî da her wisa spontane, refleks û reaksiyonên xwe parastinê bi kar tîne ku eve tiştekî gelek normal e û mirovî ye. Ji xwe divê mirov xwudanê refleksên xurt jî be. Belê xasyeteke mirov ya herî baş jî ew e, ku xwudanê mekanîzmayên kontrolê ye jî. Hissîyata xwe zû lixav dike û nahêle ew refleks û reaksiyonên pêşiyê yên normal, hilkevin dereceya reaksiyonên hişk, ku di pratîkê da serî ji mekanîzmayên mantiqî bistînin. Helbet rastîyek dî jî heye, ku çarçoveya krîtîkê ya bi hemû aliyên xwe ve, rengê reaksiyona li hemberî xwe jî tayîn dike. Li hemberê krîtîkeke îdeal, mekanîzmayên refleks û reaksiyonê yên pozîtîv, aktîve dibin. Anku mirov têhnekê jê werdigre. Lewma krîtîk divê hûker û perwerdeker be, ajaweker nebe. Belê heke krîtî-

kek, ji çarçoveya xwe ya baş û objektîv dûr bikeve û negatîv be, hingê jî bivê nevê mekanîzmayên xwe parastinê derdikevin pêş û aktîve dibin. Di merheleyeke wisa da divê xwunsariya bizanahî bête nîşandan û his bêne lixavkirin û mekanîzmaya mantiqî bête xurt kirin, ku reaksiyona hişk dernekeve pêş û bi wê kelê, hissiyat hakim nebe. Gerçî "hissîbûn" jî alîyekî xwezayî yê mirov e û hergav jî ne negatîv e, belê dîsa ve divê di bin dîreksiyona hêza mantiq da be.

### **Bi giştî normên moral û etîkî**

Helbet digel pêşveçûna mirovahiyê, hewcetiyên jîyanê jî têne guhartin. Ev pêşveçûne tesîrê li normên moral û etîkî yên civatê jî dikin. Rêz û rêzikên jîyanê, li goreyî şertên pêşveçûnê, xwe nûve dikin û digihin. Paşê jî digel pêşveçûna civatê, ev norme hind desantralîze dibin ku her çîn, kategorî, bask, grub, meslek û branş jî normên xwe yên moral û etîkî pêktînin. Helbet normên moral û etîkî ne nivîskî ne. Di nav prosesa xwezayî û bibizav ya jîyanê da pêktên û mirov wan norma, wekî prensîbên jîyanê di her sanîyeya jîyana xwe ya rojan e da bi kar tînin û wisa dom dike. Nîşana pêşveçûn û guhartina ber bi pêş ya van norma, girêdayî wê prosesa pêşveçûna civatê ya dîyalektîk e. Lewma ev norme ne statîk in. Wekî jîyanê dînamîk in û hem digel jîyanê pêşve diçin, hem xwe nûve dikin anku yên bêkêr diskalîfiye dibin û şûna wan yên bikêr digirin, hem jî jîyanê rêk û pêk dikin. Kesên, girêdayî kîjan çîn, kategorî, bask anjî gruba civatê bin, anjî mensubê kîjan meslek û branşê bin bila bibin, xwe beramberî van norman berpirsiyar dizanin û xwe bi wan ve adera girêdidin. Anjî divê wisa be. Di pratîkê da her tişt baş diçe? Nexêr! Helbet fonksiyona van norman jî bi giştî girêdayî pêşketina civatê ye. Xwandayî, têgihiştin û zanahî û dereceya kulturî ya civatê çend bilind be, pêşve biçe, ev norme jî hind rûdinin û dibin bingehên rêvebirina civatê. Yên ku normên moral û etîkî binpê dikin, sîstemên etîkî parçe dikin helbet xirabîyeke mezin hem li xwe, hem jî li civatê dikin.

Di tehrîb kirina van norman da, yêk ji sebebên herî bingehîn, tovê nexweşîya berjewendiyên kesîni yên egoîst e. Gava mirov, berjewendiyên xwe yên kesîni yên egoîst bide pêşîyê û tîne bo wan bixebite, hingê serê davê direve û veresandina tevne sistema normên moral û etîkî dest pê dike û ew verestn wekî benîkê goreyê pê ve diçe û erozyona wan normên moralî û etîkî gav bi gav fireh dibe. Rê li ber girtina vê erozyonê, bi parastina normên moral û etîkî yên bikêr dibe û ev parastine, hem ji bo kes, hem jî ji bo civatê, zemîne silametiyê ye û divê ew norm bêne parastin.



## Krîtikerî û elementên identîtêya krîtikerîyê

Krîtikerî anjî rexnevanî herçend beşekî nivîskarî û lêkolînerîyê jî be, hindek taybetîyên xweser yên xwe jî hene. Li vê derê krîtikerî êdî ji sadetîya gazindekerîyê derdikeve û bi serê xwe dibe kalîte û branşek. Helbet krîtikerî jî wekî nivîskarîyê, hem bi awayê amatorî, hem jî bi awayê profesyonelîyê tête kirin. Ji ber hindê jî, wekî her meslek anjî branşê, krîtikerîyê jî normên etîkî yên xweser hene û ev norme unîversal in. Gerçî îro di civata me da ev kare bi awayê profesyonel, hetta mirov dikare bêje ku bi awayê amatorîyêke micid jî nayête kirin; belê dîsa ve bi kêm û kasî jî be, ev kare tête kirin û divê normên etîkî hebin û ev norme, divê bibin tixubê xebata kesên ku vî karî dikin.

Îro di nav piranîya civata me da, tesbît kirina tixubên meslek anjî branşan gelek zehmet e. Ji ber ku rewşa civat û welatê me kîvş e. Hewce nîn e ku mirov dûr û dirêj li ser vê çendê raweste. Belê digel vê têkelîya tixuban, jîyan jî didome. Di rewşeke wisa bi kîz da, gelek kes çend kara digel hev dikin û adeta “du, carina sê zebêşa di bin çengekê da” hildigirin! Ev çende, di bizava ji bo

domandina jîyana rojane da bivê nevé, dibe. Neyîtî û desttengî, mirovan dide zorê ku digel karê xwe yê serekî, karên dî jî bikin. Belê hindek kar hene, ku di ber hindek karan da nayêne kirin.

Heke bêne kirin jî kalîte dikeve. Krîtikerî anjî rexnevanî jî yêk ji wan karan e. Anku hem di “pîzza”yê da kar bête kirin, ji ber ku karekî giran û zehmet e, hem jî êvareke direng bi wê westana piralî rûnin çend rûpelan li ser mijar anjî kesekê reş bikin, nabe! Ev kare, karekî ronakbîrîyê ye. Konsantrasyon û zanîneke mişt, lêkolîn û xwandineke piralî dixwaze. Bo vê çendê jî divê dem hebe. An divê bi profesyonelî anjî bi amatorîyêke micid bête kirin. Belê mixabin îro kîza identîtêya krîtikerîyê heye di nav civata me da. Ev çende berpirsiyarîyê dişikêne. Şûna wê, bêberpirsiyarîyê bi cih dike. Krîtikerek di rewşeke wisa da kar bike, çend dilpak jî be têra nake. Ji ber ku ji bingehên pêşveçûna ramanî, dûr e. Ji ber hindê jî nikare xwe ji alîyê xwarineka ronakbîrîyê ve têr bike. Demê xwandina piralî û lêkolîna berfireh nikare bibîne û dîsa nikare enerjîya karê zanîne depoyê bike û herweha nikare xwe ji alîyê ramanî ve jî “techîz” anku biratib bike.

Krîtikerek, digel xasyetên xwe yên baş yên kesîni, heke xwe ji alîyê ramanî û bi giştî zanîne ve jî rapêçe û herweha li beramberê etîka ronakbîrîyê jî berpirsiyar be, hingê dikare xwe ji hissiyat û reaksiyonên nişkê ve xilas bike, mantiqê xwe bixebitîne û pozisyonêke objektîv wergire. Belê heke ji van tiştan dûr be, bivê nevé dê bikeve bîra tengbînî û subjektîvîzmê û şûna mantiqê xwe dê bi his û reaksiyonên

nişkê ve hereket bike û eve jî dê wî anjî wê biêxe xeletîyê û pozisyonê nebaş. Krîtîkerek, dîsa heke ji alîyê malzemeyên krîtîkkirina bikalîte ve bi kêmasî be, dê daxwaz û hezkirinê xwe yê kesîni û tagirîya xwe ya subjektîvîst bi kar bîne. Encama vê jî bi timamî kastrof e!

### **Kalîteya krîtîkê**

Tiştêkî aşkera ye ku krîtîk divê ji hissîyatê dîr, girêdayî hêza mantiq û zanyarîyê be. Di vî warî da bi giştî hindêk pîvên şematîk hene ku divê her dem li ber çav bin. Krîtîker divê xwudanê van kalîteya be û krîtîk jî divê li ser wan elementên bingehîn bête avakirin. Bi kurtî mirov dikare wisa rêz bike:

- Divê li ser çarçove û mijara nivîsara ku dê krîtîk li ser bête kirin, zanîneke kûr û fireh ya teorîk hebe û krîtîker xwudanê ravekirineke hevdem be

- Li ser şertên ku nivîsar tê da hatîye nivîsîn; wekî dem û rewşa civatê agahdarî hebe

- Nivîsar girêdayî kîjan êkolê ye û zanînen li ser wê êkolê
- Elementên estetîk û metodên zanyarî
- Agahîya li ser bîr û bawerîya nivîskarî
- Xwudanbûna bîr û bawerîyeke têr û tijî
- Objektîvbûn

Helbet mirov dikare gelekên dî jî lê zêde bike. Heke krîtîker li ser van xala û stratejîya krîtîkkirinê biratib be, hingê dikare krîtîka xwe li ser bingehêkî zanyarî ava bike. Li alîyê dî, zanîna van ya ji alîyê teorîk ve jî bi serê xwe têra nake, divê jîrîtiya formulekirinê jî hebe ku van zanînen xwe di çarçoveyeke zanyarî da bi cih bike. Kesê ku bi van zanînen bingehîn ve "mucehhez", dikare krîtîkeke sistematîk bike anjî binivîse. Ji bo vê çendê jî hindêk pîvên şematîk hene û mirov divê li goreyî wan pîva bi rê bikeve. Bi kurtî ev in:

- konkretîya ji alîyê dîmenên dem û cih ve
  - dîmenên dî yê konkret û abstrak
  - dem û herikîna bûyera û pozisîyona elementa
  - temaya nivîsarê
  - rave kirina ji alîyê objektîv û subjektîv ve
  - kalîteya edebî
  - beramber kirin
  - perspektîva ji alîyê edebî, kulturî, dîrokî, felsefî û civakî ve
- Di dawîyê da jî bîr û bawerîya krîtîkerî ya;

- ji aliyê îdeolojîk, anjî
- ji aliyê giştî ve

Dîsa li ser elementên nivîsîna kompozisyonê jî divê agahdarî hebe. Kêm zêde şemaya nivîsîna kompozisyonê li her derê wekî hev e: Destpêk, ravekirina fireh û encam. Eve divê bi zanîn û sistematîk bêne bi cih kirin ku nivîsareke baş ya krîtîkê derkeve meydanê, ku bikêr bêt û hem xwandevan hem jî yê anjî ya ku krîtîk lê hatîye kirin, têhnekê jê wergire. Heke teksta krîtîkê sistematîk nebe û ji hemû pîvên nivîsîna kompozisyon û bingehên krîtîkkirinê dûr be, hingê xwandevan nikare têhnekê jê wergire, jê istifade bike. Krîtîkeke ji aliyê form, sistem, ziman û naverokê ve rêk û pêk, tesîreke pozîtîv hem li ser xwandevana, hem jî li ser yê anjî ya ku krîtîk lê hatîye kirin dike û ew krîtîk xizmeta pêşkevtinê dike, ku eve bi serê xwe mil dayîna prosesa zanyarî û têgihandinê ye.

### **Objektîvbûn**

Yêk ji kalîteyên herî girîng jî objektîvbûne. Krîtîker divê sedased objektîv be. Heke bi mucêhhezî û têrîya zanîne ve, bi awayekî objektîv krîtîk bête kirin dê encameke gelek serkerî û bikêr derkeve ku ev encame dê tesîreke baş li prosesa -nivîskar + xwandevan + krîtîker / krîtîker + xwandevan + nivîskar- bike, ku ji xwe ev e, tiştê ku divê bête kirin. Li milê dî; helbet krîtîker jî xwudanê bîr û bawerîyekê ye ku ew jî tagîrê rastîya xwe ye. Wekî krîtîka xwe dike, ji serî û pêve li goreyî pîv û normên li jorî hatine gotin divê dest pê bike û di dawîyê da jî li goreyî bîr û bawerîya xwe ya kesînî encamê girêbide. Belê di vê girêdana encamê da jî divê durust be û argumentên bîr û bawerîya xwe ya subjektîv, rave bike. Krîtîkeke baş, divê objektîv be û li dawîyê tagîrîyê kivş bike. Krîtîkerek baş jî, hindî ku ji objektîvîteyê dûr nekeve, serkerî ye. Anku; krîtîker hem divê objektîv be, hem jî bîr û bawerîya xwe bi şêweyekî zanyarî bîne ziman ku teksteke bikêr ya krîtîkê derkeve meydanê. Krîtîker divê van her du pîvên teksta krîtîkê, bi hostahî û di ragirtineke biterazî da, dane. Divê yêk ji wan pîya kêm nebe. Ne bi navê objektîvbûnê desta ji bîr û bawerîya xwe berde, ne jî êxsîrê hisên xwe be ku bi timamî bîr û bawerîya xwe bi awayekî subjektîvîst û tengbîn, bîne ziman. Heke terazîya krîtîkê bi van her du pîyan hate ragirtin, hingê encameke pozîtîv derdikeve û xwandevan têhneke baş ji vê riberizê werdigrin û bi navê zanyarî û ronakbîrîyê jî karekî baş tête kirin.

### **Nexweşiya subjektîvîzmê**

Divê mirov li ser vê babetê jî bi girîngî raweste. Ji ber ku eve nexweşîyeke wisa ye ku heçî mirovê tûşî wê bû, jê xilasî bi zehmet dibe. Di vê nexweşîyê da jî hindêk nîşan hene ku divê mirov wan bide kivş kirin. Bi kurtî mirov dikare wisa rêz bike:

- sendroma rast kirina her tiştî
- egosantrîzm
- ji her kesê baştir zanîn
- xwe li ser ewra dîtîn
- nekubarî
- nêdilnizmî

Mirov dikare zêde jî bike. Axir, eve xalên grîng û bingehîn in. Mirovek, heke bi van nexweşîya bikeve, nikare objektîv be. Ji xwe xwudanê van nexweşîya bi handîkap e. Du tîpên ekstremîst tûşî vê nexweşîyê dibin:

1. Mirovek dibe ku gelekî xwanda û zana be. Di branşa xwe da dibe ku bispor û otorîte be. Belê digel van alîyên xwe yên baş, heke tûşî wan xasyetên negatîv yên me li jor rêz kirî bibe, hingê ew nikare objektîv be. Ji ber ku ew, xwe adeta “mehdî” dizane ku her tiştî û nivîsarên li ser hemû branşan têne nivîsîn, li goreyî xwe serast bike, anjî yên ku dîsa li goreyî wî anjî wê, xeletî kirine, bi navê “zanabûnê” wan çîz bike û ji vî “şerê dîka” mizeffer derkeve! Ji ber ku ew, misyonêkî wisa di xwe da dibîne; herkes şaş e, tinê ew rast e û divê wan şaşîya jî tinê ew rast bike! Helbet ev tîp mirove “waqiyayî klînîk” in. Saxkirin anjî tedawîya wan zehmet e!

2. Tîpek dî yê ekstremîst jî “zirnezan” e. Anku mirovê nexwanda, dibe ku unîversîte jî xilas kiribe, ew ne xem e, bêtetmîn, qels û lawazê hizir û bîrî, ku evolusiyona ramanî timam nekirîye û ji hemû ratiba ronakbîrîyê dûr û tinê bi gotinên li der û dora têne gotin xwe têr dike. Anku bi keda xwe, xwe ji alîyê bîr û ramanî ve têr û tijî nekirîye... Ev her du tîpên ekstremîst jî xeternak in.

Belê xaleke dî ya nîvekar ya her du tîpan jî heye ku ji alîyê civakîbûnê ve jî yêkser prîmîtîv in. Ji alîyê cîhana navîn ve jî dilê wan reş e, hesûd û bixerez in. Ew tehemulî çu pêşketinên li der û dora xwe nakin, hindî ji destê wan bêt dibin asteng, pînca diavêjin ber pêşketinan û xirabker in. Heta mirov dikare bêje ku li der û dora wan, heval anjî dostek ji dil jî nayê dîtîn. Ev cîhana wan ya reş û tarî, rê nade ku temetî serê derzîyê başîyekê li dora xwe bibînin. Hîpernegatîv in û mixalîfên muzmîn in. Digel xwe û jîyana sosyal ne aşt in. Lewma jî dilopeke pozîtîv di çu tiştî da nabînin. Çavên wan dûr nabînin û hîpermiyop in. Tinê ji xwe razî ne. Carina ji xwe jî ne razî ne û bi wê hirsê, çî bi ber dasa wan bikeve dipejinin.

## Zemîné ku krîtîkerên negatîv digihîne

Gelek sebebên objektîv û subjektîv hene ku mirovên wisa ji nav civatê derdikevin. Ji problemên ekonomîk, sosyal û kulturî bigrin, heta yê psîkolojîk û rewşa malbat, dorber û civatê, tesîrê dikin. Mirovên wisa ji gelek alîyan ve netêr in. Tekamulîya wan ya giyanî, kulturî û sosyal li goreyî prensîbên evolusyonê timam nebûye û ne gihiştine dereceya têrîya di van waran da.

Li milekî dî jî; mirovên ku ji nav kultura rêxistinên polîtîk yê prîmîtîv tèn, nikarin zû bi zû adabteyî krîtîk û analîzên li ser ziman û mijarên edebî, kulturî, hunerî û zanyarîyên dî, bin. Û ji xwe wan, ew têrîya zanîne jî nîn e. Bo wan, polemîkên stewre polîtîk, xwe nîşandaneke e, xwe isbatkirineke e. Polemîkên stewr bo wan şerê dîkan e û xwe pê termîn dikin. Helbet krîtîkên pozîtîv û bikêr, di meydana polîtîkayê û di navbeyna rêxistinên polîtîk yê nûjen da jî têne kirin, belê ew, bi normên krîtîkerîya bikalîte, nûjen û zanyarî dibin. Hindek kesên ku di pîyaseya polîtîk da, bi navê polîtîkzanîyê jî bi karê “krîtîkerîyê” radibin, krîtîkên li ser bîngehê zanyarîya polîtîk jî nakin, zêdetir li ser bûyer û pêşveçûnên aktuel dikevin polemîkên ajîtatîv û propagandatîv, ku mirov nikare wan polemîka, di çarçoveya polemîk û krîtîkên zanyarî da bihejmêre. Ji xwe krîtîk û polemîk jî ji hev cuda ne. Gerçî polemîkên bikalîte jî helbet têne kirin. Belê ew jî ji alîyê kesên zana ve û di serwîyeyeke bilind û bikalîte da dibin. Vêca kesên ku ji “ekolên” negatîv û prîmîtîv yê polîtîk gihiştî û ji wan dera xwe “gihandî”, nikarin krîtîkên bikêr û pozîtîv bikin. Ew her li ser dewsa berê dikevin polemîkên stewr û reşkirinê. Gelek nivîsarên bi navê “krîtîkê” têne weşandin, bi zêdehî ve polemîkên stewr in û heta niha temetî dilopekê jî encameke pozîtîv nedane û ji xwe nikarin bidin jî!

## Krîtîk kirin karekî bijare ye

Krîtîk kirin, karekî zanyarîyê ye bijare ye. Bi serê xwe xwudanê normên etîkî ye. Ne hewce ye bi nav bikin ku îro li dinyayê bi sedan kes hene, krîtîkerîyeke profesyonel dikin, ku xwandevan têhneke zanîne jê werdigirin. Krîtîkerîya wisa li ser bîngehê zanyarîyê tete ava kirin, bi serê xwe branşek û ekolek e. Karê wan kesa, taqîb kirina her cure xebatên zanyarî, edebî, kulturî, hunerî, dîrokî û branşên dî yê pozîtîv e. Ew, xeletî û kêmasîya bi argumentên zanyarî derdêxin û alternatîvan pêşkêş dikin. Anku ne pesindarîyeke vala, ne jî reşkirinê dikin. Krîtîker hene ku berekî edebî, kulturî an hunerî anjî yê zanyarîyên dî yê pozîtîv, tinê ji alîyê başî û serketinîyê ve disengînin û pîroz dikin. ðlleh li duv şaşî û kêmasîya nagerin. Qîmetê xebatê dizanin û bi wê berpirsiyarîya objektîv, berên ku hildigrin binê zirbîn û pro-

van alîyan ve tijî kêmasî û netêr, ji her alî ve agresîv dibin. Ziman û qelemê xwe ji bo ajaweyê bi kar tînin. Ji ber ku ne xwudanê bîr û bawerîyekê ne. Bi vî awayî xwe nîşan didin, xwe tetmîn dikin. Eve handîkapeke mezin e û di her civatê da peyda dibe, belê mixabin ku bitaybetî li nav civatên paşdamayî pitir tete dîtin.

Tedaviya vê nexweşiyê ji heye helbet. Belê dem û sebir divêt. Xebat û têkoşîn divêt. Dîsa divêt ev kesên tûşî van nexweşîya bûyî, bisebir bêne perwerdekirin. Eve jî, di prosesa evolusyonê ya ku bi xebat û bizaveke bêwestan hatîye xurtkirin da, dê pêkbêt. Ji ber ku çu tişt bi îrade û daberizîna ekstremîst nayête serast anjî durust kirin.

Belê! Divê li kalîteyê bigerin. Hem jî kalîteyê komple. Di her karî û her tiştî da. Divê cihana ronakbîrîyê ya civata me jî hilkeve vê dereceya bikalîte û valahî anjî kêmasîya xwe ya ji aliyê krîtîkerîya bikalîte ve tijî û timam bike. Hêvî û bawerî heye û eve jî nîşana serketinê ye.

#### Not:

Di hejmara 21an ya Nûdemê da xwandevanekî bi navê Laleş Qaso, di derheqa “zimanê” nivîsara min ya bi navê “Ronakbîr û Ronakbîrî” (Nûdem 19) da “nivîsarek” nivîsîye! Xuya ye camêrî gelek îza û zehmet kêşaye, xwe pê êşandîye! Qederê çar rûpel û nîva nivîsîye, belê mixabin tinê qelemê xwe bi kar anîye!..

Ji ber ku xwandevanî awayekî bêkêr û zimanekî şikestî û vulger bi kar anîye, ez dixwazim ji vî keyşî istifade bikim û bi kurtî çend gotina bêjim.

Mirovê ku bi karê “rexneya” li ser zimanî radibe, divê li ser zimanî î zana be. Hem jî ne zanayekî rêzê, zanayekî baş û bijare be. Her di serî da divê çî bizane?

- fonetîk

- morfolojîya ziman

- elementên gramêrê

- hevokszî

- sînonîm

- etîmolojî

- rastnivîsîn

- dîyalekt, devok, aksan û nuansên zimanî baş bizane!

Vêca hayê vî xwandevanî, dîyar e ku qet ji van tiştan nîn e û di serda jî pilek “te-vazû” jî nîşan nedaye! Karê hemû mirovên kêmxan ev e: Mezin axivtin, belê sivik û vala! Karê kesên wisa demagojîyêke bikujî ye.

Digel ku xwandevanî “nivîsara” xwe bêsîstem, têkel û bêserûber nivîsîye, belê

jektora xwe, biqîmet dikin. Krîtîkerên zimanî, edebîyatê, helbestê, muzîkê, sînema, tîyatro, wêne û baskên di yên zanyariyê, bi vî karê xwe yê qenc têne nas kirin û bi vê îdentîtêya xwe, navdar dibin. Xwudan rûmet in ji ber vê xebata xwe. Ew vê îdentîtê û xebata xwe, wekî çekeke şantaj û reşkirinê bi kar nayînin. Ew dilnizm û sade ne. Belê objektîv in. Ji ber hindê ye ku biqedir in. Sîyaneta wan bilind e di nav ronakbîran û hemû civatê da. Cihê ku krîtîkeriya li ser bingehe zanyariyê û bikalîte lê neyî, kêmk oksîjen e. Krîtîkeriya bikalîte û ya li ser bingehe zanyariyê hatiye avakirin xwunêke taze û oksîjen e bo ronakbîran û cîhana ronakbîriyê. Gelek nivîskar, bi taybetî jî novel anjî romannivîs, kedkarên hemû baskên hunerî û yên di, li hêviya krîtîkerên navdar in, ka dê li ser berên wan çi bêjin û krîtîkên çawa bikin. Ji ber ku krîtîk ji vî alî ve motîvasyon e. Heke ev zanyariyê, bikalîte bi kar bêt, hem mirovan motîve dike, hem jî xizmeta pêşkevtin û xwe nû kirinê dike. Nivîskarî û branşên wê, ji milekê ve xebatên perwerdekirin û têgihandina kulturî ya civatê ne. Lewma krîtîkerî jî divê bi vê kalîteyê bi kar bêt ku hem fonksiyona xwe ya motîvekirinê, hem jî ya perwerdekirinê bi başî bîne cih. Vêca wekî mirov ev portreyê baş yê krîtîkerî anjî krîtîkerê dibîne, dikeve ber xwezîyan ku di nav civata me da jî yên wisa hebin. Helbet dê hebin, belê hewcehî bi dem û sebirê heye. Bi hêviya ku krîtîkerên bijare derkevin meydana ronakbîriyê û cîhana ronakbîrî û têgihandina civata me jî zengîn bikin.

### **Gotina dumahîkê**

Kesên micid bi karê krîtîk û analîzê radibin, xwudanê bingeheke saxlem ya zanîne ne. Bi gotina gelerî, turîkê wan bi zanîne ve î tijî ye. Anjî divê wisa be. Ew xwudanê bîr û bawerîyeke wisa ne, ku ew, bi keda xwe, bi xwandin û lêkolînê, bi dest ve anîne. Neku ji der û dora bihistine. Sermayeyê xwe yê ramanî bi xwuha enîya xwe kar kirine. Krîtîkerên bikalîte û zana, xwudanê etîka branşa xwe ne. Bi xwe bawer in û wekî li ser mijarekê radiwestin, lê hûr dibin û hildigirin binê zirbîn û projektora xwe, dilnizmî û kubarîyê jî, ji dest bernadin. Vê xasyeta xwe ya baş ji bo şikandî û pelixandina mirovan anjî hevrikên xwe anku kesên li hemberê xwe, bi kar nayînin. Ew hewceyîyê bi metodên kirêt û zimanşikestî nakin. Ew bi zimanekî vekirî û bi metodên zanyarî û sistematîk, bi argumentên têrker û alternatîvên li goreyî xwe rast û zanyarî, bi objektîvî radiêxin ber xwandevanan.

Mirovek, heke bi navê ronakbîriyê rabibe, belê evolusyona ramanî û kulturî jî di kesîniya xwe da timam nekiribe, ew bêhêz e. Wî anjî wê, heke hucreyên mejîyê xwe bi xwarîneka ramanê têr nekiribin, êdî zehmetî dest pê dike. Mirovên ku ji

hindî ji destê min bêr, ez dê bisîstem pêda biçim.

Di pêşîyê da ez dixwazim wêneyê wî xwandevanî ji wê nivîsara wî ya şurheya bê-jeya bikêşim.

1. Xwudanê nivîsarê di nav halê agresîvîyê da, piranî zimanekî nekubar, bêrêz û vulger bi kar anîye. Yêk du cara jî gotina "birêz" bi kar anîye! Eve ne awayê mirovê zana û bi xwe bawer e.

2. "Nivîsara" xwe li ser prensîbên polemîk anjî krîtîkê nedanîye. Ji ber hindê jî, di nav kategorîyên reaksiyona zanyarî ya nûjen da cih nagire. Anku ne polemîk ne jî krîtîk e. Ji xwe ne gazinde û ne jî gilî ye! Belê hem bi form, hem bi ziman, hem jî bi naverokê ve tam di çarçoveya "dev avêtinê" da rûdine. Qelemê xwe wekî objeyekî reşkirinê bi kar anîye. Ji nivasara min hindek gotin û nivheвок, bêsistem hilgirtine û çend gotinên bêbingeh li ser kirine. Wekî tirpankêşekî bêkêr, tirpana xwe hilgirtîye destê xwe û ketîye nav mêrgê û bêqayde tirpana xwe kêşaye, adeta dawêşandîye. Ji ber hindê jî gîya car ji nîvekê, car ji binî û car jî ji serî birîye. Birîye dibêjim ji ber ku karê ku kirî, ne awayê giyadirunê ye!

3. Xuya dibe ku zanîna wî ya li ser bi giştî zimanî têra nake. Herweha hayê wî ji mezinahî û zengîniya zaravayê kurmançî ya ji alîyê devok, aksan û nuansan ve jî nîn e. Ji çarçoveya devokê gund anjî bajêrkê xwe derneketîye. Li goreyî wî hemû gotin û hevokên min "xwar" in, anjî "vêl" in. Eve çî reng gotineke kirêt e! Carê, hevok ne "xwar" ne jî "vêl" dibin. Belê, bo nimûne; binê sêhla nanî ye "vêl" e! Hetta devê yêkê jî dikare "vêl" be! Darek "xwar" dibe. Hetta stuyê yêkê jî dikare "xwar" be! Belê hevok ne "xwar" ne jî "vêl" dibin! Heke elementên hevokê bi qayde ne hatibin rêzkirin, hingê mirov dikare bêje ku ev hevokê şaş anjî xelet hatine rêzkirin. Çi ne ev element? Di hevoka sade ya kurmançî da ev in: Kirde + têrker anjî pêveber + lêker. Carina jî heke lêker bi hereket be tete nîvekê. Heke hevok dirêj be hingê elementên di jî, wekî nav, rengdêr, daçek, hoker û yên di bi qayde di nav hevokê da tene bi cih kirin. Vêca serê gotinê binê gotinê ev bêjeyên "xwar" û "vêl" wekî benîşt cûne. Ev awaye, hema aşkera divê bête gotin ku nezanîyeke mezin e. Anku çî? Tu tinê hevokên rast, rêz dikî xwandevan! Eve hem tam perîşanî û sefaleteke "fikrî" ye, hem jî nexweşîya "sendroma rast kirina her tiştî" ye!

4. Mirovek hinde negatîv dibe! Adeta nivîsara min reş kirîye. Dilopek objektîvîte bi kar neanîye. Ketîye bîra subjektîvîzmeke kûr û bêbin, ku bi xwe jî nikarîye jê derkeve!

5. Durustî jî nîşan nedaye! Ji ber ku hindek bêje û çend nivheвок wekî nimûne wergirtine û bêyî sistem, bi terekîyeke mezin adeta serûbin kirine!



6. Bi xwe nebawerîyeke mezin ji nîşan daye û ew hêz di xwe da nedîtîye ku xwe li naveroka nivîsarê bide, tinê di nav çend bêje û hevokan da bi pasîvî “naveroka nivîsarê li dera ha” gotîye.

Ziman û naveroka nivîsarê hind ji hev cuda kirîye, heçku du tiştên ji hev cuda ne! Halçi, her nivîsar û mijara wê bi bêje û termên xwe tête danîn û ravekirin. Mirov nikare wan ji hev îzole bike, anjî dîwarekî beton dane nîveka ziman û mijarê. Ziman û mijara nivîsarê pêkve girêdayî û risyayî ye. Helbet nivîsarek ji gelek alîyan ve divê bête vekolîn. Ziman jî yêk ji wan elementan e. Belê heke mirov tinê elementekê ji nav timamî naveroka nivîsarê veqetîne, nabe. Vêca ev xwandevane jî ketîye vê şaşîyê. Belê ji rûyê nivîsara wî xuya dike, ku wî ev şaşîye bi zanahî kirîye! Lewma jî zimanekî şikestî û bêform bi kar anîye û tinê bi dubare kirina termên gramerê xwe tetmîn kirîye!

Divê ev encame, bo wî bibe serpêhatîyeke perwerdeker û têhneke pozîtîv jê wer-gire.

Çend nimûneyên sefalera “fikrî” ya xwandevanî

Her di serî da ez dê çend gotinên wî yên “orîjînal” yên “reşkirinê” rêz bikim:

- hevok xwar saz bûne
- ne vêl e gelo?
- ahenga zimên xera nake gelo?
- ziman nexweş kirîye.
- ziman dîsa bi ser hev de guvaştîye.
- bêjeyên pir ecêb
- çawa birukubîne!
- ziman pir selixandî ye!
- çewt nivîsîye.
- bi ku de şeg bikin?
- hevok çendî vêl in
- pir belawela ye
- bi kurmancî nabe
- li kurmancî nayê
- di kurdî de nabe
- di kurdî de tuneye

Xwandevanî nivîsara min ya nêzîkî deh rûpelî, bi navê “zimanzan”îyê, bi van “gotin” û “termên” li jorî, “rave kirîye”! Eve çi sefalet e!

Belê, niha ez dê bi kurtî li ser çend xalên pêvîst rawestim!

Min gotîye “Di her demî û her civatê da”. Xwandevan dibêje ev hevokê ye “xwar” û “vêl” e! Xwandevanî parçeyekî hevokê ji nîveka hevok û paragafê mûçink kirîye û derêxistîye anku ristika hevokê xirab kirîye û paşê jî wisa dibêje: “Dem û civat wek bêje çawa mirov dikare berhev bike?”.

Wekî xwandevanên dilsax jî dixwunin, ne hewceyî gotinê ye ku ew nîvhevoka ji nav nivîsara min hatîye mûçinkkirin, her bi wî halê xwe yê birîn kirî jî, ne ye “xwar” ne jî ye “vêl” e! Li milê dî; carekê, divê ev “xwandeve” bizane, ku mirov bêjeya berhev nake! Bêje, ne dar, ne jî ber anku kevir in, ku bêne berhevkirin! Bêje têne rêzkirin. Hevok ristik e. Ristik çi ye? Ji zîncîra zêr anjî zîv ya gerdênê ra ristik tete gotin. Xelek anjî belgên zêr û zîv bi benikekî saxlem ve û bi duvêk ve têne rêzkirin û ristik tete çêkin. Helbet ev ristike dibe ku ji morik, berên bihadar û parçeyên metalên rêzê jî be, axir! Hetta gelek kes ji sentaks anjî hevoksazîyê ra “ristesazî” jî dibêjin. Vêca hevok jî ji bêjeyan pêktên û piştî bêje hatin rêzkirin, dibin hevok. Daku xwandevan têbigihe, ez dê wê nîvhevoka xwe dîbare binivîsim: “di her demî û her civatê da”. Di danîna hevokên wisa da, heke mirov carekê prepozisyona “di” bi kar anî, êdî cara duyê ne hewceye bi kar bêt. Anku; “di her demî anjî wextî da” û “di her civatê da”! Heke mirov xwast, van her du nîvhevoka li duv hev rêz bike, hingê dubarekirina prepozîyonên “di” û “da” hewce nakin. Eve sanahî û sivik kirina ziman e. Lewma “di her demî û her civatê da” hatîye nivîsîn!

Xwandevan li ser hindêk bêjeyên ku bi forma “nêr” anjî “mê” bi kar hatine jî di-sekine û dibêje ku, bo çî “dem” nêr bi kar hatîye. -Helbet ew nabêje “bi kar hatîye”. Dibêje “xebitandîye”. Ketîye duv bêjeyên min, belê wî bi xwe bêje xelet bi kar anîne. Mirov bêjeya xelet anjî rast naxebitînin. Bi kar tînin. Xwandevan divê vê nuansa di navbeyna “xebitandin” û “bi kar anînê” da jî bizane!-

Ev pirse ji mêj ve ye li ser maseya riberizê ya zimanzanên kurdî ye. Ji xwe bi dehan bêje hene ku cinsîyeta wan li goreyî her navçeyê tete guhartin. Bo nimûne; “qelem” li aliyê Diyarbekirê û berîya Mêrdînê bi forma “mê” bi kar têt, belê li aliyê Hekarîya û Behdîna “nêr” bi kar têt. Vêca kes nikare bêje “ya min rast e”! Paşê “rastî” jî relatîv e. Ji bilî qaydeyên bingehîn yên zelal û kîvşkirî yên rêzimanî, di van detayan da relatîvîyet heye. Êdî riberiza li ser vê yêkê bêkêr e û xizmeta pêşveçûnê nake. Taybetî jî li ser pirsên zimanî, herkes rabe li goreyî xwe bêje “eve rast e, eve ne rast e”, anjî bêje “qayde û forma devokê min rast e, yên dî ne rast in” nabe... Navçeyê berfireh, bêjeya “dem” nêr bi kar tîne, tu mê bi kar tîni. Ev cudahîyên navçeyî hene û dê hebin jî. Paşê eve di riberiza li ser pirsên zimanî da çend girîng jî

bin, belêm detay in. Divê îro li ser xalên girîngtir yê zimanê bête rawestan. Belêm eve jî têgihîn û zanînekê dixwaze. Xwandevanê me jî, mixabin ku ji vê têgihîn û berpîrsiyarîyê dûr xuya dike û heta ku xwe li ser pîrsên bîngêhîn perwerde û amade bike, diçe di nav detayan da xwe berze dike. Hem paşê wî bi xwe jî gotina “çax” nêr bi kar anîye. “Dem” û “çax” termên demî ne. Heke “çax” nêr bi kar hat, bo çî “dem” bi kar neyêt!

Bêjeyek dî jî heye ku xwandevan li ser ketîye rikê, ku li goreyê wî dîsa min “xwar” û “vêl” bi kar anîye! Ew jî “Riberiz” e. Ev bêjeye li şuna “munaqêşe”yê bi kar hatîye. Xwandevan dibêje ku, ew “Raberzîn e”! Li goreyê xwe jî wisa îzah dike: “Ra + berzîn”. Û dibêje ku bi sedan nimûne hene, belêm nimûneyek jî nedaye. Niha em wê gotina xwandevanî ji alîyê morfolojîk ve jêkve bikin: “Ra” pêşkît e. Gotina “berzîn” jî bi serê xwe manaya “canîhesp” anjî “canîmahîn” a ku li ber zîn dide. Vêca ev “ra+berzîn” a xwandevanî çawa dibe “munaqêşe”! Çend mantiqekî şaş e! Her ev çende jî nîşan dide ku xwandevan li ser van pîrsa micid nesekîniye û qet lê hûr nebûye! Hema çawa bi ber guhê wî ketîye wisa dawêşandîye!

Halçî, ev bêjeya “riberiz”ê, forma xirabbûyî ya “rûberizî”yê ye. Di nav dem û salan da form guhartîye û ew pêşkîta “rû” bûye “ri” û “î”ya dumahîkê jî ketîye û bêjeyê ev reng wergirtîye: Riberiz. Hindî “beriz” anjî “berizî” ye, ew bi serê xwe xwudan mana ye û têtê manaya “dij derketin, dij rawestan”ê. Vêca gava mirov bêjeya “riberizê” ji alîyê morfolojîya zimanî ve jêkve bike, wisa dibe: “Rû + beriz” an “rû+berizî” anjî “ri + beriz” an “ri + berizî”. Anku rû bi rû anjî li beramberî hev, parastina bîr û bawerîyên li dijî hevdu! Anjî axivtina hevrikî ya rû bi rû anjî li beramberî hev ya di navbeyna hevrikan da! Di demên berê da, “riberizên” di nav xelkê da tinê devkî û bi dengêkî bilind, adeta wekî şerê devî hatine kirin. Û xelkê, bo wan munaqêşeyên xwe “riberiz” anjî “riberizî” gotine! Belêm di şertên îro da nayê wê manayê ku “riberiz” dê her bi awayê kevin anku “hişk û deng bilindkirinê” bête kirin. Gerçî mixabin ku ew tarz “riberiz” îro jî dom dike û tiştêk dî jî lê zêde bûye, ku di navbeyna xwanda û “ronakbîr” an da jî her ew tarz “riberiz” têtê kirin!.. Paşê ev gotina xwerû kurdî, li şuna “munaqêşe” ya erebî û “diskusyon” a latînî, bi kar têt! Me jî di serî da hewcetî bi vê gotina “riberiz”ê heye. “Munaqêşe” anjî “riberiz” a baş anjî xirab tiştêkî dî ye! Hem paşê eve gotineke hizar salî ya xelkê ye. Ji nav jîyana xelkê me derketîye û di kûrahîya dîrokê da li ser serpêhatîya xelkê bi xwe û dîsa ji alîyê xelkê ve hatîye çêkirin. Anku xelkê, ew pevçûnên devkî û axivtinên li dijî hevdu hatine kirin, bi vê bêjeya “riberiz”ê bi nav kirine, ku li goreyê mantiqê zimanzanîya nûjen jî rast hatîye danîn! Lewma bêjeya “riberiz”ê, ji nav hewcetîya jîyana xelkê

derketiye û sedased jî orîjînal e. Lewma ew gotina xwandevanî gelekî bêbingeh e û li hewayî dimîne. Û ev bêjeya “riberizê” îro jî di nav xelkê me da bi kar tê. Ne bêjeyeke nû ye, ku mirov bêje ji alîyê hindêk kesan ve hatiye çêkirin.

Li ser van gotinên min yê nû ku xwandevanî her yêkser reş kirine û ji kurdî ne hejmartine, dixwazim anekdorekê bêjim. Ji ber ku xwandevanî xwe di çarçoveya tenge gund anjî bajêrkê xwe da asê kirîye û ya ji wî ve, tixubê kurmanciyê li gundê wî xilas dibe. Heke bêjeyeke me li gundê wî bi kar neyêt, hingê yêkser an “xwar” e an “vêl” e anjî ne kurdî ye!!

Di çîroka “Sonika Kirêt” ya H.C. Andersen da; wekî sona kurk dem tê û ji ser hêkên xwe radibe, çûçelok ji hêka derdikevin û gotina wan ya pêşiyê dibe ev: “Dinya çende mezin e!” Helbet heqê wan hebû wisa bêjin. Ji wê dinyaya tenge hêkê derketibûn û hatibûn dinyayêke firehtir. Dayîka wan lê vedigerîne û wisa dibêje: “Ma hûn dinyayê hinde dizanin! Dinya heta serê dî yê bexçeyî dirêj dibe. Ji wê derê jî pêda, heta zeviyên qeşeyî (keşe) dirêj dibe...” Belê! Vêca heke xwandevanê me jî piçekê xwe bilivîne dê bizane ku dinya û helbet Kurdistan jî ne tinê gund anjî bajêrkê wî ye!

Li ser forma “ev” û “ev berheme” jî dengê xwe bilind kirîye û dîsa “xwar” û “vêl” a xwe dubare kirîye. Vê carê jî hawara xwe gihandiye Celadet Bedir Xan. Ji ber ku navê Celadet jî bi awayekî feodalî û prîmîtîv bi kar anîye, divê kurt li ser bisekinim. Wisa dibêje xwandevan; “Xwediyê vî zimanî Celadet...” Ev tarze tercîhek e helbet! Belê me ne tarzê mirovên pêşketî ye. Ev tarze herweha şikandina rûmet û mezinahiya Celadet Bedir Xan e jî. Ew ne “xwediyê vî zimanî” ye! Ew kedkarê herî mezin yê vî zimanî ye! Li alîyê dî jî, ew ne tabu ye! Bi navê qedir girtina mirovên hinde birûmet, gotinên wisa, bi yêk gotinê sivikî ye!

Me çî gotîye: “Ev berheme”. Xwandevanê me dibêje nexêr divê bêjin “ev berhema ha”! Celadet Bedir Xan dibêje “jinika ha”. Belê Kamiran Bedir Xan jî dibêje “keçka he”. Ez jî wê “ha” anjî “he” yê û paşkîta zayendê radikim û “e” yê pêve dikim, ku ev forme li timamî Hekarîya û Behdîna bi kar tê. Ha bêjin “ev keçka”, ha bêjin “ev keçka he”! Anjî bi devokê Hekarî û Behdîna “ev kiçika” anjî “ev kiçika he”. Dîsa ha “ev kurike”, ha “ev kurikê he”. Yêk tişt e! Hayê xwandevanî ji van dîmen û detayên zimanî nîn e. Û paşê her sê form jî rast in! Kurt xeber ev e! Dîsa divê neyê ji bîr kirin ku Celadet û Kamiran Bedir Xanan jî zêdetir nimûneyên Cizîra Bora û Cizîra Binxetê û dorberê wan dera, bi kar anîne. Di nav nimûneyên wan da, gotin û hindêk qaydeyên bi wan ve girêdayî yê nû bi taybetî navçeya Hekarî û heta dereceyê yê Behdîna jî, kê m in.

Niha em bêne ser nimûneyeke çemandîna nava, ku xwandeveanê me li ser wê ketîye mixabin lê nezaniyeke mezin. Xwandeveanê me ev gotina min; "Di mirovi da" hilgirtîye û wisa dibêje; "Di mirovi da çi ye? Gotineke wilo di kurdî de tune ye..." Eve jî sefaleta "fîkrî" ya xwandeveanî nîşan dide. Wekî me li jor behsê anekdota Andersens kirî, eve bû. Xwandeveanî dîsa serê xwe kirîye binê xîzê gundê xwe, lewma jî nikare çu dera bibîne ku hayê wî ji deverên dî û axivtina wan dera hebe. Kurdîya wî tinê di nav tixubên gundê wî da ye û ya ji wî ve kurdî her ew e!

Li Hekarî û Behdîna çemandîna navan wisa dibe: Bi gelekî ve "Mirovi"! bi kar tê. Belê li navçeyên nêzikî Bora "mirovî" jî tête gotin! Çend nimûneyên dî:

"aşî / aşî"

"şivani / şivani"

"gavani / gavani"

"hespi / hespi" dibêjin.

Forma çemandîne ya wekî "êş", "şivên", "gavên" û "hêsp" bi kar nayê.

Vêca her sê form jî rast in. Anku ev forma "mirovî" jî di kurdî da heye, belê xuya ye tinê di "kurdîya" xwandeveanî ya hilweşiyayî da nîn e!

Xwandeveanê me gavê seetê gotin û hevokên min an "xwar" anjî "vêl" dibîne. Belê wî haj xwe nîn e ka ew gotina çawa bi kar tîne. Bo nimûne wisa dibêje: "Gotineke wilo di kurdî de tune ye". Di vê hevokê da, wekî Celadet Bedir Xan gotî, divîya li ber halê neyînî yê "heyînê" anku lêkerê "neyînê" anku ji "tu ne bûn"ê, "tune" anjî "tu neye" nivîsîba!

Dîsa sedased bi manakirineke xelet, gotinên min tam berevajî kirine û her wisa jî berevajî rave kirine. Wisa dibêje: "Belê a herî balkêş îcar ku nivîskar, ji me re, hiş, bîr û ramanê wek organ rave dike."

Niha ez dê li jêr wê hevoka xwe dîsa binivîsim. Min wisa gotîye: "... Di mirovi da navenda aksiyona hiş, bîr û ramanî, organê mejî ye."

Gotineke hinde vekirî û zelal, tinê mirovên xwe şaş kirî wisa bi aşkerayî û rûçirî li ber hemû xwandeveana berevajî dikin û gotinên xwe yê jî binî ve xelet û ne rast wekî "rastîyê" pêşkêş dikin!

Nexweşîyeke çawa heye, "nebînîya bêjeya" anku "word blind" dibêjinê. Wisa xuya dike ku di çavên vî xwandeveanî da, ev nexweşîye heye. Heke mirovekî timam, wan gotinên min, hinde bi aşkerayî serûbin nake. Niha di vê hevoka min da çawa "hiş, bîr û raman" wekî "organ" têne nîşan dan? "Navenda aksiyona hiş, bîr û ramanî organê mejî ye" tête gotin. Eve çi bêberpirsiyarî ye! Ev tarzê vî xwandeveanî, ji etîka "xwandeveanîyê" jî bi timamî dûr e!

Di pirs a gotina lêkerê “bûn” anjî “bûyîn”ê da jî demagojî kirîye. Ev her du form jî rast in û du bêjeyên cêmik in. Wekî “man û mayîn, dan û dayîn, çûn û çûyîn”ê. Vêca “bûyne”, forma “bûyîn”ê ya axivtinê ye. Wekî herkes dizane, di axivtinê da hindêk dengên “vokal” dikevin. Ev bêjeye jî, ji nav hevokê mûçink kirîye û xwastî-ye gêreyê li ser bike! Min di nav vê hevoka xwe da bi kar anîye; “... bi sedan ‘zana û alim’ derketine ku bi zanîn û kiryarên xwe bûyne asteng li ber pêşveçûna mirovahî-yê...”. Xwandevanê me li milekê “zirbîna” xwe hilgirtîye destê xwe, ku divê xeletî-yeke me bibîne; lê li alîyê dî jî, ji ber ku î hîpermîyop e, vêca zirbînê jî têra nekiriye ku tiştekê bibîne, hingê jî demagojî li ser “bûyne” û “bûyîne” kirîye. Karekî pûç! Niha dîsa ez dê nimûneyeke kurt bidim daku xwandevan tetmîn be!

Ew bûne asteng

Ew bûyîne asteng

Ew bûyne asteng

Her sê form jî rast in. Demagojîya xwandevanî ya li ser vê xalê jî bi tinê sefalet e!

Li derekê jî xwe li gotinên “ronakî” û “tarîkî”yê asê kirîye. Dîsa dibêje; “Min nebihîstîye ku kurdekî ji ronahîyê an ronatîyê re, ‘ronakîyê’ gotîye”. Ewe jî ecêbîyeke dî ya xwandevanî ye!

Xwandevanê me jî, mala wî ava be, hema qet çu tişt nebihîstîye! Ew adeta di ge-  
raveke sefaleta “fîkrî” da melevanîya dîke! Carê, gotina “ronak”ê heye. Ronak, wekî  
nav jî navekî gelek xweş e. Bi sedan “Ronak” hene li Kurdistanê. Li goreyî qaydeyê  
morfolojîya zimanî jî, paşkîta “î” têtê paşîya bêjeyê, wekî; “ronak + î” û “ronakî”  
çêdibe. Serda jî, di nav xelkê me yê navend û rojhilata welatî da, bi kar têt. Ev goti-  
ne bi gelek formên cuda têtê gotin; di serî da li ser bîngêhê “rohn” û “ron”; bi hev-  
karîya paşkîtan, rohnahî, ronahî, rohnî, ronî, ronkahî, ronakî û belkî li gelek navç-  
eyên dî hindêk dî jî hebin, diafirin. Ji xwe xwandevanî bi xwe jî “ronatî” gotîye!  
Ma bo çî ji bo “intellektual” “ronakbîr” têtê gotin? Dîyar e “hikmetek” di vê “ro-  
nak”îyê da heye!

Hindî gotina “tarîk” e, ew jî li goreyî qaydeyê morfolojîya zimanî çêbûye. Anku;  
tarî + k = tarîk. Piştî vê operasyona li ser bêjeya, heke ji “ronak” ronakbîr çêbe, ji  
gotina “tarîk” jî tarîkbîr çêdibe. Paşê hem “ronakbîr” hem jî “tarîkbîr” termên zan-  
yarî ne. Ronakbîr anku xwudanê “bîr”eke anjî “fikireke” ronak anku bironahî! Ta-  
rîkbîr jî anku xwudanê “bîr”eke anjî “fikireke” reş û tarî! Her du term dijberî hev  
in. Wekî sipî û reş! Ronakbîr temsîla mejîyekî “sipî” û zelal û tîrironahîyê dîke. Ta-  
rîkbîr jî temsîla mejîyekî “reş” û şêlu û tîrtarîyê dîke! Êdî her ev e! Vêca ji bo ku  
xwandevanê me di vê prosesa operasyona li ser gotina da bigihe, divê bi keda xwe,

zanîna xwe gelek pêşve bibe!

Li vê derê dixwazim li ser gotina xwandevanî ya “min nebihîstîye ku kurdekî ji ronahîye an ronatîye re, ‘ronakîye’ gotîye.” dîsa bisekinim. Ji ber ku ev tarz gotine; haletekî “ji her kesê baştir zanîn” û “xwe li ser ewra dîtin”ê ye, ku bi serê xwe negatîvîyeke herî mezin e. Niha wekî gotiba “min nebihîstîye”, em da bêjin dibe ku li navçeya wî wisa nayêt gotin. Belê “kurdekî” gotîye! Bi vê gotinê bo xwe li piranîyekê gerîya ye, belê di rastîye da ew “kurdekî”, hema ew ‘tek û tinê’ bi xwe ye! Paşê wî jî li derekî nivîsara xwe “bi ku de şeg bikin?” gotîye. Ev gotina “şeg” di wan ferhengên ku wî bo xwe kirine referans da jî nîn e. Belê dîsa ve ez nabêjim ku ew di kurdî da nîn e. Ji ber ku dibe ku di navçeya wî da bi kar têt. Û bi ihtimaleke mezin jî bi manaya “bi kîjan alî ve bidin”, bi kar hatîye.

Em bêne ser gotinên “kî” û “kû”! Li hêla Hekarî û Behdîna di şûna “kû derê” da “kî derê” bi kar têt. Serda jî her bi wê manayê, ev formên “kerdi” û “kîrê” jî bi kar tên. Bo nimûne: “Tu dê çîye kerdi?”. Anjî “Tu dê çîye kîrê?”. Û herweha “Tu dê çîye kî derê?” jî tete gotin. Anjî; “ew li kî derê ye?”, “ew li kerdi ye?”, “ew li kîrê ye?”. Anku ev forme hene û li goreyî qaydeyên gramîtikê jî rast in. Ji ber ku gotina “kî” li vê derê hem bi manaya pronavê nîşandanê, hem jî bi serê xwe bi kar nayêt. An digel “derê” an “rê” anjî “erdi”, anku “cîh” bi kar têt. “Dê biçîye kî derê?”. Anjî wekî dibêjin “tu dê çîye kerdi?”; li vê derê “kerdi” forma kurtkirî ya “kî erdi” ye. Anku bi vekirî wisa ye; “tu dê çîye kî erdi?”. “Tu dê çîye kîrê?” jî bi vekirî wisa ye; “Tu dê çîye kî rê?”. Vêca li hêlên rojavaya Kurdistanê, şûna van tarz gotina wisa dibêjin; “dê biçî kû ?” anjî “dê biçî kû derê?”. Hemû form jî rast in û tam li goreyî qaydeyê gramerê ne û rengên zengînîya zimanê kurdî ne!

Xwandevanê me niha jî ketîye duv “î” yê. Min wisa gotîye: “...ronakbîr, di bîr û helwesta xwe da heke î girêdayî be...” Li goreyî xwandevanî dîsa ya min “vê!” e, belê yên wî hemû rast in!

Di hevoka min da “î”yê tam cihê xwe girtîye. Kî “î” girêdayî ye? Ronakbîr! Tîmam, her hind e! Nimûneyekê jî ji pirtûka Celadet Bedir Xan û Roger Lescot bidim: “Ev hesp î qenc e”. Çi “î” qenc e? Hesp! Anku wekî Celadet Bedir Xan jî dibêje “î” dikare berî rengdêr bi kar bêt. Li vê derê tiştê girîng ev e: “î” forma nêr, “e” anjî “ye” jî ya mê nîşan dide. Dîsa ez nimûneyekê ji pirtûka Celadet Bedir Xan bidim: “Ev mehîne e qenc e”. Ev hevoke dikare wisa jî be: “Ev mahîne ye qenc e”! Her hind e!

Xwandevan wekî li ser “î”yê demagojîyê dike, nimûneyeke wisa dide; “serê me î hişk - serê me ê hişk”. Ya rast divê “ê” anjî “yê hişk” be! Belê hema bi kîjan awayî

be, xwandevanî tam xwe tarîf kirîye!

Dîsa xwandevanê me serê xwe ji ber gotin û hevokên min li dîwaran dide! Çi ye? Rawestek! Ev gotine jî ji nav hevokê mûçink kirîye, ser û çavên paragraf û hevokê pelixandine, bêje ji manaya ku di hevokê da xuyayî, dûr kirîye! Hevoka min ev e: "Jîyan ne rawestek e. Jîyan bi serê xwe bizav e, têkoşîn e.". Li vê derê mexseda bi kar anîna "ne rawestek e" yê; anku "jîyan nasekine, bibizav e" anjî "jîyan ne statîk e, dînamîk e". Bi gotineke dî; "rawestek" ne li şûna, belêman bi manaya "statîk"ê bi kar hatîye! Vêca xwandevanî ew bêje, ji wê manaya xuyayî ya di nav hevokê da, bi mexsedeke neqenc dûr kirîye. Aşkera ye ku gotina "ne rawestek e" bi manaya "ne statîk e" yê bi kar hatîye. Li vê derê rewşa jîyanê hatîye ravekirin. Belêman xwandevanî ji ber negatîvî û dilreşîya xwe, ew bêje li zimanê xwe alandîye û ne polemîkeke stewr jî, bi timamî zimandirêjî li ser kirîye. Ez dê wê paragrafa wî ya ku bi zimane-kî vulger nivîstîye li jêr bidim.

Wisa gotîye xwandevanî: " Li gor ferhengên kurdî bêjeya "rawestek" frênê te-rempêlê ye. Hin gotinzanên me jî mîna kemalîstên tirk ên wextekê ku ji aşxanê re (otlangaç), ji qedemgehê re (siçirtirgaç), ji frên re (dûrdûrûcû) û hwd. digotin, bêjeya frên wek (dûrdûrûcû) xistin zimanê me. Ne baş kirin. Li zimên nayê."

Li vê derê xwandevan êdî bi timamî jî hemû tixubên "erîka qelemdestî û xwandevanîyê" dûr ketîye, lewma ev zimanê hinde kirêt û vulger bi kar anîye. Paşê her ew paragrafa wî jî, ji aliyê forma zimanî ve, di nav xwe da ji hev ketîye û bêserûber e. Di dawîya paragrafa xwe da jî dibêje "frên wek (dûrdûrûcû) xistin zimanê me". Xwandevanî li vê derê xwe tam jî bîr ve kirîye û nizane ka çi dibêje!.. Ji xwe min jî "rawestek" bi manaya "fren"ê bi kar neanîye! Xwandevan ji ber nezelaîya serê xwe nizane dê demagojîyê jî li ser çi bike! Paşê wekî referans jî behsê hindêk ferhenga kirîye. Hayê me jî ji wan ferhenga heye helbet. Di wan ferhengan da jî bi sedan bêjeyên "nûçêkirî" hene ku li goreyî qaydeyê morfolojîya zimanî nehatine çêkirin û gelek şaş û dijmana hatine danîn, ku qet cih nagirin û ji manaya xwe ya rastîn dûr in. Paşê mirovê ku bi navê "zimanzanîyê" radibe, divê tinê bi referansa ferhenga qayîl nebe. Divê ew bi xwe jî li ser bi giştî gramera zimanî û etîmolojîyê bixebite û paşê bigihe encamêkê.

Li milê dî; ji aliyê morfolojîya zimanî û zanyarîya teknîkî ve jî "rawestek" nabe "fren". Fren di otomobîl anjî makîneyan da, mekanîzmeyeke makenîk e. Sistemêkî kompleks e. Ne tinê pedalê frenê ye. Pedal yêk ji aletên bi kar anîna sîstem û mekanîzmaya frenê ye. Li goreyî dû sistemên frenê ev prosese wisa bi kar tê: Pedal + hêz + hîdrolîk + fişar + balata = rawestan anjî sekinîn . Anjî pedal + hêz + hewa +



fişar + balata = rawestan anjî sekinîn. Helbet aletên di yên bi vê sistemê ve girêdayî jî hene ku vê prosesê timam dikin û bûyera rawestan anjî sekinînê pêktêt. Anku fren sistemek e, ku bi hêzeke duyemîn dikeve dewreyê û fonksiyona rawestandî anjî sekinandinê tîne cih. Vêca wekî bi dehan gotinên xelet, ev gotina “rawestek”ê jî bi manayeke ne di cih da ketiye nav ferhenga û ev çende jî kesên “kêzman” diêxe şaşiyên ecêptir!

Di dawiyê da jî dîsa li ser hevokan dîsekine û li ser vê hevoka min “Ew bi karê mejîyî ve mijûl e” wisa dinivîse: “Ez fêr nakim bê çima tu nabêjî, ew bi karekî întellektuelî dadikeve an mijûl dibe.”

Niha eve gotine? Eve çî “ji xwe razî”tî ye? Mirovê ku ji etîka gotinê misqalek têhn wernegirtî wisa dibêje!! Hem paşê ev tarz gotine jî bi serê xwe sefaleta “fîkrî” ye! Du mirovên cuda tarîf, teswîr anjî ravekirinê wekî hev anjî bi yêk qalib bêje û hevokê nakin! Herkes “tişteke” bi bêje û termên ku ji nava dil û mejîyê xwe dibişkinvin, teswîr û rave dike û tîne ziman. Ziman ne “matbû” ye ku mirov qalibên bêje û hevoka hilgire û di nav nivîsarê da bi cih bike!.. Ez karê “ronakbîrîyê” wisa rave anjî teswîr dikim! Kesek di li goreyî xezîneya gotinên xwe cudatir rave dike. Belêr vêca têgihîna van ravekirina jî, kapasîteya zanahîyê dixwaze. Mirovên ji zanîne dûr helbet “fêr nakin”! Xwandevanê me dîsa ji zanahîya li ser zimanî dûr wisa dibêje: “bi karekî întellektuelî dadikeve”. Xwandevanî bi vê gotinê jî êdî bi timamî xwe kirîye stuna sefaleta fîkrî! Mirov “bi karê întellektuelî danakeve”! Mirovê heke manaya “daketin”ê jî nizane û rabe li cihekî wisa bi kar bîne, ku qet girêdanek pêve nîn e, dê çawan be? Mirov bi karekê radibe, xwandevanê min, “radibe”!. “Rabûn”, wekî bêjeyê hevedudanî, bi hevkarîya pêşkîta “ra” çêbûye û bizava hilketinê anku bizava ber bi jor, rave dike. Çend mînakên di jî ev in: rakirin, radan, rahiştin.

Hindî “daketin”e, ew jî bizava ber bi xwarê rave dike û bi hevkarîya pêşkîta “da” çêbûye. Çend mînakên di jî ev in: danîn, dadan, dagirtin, daketin. Dîsa gotineke min ji nav hevokê mûçink kirîye û hevok jî bi timamî wernegirtîye û wisa “biryar”(!) daye: “Rijandin lêkerê negatîv e. Bi kurtî, rewş nayê rijandin; tê ber çawan, tê fikirandin û hwd.”

Min ew bêjeya “rijandinê” li ser erkên ronakbîran bi kar anîye û wisa nivîsiye: “Çîrok û novelên fantazîk û serpehatîyan jî bila binivîsin, belêr rewşa gel û welatê xwe jî bila birêjin ser kaxezê.”

Carekê, nivîsîn jî rengkî rijandina ser kaxezê ye û bi wê manayê tam di cihê xwe da û rast bi kar hatîye! Li alîyê di ‘rijandin’ hergav bi manaya negatîv bi kar nayê. Girêdayî dem û şertan e. Wekî di nav xelkê da; “ya dilê xwe birêje” têtê gotin, ew

bi manaya “ya dilê xwe vekirî û bidetay bêje” yê bi kar têt! Paşê di wê hevoka min da îronîyeke hind zirav bi kar hatîye, ku mixabin xwandevan vêra negihîştîye ku têbigihe.

Bi kurtî; mirovek bi navê “zanahiyê”, belê bi nîyeteke negatîv û dilreş bi karekê rabe, sernakeve. Xwandevanê me jî her di destpêkê da, hem bi nîyeteke negatîv, hem jî bi “zanaîneke” serdevkî, li ser nivîsara min sekiniye û li ser bêje û hevokên min wisa gotîye; “ahenga zimên xera nake gelo?”. Niha eve gotin e? Anku çi? Barometre anjî metronoma “ahenga zimanî” di destê kê da ye? Ahenga zimanê kê, li kê xweş an xirab têt?.. Eve êdî tarzê herî dawîyê yê “dev avêtin”ê ye û bi yêk gotinê gelek sivikî ye!.. Li ser vê nezanîya xwandevanî mirov dikare tinê wê anekdora qirereşê (Corvus corone) bêje; gerçî ev anekdote piranî li ser “hevrik” anjî “hevrikan” têtê gotin, belê qeydî nake bila vê carê li ser me be! Ji qirereşê rewşa çûçeloka wê pirsîne û wê jî gotîye ku çûçeloka wê li ber dilê wê wekî çûçika ankayê ye. Anka, anjî “zumrudî anka” firindeya herî sipehî û bedew e, lê di rastîyê da nîn e. Ew di xewn û xiyalan û di çîrokên da heye. Belê digel hindê jî, ew bûye sembola sipehî û delalîyê. Vêca berê herkesê li ber dilê xwudan gelekî sipehî û şîrîn e. Ahenga zimanê nivîsara min jî, li xwandevanî xweş neyê jî, li ber dilê min ahenga herî xweş û şîrîn e. Niha hûn werin jî min bipirsîn ka ahenga zimanê xwandevanî, ku hetmen bo wî jî “anka” ye, bo min çawan e? Zimanê wî yê şikestî, bo min hind bêaheng hat, belê dîsa ve ji ber hewcetîya berpirsiyarîyê, min sebîr û xweşbînî nîşan da û li ser “reşbelek(!)” a wî hinde dirêj nivîsî!

Belê! Vêca xwandevanî xwe kirîye hem dozger, hem dadger û li milê dî jî xwe kirîye “şêxulislam” anjî ayetullahê “fito” yê! Xwandevanî “fitû” nivîsiye! Camêr rûniştîye û tixubê dev avêtina nivîsarê jî bezandîye û xwe bi xwe, “fitû” daye ku dev bavêje ahenga zimanî jî! Li ber “fetwa” ya erebî, xwe bi xwe “fitû” ya xwe daye, ku nivîsara min yêkser reş bike! Ji ber ku xwandevan ne bi zanîne, bi “fitû” yê rabûye, lewma jî nikariye normên zanyarîya zimanî bi awayekî zanahiya objektîv bi kar bîne û ketîye çala subjektîvîzmeke req û hişk. Qelemê xwe bi normên erîka qelemdestî û xwandevanîyê bi kar ne anîye, “qelemkêş”îyeke sivik û xalî kirîye û di vî karê xwe da jî serneketîye. Her serneketîni divê bo kesê serneketî bibe kana tecrubeyan! □

# Du şîr ji JACQUES PRÉVERT



**Jacques Prévert** şairekî fransî yê hevdem e. Ew di sala 1900'î de li Neuilly hatiye dinyayê. Gelek ji şîrên Jacques Prévert ji aliyê hozanên fransî ve bûne stran û gelekî hatine hezkirin. Ji bilî şairtiyê Jacques Prévert mîna senarîst jî navdar e.

Ev herdu şîrên Jacques Prévert ji pirtûka wî "Paroles" ku di sala 1949'an de di nava weşanên Gallimardê de derketibû, hatine wergerandin.

## **Ji bo te evîna min**

Ez çûm bazara çûkan  
Min çûk kirîn  
Ji bo te evîna min  
Ji bo te

Ez çûm bazara gulan  
Min gul kirîn  
Ji bo te evîna min  
Ji bo te

Ez çûm bazara xurdeciyên  
Min zincîr kirîn  
Zincîrên giran  
Ji bo te evîna min  
Ji bo te

Û dû re  
Ez çûm bazara kolan  
Ez li te geriyam  
Lê min tu nedît  
Min tu nedît evîna min.

## **Ez weke xwe me**

Ez weke xwe me  
Ez wilo çêbûme  
Gava ez dikenim  
Dengê ewran ji min tê  
Yên ji min hez dikin  
Ez jî ji wan hez dikim


Ne sûcê min e  
Ku her carekê  
Ez bi awakî din hez dikim  
Ez weke xwe me  
Ez wilo çêbûme  
Hûn çi ji min dixwazin  
Hûn çi dixwazin ji vê bêtir

Ez ji bo hezkirinê çêbûme  
Û tiştêk nikare vê biguhere  
Meziyetên min gelekî bilind in  
Bejna min gelekî berbiçav e  
Memikên min gelekî şidyayî ne  
Çavên min her kesî hemêz dikin  
Û piştî her tiştî  
Çi ji we re?  
Ez weke xwe me  
Kesên ji min hez dikin  
Ez jî ji wan hez dikim  
Çi ji we re?

Tiştê ku hat serê min  
Min ji yekî hez dikir  
Yekî ku ji min hez dikir  
Weke zarokên ji hevdu hez bikin  
Weke yên dizanin ji hevdu hez bikin  
Hezkirin... Hezkirin...  
Bo çi hûn pirsan ji min dikin?  
Ez li vê derê me  
Ji bo hûn ji min hez bikin  
Û tiştêk nikare vê biguhere.

Ji fransî: **CAN GULŞENOGLU**

# Çima Stalînîzm!?



## ŞEREFXAN CIZÎRÎ

**B**i taybetî tevgera çep li Kurdistanê, ji roja ku derketiye meydana polîtîkayê û heta roja îro, di hemû waran de Stalînîstî kiriye. Di pirsên rêxistinî de, di pirsên hunerî de, di pirsên metodolojî de, di pirsên danûstandinên polîtîk de, di pirsên netewî de, di pirsên dîrokî û kultura netewî de, di pirsên avakirina sosyalîzmê bi xwe de, her gav Stalînîzm hatiye parastin. Ramanên Stalînîstî bi awayekî pir fireh di nav çepên kurdan de belav bûne. Ramanên Stalînîstî li welatê me bi awayekî kûr heyvan girtine. Kesê ku kûranî û hûmanîzma Marksîzmê fahm nekiribe, sosyalîzm ji xwe re nekiribe felsefa jiyane, dikare ji aliyê Stalînîstan de bi propogandake pîr hêsan bêne îknakirin.

Encamên vê yekê dikarin pir bin. Ji aliyê ramanî de Stalîn beriya Marks hatiye Kurdistanê. Li pîr welatan, xelkê pêşî Marks û Engels nas kirine û paşê jî Stalîn fêr bûne. Ji aliyê dîroka ramanî de ev rastî pir girîng e. Lê mirovê kurd berê Stalîn xwendine û paşê jî bi çavekî Stalînîstî li Marks û Marksîzmê temaşe kirine. Li ser vê realîte û problemên bi vê yekê ve girêdayî divê lekolînên kûr bêne çêkirin...

Ji aliyekî de mirov dikare wilo bibêje; zanyariya nîzm û kêmbûna xwendin û nivîsandinê li Kurdistanê, alîkariya pêşketin û pejirandina Stalînîzmê kiriye. Di civa-

ta me de hergav nezantî û dogmatîzmê xwîn dane hevdû. Ji aliyekî de problemên perwerdekirina xelke kurd û ji aliyekî de jî sistema kolonyalîst li Kurdistanê, ji bona mirovên me birînên kûr pêkanîne. Ev birînên psikolojîk û kulturî ku li Kurdistanê peyda bûne û polîtîka Stalînîstî, bi hemû awayî hevdû ji aliyê ramanî de timam kirine. Dogmatîzma Stalînîst û rewşa Kurdistanê ya dijwar, xwîn û jiyana dane hevdû.

Ev mesele wilo hatiye pejirandin: Li miqabîlî dijwarbûna mercên Kurdistanê, dijwariyeke Stalînîstî pêwîst bû. Li hember kolonyalîzmê û dijwarbûna mercên Kurdistanê, xedarbûna Stalîn wek riya xelasbûnê dihate fahmkirin. Tûjîtiya Stalîn li dijî dijminê xwe, li cem kurdan îmajeke başiyê çekiribû û ev riya hanê jî wek riya rizgariyê dihat pejirandin. Lê di bingeha xwe de pîrsa helî mezin jî ev bû; kî dost e û kî dijmin e? Di dîroka Kurdistanê de ev pîrsa girîng hergav aktuel bûye. Gotina dost û dijmin li Kurdistanê ji aliyê semantîk de baş nehatiye şirovekirin. Ji aliyê civatî û îdeolojî de ev gotin divê baş bêne zelalkirin. Zelalbûna ramanî bi hêsanî zelalbûna polîtîk jî bi xwe re tîne.

Yek jî encamê popûlerbûna Stalîn li Kurdistanê, dikare xedarbûna wî be. Xedarbûna Stalîn di warê giştî de, li hember kolonyalîzma ku li Kurdistanê heye, wek normek û pîvanekî baş hatiye dîtîn. Xedariya kolonyalîst ku li pir welatan heye, wek reaksiyon, li welatên bindest xedariyek Stalînîstî derxistiye meydanê.

Encamêkî din jî dikare zêîfbûna zanyariyê ya li ser Stalîn û Stalînîzmê be. Li ser Stalîn û dîroka Stalînîzmê berhemên baş li welatê me nayên naskirin. Xelkê me Stalîn pîralî nas nakiriyê. Polîtîkvan û rewşenbîrên ku kirinên Stalîn nas bikin û hinekî hayê wan jî dîtîn û kultura sosyalîstî hebe, tu cara, bi wijdanekî rehêt nikarin Stalînîzmê biparêzin.

Stalînîzm pir caran li cîhanê bûye alîkarê kultura xelkê serdest. Weke tirk, faris, ereb, rûsan ûhw. Xelkê serdest, di bin navê çepîtiyê de, Stalînîzm jî xwe re kirine mertal û zilmkarî li xelkê bindest kirine. Di vî warî de mînak pirin. Ma çepê tirkan Stalînîzm jî xwe re nekirin wek Mîshefa neteweparestiyê? Ma wana bi gotinên Stalînîstî piştgiirtiya qirkirina xelkê kurd li Dêrsimê nedikirin? Ma di serhîldana Şêx Seîd de li gora wana Kemalîst ne pêşverû û xelkê kurd jî ne paşverû bû? Ma desthilatiya Stalînîstî di vî warî de tu cara rexne li van çepên neteweparêz girtiye? Li vir mirov dikare mînanan pirtir bike. Lê xelkê kurd wek xelkekî bindest û hejar nikare tu cara zilmkariya Stalînîzmê biparêze. Qirkirin û sirgonkirina xelkê zahmetkêş di bin navê sosyalîzmê de, tu cara nikare bê paraztîn. Stalîn xelkê rûs qir kiriye û sirgon kiriye. Êdî tu kes nikare vê yekê veşêre. Ma têkiliya qirkirin û sirgonkirina xel-

kê zehmetkêş, bi çi awayî dikare bi sosyalîzmê re hebe?

Tenê di navbera salên 1937-38'an de milyon û nîvek endamên Partiya Bolşevîk bi destên Stalînîstan hatine kuştin. Ma gelo li tu welatan dijmînên sosyalîzmê karîbûn, ji sedî yekê ku Stalînîstan li himberî şoreşgeran kir, ew bi xwe bikin? Sîstemên faşîstî jî nikarîbûn ewqas mirovên çep û sosyalîst bidin kuştin. Eşkere ye ku armanca Stalîn ne avakirina sosyalîzmê bû. Ji xwe sosyalîzm ji serî de çewt hatibû fêhmîkirin. Ma sosyalîzm dikare bê mirovan ava bibe? Ez naxwazim bêjim ku Stalînîzm ji kokê de xerab e û bi kêrî tiştêkî nayê. Ev pîrsek pîr mezîna e û lêkolînên mezîna dixwaze. Bi raya min başî û xerabiya Stalînîzmê pîralî, hergav dikare bê şirovekirin. Lê ez dixwazim bi kurtî li ser dîroka Stalînîzmê, li vir behsa çend tiştên bîngêhîn bikim:

Piştî mirina Lenîn di sala 1924'an de, serokatiya Bolşevîkan derbasî destê Stalîn dibû. Di wesyetnama xwe de Lenîn, bala Partiya Komunîst di hinek bûyeran de kişandibû ser hinek problemên hindurî. Di derbara Stalîn de di wesyetnama Lenîn de pîr tiştên pozîtîf tunebûn. Li gor wesyetnamê, Stalîn kesekî zalim û qebe bû. Ji ber vê yekê jî Lenîn dixwest ku sekreteriya giştî ya Partiya Komunîst ji destê Stalîn bê derxistin. Lê ne tenê Stalîn, serokên Bolşevîkan hemûyan, nesîbê xwe ji wesyetnamê digirtin. Di rastiya xwe de Lenîn kes layiqî serokatiya Bolşevîkan nedidît. Ji ber ku pîrsa serokatiye bi giştî û serokatiya Bolşevîkan jî bi taybetî hinek sixletên mirovanti dixwestin. Ev sixletên mirovantiyê û başiyê li cem tu berendamên serokatiya Partiya Komunîst pêyde nedibûn.

Pîr pîspor û dîrokvan dibêjin ku; dîtînen ku Lenîn di wesyetnama xwe de anîbûn zîman, bûn encamên bîngêhîn ji bona ku wesyetnama wî demekê dirêj bê veşartin. Bi raya min ev dîtîna dîtîneke rast e. Ji ber ku; li gora wesyetnamê Troçkî mirovekî "hisî bû" û "îdarekar bû", Buxarîn tu cara "diyalektîk" fahm nekiribû, Zînovyev û Kamenyev bi xwe, di sala 1917'an de, li dijî şoreşa oktober derketibûn ûhw. Bi kurtasî mirov dikare bêje ku; endamên komîta navendî hemû xwediyên kêmasiyên mezîna bûn. Ji ber vê yekê jî wesyetnama Lenîn hate veşartin. Bi veşartîna wesyetnama Lenîn re kêmasiyên serokatiya Bolşevîkan jî bi hemû awayî hatin veşartin.

Piştî ku Stalîn bû serokê partiyê, bi fên û fûtan zora hemû mixalefete bir. Weke rûviyekî qurnaz û kevnare mirov li dijî hevdu bi kar tanîn û bi wana weke libên tîzbiye dilîstin. Di vî warî de zîrekiya Stalîn pîr hebû. Pêşîya pêşî mixalefeta çep, bi awayekî xedar ji navê rakir. Piştî berê xwe da mixalefeta rast û ew jî ji holê rakirin.

Hemû desthilata polîtîk, Stalîn di wextekî kurt de, di destê xwe de kom kiribû.



Piştî salên 1930'î û vir de, êdî Stalîn bûbû serokê "mezin", "bêqisûr", "bêçewtî" û "pêxemberê" tevgera komunist ya cîhanê. Di demeke kurt de îtîatkirin ji Stalîn re kete şûna berjewendiyên çîna karker, şûna prensîban û şûna sosyalîzmê. Di dawiya dawî de jî îtîatkirin ji Stalîn re kete şûna programa partiyê. Di rastiya rastî de jî, îcar hêdî hêdî Stalîn dikete şûna partiyê bi xwe...

\* \* \*

Piştî şoreşê di navbera salên 1917'an û 1921'an de, Bolşevîkan polîtîka prensîbên komunîzma şer didan xebitandin. Jiyana civatî û polîtîk ji ber şerê hindurî, mecbûrî hatibû mîlîtarîzekirin. Tebeqa gundiyan bi taybetî pir hejar û perîşan bû. Berhemên gundiyan yê ku zêdebûn jî, Bolşevîkan dest datanîn ser û dûre jî ew berhemên zêde li karker û leşkeran belav dikirin. Gundiyan ji vê yekê zêde tiştêk qezenc nedikirin. Ji ber ku tiştên ku hebûn li ber çavan bûn. Heger wiha nebûya, ewê karker û leşker ji birçîna bimirana. Li bajaran zehmetiyên mezin hebûn.

Piştî sala 1921'an û pê da Partiya Komunist, prensîbên polîtîka ekonomî ya nû (NEP) dane xebitandin. Ji xwe yek ji sloganên partiya Bolşevîk di şoreşê de, belavkirina erdê li gundiyan bû. Xelkê ku di erdê de kar dikirin, diviyabû bibin xwediye erdê. Ev polîtîka ekonomî ya nû heta sala 1928'an berdewar kir. Di vê demê de pirr tişt bûne malên kesan. Ji derveyî endûstrî ya bingehîn, hemû tevgera ekonomî kete bin destê teşebîsa kesan. Tebeqa gundî bi awayekî germ bi xêrhatina polîtîka ekonomî ya nû dikir. Di vê demê de jiyana ekonomî ruh pêdihat.

Lê piştî sala 1928'an, Stalîn weke serokê partiyê biryar da ku, erdê bi zorê kollektîvîze bike. Li himberî vê daxwaziyê gundiyan li ber xwe dan. Tebeqa gundî ne dixwest ku erd û malê xwe bide dewletê. Wê demê Stalîn biryar da ku dest bi polîtîka hişk bike û piştî vê biryarê jî, îcar dema qirkirina gundiyan dest pêkiribû. Stalîn digot ku "dewlemendên xwedî erd divê weke çîna ji navê bêne rakirin". Netîca vê biryarê hîna jî tê şirovekirin. Weke tê zanîn pîrsa "dewlemendên xwedî erd kî ne?" ne ewqasî hêsanî ye. Feodal û arîstokratên xwedî erd hemû kes wan dinase. Lê belê pir kategoriyên gundî hene ku, rewşa wan ya ekonomî ne dikare weke dewlemendiyê ne jî dikare weke xizaniyê bê pejirandin. Kesên ku mitqalekî ji ekonomiyê fahm bike, dizane ku bi sedan kategoriyên ekonomî, di navbera kategoriya dewlemend û kategoriya xizan de hene. Di xebata kollektîvîzekirina erdê bi zorê de, pir kesên bêşûc hatin kuştin û sirgonkirin. Dîrokvanê ku civata Sovyetîstanê baş dinasin, navê vê guherandinê kirinê "şoreşa ji jor de".

Bi alîkariya hatinên ji zîraetê, civata Sovyet hate endûstriyalîzekirin. Endûstriyali-

zekirina Sovyet di demeke pîrr kurt de xelas bû. Prosesa ku sedsal jê re lazim bû, li Sovyetê di 15-20 salan de hate xelaskirin. Guherandin di civatê de bi tempoyeke pîrr bilind û xurt meşiya. Ji aliyê kulturî, sosyal û ekolojîk de civata Sovyet hate çelqandin. Ji vê çelqandina civata Sovyet, nasnameyên pîrr çewt derketin meydana... Netîca vê yekê jî civata Sovyet serobino kiribû. Bi milyonan mirov hatibûn koçkirin, kuştin û cezekirin. Hejmara kesên kuştî hetta niha jî baş nehatiye diyarkirin. Li gora ku tê gotin û nivîsandin, Stalîn, di navbena 5 û 10 milyonan de mirov dane kuştin. Pîrr dîrokvan û civaknasên ku li ser civata Sovyet û polîtîka Stalîn pîspor in, ji bona polîtîka Stalîn di sala 1930'an de "polîtîka gelqirkirinê" dibêjin. Di navbera van dîroknas û civaknasan de, hejmara kesên çep zêde ne. Weke mînak mirov dikare navê Isaak Deutscher û Roy Medvedev bêje.

\* \* \*

Di sala 1929'an de Troçkî hate sirgonkirin. Troçkî xebata xwe ya polîtîk li derveyê welat meşand. Di sala 1940'î de Troçkî ji aliyê sîxurê Stalîn ve hate kuştin. Pîrr kesên bijarte jî partiya Bolşevîk, di navbera salên 1930 heta 1940'î bi biryara Stalîn hatin kuştin. Di nav van kesên kuştî de mirov bi hêsanî dikare rastî kesên endamên komîta navendî, endamên polîtîbîro, ekonomên navdar, ûhw bibê. Pîrr Bolşevîkên navdar, ji ber polîtîka Stalînîst xwe kuştin. Komîta Navendiya Bolşevîkan, ji derveyê du - sê kesan, hemûyan an xwe kuştin an jî ji aliyên polîsên Stalîn ve hatin kuştin. Serokên şoreşê weke Troçkî, Buxarîn, Kamenyev, Zinoviyev, Lunaçarskî û pîrr kesên din, bûne goriyên şoreşa xwe. Stalîn weke mirov bi libên tîzbiyê bileyîze bi wan dilîst. Kuştina van kesên navdar nîşan dide ku Stalîn hemû qîmetên şoreşê dabûn nav lingan. Desthilata Stalînîst tu pîvanên exlaqî nas nedikir. Li gor sîstema Stalînîst encamê kuştina serokê Bolşevîkan ev bûn; ew bûbûn "sîxurên burjuvazî", ew bûbûn "dijminê xelkê" ûhw. Lê hemû kes dizane ku ev îthamana bê bingehe bûn. Dîrokvanê rûsî weke Medvedev, Petrovskî, Jakîr bi alîkariya dokumanên rûsî ev îtham hemû pûçkirin. Roy Medvedev bi xwe şefê Enstîtûya Dîrokê li Moskova bû.

Mirov bi kurtî dikare bibêje; Stalîn di derheqê Bolşevîkên kevnare de derewên spî dikirin. Bi alîkariya metodên polîsiye, sîstema Stalînîst di derheqê mixalîfên xwe de îfadeyên sexte çêdikirin. Cîhane navê Dadgeha Moskova weke cihê derewan, sextekariyan, îtham û şarlaniyan nas dikir. Sewcî Virjînskî bû sembola huqûqê sexte û parêzgerê sîstema Stalînîst. Virjînskî li cîhanê deng da. Gotinên wî weke "van kûçikan hemûyan daliqînin" bû xof û kete dilê kesên mixalîf li Sovyetê.

\* \* \*

Li dijî faşîzma Hîtler Stalîn di sala 1939'an de, pêşniyaza peymanekê ji welatê rojava re bir. Stalîn bi vê pêşniyaza xwe dixwest ku hemû hêzên antî faşîst di eniyekê de bide hevdû. Faşîzm weke dijminê hemû hêzên demokrat, lîberal û sosyalîst di hate pejirandin. Li miqabil vî dijminê çavsor, pirr kesên daxwaz dikirin ku eniyek fireh û mezin bê avakirin. Lê nakokiyên ku di navbera hêzên demokrat û sosyalîst hebûn rê nedida vê yekê. Stalîn kir û nekir welatê rojava, di mijara eniyekê bi hevdû re qanî nekir.

Paşê Stalîn berê xwe da Hîtler û di 29'ê tebaxa sala 1939'an de li Moskovayê, di bin navê pakta Molotov-Ribbentorp de, lihevhatinek bi Elmanya re îmze kir. Li gora vê paktê ewê Sovyet û Elmanya bi hevdû re şer nekiribûna. Li gora xaleke bingehîn ya vê paktê jî Ewrûpa Rojhilat hatibû parvekirin.

Di danûstandina Stalîn û Hîtler de, pirr dîrokvana qala polîtîka "reel" dikirin û ev danûstandin weke mînakê hêja derxistin pêş. Polîtîka reel hêzên weke Sovyet û Elmanya Faşîst anîbûn cem hevdû. Polîtîka reel ketibû şûna prensîbên polîtîkayê û nakokiyê îdeolojîk. Pîvan ji meydana rabûbûn. Qewet ketibû şûna heq û polîtîkvanên fenek jî ketibûn şûna polîtîkayekê bi sexşiyet...

Dibêjin ku; Stalîn dixwest bi vê peymanê wext qezenc bike. Piştî îmzekirina peymanê, ekonomiya Sovyet pêşde diçû. Stalîn welatê xwe bi çek dikir û Artêşa Sor tekûz dikir ûhw. Lê belê peymanê Molotov-Ribbentorp û dema aştiyê zêde dirêj dom nake. Di sala 1941'ê de Hîtler êrîşî Sovyetê dike. Stalîn bawer nedikir ku şer ewê wiha zû derkeve. Hîtler fen li Stalîn kir û ew xapand.

Hîtler ji xafilî êrîşî Sovyetê dikir. Li gora şahidê wê demê, Stalîn ji ber vê yekê di destpêka şer de şaş bûye û ji desthilanîn jî ketiye. Li gora dîrokvana û şahidê demê Stalîn di destpêka şer de derbasî oda xwe dibe û demêke dirêj xwe îzole dike.

Ewê ku bi hemû babetî li himber faşîzma Hîtler tekoşin dide, xelkê Rûsya ye. Lê mixabin, dîsa weke pirr caran nav û şeref ji serokan re dimîne. Nêzika 20 mîlyon mirov ji xelkê Sovyetê hatin kuştin. Welat talan û wêran bû. Lê piştî şer Stalîn bû "serokê mezin" û "bavê" komunîzma cîhanê.

Di dema şerê cîhanê de, pirr qumandan û leşkerê neqandî bi biryara Stalîn hatin kuştin. Kesên ku li himber taktîk û çewtiyên Stalîn derdiketin bi carekê re dihatin kuştin. Li gora dîrokvanan pirr kesên ku li Sovyetê mihacir bûn jî hatin kuştin; weke Komunîstê Mecarî Bela Kun, weke komunîstê Îranî Sultanzade, weke Komunîstê Elman Hermann Remmele ûhw. Pirr mihendîz û teknîsyenên ku di endûstri-

ya çek de kar dikirin, hunermend û zanyarên hêja, doktor û karmendên partiyê bi biryar û daxwazên Stalîn ve dihatin kuştin, girtin û sirgonkirin. Jina Lenîn Krupskaya jî têra xwe ji destên Stalîn kişandibû.

Di dema Stalîn de xebata leşkerî pir zêde hate mîlîtarîzekirin. Kokil, nişan û xirikên leşkerî yê ku Bolşevîkan qedexe kiribûn, ji nû de bi paş de hatin. Stalîn pir caran kokil, nişan û xirik bi xwe vedikirin.

\* \* \*

Ma gelo bi rastî ev polîtîka pêwîst bû? Bersiva vê pirsyarê nikare yekalî be. Dîrokvan li problemên Stalînîzmê cihê cihê meyze dikin. Dîrokvan û nivîskarên ku heyranê Stalîn in dibêjin ku ev polîtîka pêwîst bû û rast bû jî. Li gora wan diviyabû ku mirov li bûyeran wiha meyze bike; heger Stalîn ev polîtîka nemeşanda, ewê civata Sovyet karakterê xwe yê sosyalîstî winda kiriba. Ji ber ku kapîtalîzm û emperyalîzma cîhanê rasta rasta dixwestin ku civata Sovyetê îzole bibe. Hêzên serdestên cîhanê kesên ajan-provokator berdabûn nava partiya komunist û dixwestin ku sîstemê ji hindur de hilweşînin. Stalîn jî li himberî van ajan-provokatoran tekoşîn dida... Di warê ekonomî-polîtîkayê de jî heyranên Stalîn, hemû bûyerên di civata Sovyetê de bi rêk û pêk dibînin. Li gora wan xeta Stalîn riya rast û sosyalîzmê bû. Endûstriyalîzekirina civata Sovyet pêwîstiyek mezin bû. Kolektîvîzekirina erdê jî li himber dewlemendên erdê hate kirin. Lê çewtiyên mezin ku di warê endûstriyalîzekirinê de, di warê zireête de, di warê berhemîya giştî de hatin kirin, bi zanistî têne nixumandin. Hemû kes dizane ku reqem û statistikên ku di warê ekonomî de dihatin belavkirin, çewt bûn û tijî şaşî bûn. Ji bona hinek armancên polîtîk werin cîh, xelkê rûs dixapandin û derew li wan dikirin. Ev aliyekî bûyerê ye.

Ji aliyê din jî dîrokvan û ekonomên Marksîst hene ku, polîtîka Stalîn bi pîvanên çepitîyê rexne dikin. Li gora van kesên sosyalîst û pîspor, civata Sovyet ne hewcedarê polîtîka Stalînîstî bû. Di bin serokatiya Stalîn de endûstriyalîzekirina Sovyet çewt hate meşandin. Kolektîvîzekirina erdê bi metodên çewt hate pêkanîn. Civata Sovyet nikaribû, bi carekê re endûstriya mezin rake. Avaniya polîtîk û sosyal ne amade bû ji bona kolektîvîzekirina erdê. Bi alîkariya polîtîka endûstriyalîzekirina civatê û kolektîvîzekirina erdê, hevgerêdanên civata Sovyet perçe perçe dibûn. Ji ber vê yekê jî di warê polîtîk û sosyal de çewtiyên mezin bûn. Jiyana karker û gundiyan baştir û xweştir ne bû. Bi hêsanî mirov dikare bêje ku; jiyana wan ji pîrr alîyan de xerabtir bû.

Pîrr kesên ku di refên partiyê de hatin sûcdar kirin, piştî mirina Stalîn bi hêsanî

hatin rûspîkirin. Kesên ku ji aliyê Stalînîstan ve weke "sîxur" an jî "dijminê xelkê" dihatin nîşandan, di rastiya xwe de sosyalîstên hêja û xwedî bawerî bûn. Xedariya Stalîn ne ji ber "Sîxurbûna wan bû", lê belê ji ber bawerî û ramanên wan bû. Stalîn dixwest ku bi hemû awayî rîşma polîtîka di destê xwe xîne û desthilata polîtîk li cem xwe kom bike. Ji aliyekî de hemû desthilata polîtîk li cem Stalîn kom bûbû û ji aliyê din jî de ev desthilat bi awayekî çewt dihate bikaranîn. Mezinbûn û firehbûna desthilata polîtîk li cem Stalîn, bi xwe re xavîtiya polîtîkayê pêkranî. Partî Stalîn bû, çîna karker Stalîn bû, komîta navendî Stalîn bû, polîtîbîro Stalîn bû, erê, sosyalîzm bi xwe bûbû Stalîn!

Di warê huner û edebiyatê de jî Stalînîstan çewtiyên mezin kirin. Pîvanên hunermendî û edebiyatê bûbûn pîvanên girêdanên bi Stalîn û Partiyê ve. Pîrr nivîskar û hunermendên nîvçe, bi rîya ku pesnê Stalîn bidin xwe ji berpirsariya hunermendî û nivîskariyê azad dikirin. Entellektuelê bi şexsiyet cih ji wan re tune bû. Bi alîkariya xelat û bertilan, sansur û tirsê, sîstema Stalînîst nivîskar kiribûn weke karmendên partiyê. Xebata edebiyat û hunerî bûbû weke ku mirov li restoraneke rûne û xwarinê daxwaz bike. Organên dewlet û partiyê li gora mentalîta xwe edebiyat û huner daxwaz dikirin. Azadiya huner û ramanên Marksîstî di vî warî de ketibûn nava lîngan...

### **Ma gelo Stalînîzm temsîlî çî dikir?**

Ez dixwazim ku bersiva vê pirsê li gora dîtîna û zanyariya xwe binivîsinim. Li gora bahweriya min Stalîn û sîstema Stalînîst temsîlî çîna zahmetkêş nedikir. Berjewendiyên çîna zahmetkêşan tu cara nikare di dîktatoriya kesane de bê komkirin. Her çiqas Stalîn waz û kirinên xwe di bin navê çîna karker de dikirin jî, bi praktîka Stalîn darbeke mezin li dawa sosyalîzmê hat xistin. Desthilata Stalînîst ku bi taybetî ji mezinkirina dewletê û hêzên polîsiyê pêk dihat, bi demê re bû weke dîwarekî û ketepêşîya sosyalîzmê. Aparata Stalînîstî îcaze nedida ku çîna zahmetkêş xwe azad organîze bikin û demokrasîya sosyalîst li civatê belav bikin. Keda karkerê rûsî kete bêrîka birokratan, polîsan, leşkeran û berdevkên sîstemê. Jiyana karkeran ji aliyê ekonomî de baş tekûz nebûbû. Keda karkeran hate çirvirandin. Lê birokratên dewletê di nav îmkanên ekonomî de avjenî dikirin.

Em dizanin ku yek jî armencên sosyalîzmê kêmkirina tixûban di navbera karên gewde û karên mejî de ye. Ferqa di navbera xebata karê gewdeyî û karê entellektuelî de, roj bi roj di civata Sovyetê de zêde dibû. Polîtîka Stalîn ya ekonomî û en-

dûstrî alîkarî dikir ku ferq û dûrayiya ku di navbera karkeran û entellektuelan de hebû mezintir bibe. Polîtîka Stalîn ya derve jî nebisekerî bû. Li welatên weke Grekland, Ispanya û Elmaniyayê tevgerên şoreşgerî, ji ber polîtîka Stalîn ya çewt û xweparêz hatin pelixandin. Li Elmanya, polîtîka ku li himber Sosyal Demokratên Elman hate meşandin, rê ji faşîzma Elman re vekir. Weke tê zanîn enternasyonala sisiyan û partiyên Komunist ji Sosyal Demokratên re digotin; "faşîstên sosyal". Dubendî di navbera tevgera karkerî de birînên mezin pêk anîbûn.

Li gora raya min Stalîn bi kirinên xwe temsîliya birokrasî û burjuvaziya biçûk dikir. Polîtîka Stalîn nikare tenê li gora hinek sixletên Stalîn were îzahkirin. Em hemû dizanin ku rola kesan û serokan di dîrokê de heye. Lê dîsa jî em hemû dizanin ku serok û kes di pêkanîna dîrokê de rolên pirr biçûk dileyîzin. Ewê ku dîrokê çêdikin û pêşde dibin çînên sosyal in û xelk in.

Di dawiya nivîsara xwe de ez dixwazim bûyereke biçûk, lê ji aliyekê de jî pirr bi mane bînim ziman: Dîrokvanê navdar Carr li ser dîroka şoreşa Sovyet pispor e. Di pirtûka xwe ya li ser şoreşê de Carr behsa mezinbûna Lenîn dike û dibêje ku, piştî şoreşê rojekê ji rojan, ji bona Lenîn porê xwe biqusîne, ew diçe ser berber. Lenîn serokê şoreş û dewletê ye. Dema ku dikeve hundurê dikana berber, xelk ji ber serok radibin û dixwazin ku cîhê xwe bidinê. Li dikana berber dor heye. Lenîn diçe li paşiya dorê rûdinê û heta ku dora wî tê rojnama Pravda derdixe û dest pê dike rojnameya xwe dixwîne û li benda dora xwe disekîne.

Di dema Stalîn de jî berber li malên karmend û serokên partiyê digeriyan. Ji bo wan berberên bi taybetî hebûn, dikan û havîngehên bi taybetî hebûn, meaşên bi taybetî hebûn û piraniya xizmetan jî bûbûn bi taybetî! □

# ”Ez mirim, gelo kes ê min bi bîr bîne”

**MUSTAFA ALADAG**

Eyşe Şan di kaseteke xwe ya dawiyê de weha bangî guhdarên xwe dike. Ji bo karê xwe yê fermî çend sal e ku kasetan dernaxe. Her kes hew dizane ku Eyşe Şan miriye. Ew loma weha gazî guhdarên xwe dike. Ez li vir im. Ez dijîm. Jiyana wê bi hunerê wê ve hatibû girêdan. Guhdarên wê çend salan kasetên wê nedîtibûn, tu maneyek nedabûnê. Gotibûn, ji ber ku Eyşe Şan miriye loma ew kasetan dernaxe. Eyşe Şan pir ji jiyana hez dikir. Ew ne bi destekî lê bi deh destan bi jiyana ve girêdayî bû. Wê nedixwest bifikire ku wê rojekê mirin ji wê re jî bibêje rojbaş. Mirinê rojekê bi ser wê ve girt. Pêşî kanserê bi ser wê ve girt. Kanserê ew guvaşt, guvaşt, û rojekê tiştêkî ku biguvêşe li holê nemabû. Lewra wê rojê Eyşe Şanê ji nav me koç kiribû. 18'ê çiriya pêşîn 1996. Mêvanê Eyşe Şanê Ezraîlê navdar bû. Dema ew mêvanê Eyşe Şanê yê navdar hatibû serdana wê, kesek ji kurdan li wir tunebû. Kurê wê, keça wê û çend cîranên wê di dawiya jiyana wê de li ba wê bûn. Me nûçeya mirina wê piştî mehekê ji rojnameya Demokrasiyê bihîst. Rojnamevan Müslüm Yücel, piştî mirina wê, mehekê şûnda, bi telefonê li mala wê digere, kes bersiv nade. Li ser wê, Müslüm li keça wê Yasemînê digere. Yasemîn dibêje: ”Ev ji mehekê zêdetir e ku diya min miriye, lê haya we jê tuneye. Eyşe Şanê mîna gelek hunermend, hozan, siyasetmedarên kurdan bédeng ji nava me koç kiribûn û çûbû. Êdî min nikaribû ew tiştên ku ez di derheqa wê de meraq dikim, jê bipirsim. Nikarim bersiva dilxweşî û xemgîniyên wê, dostanî û evîndariyên wê jê hîn bibim. Lê hewce bû ev werin zanîn. Min jî bi alîkariya Fadîle Türkan, keça wê Yasemînê dît. Ez pê re peyivîm, haya Yasemînê ji her tiştên ku diya wê kiribû û jiyabû, tunebû. Min çend nivîs û hevpeyvînan ku heta niha pê re hatibûn çêkirin xwendin û ev nivîs jê derxist.

## Min îlhama xwe ya hunermendiyê ji bavê xwe girtiye

Eyşe Şan di bîranînên xwe de weha dinivîse: "Meha Atatürk miriye ez hatime dinyayê". Yanî Eyşe Şan çiriya paşîn, di sala 1938'an de hatiye dinyayê. Navê bavê wê Osman, navê diya wê Elîfê ye. Bavê wê Karliovayê koçî Amedê kiriye. Ew ji eşîra Cibrî ye. Diya wê Elîfê ji mala Hecî Mîstefa Begê Erziromî ye. Malbata diya wê di şerî Ūris de ber bi başûr direve. Bi rê de heft xalên wê, kalik û pîrka wê tîn kuştin. Diya wê û xalê wê tîn li Diyarbekirê bi cih dibin. Dengê bavê wê pir xweş bûye. Wî bi dengê xwe yê xweş stranên kurdî gotiye. Di hevpeyvînekê de Eyşe Şan dibêje: "Xwezî zimanê dîwarê mala me ya Diyarbekirê hebûya û ji me re qala wan şevên dengbêjan bikira. Min jî wê demê di quncikan de li wan dengbêjan guhdarî dikir. Min wisa guhdarî dikir, ku yekî gazî min bikira ez ê vecinîqiyama. Dengê bavê min yê xemgîn pir li ser min tesîr kir. Sal derbas dibûn, dîsan jî dengê bavê min ji guhê min dernediket. Min dixwest ez kilamên wî bistirêm. Strana bavê min ya herî xweş, *Lê lê Bêmal* bû. Gava ku wî *Lê lê Bêmal* digot, hêşir ji çavên wî dihatin. Hîn wê demê pêşniyaza plaqçêkirinê ji bavê min re dihat. Lê bavê min qebû nedikir û digot guneh e. Dîsan ew di hevpeyvîneke xwe ya din de jî dibêje: "Min îlhama hunermendiyê ji bavê xwe girtiye". Gava ew bi dengê xwe yê xweş quranê dixwîne, her kes dengê wê dicibîne. Di zaroktiya xwe de stranên ku bavê wê dibêje, ji ber dike û carinan ew bi xwe wan dibêje. Lê di nava kurdan de ku dengbêjîya jinan tişteki nebaş tê dîtin, Eyşe Şan jî bi tenê di nava jinan de distirê. Dema ku ew dibe huvdeh-hîjdeh salî, bêî xwestina wê bavê wê, wê dide Şewket Tûran. Şewket Tûran mêrê du jinan e. Ji ber ku ji jina wî ya pêşî zarokên wî çênebûne, wî loma Eyşe Şan xwestiye. Eyşe Şan sal û nîvekê li ba Şewket Tûran dimîne. Jê re keçikek çêdibe, navê wê dikin Yasemîn. Hê Yasemîn sê mehî ye Eyşe Şan ji Şewket Tûran diqete û berê xwe dide Entabê. Li Entabê debara xwe bi pînekirin û dirûtina kincên qetyayî dike. Ew bi alîkariya Naîl Baysu di radyoya Entabê de dest bi gotina stranên tirkî dike. Ew salekê du salan li wir dixebite.

## Plaqa wê ya yekem di sala 1963'an de derdikeve

Dema li Entabê wê ji kar derdixin ew berê xwe dide Stenbolê. Li Stenbolê di çayxaneyekê de dest bi kar dike. Ew di çayxanê de stranên dibêje. Berî ku plaqa wê derkeve navê wê belav bûye. Bi plaqçêkerê Cihû, Albert Meşûlûn re peymanekê du salan çêdike û plaqa xwe ya duwemîn çêdike. Ew di plaqên xwe de bi kurdî û tirkî distirê. Di plaqa xwe ya yekemîn de du stranên kurdî, *Lê lê Ximşê*, *Lorkê* û bi



tirkî jî stranên *Siverke Yollarında* û *Gurbette* distirê. Ew di derheqa bazara plaqan de nezan bûye, loma buhayekî erzan, hezar lîrayên Tirkîyeyê mafê çapa plaqa wê jê distînin. Gava bi nav û deng dibe, Lütfü Sütsübê Wanî Albert Meşûlûl ditirsîne û peymanê wê dide îptalkirin û bi Eyşe Şanê re peymaneke nû çêdike. Ew li ser piştê wê peteyan qezenc dike. Êdî Eyşe Şan bûye hunermendeke bi nav û deng. Navê wê li ba tirkîyan Ayşe Şan, li ba kurdan Eysana Elî û li başûrê welêt jî Eyşe Xan e. Qala navê û Zeki Müren bi hev re tê kitin. Posterên wê pacyên plaqfiroşan dixemilîne. Bavê wê û birayê wê Elî Şan naxwazin Eyşe Şan plaqan çêbike. Dibêjin em ê te bikujin. Li çayxaneyan li ser qehrê kevnemêrê wê Şewket Tûran, plaqên wê lêdekin. Ew jî dibêje ez ê te bikujim. Lê Şewket Tûran pir jê hez dike, destê wî lê nage. Ji xwe Eyşe Şan bi a kesî nake û di riya xwe de dimeşe. Ji ber ku di plaqên xwe de bi kurdî jî distirê, dewlet naveroka plaqên wê kontrol dike. Herçiqas di stranên wê yê kurdî de naverokeke siyasî tunebû jî, dîsan dewletê bi çavekî ne baş li Eyşe Şanê dinihêrî.

### **Kurê wê dibêje: "Jiyana diya min gunehkarî ye"**

Eyşe Şan nikare bi serê xwe li hemberî dijwariyên jiyana rêbikoşe. Hevalên wê ên hunermend, plaqçêkerên wê dek û dolaban li serê wê digerin. Eyşe Şan hevalê xwe yê hunermend Abdurrahmanê Entabî ji xwe re mîna hevalê jiyana hildibijêre. Ew bi Abdurrahman Kerse re diçe Almanyayê. Keça wê Yasemîn li ba xwişka wê dimîne. Bavê Yasemînê destûra fermî nedaye ku Yasemîn bi diya xwe re here Almanyayê. Dema ku Eyşe Şan li Almanyayê ye bavê Yasemîn ji bo Yasemîn mîna diya xwe nebe hunermend, wê ji ba xaltiya wê direvîne û dibe Diyarbekirê. Eyşe Şan sê salan li Almanyayê dimîne. Li wir kurê wê Mûrat tê dinyayê. Paşê ava wê û Abdurrahman Kerse jî di eynî cihokê de naherike û ji wî diqete. Lê divê ez li vir behsa tiştêkî bikim. Kurê Eyşe Şanê Mûrat Kerse niha li Entabê dijî û di nav tarîqateke olî de ye. Dema min xwest ez li ser jiyana diya wî bi xwişka wî re bipeyvîm, ew li hember derket, "Ji xwe diya min gelek guneh kirine. Hûn jî bi vê hevpeyvînê wê gunehkartir dikin." got. Mûradê Eyşe Şanê jî jiyana diya xwe weke gunehkariyekê dinirxand. Ew wêneyên ku Eyşe Şanê di gera xwe ya başûr de bi hunermendên başûr, Îsa Berwarî, Mihemed Arif Cizîrî û bi gelek hunermendên din re kişandibûn, nîşanî me neda. Lê ew Mûradê ku jiyana diya xwe mîna gunehkariyeke mezin dinirxand, mîrasa diya xwe qurîş bi qurîş bi xwişka xwe re par ve kir.

## **Li başûr: Dostaniya hunermendan**

Eyşe Şan di sala 1979'an de diçe Kurdistana Başûr. Ew diçe Bexdyê. Di radyoya Bexdayê de kilamên kurdî dibêje. Eyşe Şan li Başûr pir tê naskirin û hezkirin. Bi çûyîna wê ya Başûr re nav û dengê wê li Başûr hê bêtir belav dibe. Di hevpeyvîneke xwe de Eyşe Şan dibêje: Dema ku di radyoyê de navê min dihate anonskirin erd dihejiya. Kurdan wek lorîkan li min guhdarî dikirin. Waliyê Hewlêrê, mêrê sê jinan jî, nav û dengê Eyşe Şanê bihîstîye. Walî wê dawetî Hewlêrê dike. Walî bi dengê Eyşe Şanê mest dibe, dev ji wê bernade. Eyşe Şan bi zorê ji Walî xelas dibe. Ew li başûrê welêt, bi gelek însanan re hevnas dibe, bi gelek re resiman dikêşîne.

Di hevpeyvînekê de ew ji bo Mihemed Arif dibêje: "Ew zêrekî zer bû. Dengê dinyayê di bêhna wî de bû" Lê ji bo Îsa Berwarî baş nafikire. Ji ber ku Îsa Berwarî stranên ku wan bi hev re gotine, derdixwe piyasê. Gelek kes li başûr dozê li Eyşe Şanê dikin ku ew li başûr bimîne, lê Eyşe Şan namîne û dîsan vedigere Tirkîyeyê. Di dema wezîrtiya Şerafettin Elçî de, bi alîkariya Elçî ew dikeve karekî resmî. Dibe memûr. Jiyana Eyşe Şanê piştî memûrtiya wê di nava tenêtiyê de derbas dibe. Heya sala 1989'an li Aydın û İzmirê memûrtiyê dike. Di sala 1989'an de êdî Eyşe Şan teqawîd dibe, û li İzmirê, li Balçovayê rûdine. Ew dîsan dest bi karê xwe yê hunerî dike. Mixabin em nizanin, wê heya niha çend kaset û plaq derxistine.

## **Bila kes min bi vî awayî bi bîr neyne**

Qanserê Eyşe Şan ji hal de xistibû, ew roj bi roj ber bi mirinê ve dajot. Li nexweşxaneyê Tepecikê diçe kontrolê. Ji bo ku doktor rontgena serê wê bikişîne, porê wê kur dike. Rontgen tê kişandin. Ew çend rojan di nexweşaneyê de dimîne, paşê vedigere malê. Keça wê jê dixwaz dik ku ji bo bîranînê resimekî wê bikişîne. Eyşe Şana nexweş ku çend rojên xwe yê dawî dijî, li keça xwe vedigerîne û dibêje: "Bila ez bi vî awayî neyê bîra kesî". Ew her dem ji keça xwe re dibêje, gelo ku ez bimirim kes ê min bi bîr bîne.

## **Heyranên min hene, hûn çi ne?**

Di nav salên dawiyê de nexweşiyê pêsîra Eyşe Şanê bernedida. Ew li mala xwe rûdinişt û wextê xwe bi xwendina quranê, nimêjkirinê û bi kilaman re derbas dikir. Ji tenêtiyê pir hez dikir. Navbera wê û zaroyên wê nebaş bû. Wê herdem ji zaroyên xwe gazin dikirin. Keça wê Yasemîn dibêje: "Diya min her dem ji me re digot, hûn kî ne? Heyranên min hene. Hûn hebin çi ye, tunebin çi ye. Ez ne hewcedarî we

me. Wê di jiyana xwe ya hunerî de herdem hurmet dîtibû. Gava wê ji wê jiyane gava xwe avêt jiyana rastîn, psîkolojiya wê xera bû". Lê heyranên wê her dem ew bi tenê hiştin. 18'ê çiriya paşîn, gava darbesta wê berê xwe dabû goristana Bûcayê, hejmara mirovên pê re ne zêdeyê dehan bû. Heyranên Eysana Elî, di roja teng de ew bi tenê hiştibûn. Rojên ku wê digot "Lê lê Ximşê" dûr bûn. Kurdan di hûnermendeke xwe ya bi nav û deng di bédengiyê de hiştibûn. Berî mirina xwe Eyşe Şanê gotibû min li Diyarbekir di gora diya min de veşêrin. Berî bi du-sê salan birayê wê wefat kiribû, wî jî gotibû min di gora diya min de veşêrin û ew di gora diya wî de veşartin. Keça wê Yasemîn dibêje: "Em bi meleyan şewîrîn, wan gotin ger di ser miriyekî re pênc sal nebhure, guneh e ku mirov miriyekî din veşêre. Me jî diya min, li Bûcayê veşart".

### **Eyşe Şan ji kê hez dikir û ji kê gazin dikir**

Mirin wê rojek zû sê rojan dereng ji me gişan re bibêje merheba. Mirinê ji Eyşe Şanê re jî got û wê ji nav me koç kir. Mirov dikare li pey wê çend tiştan bibêje. Ya herî pêşî, Eyşe Şan bi nasnama kurdî derketiye, straye û di dema xwe de weke Zekî Mûren bi nav û deng bûye. Eyşe Şan jineke apolîtîk bû, welatparêzî di serê wê de baş zelal nebûbû. Lê wê tu carî ji kurdî têkiliyên xwe nebiriye. Ew hûnermendeke kurdan û ya zimanê kurdî bû. Eyşe Şanê ji nav hûnermendên kurdan ji Arif Cizîrî, Îsa Berwarî û ji Şivan Perwer hez dikir. Ji nav hûnermendên ku bi tirkî distirên jî ji İzzet Altınmeşe, Belkis Akkale û İbrahîm Tatlıses hez kiriye. Ji aliyê din ve Eyşe Şan ji İbrahîm Tatlıses gelekî gazin dikir. Li gorî gotina keça wê, wê her tim digot ku ew gelekî bi kêrî Îbo hatiye, lê Îbo her kes derxistiye programa xwe ya televizyonê, bi tenê ew dernexistiye. Wî herweha qet telefonê venekiriye û li halê wê nepirsiye. Wê ji Şivan Perwer jî gazin kiriye û gotiye ku Şivan jî qet lê negeriyaye û li wê nepirsiye.

Eyşe Şan ji te re oxir be, em ê te her tim bi bîr bînin. □



# Xatûna şertê xwe; Eyşe Şan

## TÊMÛRÊ XELÎL

Eyşe Şan serbilindiya sazbandiya me ye. Kubir û akla wê eslî kurmancî ye, lewzê wê şêrîn e, ew kubariya hunermendiya me ya dengbêjiyê ye, ji me re hurmet û şanet aniye, bûye hezkira bi milyonan maşoqên stranên me. Gava mirov guh dide stranên wê, mirov dibêje qey ew stran tenê bi wî awayî têne gotin û divê bi tenê Eyşe Şan wan stranan bistirê.

Stranên Eyşe Şanê piranî yên evîndariyê ne. Di wan de zargotina me ya dewlemend, rehma dilê gelê me, evîna paqij têne ber çavan. Di strana "Bêmal" de xetên weha hene:

Lê lê Bêmal, tu ne sêv î, sêvê Meletiyê,  
Sal donzdeh me paşila xwe de bigerînim,  
Rojeke rojiyê fitara xwe bi te vekim.

Lê ew di stranên din de weha dibêje:

Mîn neke bazar û xwe neke tucar  
Ez ê zêrên serê xwe bifiroşim  
Delalîkê dilê xwe  
Ji Kela Diyarbekirê xelas kim

Zargotina me, di nava reperetuara stranên wê de cihêkî mezin digire. Ew bi taybetî di stranên "Çemo", "Saliho", "Bavê Seyro" de baş xuya dibin.

Çemo, Çmê lo Bişeriyê,  
Kelek vala berdan pê gemiyê,  
Koloz xweş e ber kofiyê,  
Zewac xweş e li zozanan, koçeriyê.

Çemo, Çemê Qirdilekê,  
Vi sibê qazê daye pêy werdekê,  
Xelk û alem bûne aşiqê mal û halê dinyalikê,  
Ew jî bûye heyrana bejna vê keçikê...

Eyşe Şan qedrê zargotina me girtiye, pesnê erf û adetên me yên baş daye, lê li dijî yên xerab derketiye: "...*derdê hewiyê wele nakşînim*".

Bi saya stranên wê, gel qîmet daye wê, ji wê hez kiriye, navê "Gula govendan" lê kiriye. Ew jî bi wê yekê ve firnax bûye, texmîn kiriye ku bi kêrî milletê xwe hatiye û ji eşqê stranên govendê straye: "Kirasê te meles e", "Koçerê", "Cemîle" û yên mayîn.

Di stranên Eyşe Şanê de xuya dibe ku wê ji ber stranbêjiya xwe gelekî zelûlî ditiye, loma ew mecbûr maye, wê welatê xwe terk kiriye û demekê li Ewrûpayê maye.

Eyşe Şan ji bilî derdê xerîbiyê, derdê kezebê jî ditiye. Wê keça xwe Şahnaz wenda kir û paşê jî li biyanîstanê diya xwe wenda kir, bê ku bikaribe here ser gora wê. Loma, wê ji bilî stranên evîndariyê, stranên derd û kerbê jî straye. Kîlama xwe ku avêtiye ser diya xwe, Hecî Xanimê, wilo ye:

Ava çemê Diyarbekirê îro têye leme-leme,  
Dayê qurban, pêl li pêlan dixe, davê ser kelem e,  
Dîsa îro dilê min şewitî dayika min ket bîra mine,  
Hêsirên min xerîba Xwedê mîna barana biharê tèn û nasekinin.

Hey wax dayê, xerîb im dayê, bêkes im dayê,  
Kesê min nema li vê dinyayê  
Ez bimrim dayê...

# Daxwazên min ji edebiyatê çî ne

ARTUR LUNDKVIST

Ji hemû ifadekirinên formên hunerî ez bêtir cihêkî taybetî û xweser didim edebiyatê. Dibe ku ev yeka hanê ji hin taybetiyên min ê xwusûsî jî tê: mijûlbûna min bi edebiyatê re, rengê taybetiya nivîskariya min, rengê perwerde û pisporbûna min û belkî jî ji hemûyan bêtir qîmet û hêjandineke xûsûsiye ku ez bi xwe didim edebiyatê.

Lê ez bawer im, argumentên ku ji vê dîtina min a li ser edebiyatê re bibin destik û piştgir wê gelek bin. Ji ber ku tu şiklên din ê huner bi qasî edebiyatê nikarin hûnandin û tevgirêdaneke ewqasî xurt di navbera tiştên konkret û tiştên ku abstrakt in de pêkbîne. Heger mirov bixwaze bi gotineke din bibêje, hûnandin û tevgirêdana di navbera hîs û entellektueliyê de ye.

Wêne û muzîk dikare bi awayekî din bi tesîrtir be. Ji ber ku wêne û muzîk raste rast bangî hîs û çavên mirov dike (lê ew jî dîsa bi kesê temaşevan û guhdar ve girêdayîye).

Lê dîsa jî ev herdu beşên hunerî nikarin bi qasî edebiyatê vekirî û zelal form bidin fikir û hevgerêdaneke xurt a fikrî bi qasî edebiyatê pêkbînîn. Tiyatro û film ew tişteki din e: di tiyatroyê û filmê de bi riya hereketên rû û wech ku tesîreke xurt dike ew jî ji ber ku hevgerêdana van herdû beşên hunerî bi edebiyatê re xurte û ji edebiyatê tîn xwedîkirin. Metod û rêgahên ku di van beşên hunerî de tîn bikaranîn ew jî nêzîkî ê edebiyatê ne.

Edebiyat bi gelek awayên dinê jî li pêşiya beşên din ên hunerê ye. Edebiyat dikare xwe bighîne her kesî bê ku hewcedarî xebateke kollektîv bibe an jî hewcedarî aleteke teknîk bibe.

Edebiyat mecal dide ku her kesek li gora wextê ku ew bixwaze bixwîne û tiştan

hilbijêre dide mirovan. Mirov dikare tiştên ku mirov dixwîne çend caran dubare bike, xwe kûrtir bike û bi gelek awayê din jî bûyeran bigre dest.

Xwendin dikare heyecana mirov bi carekê re bilind bike û bi carekê re jî daxîne. Hemû mecal û îmkanên ku mirov bikare hîskirinên xwe û prosesa fikra xwe bike yek heye: tiştê herî girîng ew e ku balansekê di pêşkevîna însan de pêktîne. Ji bo zanebûnek rast û durust û ji bo ku mirov karibe hevgerêdan û mêzêneke baş di navbera fikir û hîsên ku di vê rewşa modern î heyî de ku ji hev belavîna pêkbîne dibê alîkar.

Edebiyat di eynî wextê de ji xeynî van faktorên bi awayekî tekûz û bê kêmasî guhestandina peyv û gotinê ye. Bêî ku tu kes di navbera nivîskar û xwendevan de hebe, nivîskar bi riya gotin û peyvê bi xwendevan re dikeve têkiliyê. Gotinê ji mirov derbasî mirov dike bêî ku di bin tu reaksiyonên kollektîv de an jî di bin tesîra hin faktorên din de bimîne. Bi vî awayî edebiyat dikeve nava prosesa şîûr û zanebûna mirov. Hesasiyeta mirov bi pêşde dixe. Kapasîta ku mirov bikaribe tiştan bibîne û îdrak bike û ji dervî van tiştan hemûyan edebiyat dibê perçak ji ûjdan û însanetiya mirov. Ji ber vê yekê divê mirov ji edebiyatê re hin şert û pîvanên xusûsî deyne. Edebiyat şikil, pêjn û tecrûbeyên ku pêşkêş dike divê bawerî bidin û rast û durust bin. Divê tiştan lê zêde neke. Divê tiştan başî û sivik neke û neguhere. Heta dawiyê naverokê di nava rastiya huner û psîkolojiya wê de biparêze. Divê spekulasyona li ser hedefê pêşîya xwe neke û bi tu awayî meyla pêjn û dîtinên xwe nexê nav û vekirî neke. Heger ne bi vî awayî be wê demê dûrî wezîfa xwe ya ku însan bi xwe tiştê keşf bike dikeve.

Bi çend awayan konformîzm heye. Şiklekî konformîzm di nava sosyalîzmê de heye û konformîzmek jî di nava kapîtalîzmê de heye (ji bo ku ev herdu sîstemên civakî ji hevdu cihê ne û du grûbên mezin in, em li ser van herduyan rawestiyên.) Ev herdu sîstem jî sextekariyê dikin û dikevin pêşîya edebiyatê û astengan li pêşberî wê çê dikin. Nahêlin ku edebiyat bi wezîfeya xwe ya bingehî rabe. Ev jî zûdeye ku di bin navê sosyalîzmê de ev yekê hanê tê kirin. Sosyalîzmek realist û programkirî ku bi hemû awayê xwe vekirî û zelal formalîzmê tê pêkanîn. Edebiyatê li gora menfe-erê dewletê û îdeolojiya resmî tê bi karanîn. Rastî û realîteya jîyanê ne bi awayekî rast û durust tê pêşkêşkirin. Bi awayê ku ji wan tê xwestin dinivîsîn. Îdeal, optimîzm, pedagojî: hemû ji bo vê armancê tê bikaranîn. Lê ne ji bo afirandin û pêş-xistina edebiyateke baş tê kirin. Pêwîst e ev îdealên ku me li jor behsa wan kirin bêî ku di bin tesîrekê de bimînin bi awayekî xweser û azad di jîyanê kevin. Hunerê afirandinê bi her awayî tiştêkî xweser û xusûsî ye û tê mana ku bi tu awayên din şûna



wê nikare bê dagirtin. Mademkî ev tişt wilo ye wê demê divê huner bi awayekî azad bê bikaranîn û tu asteng û bend pêşî lê negre. Huner divê bi rastiya naveroka xwe ve girêdayî bimîne.

Tu dewlet û civat heqê wan tune ye ku vê aletê ragihandinê bi awayekî çewt bikarbîne û wê ji naveroka wê bi dûr bixe. Ev aletê ragihandinê daxwazên mirov ê ku ne di hesêb de ne û spontan in keşf dike ku ev yeka hanê bi qasî jiyana mirov muhîm e. Ji ber ku ev tişt bi tu awayên din nikare bê ziman.

Polîtîka û siyaseta kêma an jî zêde bi tiştên manifestoyê û programkirî dikarin mijûlbin. Lê edebiyat û huner bi tiştên weşartî û ne diyar ve mijûl dibe. Ji ber vê yekê tu carî siyasatvan nikarin serokatîyê ji nivîskaran re bikin û biryara li ser wan bigrin. Heger siyasatvan bixwazin wê yeka hanê bikin, ev tişt zerara herdu aliyên e û herdu alî jî ji vê yekê destkevtî nabin. Dikare gelek caran tiştên ne rast û ne berbihev, tiştên ji rê derketî jî bên kirin, ku civat mecbûr bimîne li tedbîrê xweparastinê jî bigere. Lê dîsa jî bi bawerîya min divê bi tu awayî rê li ber dîtinên ku çewt û xelet in jî neyê girtin û neyê sansûr kirin.

Di rewşa hemû civatan de symptomê bi vî rengî dikarin derkevin pêş. Ev dîtinên wilo ku tersê norm û pîvanên civatê ne derdikevine holê. Ew jî perçak ji jiyana ye ku divê bi her awayî mirov bala xwe bide ser. Ev dîtinên wilo wek sînyalê balkişandinê ne. Û dawîya dawî ev yeka hanê ji xwe rexnekirina civatê bi xwe ye ku xwe bi vî rengî dide der.

Konformîzm di civatê kapitalîst de jî bi awayekî vekirî û ber bi çav tê kirin. Lê bêtir bi awayekî weşartî û ser girtî tê kirin. Konformîzm bi awayekî vekirî û spekulatîv bi riya aborî tê kirin. Giranyê bêtir dide ser nivîsên tîtikî û rojane. Çih bêtir dide nivîsê sansasyonel û sewiya nivîskariyê dixîne. Qîmet nade huner û naveroka nivîsa. Bi awayekî vekirî exlaq, norm û pîvanê ji edebiyatê re nahêle û edebiyatê dike malzemekî kirîn û firotinê. . .

Ev yeka hanê gelek caran wek ku ne plankirî tê kirin xuya dibe. Ev tişt belkî şiklî wilo be. Lê di eslê xwede ev yeka hanê pirr bi awayekî zanistî tê kirin. Bi vî awayî wek lehiyê romanê polîsiyê, fantazyê ajaniyê û romanên dedektîv ji bo mezinan derdikeve piyasê. Di nava vî şiklê edebiyatê de konformîzmek weşartî û sergirtî heye. Ev şiklê edebiyatê xwe di warê polîtîk de bê teref nîşan dide. Le ev şiklê edebiyatê ji aliyê siyasî û polîtîk de konservatîv û paşverû ye. Ev şiklê edebiyatê her çiqas bixwaze xwe wek bê teref nîşan bide û wilo bawer e ku ew alîgiriya polîtîk nake û xwe objektîv û xweser nîşan bide jî (tevku ji aliyê xwendevanên wê de jî wilo tê dîtin.) Lê ev dîtina hanê ne rast e û bi her awayî xwexapandineke bi tahlûke ye.

Bi tu awayî mirov nikare berhemê nivîskar ji nivîskar bi xwe cuda bike. Kapasîte û zanebûna nivîskar a hunerî, hîs û tecrûbeyên wî yên jiyane, kûrbûna hîs û fikrên wî, radîkalîzm û pêşverûtiya nivîskar hemû bi hev re form û rolekê didin nivîskar. Derbasbûna nivîskar û tîpên ku ew dicibîne û qîmet dide wan tesîreke xurt li ser form û naveroka berhemên wî dihêle. Ev yeka hanê jî problemeke vekiriye. Form û naverok nikarin ji hev dû bînin veqetandin. Ew herdu hevdu timam û tekûz dikin û herdu aspekt bi hev re di nava wextekê de pêktên. Ew tîpên ku nivîskar qîmeteke bilind dide wan nivîskar divê bi awayekî azad heta dawiyê û heta ku jê tê wan baş bînin ziman. Heger ku bi awayekî din bike wê demê dibe formalîzm û kuştina huner. Divê heta dawî cîh û tolerans ji stîlê xweser re hebe. Heger armanc ew be ku bixwaze tiştekî bînin ziman.

Daxwazên min ji edebiyatê kêr an ji zêde ev tiştên ku min li jor behsa wan kir. Edebiyat divê bide dû wezîfeya xwe ya esasî ku ew pêvrabûye. Û bi tevayî daxwazên min ji xwendevanan ev e ku bi awayekî zanistî alîkarî û piştgiriya xwe bidin vî şiklê edebiyatê. Ji bo ku ev şikl edebiyatê karibe bi wezîfeya xwe ya esasî bînin cîh. Edebiyat aletê ragihandinê ye ku bi tu awayê din cihê wê nikare bê dagirtin. Mirov bi riya vê aletê ragihandinê xwe keşf dike û bi pêşde dixê. Ev reng edebiyatê dibe alîkarê her kesê ku dixwaze bighêje rastiyê. Ferq nake ku mirov di bin kîjan sîstema civakî de dijî. Wê demê divê nefretê ku li dijî yekformiya edebiyatê çê dibe û xelkê dûrî edebiyatê dike û diwestîne. Tev ku ev yeka hanê bêtir li welatê kapîtalîst mirov rastî wê tê jî, belkî bi vî awayî rê li pêşiya xeletiyên û kêmasiyan bê girtin. □

Ji swêdî: **MUSTAFA CIZİRÎ**

Konkret nr 1. 1967 Artikeln ursprungligen skriven för den bulgariska tidskriften Kontakter. ( Ev benda han ji bo kovareke bulgarî hatibû nivîsandin)

# Ez bi xeyalan şiyar dibim



**SUZAN SAMANCI**

**E**z wê sibehê dîsan bi xeyalan şiyar bûbûm. Min dixwest ez têkevim çemê xeyalan; carinan hema ku ez dikevimê, qeyika min serobino dibe. Ez bi hêdîka ketim çemê xeyalan: Gotin û hevokên ku ji hovedaristana min difûriyan li kesên ku li dora qeyikê diçûn û dihatin diketin, bi destên hev digirtin û bi aheng dîlan digirtin. Ez bi dengê telefonê veciniqîm. Te digot qey ez di ser sûc de hatibûm girtin! Min rahişt ahîzeya telefonê, dengê bi huzûr yê di telefonê de, "Ez Ferîdûn" got. Min tavilê "Andaç?" got. Wîlo, ji ber ku li van deran Ferîdûn tunene! Navê gişan Şêxmûs û Veysel in (Ji ber ziyaretgehên Veysel Qeranî û Siltan Şêxmûs). Di van salên dawiyê de jî Rojda, Kendal û Zinar pir bûne...

Sal 1971 bû. Gava em di rojke zivistana sar de sirgûnî Nevşehîrê bûbûn, xemgî-

niyê bi ser mala me de girtibû. Me ê li xerîbiyê çi bikira?... Pênc salên zaroktiya min di nava mirovên ku sitranên bêrîkirinê diavêtin ser kesên xwe derbas bûn. Jinên ku di xaniyên nizmik de li hev kom dibûn, her derengê şevê nanê şikeva lêdixistin, her çîrokên mustehcen digotin û bitirs qala mêrên xwe û jinên almanan dikirin. Min pir ji rojên nanlêxistinê hez dikir, ez bêdeng li ba wan rûdiniştim. Gava ew diwestiyan an jî ji bo vexwarina çayê navbirek didanê ew hingî li min hayê dibûn. Gava jinên rûdagirtî, "Ma tu hê neçûyî keçikê? Ma bi rastî tu kurd î?" digotin, min bi hîsên sûcdariyê awirên xwe diguhertin û bersiv nedida. Gava carekê pîrejinekê bi çavên xumamî li min nihêrî, "Tobe bike, welehî ez bawer nakim!" got, bûkeke nû, "Xem nake yadê, ew jî însan in" gotibû. Gava bavê min bitirs ji radyoya Êrîvanê li stranên kurdî guhdarî dikir, diya min jî bi rêk û pêkiya xwe dixwest ji xwe re cihêkî çêbike.

Min ji dersên tirkî hez dikir. Min ji Koca Aliyê Ömet Seyfettin yê bi rûmet û mêrxas hez dikir, ez ji bo Hesênê ku ji dîfteriyê miribû, bi şevan digiriyam. Wê salê, ji bo Înce Memedê di "Arkası Yarın" de, min baz dida malê. Min pirtûkeke du cild, di deh rojan de xelas kir. Gava min Qereçiyên Osman Cemal Kaygılı ku Tarık Dursun K. derbasî radyoyê kiribû, ji ba pirtûkfiroş kiribû, yê pirtûkfiroş destê xwe di ser serê min re biribû, "Ma tu ê van pirtûkan bixwînî xanima biçûk?" gotibû.

Min xwe avêtibû bextê pirtûkan. Min mîna *Çalığışu* notên rojê digirtin. Ji bo ku ew kurdîtiya min li rûyê min nexin, min dixwest ez bi devoka Nevşehîriyan bipeyivim. Rojekê mamosteyê îngilîzî Tanjû Beg, bi melûnî li çavên min nihêrî û "Ma tu Barzanî nas dikî?" got. Şerê 74'an yê li bakurê Iraqê, ev gotin pê dabûn kirin.

Gava ez di nava salên heftêyan de vegeyriyam Diyarbekirê, dema bilindbûna tevgera şoreşgerî bû. Xebatên komeleyî, şerê rêlxistin, boykot, grev, meş... Divê ez mikur werim ku min di meydana de kulmên xwe li ba nekirin, min parkayên leşkerî li xwe nekirin. Keçikên xwendevanên fakulteyê rojekê li deriyê me xistin û "Em dixwazin tu bi me re bixebitî" gotin. Ez hingî panzdeh salî bûm. Wan ji min xwestin ku ez paragrafekê ji Materyalîzma Dîrokî bixwînim û ji wan re şirove bikim. Min milên xwe hejandin û "min tişt jê fêhm nekir" got. Ez tevlî wan nebûm, ez ji wan reviyam. Ez vegeyriyam cîhana xwe ya biçûk û rengîn. Min Simone de Beauvoir nas kir. Min xwe û jinîtiya xwe keşf kir. Ez jî bi Madam Bovary re dildar bûm: Ev evîndariyên naîv ên platonîk bûn. Min di vê navê de bi dizî şîrên evîndariyê dinivîsandin. Gava ew şîrên min di magazînan de dihatin weşandin, rûyê min ji şerman sor dibû.

Piştî lîseyê zewac zû hat... Ez biryara xwe didim: "Divê ez binivîstînim." Ez dikevim qulîka hundur û ez têkiliyên xwe ji der û dora xwe dibirim. Her ku ez dixwînim, ez ji adetên ku min dixwînin û dihelînin, rizgar dibim. "Ez însan im, jin im" dibêjim. Ez bi der û dorê re li hev nakim. Gava ez dibim xerîbê xwe, ez "xwebûna" xwe dibînim. Şîrên min yê cidî cara pêşî di salên 85-87'an de di kovara "Sanat Olayî" de têne weşandin. Ez bi kêfxweşiyê re ditirsim jî... Ez bi hezkirina nivîsandinê ketibûm nava agirekî; ev agirekî cûda bû: Auraya azadiyê ya bi hêz î li dora wê, ez haş dikirim, lê di eynî wextê de ez bi hêz jî dikirim. Dema min şîrê dinivîsand, min meyla xwe berdida ser nivîsandina çîrokan. Gava min dixwest ez gotaran binivîstînim, ez hingî dixetimîm û dimam. "Şîrê min yê çîrokê" hê baş germ nebûbû; helbet wê rojekê di ser re biçûya. Kirineke jinane û ji bo hebûnê min çîrokên xwe di bin sernava "Eriyip Gidiyor Gece" de civandin û da çapkirin. Em di salên nodî de di nava agirekî de bûn. Ewrên reş li ser me digeriyan û dengên stranên şîrê bilind dibûn... Roj, mîna Moxolan dişewitîne û xerab dike... Gund yek bi yek ji nexşeyê dihatin malîştin... Û bi roava re kuçe bêdeng dibûn. Mîna ku Baudelaire dibêje, "Ji her tiştî cinayet diniquete..."

Çi bi min tê wilo! Pênûsa min serî ji min standiye û diçe. Xwedêyo, ez belavok melavokekê nenivîsim! Demeke zêrîn ya her bûyerê, her îdeolojîyê, her stranê heye. Rengê çîrokê hebekî çilmisî bû; lê ji bo ku rengdar û jîndar bibe baş ruh pê ve hatiye.

Min gotibû ez her bi xeyalan şiyar dibim, berî ku ez li wê qeyikê siwar bibim, ez pir bi tirs bûm. Dilê min ji ber bargiraniya xwe hew dikarîbû êş hilgirta. Dengên stranên şîrê di guhên min de dikirin zingînî, bêhna genî ji pozê min dervediket. Ez bi dîqet li der û dora xwe hûr dibim. Ez careke din baweriya xwe bi hêlên kêr û zêde yê rêwîtiyê tînim, gava em di çem de diçin, ez li daristana wî aliyê çem çîrokbêjên xwe dibînim. Gava ez di çolbeyarên Çexov yê bê ser û bin de derbas bûm, min di ser berçavkên wî yê girov de mêze kir, "Şiyar be, tivinga bi dîwêr ve dardekirî ji bîr meke!" ew bi ken dibêje. Mîna ku yek "Hişt, hişt" dibêje, gava ez li piş xwe dizivirim, Saît Faîk bi awirên xwe yê tûj û çavên xwe yê şîn, "Têkeve dilê mirovên normal, detayan ji bîr meke!" hebekî bi qerf dibêje. Sabahattîn Alî, bi nêrîneke entellektuelî, "Çîroka nemir û rastîn ew e ku hertiştî li ber çavan bigire û li ber xwe bide" bi xemgînî dibêje. Sadik Hîdayet bi kincên xwe yê xet-xetî xayiz e, di ber xwe de dibêje, "Dinya derve bi reng û bêhnên xwe tesîrê li mirovan dike. Bala xwe bide bipaşdevegerînan û dibîranînan". Çaxa Fuentes bi kenekî ji dil dibêje: "Erotîzmê ji bîr meke," Şolohov bi rûyê xwe yê sor bang dike, "tasvîr, tasvîr!" Ez paşê dengê André Gide yê ku dibêje "Hertişt kes û ji dilî" dibihîzim. Ez û Vûs'at

O. Bener, Tomris Uyar, Ferid Edgü û Selim İlerî ku hertim li qiraxa çem mijûl in, em ji dil silavê li hev dikin.

Xemgîniya min zêde dibe. Ez qeyika xwe dikişînim quncikeke zelal, ez vedigerim rewşa xwe ya safî. Cografya min li ber çavan e, ez wê baş nas dikim. Ez gihîştina mirovan û bêhngirtin û bêhnberdana bi wan re mijûlyeke herî girîng dibînim. Divê ev mijûlî û têkoşîn, ne ya jêxelasbûnê be. Divê ez kêliya ku tê de dijîm zemt bikim, gava ez di hundurê kêliyê de rojane bim, ez bi bîr tînim ku divê rojanebûyînin çîrokên min danequrtînin.

Cografya ku ez tê de dijîm, ger cografyayeke çavbihêsir be jî, ez pê ve girêdayî me. Mirovên bi nasnameyên perçebûyî, di nava xwînê de mayî derdikevin pêşberî min. Ez bi atmosfereke gewr ve hatime rapêçandin. Ez xemgîn dibim. Ez berê xwe bi royê ve dikim û bi wê re dostaniyeke rasî datînim. Ez bi pistîni jê daxwaza dirêj-kirina çîroka xwe dikim. Ez dixwazim hêviyê, hezkerinê û aştiyê belav bikim.

Çîrokên ku ez bawer dikim ew ê bi xwe rengî bibin û bikemilin, ez hingî bawer dikim ku ez ê bigihêjim qiraxên xweserbûn û azadiyê.

Paşê birûskê vedide, mijar di mista min de ye. Mijar ji bo min alavek e. Ez ji rawestandina pişt bûyeran hez dikim. Ez ji hovedarsitana xwe bi gotinên ku hol dibin re mijûl dibim, yên ku modeya wan buhurîne, ez wan datînim aliyekî. Ez ji bo rîtm û ahenga wê bi dengê bilind dixwînim. Gava çîroka min li ser maseyê li bendî kemilandina xwe dimîne, çîrok, "Ez hespekî boz yê ku di deşta kesk de bi çargavî diçim e" bi awayekî rûşuştî dibêje. Lê gava ez dibêjim roman, "Ew jî hespekî ku di deşteke kesk de bi loqandineke sivik diçe ye" di ber xwe de dibêje.

Baş e, ez digel van hemûyan dixwazim çîrokên baş binivîsînim. Gava ez çîrokên pir xweş binivîsînim, ez ê xwe girîng bihesibînim.

Xewn û rastiyan min di ser pira çîrokê re bi hev re derbas dibin, gava ew di ser pirê re derbas dibin ew rengî dibin. Rastiya min ji xewn û xeyalên min re dayiktiyê dike. Bi salan mirovên li vê cografyaya welatê sirgûn û paşdemayîne hebûn, lê belê hatibûn înkarkirin. Gava ez hewl didim qêrînen ku di guhên min de dikin zingînî bikim stran, ez dixwazim ji şopa şerê qirêj kevokên aştiyê bifirînim. Albert Camus, "Mirovê ku serî hildide û li dijî xerabiyên şer dike, ew dev ji qenciyan berdi-de û dîsan xerabiyê ava dike," dibêje. Ger para rastiyan tê de hebe jî, ev min ditirîne. Ez dixwazim ew xerabî di serê pênuşa min de bibe spehîti, hêvî, evîn û nermetevneke ku xwe li mirovan radipêçe û wan hemêz dike. □

Ji tirkî: **F. CEWERİ**

Sermava nivîsa Suzan Samancı "İmgelerle Uyanırım" e. Me gotina "Xeyal" di şûna "İmge" de bi kar aniyê.

# Mehdî Zana: "Girtîgeh dibistana jiyânê ye"

**Mehdî Zana** di sala 1940'î de li Farqînê hatiye dinyayê. Digel ku jiyana wî bi karkerî derbas bûye jî, dişan ew li Kurdistanê figurekî siyasî yê berbiçav e. Wî di 77'an de serokatîya belediya Diyarbekirê kiriye. Piştî hatina cûnta leşkerî (1980) êdî bû girtiyê bajarê Diyarbekirê. Di pêvajoya girtinê de gelek îşkenceyên hovane lê hatin kirin. Lê wî li ber xwe da û ji ser ya xwe daneket. Wî di girtîgehê de serpêhatiyên xwe di pirtûkan de civandin ser hev. Heta niha bi kurdî û tirkî pênc pirtûkên wî derketine. Herweha pirtûkên wî wergeriyane zimanên fransî û flemanî jî. Jina wî Leyla Zana niha di girtîgeha Ankarayê de radizê, wî jî xwe ji ber cezayê girtîgehê daye alî û niha li Swêdê ye.

Me rojek ji rojên Tîrmeha 1997'an Mehdî Zana li Stockholmê, li kafeteryake li rex çemekî dît û li ber pêlên keştiyên mirovên dilşa, li ser xemgînî û dilşahiye pê re sohbet kir:

**Nûdem:** *Ev nêzikî sê salî ye ku tu di nava xebata siyasî de yî. Di vê pêvajoyê de tu gelek caran hatiyî girtin û te gelek îşkence dîtiye. Tu dikarî hebeke ji me re behsa jiyana xwe û destpêka xebata xwe ya siyasî biki?*

**Mehdî Zana:** Destpêka xebata min ya siyasî hê ji salên min yên li Silîva dest pê dîke. Wê demê, ji aliyê mezinan ve behsa serîhildanên berê dihate kirin. Bi wê ve girêdayî, behsa lêdanê, îşkenceyê, kuştinê, eskeran û koçberiyê dihate kirin. Ev behsên ha mîna çîrokan, serpêhatîyan, kilaman û bîranînan dihate kirin. Vê yeka han gelekî bala min dikişand. Ne bi tenê bala min dikişand, ez bawer dikim bala wî nivîşê me gişan dikişand. Ji ber ku ew nîfş, nîfşekî bermayê êş û eziyetê bû. Me çavê xwe vekiribûn, em bi êş û eziyetê hesiyabûn. Bi destûra te be, ez ê di vir de mînakekê ji zaroktiya xwe bidim. Ez bawer dikim, ez hê şeş-heft salî bûm, li binya mala me qereqoleke eskeran hebû. Her tim ji wê qereqolê dengî dihat. Dengê qîrînê, dengê axînê û bi wan dengan re jî dengê tenekan, dengê textan, dengê lêdana deriyên dihat. Me zarokan meraq dikir, me digot gelo ew çi ye. Hingî bavê me ji me re digot, ew li xelkê dixin û ji bo ku qarewara wan were veşartin, ew li teneke û

textan dixin. Yanî ji dema zaroktiya min bigire, heta dema xortaniya min, her ev behsên ha bûn. Di dema terzîtiya min de jî, li hundurê dikanê her li ser kurdîtiyê û zilma leşkeran dihate peyivandin û mînaqêşe kirin. Tam di wan deman de em bi Kurdistana Iraqê û şerê Berzanî hesiyan. Berzanî bi pêşmergeyên xwe re li dijî karbidesiya Iraqê serî hildabû. Guhê me, her tim li ser şerê wan bû. Şerê wan, serîhildana wan, em hê bêtir bi kurdîtiya me hesandibû. Bi riya radyoya wan me hertim deng û bahsên nû ji Kurdistana Başûr dibihîst. Kêfa me dihat, em bi kelecana bûn. Ew bûyerên ku li der û dora min dibûn, zanebûneke milî dida min, ez bi hişyarbûneke milî dihesandim. Lê min hingî zêde ji siyasetê fêhm nedikir, min nizanîb li hemberî girseya xelkê bipeyivim.

Rojek ji rojên sibata 1963'an, min kaxezeke sê metro dirêj û not sentîm fireh, baş ûtî kir û li ser wê nivîsand: "Yaşasın Barzani, kahrolsun sevmiyenler" yanî (Bijî Berzanî, bimire yên ku jê hez nakin) min ew kaxeza ha bir Silîva û ew saet di yekê şevê de li cihê herî navendî daliqand. Gava ez sibehê zû di wir re derbas bûm, ez çî bibînim, dê weledê xwe avêtiye, herkes li wir kom bûne û polîs wan dehf didin. Lê min gotibû, polîs kê bigire, ez ê paşê herim bibêjim ku ew kaxez daliqandiye ez im. Çend heval girtin, lê ew ber destê êvarê berdan. Xuya bû, ew serîhildaneke min ya hundurîn bû. Min dixwest ez bi wê kirinê tola xwe ji tiştinan hilînim.

– *Te got ku ew bûyerên ku li Kurdistanê dibûn, ew çîrok û serpêhatiyên ku mezinan qal dikirin, ne bi tenê tesîr li te dikir, lê herweha li hemû xelkê dikir. Lê belê hertim hin kes hene ku ji nava xelkê derdikevin, lê ji xelkê re serkêşiyê dikin, xelkê organîze dikin û wan li dû xwe dikişînin. Gelo wê demê, ji bilî te kê hebûn?*

– Piştî vê bûyera ha, hostayê min, paşê jî şîrkê min Niyazî Hosta, ew mirovekî zana û hişyar bû, pir xwendibû, ji rewşa cîhanê û siyasetê pir haydar bû. Mele Evdilkerîm, Şêx Mizbeh, Mele Mehmûd, Mele Evdilayê Xerzî hebûn. Bi taybetî pir tesîra Mele Evdilayê Xerzî li ser me çêbû. Wekî din ev pir dihatin dikana me ya terzîtiyê. Piştî bûyera min ya daliqandina kaxezê em çûne Diyarbekirê. Wê çaxê li Diyarbekirê Partiya Karkerên Tirkîyeyê hatibû damezirandin. Min hingî ji Niyazî Hoste re got, were em ev têkevin vê partiyê. Wî got niha dev jê berde, bela wê ney-ne ser me. Lê min zêde guh neda belayên ku wê bihatina û min dixwest em aktîv di Partiyê de bixebitin. Paşê em bi hevalên din re jî peyivîn, me bi wan re mînaqêşe kir û me Mele Evdilkerîm şand Diyarbekirê da ew bi Partiyê re bipeyive.

– *Yanî pêşniyaza avakirina PKT'yê ji we hat, ne ku wan bi we re têkilî danîn û xwestin we bikişînin nava Partiyê?*

– Silîvan bala Partiyê kişandibû, lê belê yê ku têkilî bi Partiyê re danîn em bi xwe





Mehdî Zana: "Ez şerkirekî gelê kurd im"

(Foto: Şîrvan Nûray)

bûn. Û gava mirov li dîroka Partiya Karkerên Tirkîyê dinihêre, mirov dibîne ku giraniyeke Silîvan di Partiyê de çêbûye.

– Gava mirov çavekî li dîroka Partiya Karkerên Tirkîyê û herweha li dîroka tevgera kurdî digêrîne, mirov dibîne ku gelek şexsiyet û siyasetvanên kurd, ji gelek deverên Kurdistanê di Partiya Karkerên Tirkîyê (PKT) de xebitîne. Sebeba ku kurdan xwe li PKT'yê digirtin çi bû? Gelo tu alternatîvên din tunebû? Te behsa tevgera Berzanî kir û herweha navên ku te hejmartin jî, piranî mele bûn, ji bo çi hûn negihîştin Berzanî, lê hûn dageriyan Partiyê çep. Sebeba wê yekê çi bû?

– Hingî di nava partiyên rast de, meşandina karê kurdî zehmet bû. Me digot em

ê di nava partiyeke çep de bi rehetî vî karî bimeşînin. Wê çaxê serokatiya partiye Aybar jî samîmî bû. Wî dixwest kurd, çep, komunist hemû di nava partiye de bici-vin û sistemeke demokratîk û sosyalîst li Tirkiyeyê ava bike.

– *Xuyaye Partiya Karkerên Tirkiyeyê bersiva pirsên we neda, loma hûn ji wan veqetiyên, we bi xwe li Kurdistanê partî ava kirin, an jî hûn di nava partiyên kurdan de xebitîn. Gelo sebeba veqetandina we çi bû?*

– Piştî 64-65'an gava rehmetiyê Seîd Elçî partî damezirand, PDK'a Kurdistanê Bakur. Hingî xebateke mezin çêbû. Dihat gotin ku çepîtî ji me re nebaş e, komunîzm ji me re zerar e; dihat gotin ku PKT ji aliyê ajanan ve hatiye danîn, da ew pirsgirêka kurdî têxe nava xwe û bifetisîne. Pir heval bi van propogandayan îkna bûn û veqetiyên, lê ê min nediket serê min, loma min û hinek hevalan gelek minaqeşeyên germ kirin; ji ber ku ez aktîv bûm, wan dixwestin ku ez ji PTK'yê veqetim û bi wan re bixebitim. Lê gava ez di nava PTK'yê de dixebitîm jî, min hertim pirsgirêka kurdî dida pêş û min hertim propogandaya kurdîtiyê dikir.

– *Mîna ku te di destpêkê de behs kir, karê te terzîtî bû. Xuyaye dikana te ya terzîtiyê bûbû cihê hevduhîna pêşverûyên kurdan yê wê demê. Yanî mirovên reuşenbîr û şarezê dihatin ba we û diçûn, paşê tu hêdî hêdî bi wê xebatê bilind bû û tu heta serokatiya belediya bajarê Diyarbekirê bilind bûyî. Gava te nuh dest bi xebata siyasî kiribû, te bawer dikir, ku tu ê rojek ji rojan bikaribî bibî serokê bajarê Diyarbekir? Ew serokbûn hîseke çawan bû? Di pêvajoya serokatiya bajêr de, tiştê ku te dixwest te dikaribû ji bajêr re bikira? Ger bersiva te "na" be, sebeb çi bû?*

– Bi rastî di destpêkê de serokatiya belediya ne di bîra min de bû, herweha di hesabê min de jî tunebû. Em di destpêkê de nezan bûn, tê bîra min, ez carinan li çarşiya Silvan bi kurdî û tirkî dipeyvîm, min ji xelkê re digot ger we navê me di listeyan de dît, baweriya xwe bi me neymin. Em ji bo we ne, em welatparêz in, em çep in; armanca me ew e ku em xizmeta we bikin û we ji vê bindestiyê xelas bikin. Paşê ez rêgihîştîm ku min ev slogana han jî çewt gotiye. Tabî min ev slogan ji serê xwe gotibû, ne ku biryara partiye bû.

Lê belê xelk berê ne mîna niha bûn. Ew li dora axa û şexan bûn. Em jî derketine, ew henekê xwe bi me dikin, bi me dikenin, wan parîkî ji min hez dikirin, ew jî ji bo ku min karê xelkê dikir. Em hingî hindik bûn, hejmarê me ne zêdeyî pênc-şeş kesan bûn, lê belê divê ez mikur werim ku em xurt bûn, enerjîk bûn, em dixebitîn.

Di sala 69'an de, ji tunebûna mirovan, ez hebekî populer bûm. Me wê çaxê li Silvanê xaniyê hukûmetê îşgal kiribû, em ketibûn hepsê, xelk pê hesiyabûn. Me "Dogu mitingleri" derbas kiribûn, em li gundan geriyabûn, xelkê êdî em nas dikir-

rin. Di sala 1969'an de partiye bi zore ez kirim berendam. Emre min ji biçûk bû. Wan emre min mezin kirin û ez kirim berendam. Hingî Tarik Ziya Ekîncî, Canîb Yildirim bû, Tahsîn Ekîncî bû, hatin bi min re peyivîn û xwestin ku ez bibim berendam. Wê çaxê ez ketibûm navenda partiye ji. Di sala 69'an de em ketin hilbijartinan lê em bi ser neketin. Paşê, piştî xebateke pir û gur ya di nava xelkê de, gava em di sala 77'an de ketin hilbijartinan, em bi ser ketin. Ji ber ku me ew potansiyela ku hebû organîze kiribû, me bawerî dabû xelkê, me xwe bi wan dabû hezkirin û em ji wan bûn. Di destpêkê de hinek hevalên min ji bawer nedikirin ku em ê bi ser bikevin, lê ê min ji destpêkê ve bawerîya min bi serketinê dihat. Ji ber ku me ji tebaqa jêr dest pê kiribû. Ez bi karker û paqijkerên bajêr li raya digeriyam. Ez bi zîmanê wan dipeyivim û armanca min kewandina birînên wan bû.

– *Gelo soza ku te dabû xelkê te bi çî anî?*

– Min ji xelkê re zêde sozên mezin nedabûn, min digot em şoreşger in, em ê li cem we bin.

– *Ma te di hundurê wan du salan de tişteki taybetî ji bajêr re kir?*

– Tabî min kir. Lê dema min kurt bû, di du salan de mirov nagihîje gelek tiştan bike. Min ji avahiya bin ve dest pê kiribû. Digel wê dema kurt jî, ez dikarim bi hêsanî bibêjim ku, me ji yêr ku bîst salan bajar îdare kiribûn, bêtir kir.

Min ji hevalên xwe re jî digot, divê em wilo bixebitin ku xelk ferqa me û yêr din bi çavên xwe bibînin. Gava xelk wê ferqê bibînin, ew ê bawerîya xwe bi me bînin û wê ev yeka han jî riyên din li ber me veke. Gava rîya me jî vebe, em bi hêsanî tê de bimeşin û bigihîjin armanca xwe. Lê vê yekê bala hukûmetê kişand û êdî hukûmetê da ser piştî min.

– *Piştî evqas sal û evqas tecrube, ger tu îro bibî serokê bajarê Diyarbekirê, ya ku tu pêşî bixwazî ji bajêr re bikî çî ye?*

– Îro bi statistîkî 174 hezar zarokên kurdan ji xwendinê bêpar in. Ya ku pêşî ez bikim ez ê ji bo van zarokan li rîya alîkariyê bigerim. Jê pê ve jî, ez ê xebata ku di dema serokatiya min de neçûbû serî, bibim serî.

– *Mehdî Zanayê ku demekê serokê bajarê Diyarbekirê bû, bû girtiyê bajarê Diyarbekirê; bû zîndanîyê bajêr. Sebeb çî bû? Sebeb xebatên te yêr belediyê bû, an jî xebatên te yêr siyasî bûn?*

– Sebeb yek tişt bû; ji bo ez kurd bûm. Tu sebebên din tunebû.

– *Û ji ber sebaba kurdayetiyê jî te gelekî êş û ezîyet kişand...*

– Erê, min kişandiyê, lê ne xema min e. Ez ji wan êş û ezîyetan re hazir bûm, min dizanibû wê çî were serê min. Min di mesela kurdî de û di mesela bîr û bawe-

riyên xwe de tucarî tawîz nedaye. Min şaşî û xeletî kirine, lê ji ya xwe daneketime. Di eslê xwe de bi qasî bobelatên ku hatine serê gelê kurd, ewqasî nehatiye serê me. Gelê kurd gelek êş û eziyet dîtiye.

– *Di dema girtîna te de, ji bo ku tu Mehdî Zana bûyî, tadeke zêde li te dikirin?*

– Belê, hemû girtî bi vê yekê dizanin. Esker bûya, çawîş bûya, polis bûya, kom-sêr bûya; li mehkemê bûya, di dema seredanan de bûya, di korîdorên de bûya, di otomobîlan de bûya; bi tenê ji bo ew bibêjin, me li serokê bajarê Diyarbekirê xistiye, wan li min dixistin û pir dihatin ser min. Erê, her însanê kurd ku dihatin girtin ji lêdan û îşkencê nedifilicîn, lê min jî têra xwe kişandiye.

– *Pîştî ewqas îşkence, ewqas tade û neheqî, tu hê jî gelekî şên î; tu henekan dikî, tu dikenî... Gelo bi rastî mirov dikare piştî wê îşkenceya nenormal, normal bimîne?*

– Di vir de zanebûn muhîm e. Gava mirov bi zanebûn dest bi tiştê bike û di karê xwe de bi bawerî be, wê çaxê tişt xera nabin, mirov li ser xwe dimîne; heta gelek çaran mirov xurttir jî dibê. Ji ber ku mesele ne mesela şexsê te ye. Yanî, ne tenê ji bo ku ez Mehdî Zana me, wan ez girtim, li min xistin, îşkence bi min kirin. Na. Mesele ku ez Mehdî Zanayê kurd im û min ji bo kurdîtiyê têkoşîn daye. Gava wan jî tade gîhandine min, xwestine di şexsê min de tadê bigihînin hevalên min, merivên min, milletê min. Niha, ger ji bo diziyekê, ji bo qetlekê, an jî ji bo menfeeta malê dinyayê tade li min hatibûya, belkî ez pir li ber biketima û nikarîbûma derketima nava civatê. Lê ez niha bi serbilindî derdikevim û ez bi qasî misqalekî jî, ji ber îşkenceya ku li min hatiye kirin şerm nakim. Ewqas îşkenceya pîs û nemirovane li min hatiye kirin ku mirov şerm dike behs bike. Lê ji ber ku ez dizanim ev îşkence ji bo doza milletê li min hatiye kirin, loma ez niha rehet û serbilind im.

– *Gelek kes dibêjin ku girtîgeh ji wan re bûye dibistan. Û gava gelek kes ji vê dibistanê derdikevin, mîna nivîskar derdikevin. Haya min ji nivîskariya te ya berî girtîgehê tune, lê piştî dema girtîgehê pirtûkên te gihîştin me. Tu dikarî hinekî behsa girtîgehê û têkiliyên nivîskariyê bikî?*

– Însan gelekî xurt e, dikare li ber xwe bide û biafirîne. Ji xwe ger însan ne xurt bûya, wê nikarîbûya ji dema hovîtiyê bigihîştta vê sedsala me. Tu dizanî, girtiyên girtîgeha Diyarbekirê, gelekî tade û îşkece dîtine. Di destpêkê de, xwendin qedexe bû, pirtûk nediketin hundur, nivîsandin ne ewqasî hêsan bû. Lê rast e, girtîgeh dibistanek e, dibistana jiyane ye. Ji her sinifê, ji her kategoriyê, ji her îdeolojiyê, çî bigire ji her gund û bajarî, însan hene. Her însanek ji van xwediyê serpêhatiyan e. Gava mirov hebekî serwest be, bala xwe bide van însanan, têkeve dinya wan ya hundurîn, mirov ê bikaribe gelek tiştan binivîsîne. Min jî xwest, hem ez jiyana û

serpêhatiyên xwe û hem jî jiyana û serpêhatiyên girtiyên din bînim ziman. Heta jî min hat, min xwest ez jî wê nexweşiya jiyana, xweşiyekê derxînim, xweşiyekê bînim ziman.

Ne bi tenê ez, gelek hevalên din jî hene ku di girtîgehê de fêrî xwendin û nivîsandinê bûne û nivîskarên entîke jî wan derketine, ez gelek hevalên weha nas dikim.

– *Te heta niha çend pirtûk nivîsandine û bi kurtî naveroka wan çi ye?*

– Min heta niha pênc pirtûk nivîsandine. Lê ez ne nivîskar im, ez xwe nivîskar nahesibînim, min bi tenê xwestiye ku ez perçeyekî jiyana xwe û ya kurdan binivîsînim. Ji ber ku heta niha, hertim biyaniya li ser kurdan, li ser zimanê wan, li ser dîroka wan, li ser edebiyata wan nivîsandine. Min xwest, qet nebe, jiyana girtîgehan, îşkenceya ku li me hatiye kirin, ez bi xwe binivîsînim, em wê jî li bendî biyaniyan nehêlin ku ew rojekê ji me re binivîsînin.

Bi gotineke din jî, nivîskarî jî bo min mîna hobyekê ye, ji ber ku ez jî betalî û valatîyê hez nakim, gava ez vala dimînim, ez dinivîsînim.

– *Te di destpêka hevpeyvîna me de got ku ji bo ku tu kurd bû, tu hatî girtin û te ewqas îşkence dît. Herweha em dizanin ji bo ku tu di mehkemyên tirkî de bi kurdî îfadeya xwe bidî, te bi înad li ber xwe da. Lê belê te pirtûkên xwe ne bi kurdî lê bi tirkî nivîsandin, sebeb çi ye?*

– Gava mirov ji derve lê dinêre, mîna berberiyekê xuya dike. Tu ê rabî çar sal û nîvan di hundur de qet bi tirkî nepeyvî, tu ê li ser zimanê kurdî înad bikî, lê tu ê rabî bi tirkî binivîsî. Sebeba vê vekirî ye. Gava min nivîsand jî min jî hevalan re got. Pirtûkên min hewcedarê xwendinê ne. Divê xwendevan pirtûkên min bixwînin. Bi qasî xwendevanên kurd divê xwendevanên tirkî jî pirtûkên min bixwînin û doza me nas bikin. Ji bo ku ez bikaribim tiştên ku hatine serê me bidim bihîstin, min loma tercîha zimanê tirkî kir.

Lê mîna tu dizanî, min pirtûka xwe ya şîran bi kurdî nivîsand. Ez ne şaîrim jî, lê ji bo ku ez şerê ziman û edebiyata kurdî bi mehkemyan re bidomînim, min şîrên xwe bi kurdî nivîsandin. Niha jî, hin xebatên min yê bi kurdî hene.

– *Te got ku tu niha jî hin tiştan dinivîsî. Ger em pirsra xwe weha formule bikin; gelo plan û projeyên te yê pêşerojê bêtir li ser nivîskariyê ne an jî li ser siyasetê ne? Ger nivîskarî be li ser kîjan şaxê nivîskariyê ye? Ger li ser siyasetê be, siyaseteke çawan?...*

– Min gava din jî behs kir. Ez mirovekî şervanê gelê kurd im. Tabî şervaniya min jî bi metoda min e. Ez dixwazim gelê kurd rojekê berî rojekê jî vê belengazî û şerpezetîyê xelas bibe. Xebata min ya bingehîn û rastî ev e, yanî siyaset e. Lê ji bo

ku ez vala nemînim, ez dinivîsînim. Gelek ji van xebatên di destên min de ez mîna roman difikirim. Ka em binerin bê ez ê bi ser bikevim an na.

– *Te got, ji bo ku tu vala nemîni, tu dinivîsîni. Gelo di vê gotina te de biçûkdîtineke edebiyatê tuneye?...*

– Na, ez edebiyatê biçûk nabînim. Edebiyat giran e, lê ne sen'etê min e, zor e. Ez dixwazim bibêjim ku edebiyat ne karê min yê yekemîn e.

– *Em niha vê hevpeyvîna xwe li Swêdê dikin. Gelo tu seriyekî hatiyê Swêdê an jî tu ji bo mayîne hatiyê Swêdê?*

– Ez niha muweqet hatime, lê ez nizanim ku ez ê çiqasî bimînim. A ez niha dixwazim vegerim. Ez rojek welêt nadim bi vir. Ev der çiqas xweş be jî, ez dikim nakim ez nikarim fêrî vir bibim. Ji bo min welat û jiyana welêt tişteki din e. Lê niha ji bo min veger zor e. Ceze li ser min heye. Ez niha vegerim, ew ê min dîrek biavêjin hundur. Digel vê jî ez carina dixwazim vegerim, lê hevalên li welêt naxwazin ez vegerim. Hema ku firsendek biçûk têkeve destên min ez ê vegerim. Ez bawer dikim, rewşa gelek însanên din mîna rewşa min e.

– *Em dizanin ku hevala te ya jiyane, Leyla jî niha girtî ye, di girtîgehê de ye. Wê di vê pêvajoya girtina xwe de gelek xelatên navmeteweyî stend, gelek li ser wê hate peyvandin û di kovar û rojnameyên dinyayê de gelekî li ser hate nivîsandin. Gava tu tiştên weha di derheqa jina xwe de dibîhîzî, tu çi hîs dikî? Ji bo te hîseke çawan e?*

– Ez bawer dikim, kî di şûna min de be, wê kêfa wî were. Ez niha bi Leylayê gelekî serbilind im, pir kêfa min tê. Ji ber ku barê min hilgirtiye, wê jî ew bar hilgirtiye, ew ji bo gelê kurd di hundur de ye, ji bo xelasiya gelê kurd di hundur de ye. Ma mirov bi vê ne serbilind be, wê bi çi serbilind be?...

Leyla bi zanebûn ketiye nava vê xebatê, dizane ku çi dike û di hepsê de jî ji aliyê wijdan de pir rehet e.

– *Nûdem digihîje girtîgehan, digihîje Leyla û hevalên wê jî. Tişteki ku tu bi riya kNûdemê bigihîni Leyla Zana heye?*

– Ez dixwazim bi riya Nûdemê silav û evînên xwe ji Leyla û hemû hevalên di hundur de bişînim. Ew hertim di dilê min de ne...

– *Bi hêviya ku tu û Leyla dîsan bigihîjin hev, em ji bo vê hevpeyvîne gelekî spas dikin.*

– Ez jî pir spas dikim.

# Edebiyat û ziman

## N. ZAXURANÎ

**B**eriya hertiştî xweseriya şaxekî ji şaxê hunerê bê imajên hunerî yên wî şaxî bi çî materyalî tên afirandin, xwe dide diyar kirin. Bêguman, gava ku mirov ji vî alî ve li edebiyatê binêre, mirov kare bi awayekî hêsanî hunera edebiyatê mîna hunera zimên karakterîze bike. Lewra vegotina bi alîkariya zimên xwediyê fonksiyoneke bingehî ye ji bo afirandina berhemên hunerî ku ew jî bivê - nevê di çerçeweyeke netewî de tên pê.

Mîna ku rind tê zanîn, ziman fenomenekî gelekî tevlihev e. Fonksiyona herî girîng ya zimên ew e ku komînkasyona di navbera mirovan de pêk bîne. Bi saya zimên mirov di hevdu dighê, mirov tiştan ji hevdu re dibêje, ango di serpêhatina jiyana civakî de mirov navan li hevdu dike, bi qencî an xerabî mirov bangî hevdu dike. Herweha mirov bi alîkariya zimên bi hevdu re mijûl dibe, li ra û şêwrên hevdu guhdarî dike û bi saya vê yekê jî mirov hînî ramana hevdu dibe. Ji bilî vê yekê jî, mirov bi alîkariya zimên hisên xwe pêşkêşî dorbera xwe dike, xîtabî hisên heval û hogirên xwe dike. Mirovê hunermend bi alîkariya van fonksiyonên zimên kar û barên xwe yên hunerî li dar dixê. Ji ber ku ev fonksiyon di serpêhatina jiyana hunerî de karînen (îmkanên) bi gelek alî pêşkêşî mirovê hunermend dikin.

Vêca mirov kare bi hêsanî bibêje ku edebiyat û ziman di gelek waran de nêzîkî hevdu ne, xwediyên pîrr aliyên hevpişk in. Her du jî li ser hinek aliyên fenomena zimên dirawestî, li gore metodên xwe dinirxînin. Ji ber vê yekê jî peywendiyên her du şaxan yên nêzîk ji sed salan vir de bi hevdu re didomînin.

Lê belê, zanyariya edebî û zanistîya zimannasîyê bi xwezeya xwe şaxên zanistîyê yên ji hev cuda ne. Li pêşperî wan karmendiyên (wezîfeyên) ji hev cuda yên zanistîyê hene. Mîna ku tê zanîn, zimannasî hemû fenomenên li dorbera zimên analîz

dike, li ser wan lêkolînan li dar dixê. Bi peyveke bi rêk û pêk, zimannasî geşbûn, guhertin û serpêhatiyên di zimanên ku ji aliyê neteweyên cîhanê ve tên peyvandin li gora normên xwe şirove dike, çalakîyên mirovan yên di warê zimannasîyê de bi awayekî zanistî pêşkêşî jiyana civakî ya mirovantiyê dike. Lê heçî zanistiya edebiyata karmendiya (wezîfa) wê ew e ku hunera edebî ya gelê cîhanê şirove bike. Bi saya vê şirovekirinê jî, zanistiya edebî geşbûn û normên naverok û formên wan ligel taybetmendiyên wan ronî dike.

Vêce, biqasî ku tê xwiyakirin, mijara / objeya zimannasîyê û ya hunera edebî gelekî ji hev cuda ne. Ji bona vê yekê jî, ji bo ku her du şax bikaribin bi awayekî bi rêk û pêk mijarên xwe analîz bikin, divê ku her yek ji wan metodên xas yên ku bi objeya wan re diguncin, bi kar bînin. Ji xwe, mirovê ku haya wî ji dîroka zimannasî û zanistiya edebî hebe, bi hêsanî dibîne bê çawa mirovê edebiyatzan û zimanzan metodên ji hev cuda bi kar tînin. Ango, dema mirovê edebiyatzan û zimanzan li ser materyalên xwe mijûl dibin, mijarên xwe karakterîze dikin, metodên zanistîyê yên bi taybet bi kar tînin.

Li gel vê yekê jî, zanistiya edebî û zimannasî bi awayekî organîk li ser hev bandoreke bêhempa dideynin û geşbûna hevdu dixemilînin. Lewra hunera edebî bi awayekî bêrawestan li ser fenomenên zimên lêkolînan li dar dixê, bi saya van lêkolînan encaman derdixê meydanê û bi vî awayî materyalên hêja û bi nîrx pêşkêşî zimannasîyê dike. Bi rastî jî, xislatên / taybetmendiyên zimanê berhemên hunerî bi taybetmendiyên zimanê naveroka wan re digunce. Bi alîkariya vê guncandinê zanistiya edebî dema ku taybetmendiyên zimanê berhemên hunerî şirove dike, dibe alîkar ji bo zimannasîyê. Ji ber ku zimannasî bi alîkariya vê yekê hîn naveroka berhemên hunerî dibe.

Ji aliyê din ve jî, divê ku neyê jibîrkin, heta ku zanistiya edebî ne xwediyê zanariyê berferê û kûr be di derbarê taybetmendiyên zimanê ku berhemên hunerî / edebî pêk tên nivîsandin, dê çawa bikaribe forma van berhemên edebî bi qasî ku jê tê xwestin, şirove bike. Mîna ku baş tê xwiyakirin, li vir û di vî warî de zimannasî dibe alîkar ji bo serketina zanistiya edebî. Bêguman ev alîkarî di serpêhatina dem û dewranan de bi geşbûn û guhertina zanistiya edebî re tê guhertin.

Bêguman objeya / mijara zanistiya edebî ne bi tenê hunera edebî ya nivîskî ye. Çi hunera bi nivîskî û çi jî ya bi devkî, ango afirandina hunerî ya ku bi alîkariya zimên tê hûnandin, hemû bi carekê re dibe mijar ji bo zanistiya edebî di serpêhatina dem û dewranan de. Li kudera cîhanê dibe bile bibe, pîrriya gelê cîhanê beriya ku ji xwe re alfabekekê peyde bikin, bi zimanê xwe berhemên devkî ji xwe re diafi-



randin. Ev berhemên devkî ji nivşekî digihan nivşekî din û bi vî awayî jî jiyandina van berhemên hunerî yên devkî dihate domandin. Bi saya jiyandineke weha ya devkî gelê cîhanê bûne xwediyê çirok, efsane, stran, peyvên sehdariyê û gotinên bav û kalan. Mîna ku baş tê zanîn, ev berhemên devkî ji aliyê zanyariyê ve bi folklorê tên bi nav kirin.

Piştî ku mirovantiyê alfabe û dezgehên çapamanîyê bi dest xistin jî û bi saya vê yekê bûne xwediyê edebiyateke nivîskî ya netewî jî, her domandin ku berhemên devkî ji xwe re peyde bikin. Di serpêhatina dem û dewranan de ev berhemên devkî di warê hemû jiyanê de mil dane hunera edebî ya nivîskî û herduwan jî bi gelek alî bandoreke bêhamba li ser hev kirin.

Lê divê, baş bê zanîn ku lêkolîn û nixrandina berhemên folklorîk bi saya alfabe û dezgehên nivîskî dest pê kiriye. Ji ber ku bê alîkariya dezgehên nivîskî mirov nikare cudabûna di navbera zarava, devok, ritm (aheng), avakirina hevokan û vegotina cur bi cur de bibîne. Bê ka gelo ev fenomenên zimên yên ku li jor behsa wan hate kirin, bi orjînalîteya xwe re diguncin, an na. Bela vê yekê jî, divê ku zanistiya edebî bi zanyariya zimannasiyê xwe bixemilîne da ku bikaribe cudabûna di navbera zarava, devok û jargona de hîn bibe û bi vî awayî jî di derbarê kar û barê xwe yê hunerî de yê ku li ser folklorê tê kirin, bi ser bikeve.

Ji bilî piştgirtiya zanistiya edebî û zimannasiyê ya di warê folklorê de, herweha zanistiya edebî û zimannasî di warê edebiyata dema kevnar û ya navîn de jî dibin alîkar ji hevdu re. Gelên kevnar bi alîkariya zimanên xwe di serpêhatina dem û dewranan de berhemên hunerî yên bi nix afirandine. Di serpêhatina van dem û dewranan de, bêguman di zimanê wan de - çi di warê xezîna peyvên de û çi di warê rêzimanîyê de - guhertin û geşbûn tên pê. Di xezîna gotinan de hinek peyv kevn dibin, hinek jî ji nû ve peyde dibin. Bi vî awayî jî, ziman bi alîkariya peyvên / termên tazepişkivî bêtir bi wate (mane) û dewlemendtir dibin. Ji aliyê din ve jî, gava ku nivîskar berhemên xwe yên hunerî diafirînîn, bivê /nevê vegotina wan ji bêje û devokên navçeya wan tê bandor kirin. Ev yeka ha jî, bi serê xwe lêkolîn û şîrovkirinê dixwaze, da ku xwendevan bi hêsanî bikaribe van berhemên edebî bixwîne û di wan de bighe. Bela vê yekê jî, gava ku mirovên edebiyatzan li ser berhemên edebî lêkolîna li dar dixin, divê ku haya wan ji fenomenên rêzimanî hebe, da ku bi hêsanî bikaribin wan şîrove bikin. Eger ku mirovên edebiyatzan di kar û barê xwe yê edebî / hunerî de metodên weha bi vî rengî bi kar neynin, dê çawa xwendevan bikaribin nixrandin û lêkolînên wan yên hunerî fehm bikin.

Bi rastî jî, gava ku mirov di derbarê edebiyata kurdî ya kevnar de xwedî zanyarî

be, hingê mirov vê yekê li gel hemû rastiya wê li pêşberî xwe dibîne. Ji ber ku çaxa mirov li nav rûpelên berhemên edebiyata kurdî ya klasîk dinêre, mirov dibîne ku bê alîkariya zimannasiyê berhemên edebî yên klasîk ku ji aliyê Ehmedê Xanî, Meleyê Cizîrî, Eliyê Herîrî û ên din ve hatine afirandin, gelekî sext e ku mirov di wan bighêje. Lewra zimanê edebiyata kurdî ya kevnar mîna edebiyata ciranên xwe - Fars, Tirk û Ereb - zimanekî tevlihev û nesade ye. Zimanê edebiyata me ji bêjeyên kurdî, farisî û erebî pêk tê. Gelek caran bêje bi serê xwe tu wateyê (manayê) nade, ew mîna mazmûn an jî sembolê ye. Divê ku mirov di derbarê wê de xwedî zanyarî be, da ku mirov bi saya vê yekê têbighêje. Pirsgirêk bi vê yekê jî serrast nabe. Ji ber ku edebiyata kevnar ya kurdî ji aliyê mirovên edebiyatzan yên ku di medreseyên olî (dînî) de dihatin perwerde kirin, dihatê afirandin. Gelek ji wan mamosteyên bi otorîte yên ku piş bi sofitî, tasawwuf û mistizmê dikirin. Ji ber vê yekê jî, heger ku mirov dixwaze berhemên wan yên hunerî baş fehm bike, divê ku mirov di derbarê sofitî û mistizmê de xwedî agahdarî be. Hingî dê mirov hunera wan fehm bike û bi vî awayî jî zewqê ji hunera wan bistîne.

Herweha zimannasî û zanistiya edebî ji bo ku bi hev re bikaribin hunera kevnar ya Yewnan û ya Romayê şirove bikin, kar û xebateke wan ya bi navê "filolojiya klasîk" gelekî bi nav û deng e. Bi qasî ku tê zanîn, hunera edebî û mîtolojiya Yewnan û ya Romaya kevnar li ser edebiyat û hunera gelên Ewrûpan di serdema xwe de bandoreke bêhempa kiribûn. Ji ber ku, berhemên hunerî yên ku bi zimanê yewnanî û bi zimanê latînî hatibûn afirandin, li seranserê Ewrûpa belav bûbûn. Heta bi termînolojiya hunera edebî ya hemû welatên Ewrûpiyan bi saya van zimanan hatibû pê. Ji bilî vê yekê jî, heta bi hêsanî kare bê gotin ku mîtolojî û hunera edebî ya Yewnan û Romaya Kevnar di pişt re jî di serdemeke dirêj de, di warê naverok û formê de ji bo edebiyata hemû welatên Ewrûpa weke mînayeke bê emsal dihatê destnîşankirin. Çi qehreman û çi xwedayên Yewnan û Romaya Kevnar ji bo edebiyata Ewrûpiyan gelek bi nîrx dihatin dîtin. Ji ber vê yekê jî, gelek berhemên edebî yên Ewrûpiyan serçavîyên xwe ji çîrok û efsaneyên Roma û Yewnaniyan digirtin.

Piştî vê hûr û kûrbûna bi kurtî dixwazim ku parîkî li ser rewşa edebiyat û zimanê me ya îroyî rawestim. Bê ka rewşa edebiyata me çî ye. Çi pirsgirêkên zimanê me hene?

Di destpêkê de bi dilşadî ez karim bibêjim ku edebiyata me ya kevnar çî di warê devkî, nivîskî û çî ji aliyê kalîta xwe ve gelekî bi nîrx û serketî bû. Lewra edîbên me yên wê demê mirovên têgihîştî û têrxwendî bûn. Hîmdarên edebiyata me ya kevnar edîb û şairên mîna Meleyê Cizîrî, Faqihê Teyran, Eliyê Herîrî, Ehmedê Xanî û

ed. ji bilî zanistiya olî (dînî) herweha haya wan ji felsefê, stêrnasî, matemetîkê, edebiyatê, û dîrokê hebû. Ji bilî vê yekê, wan rind zimanê kurdî, erebî, tirkî û farisî dizanîbûn. Bi taybetî pisporên edebiyata faris û erebî bûn. Di medresan de xwedî faqih bûn. Otorîteyên serdema xwe bûn. Bi saya vê kar û xebata wan ya hêja û bi rûmet, em îro xwediyê berhemên delalî zêrîn yê edebî ne. Bi rastî jî, gava ku mirov îro roj jî şîirê Melayê Cizîrî dixwîne, mirov bi çavên serê xwe dibîne, bê çî xwedî kalîta hunerî û çawa dibin serçavî ji kesên hunermend re.

Dikare bê pirs kirin: Ma gelo ev edebiyata bi rûmet û dewlemend bi kîjan zimanî hatiye nivîsandin? Bersiv zehf hêsanî ye: Bi zimanê kurdî. Naxwe, zimanê kurdî zimanekî dewlemend û têra xwe kevnar e.

Lewra beriya niha bi sedên salan bi awayekî bi serketî şair û edibên me şîr pê afirandine. Ango, ji destpêka sedsala yazdehan ta dawiya sedsala nozdehan berhemên yekta yê edebî / hunerî bi vî zimanî hatin hunandin. Lê mixabin, îro roj li vir an jî li wir, ji civara me dengên ku tîr guhê mirov bi awayekî din in. Dibêjin: Ma gelo mirov dikare bi zimanê kurdî di warê hemû - civakî, polîtîkî, kulturî, felsefî û ed. - jiyane de xwe îfade bike? Bi rastî jî, mirov nikare van gumanan fehm bike. Ji ber ku, ya xwediyê van gumanan haya wan di serpêhatina dem û dewranan jî dîroka zimanê kurdî nine, an jî bi awayekî ji awayan ji zimanê xwe dûr ketine. Sedem çî dibe bila bibe, divê ku mirov di warê jiyane de bi hemû hêz û hewldana xwe li pêşperî helwesteke weha çawt derkeve. Lewra bi tu awayî rewşa zimanê kurdî mirov nikare bi helwesta wan ya ku ji gumanan bar kiriye, binixîne. Weke ku di rêzên jorîn de jî hate bahs kirin, beriya niha bi sedên salan mirov dikarîbû berhemên edebî, felsefî û ed. bi zimanê kurdî binivîsîne, lê îro roj mirov çima nikare xwe bi zimanê kurdî îfade bike. Heger ku kêmasiyek hebe, dê ev kêmasî ne ya zimanê kurdî be. Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku ev kêmasî ya wan hevalên ku li himberî zimanê kurdî bi guman in, bi xwe ye. Ez hêvî dikim ku dê ev heval ji niha pê ve li ser vê helwesta xwe rind mijûl bibin, da ku bi saya vê mijûlbûna xwe rastiya zimanê xwe bibînin.

Bêguman dijarî û astengî li pêşperî geşbûn û balbûna zimanê me zehf in. Li gora min astengiya herî mezin ku li himberî zimanê me dibe kelem, nîrê dagirkeriyê bi xwe ye. Pîkolî û çavsoriya hêzên dagirker li ser hemû hebûnên me yê netewî û civakî dibin hoyê serkutkirin û têkbirina wan bi xwe li seranserê Kurdistanê. Lewra siyaseta hêzên dagirker li ser hîmê înkarkirin û qedexekirinê tê birêvebirin. Ji ber vê yekê jî, zimanê me weke ku mirov hêvî dikir nepişkivî û di navbera rewşeke parastinê de hebûna xwe domand.

Li gel vê yekê jî, divê ku em weke ronakbîrên Kurdistanê ji sextî û dijwariyên ku li himberî pişkiwandina zimanê me ne, netirsin. Ji ber ku pîrraniya gelek kêmasiyan bi me ve girêdayî ye. Heger ku ta roja îro em ne xwewdiyê alfabayê standart in, gunehê me bi xwe ye. Di vî warî de, mîna ku ji rewşenbîrên me dihate xwestin, rola xwe ya dîroki neleyzî in. Me tiştên piçûk gelekî mezin kirin, yên ku ji me re bi kelk (fêde) bûn jî, me tu girîngî neda wan. Ji bo danîna kumikê li ser hinek rîpan (herfan) me bi salan gotûbêj - çi di warê devkî û çi diwarê nivîskî de - li dar xistin. Bi ya min van gotûbêjan ji çareserkirinê bêtir, alozî û tevliheviyê bêser û bin bi xwe re afirandin. Ji dêvla vê yekê, divê ku em dezgehên netewî ji xwe re damezrînin, da ku ev dezgehên netewî bikaribin pîrsgirêkên me yên netewî û civakî çareser bikin.

Kêmasiyêke din ku bi me ve girêdayî ye, sistîfî û qelsîtiya xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî bi xwe ye. Bi rastî jî, gava ku mirov li nav rûpelên ku qaşo ji aliyê rêxistin û partiyên me kurdan ve tên derxistin, dinêre, hingî mirov bi çavên serê xwe baş dibîne, bê rewşa zimanê me çiqas wêran û bêxwedî ye. Ji bo vê yekê jî, divê ku rojname, kovar, biroşîr û belavokên ku ji aliyê rêxistinên me kurdan ve tên derxistin, divê ku bi xwerû bi zimanê kurdî bin, da ku em jî weke neteweyên din bibin xwedyê çapamanîyê netewî û bi reng gelêfî. Pîrsgirêk bi vê yekê jî çareser nabe. Bi çi awayî dibe bila bibe, divê ku em kanalên belavkirina çapamanîyê bibînin, da ku kovar û rojnameyên me bigihine çîn û refên ji hev cuda yên civata gelê Kurdistanê. Herweha, divê ku sazî û dezgehên me yên netewî bi awayekî aktîf bibine piştgir ji bo nivîskarên ku li ser kultura me ya netewî mijûl dibin, da ku ev nivîskarên me xwe bi tenê nebînin û di kar û barên xwe yên rojane de sist nebin.

Warekî din yê ku edebiyata me tê de qels û lawaz e, rexna edebî ye. Ji xwe, weke ku tê zanîn, karmendîya (wezîfa) rexnê ew ku berhemên edebî bi hemû aliyên wan analîz bike, rûmeta wan ya edebî pêşkêşî xwendevanan bike. Ango, di destê pêşî de amanca rexnê ew e ku bi hemû awayî di warê jiyana hunerî de bibe piştgir ji bo xwendevanan. Rexnegir bi alîkariya rexna edebî nêrîn û ramanên xwe yên di derbarê berhema edebî de bi awayekî bi rêk û pêk zelal dike. Bêguman bi alîkariya vê zelaliyê jî, berhema / hunerî bi gelek alî tê nixandin. Bi saya vê yekê jî, ji alîkî ve rexne dibe piştgir ji bo xwendevanên hêja, ji aliyê din ve jî rexna edebî dibe alîkar ji bo nivîskarê berhema edebî bi xwe. Lewra bi saya rexna edebî nivîskar kêmasiyên xwe yên ku di prosesa hûnandina berhema edebî de peyde bûne, hîn dibe.

Lê gelek mixabin, li ba me rexne bi awayekî din tê birêvebirin. Pîrrê caran rexna edebî ji kirasê xwe derdikeve, dibe aletek di destê rexnegirî de ji bo bi cih kirina

meremên xwe yên siyasî, rêxistinî û êd. Ji xwe mîna ku tê zanîn, rexneya bi vî awayî tu kelkê (fêdê) nade tu kesî: Ne xwendevan, ne nivîskar û ne jî xwediyê "rexnê" bi xwe.

Li gel kambaxkirin û wêrankirina dijmin ya bêqadar û kêmasiyên me kurdan - mîna ku bi kurtî li jor hatin şirovekirin - dîsa jî edebiyat û zimanê me ber bi geşbûn û balbûnê ve diçin. Lewra roj bo roj nivîskar, rojname û kovarên me kurdan - çî li welêt û çî li derveyî welêt - pirtir dibin. Bi saya vê yekê jî, zimanekî ku roj bi roj ber bi standartbûnê ve diçe di navbera me kurdan de peyde dibe. Êdî hêdî bi hêdî termînolojiyêke edebî ya ku ji aliyê kovar û rojnameyên me ve tê bikaranîn, hevpartir (muşterekî) dibe. Lê belê, ji bo ku ev hevparbûnî bê tekûzîkirin, divê ku rewşênberîn me bi awayekî bi rêk û pêktir xwe çalak bikin, da ku ziman û edebiyata me di warê hemû jiyandê de geş û baltir bibe.

Warekî din yê ku têde ziman û edebiyata me ber bi pêşketinê ve diçe, hîlbijartin û awayê hunandina naverok û forma berhemên edebî yên ku ji aliyê nivîskarên me ve tên berhem kirin bi xwe ye. Bi rastî jî, gava ku mirov romana Mustafa Aydogan ya bi navê "Pêlên Bêrîkirinê", an jî romana Mehmet Uzunî ya bi navê "Siya Evînê" dixwîne, hingî mirov dibîne bê çawa nûjentî di naverok û forma van berhemên edebî de hatiye qafeltin. Lewra van berhemên edebî kirasê kevneşopîya edebiyata kurdî qetandine û nûjentî di warê form, naverok û mijarê de di xwe de bi war û cih kirine. Bêguman mirov bi hêsanî dikare vê yekê ji bo şîrên Rojen Barnas, Jan Dost û Gundî re jî bibêje. Lewra şîrên wan li gora pîvanên nûjentiye tên berhem kirin.

Herweha pêşketin di warê rastnivîsandinê de jî roj bi roj bi awayekî erênî serrasttir dibe. Mîna ku tê zanîn, di warê serrastnivîsandinê de rewş aloz e û weha diyar e ku dê pirsgirêka rastnivîsandinê bi saya serê zimannasên me bidomîne. Lewra bê çawa hêzên me yên siyasî nikarin xwe di warê netewî de bikine yek, herweha ev yek ha xwe di warê çandî de jî diyar dike. Ez hêvîdar im ku dê pisporên me yên zimannas di demeke kurt de bi awayekî çalak dest bavêjin van pirsgirêkên me û bi awireke hevçaxî wan çareser bikin. □

# Werin birano!

Were, were hundurê min  
Bigere di cîhana min a tarî de  
dûrketin

xerîbî

bîrkirin

Binere

Li dûr binere

Dayikek xwîn digirî

Hêsiyan dirijîne

Nav ava Firatê

Ava Dicle sor bûye heval

Ew diya min e

Diya te ye

Ew dayika kurda ye

Wê şîrê pêsîra xwe daye me

Em ji dijmin parastine

Lê îro ew girtî ye

Bi zincîran hatiye girêdan

Werin birano

Hêviya wê ya bilind neşikînin!...

**ÛSO KURDMAN**

# Mirovan ji helbestvanan hez kirine



## SÜLEYMAN DEMİR

...

*lê di siya dara ku dibîşkive de*

*pîrs hîna wek tebdîtekê heye:*

*Ma tu li dijî ya li gel î?*

*Ez li gel im.*

*Ez li gel im heger kirin baş be.*

*Ma ev bersiv e?*

Lars Forssell

Sandor Petefî hate dinyayê, bû helbestvan û xelkê jê hez kir. Sandor Petefî, helbestvanekî macar e. Sala 1849-an di şerê bi avûstûriyan re de hat kuştin. Wî çaxî hîna 29 salî bû. Lê gihabû ku bibe ezîzekî ber dilê macariyan. Tê gotin ku demeke dirêj, macariyan bawer nedikirin ku S. Petefî miriye. Bawer dikirin ku sax e û ku wê rojekê li deriyê wan bixe û bê bibe mêvanê wan. Ji ber wilo jî, demeke dirêj gellek malbaran, gava şîva xwe rû dikirin, sênîk û kevçî ji bo wî jî li ser masê radi-xistin. Ji bo ku gava bihata û bibûya mêvanê wan, jê fedîkar derneketina, şîva wî û cîhê wî jî amade bûya.

Gava min ev çîroka macariyan û S. Petefî bihîst, hêsir ketin çavên min. Ez tê ramiyam û min hewcedariya ku ez vê nivîsê binivîsim dît. Ji ber ku rewşa me bi xwe rewşeke ku min gellek caran diramîne. Û çî gava ez tê ramiyame, ez di ber qolincên bêhêvîtiyê re, êşa şerma rewşa kamax girtiye dora dilê min...

Macaran gellekî ji Sandor Petefî hez kirine. Hezkirineke bêpîvan e. Gellek miletan ji hin helbestvanên xwe pîrr hez kirine. Helbestvan bi pîrranî hatine hezkirin. Ev yek, seranserê dîrokê ji bo helbestvanan bûye xelata herî bilind a ku helbestvan bikaribin bistînin û nikare bê sedem be.

Gelo çima helbestvanek dikare wilqasî bê hezkirin? Gelo çima helbestvan hatine hezkirin? Bê guman ravekirineke vê ya dîrokî heye.

Helbestvanî, hêla lîteraturê ya herî kevn e. Berî nivîsandinê heye. Çi qasî berî nivîsandinê heye, ev yek bi esehî nayê zanîn, lê tê zanîn ku pîrr kevn û berî wê ye. Di jînê de pîrr zû berhem dane mirovan û jîna wan hêsantir kirine. Mirovan pîrr bi hêsantî ji helbestan fam kirine û qebûl û hez kirine.

Helbestvanî bi qasî klambêjiyê kevn e. Klambêjî ji destpêka jîna mirovan ve heye. Ji bo ku klambêjî bihata gotin, gotinên rêzkirî û lihevduhatî hewce bûn. Wir destpêka helbestan e. Wir destpêka hevdupeydekirina wan e. Gellek caran rast ji bo hev hatine afirandin. Helbestvanî û klambêjî wilo bi hev re xurt bûne û hevdu xurttir kirine.

Her demê mirovan rûmeteke pîrr mezin daye helbestvaniyê û klambêjiyê. Demekê, helbestvan, klambêj jî bû. Û her wilo, klambêj jî helbestvan bû. Îro jî dikare wilo bibe. Ji ber ku klambêjî, bê helbestvaniyê nabe.

Berê, ew hêla mirovan a afirandinê û gotinê, wek daneke ji xwedan dihat dîtîn. Kirineke payedar û pîroz bû. Ne karê ku her kes bikaribe bike bû. Ji ber wilo jî di dema yûnaniyên antîk de, ji klambêjan re, »klambêjê xwedayî« dihat gotin. Rûmetdaneke bilind û hezkirineke mezin di wê navhildanê de hebû.

Lê ne wan tenê hez kirine û rûmet dane wan. Gava bi dû re helbestvanî xurttir û bedewtir bûye, mirovan dîsa pîrr, lê bi awayekî din ji wan hez kirine. Gellek caran pîrr pîrr hez kirine. Pûşkîn, ezîzê ber dilê dinyê tevî ye. Nazim, ê ber dilê kurdan û tirkên û gellekên din e, ê dinyê ye. Nerûda, Lorca û Aragon ên dinyê tevî ne. Hin li welatê xwe tenê pîrr hatine hezkirin. S. Petefî yek ji wan e. Lê rûmeteke wilo bilind wek S. Petefî, besî helbestvanekî ye.

Carnan, li hin welatan, desthilatdaran tade li klambêj û helbestvanan kirine. Lê dîrokê tu caran ew kirin û ew tade rewa nedîtine. Me mirovan ji serî ve biryara xwe daye ku divê desthilatdar destên xwe nedin wan. Desthilatdaran ji ber çî sedemê tade li wan kiribin û ew kuştibin jî, dîrok û mirov dîsa li klambêj û helbestvanên tadelêhatî xwedî derketine. Belkî hin caran nîkatîbûn wan ji kuştine xelas bikin, lê navê wan bilindtir kirine, peykerên wan çikandine, ew hîn bêtir xwendine û rûmeta ku hêjayî wan bû xelas kirine. Bi qedexekirina berhem û rûniştina N. Hîkmet a



li Tirkîyeyê, wek ku dewletê hevî dikir ew ji bîr û dilê gelên kurd û tirk neavêt. Ew hîna bêtir li ber dilê tirkî, kurdan û hemû xwendevanên wî mezintir kiriye. Kuştina Víctor Jara, O. Mendelstam, F. G. Lorca û ên din, ew li ber dilê me mirovên dinyê pirr şêrîntir kirine. Û her wilo kiriye ku berhemên wan bêtir bên xwendin û guhdarkirin.

Divê ev yek wilo be. Ji xwe heger ku di seranserê dîrokê de ne wilo bûya, bê guman ya wê helbestvanan nikarîbûna rastî bigotina, helbestên ku em îro ji wan hez dikin û bi wan serbilind dibin biafirandina. Wê helbestvanî bûbûya rêyeke pesindana desthilatdaran û ya jî wê desthilatdaran cesareta ku gellek helbestvanên din bikujin, bidîtina. Ev merc û rastî ji bo hemû rewşenbîran wilo ne. Lê dîrok ne wilo hatiye. Azadiya ramanan û huner her hatiye parastin. Ji ber wilo gellek caran desthilatdaran newêrîbûn wan bikujin.

Lê mixabin, li gor ku tê gotin, dîsa jî helbestvan, ji nav grûpên rewşenbîrên ku seranserê dîrokê hatine kuştin, ên pirtir in. Ev yek jî, ji ber ku helbestvan, pirr zû ji nav gel bi xwe derketine û her demê di rêza xebatê a herî pêş de, merama gel û welêt a herî sereke û pirsgirêkên herî bingehîn, bi gotinên herî eşkere gotine ye. Ji doza welatan û gelan re bûne berdevk û aqilmend. Helbestvan bûne mirovên ku êşên jîne dikişînin bi xwe. Mirovan, xwe di helbestan de dîtine û xwestine li gor pêşniyarên wan guhertinan di civatê de bikin. Û her wilo, ji ber ku helbestvan, derdên nava dilê xwe jî bi dilovanî û eşkere dinivîsin, gellekî nêzîkî xwendevanên xwe dibin. Mirovan ji ber vê yekê ew parastine.

Ev yek, rudaneke ku helbestvan dikarin pê serbilind bibin. Û bi payedarî, 'divê wilo be, ji ber ku me ji bo mirovan gellek tab diye û xwîna xwe rijandiye', dibêjin. Û her wilo, helbestvan, ji ber vê rûmetê, bi cesaret in. Diçin ser bêrêti û xerabiyan. Dibêjin û eşkere dikin. Ev yek piştgiriyê ji mirovan digire. Lê ne hew wilo tenê ye.

Min di »hêza helbestê« de, serpêhatiyeye P. Nerûda xwend. Bi serbilindî wilo dibêje (ez gotina tevî wernagerînim, lê ez ê naveroka gotina wî derxim:

Ez û çend hevalên xwe, êvarekê li Santîago çûn kabareyekê. Li cîhê dansê du keleşên navdar hebûn û xwe pirr bêedeb dikirin. Yek ji wan pirr bêcîr bû. Bi zend û bend û bi qewet bû. Berê boksor bû. Dans û kêfa wir hilweşandin. Tu kesan newêrîbû wan rawestîne. Ez pirr aciz bûm. Ez wî çaxî hîna helbestvan û xortekî nûhatî ye xwendekar bûm û ez zeîf wek darikekî bûm. Ez rast çûm ser wan û min xeberên giran ji wan re dan. Min, ji vir biqêşitin, got. Li hevdu nerîn, û bi dû re bêdeng ji wir derketin. Guhdaran, ji çar aliyên kabareyê pîrozbahî û vexwarin ji me re şandin. Me şeva xwe xweş kir. Lê bi dû re min bihîst ku ê herî girs li devê derî rawesti-

yaye. Ez ketim tirsra ku gava ez derkevim, wê têra min li min bixe. Hevalên min re-  
vîyan, çûn polîsan bînin. Lê gava ez derketim, tu tiştê nebû, hat û xwest ku ez wî  
ji ber kirina wî efû bikim.

Mêrik dest pê kir û xeberên xerab ji xwe re dan. Helbestvanê ku ez wilqasî jê hez  
dikim li hemberî min e û ez li hemberî wî wilo bikêrnehatî derdikevim. Destgirti-  
yeke min a paqij heye. Me bi alikariya helbestên te ji hev hez kir.

Serpêhatiya P. Nerûda û ê keleş kêm zêde wilo bû. (Ên ku bixwazin tevî bixwî-  
nin, di di pirtûka Saf Şiir Yoktur de heye.)

Bilindiya rûmeta ku helbestvanî dikare bide mirov, wilo ye. Hêza ku helbest di-  
kare bide mirov, wilo ye.

Bi hêsanî dikare wilo û wekî din bibe. Ji ber ku helbest, bi peyvên ji hêla navero-  
kê ve giran, hevokên tîr ava dike. Gava helbestvan lê dike, êşa ku ji ber dikişîne, ve-  
naşêre. Derd û mexseda mirovan di nava xwe de his dike û dibêje. Bi dilovanî der-  
dên mirovan dike ên xwe û dibêje. Mirov vê dibînin, his dikin, qebûl dikin û ji  
wan hez dikin.

Gellek daran gava programên televîzyonê yê dokumenter di derheqa Olof Pal-  
me de derdikevin, programeke munaqaşeyê ya ku pirr bala min dikişîne derdixin,  
niha dîsa tê bîra min. Dibêjin ku Olof Palme gotarvanekî zîrek bû. Ên li hemberî  
xwe perîşan dikirin. Ew her neheq derdixistin.

Di wê programê de Vîlhelm Moberg (nivîskarekî swêdî ye) li rêza pêşiya O. Pal-  
me a bi kursiyekê duduyan li destê wî yê rastê rûniştibû. Wî çaxî O. Palme serok-  
wezîrê swêdê bû. Gotin germ bûbû. V. Moberg li xwe fitilîbû û destê xwe dibir ber  
pozê wî û bi dengê bilind bi ser hildibû. O. Palme xwe qijilandibû, bi dilovanî di-  
beşîşî û li ber digeriya ku bêhna xwe fireh bike. Lê V. Moberg qet aş nedibû, bêtir  
bi ser hildibû.

Ne O. Palme û ne jî temaşevan û guhdaran şaşiyek di kirina wî de diditin. Ni-  
vîskarek bû, karîbû wilo bikira, diviyabû wilo bikira. Çavdêr û parêzgerê berjewen-  
diyên welêt bû. Ê ku xeterên ku karîbûn bèn serê wan diditin û ji wan re digotin  
bû.

Bêguman Saddam Huseyn tiştêkî wilo qebûl nake, yekî nivîskar nikare wilo lê bi-  
ke. Gava bixwaze wilo bike, heger wî nekuje jî, wê wî di hefsê de birizîne. Ne ji ber  
ku ji O. Palme mênxastir ya jî xurttir e. Ji ber ku zalim û cahîl e. Pîvan ev e. Ū bê-  
guman Saddam li dinyê pirr in.

Li gor agahdariyên ku T. Sâfve dide, rojekê ji rojan, A. Lûnaçarskî (wezîrê per-  
werdekirinê) û Mayakovskî bi hev re çayê vedixwin û diaxivin. Gava dor tê galga-

lên ku Mayakovskî ji bo Yagoda (li Moskovayê, şêfekî polîsan ê bilind ê dema sov-  
yetan, ku bi kuştin û zalimiyê dihat naskirin) û zilamên wî gotibûn, Lûnaçarskî, tu  
giran diaxivî, ez jî nikarim te xelas bikim dibêje, Mayakovskî, ez ji wî mezintir û  
xurttir im, rêzên helbestên min ji polîsîn wî pirtir in... ew ê min biparêzin, dibêje.

Xuya ye rastî ew yek bi xwe ye. Li gor ku îro derdikeve, Yagoda û ên wek wî her  
bi dû Mayakovskî de bûn, lê ji ber tîrsa rêzên wî û xwendevanên wî, newêrîbûn  
nêzîkî wî bibin. Mayakovskî ev yek bi esehî zanîbû û ji ber vê yekê bi cesaret digot  
û dinivîsî. Lê carnan xwînêrêjî dibe rêyeke parastina desthilatê. Zordarî nayê zefî.  
Wî çaxî li rêzan û xwendevanan guhdarî nake. Wî çaxî îcar êrîşî her babet rewşen-  
bîran dike. Li hin deran helbestvan herî zû dikevin ber wî darê zora wan.

Ez nikarim bêyî ku çend gotinan di derheqa rewşa kurdan de bibêjim, dawî li ni-  
vîsa xwe bînim.

Gava mirov bala xwe dide rewş û aktîvîtên kurdan ên di vî warî de, mirov gellek  
caran şerm dike. Cehaleteke pirr mezin derdikeve ber mirov. Hinên ku bawer in  
ku siyasethanên pirr jîr in, serketinên mezin diyarî me kirine û ji ber wilo jî em he-  
mû deyindarên wan in, dikarin cesaret bikin û bi rêya medyayê ji nivîskaran bix-  
wazin ku wilo ya jî wekî din binivîsin û bibêjin, ya jî nenivîsin û nebêjin.

Lê divê qet neyê jibîrakirin ku pîvanek ji pîvanên kubarî, xurtbûn, mezinbûn û  
pêşketina miletekî, bi doşa hezkirin û qebûlkirina çand û ên ku wê diafirînin der-  
dikeve. Bi piştgirî û azadiya ku bikaribe bide wê û wan derdikeve. Gava hewce bi-  
be, bi parastina ku civat bikaribe li wê û wan bike derdikeve.

Biserketin û mezinbûna nivîskarên welatekî, bêguman berî hemû tiştan bi hêza  
berhemên wan e. Lê heger xwendevanên wan li wan xwedî dernekevin, ne karin  
bijîn û ne jî karin bi tu awan mezin bibin. Heger tirkên Orhan Pamûk nexwendî-  
na û ew li ba xwe mezin nekirina û ew pêşkêşî dinyê nekirina, wê di qada lîteratura  
dinyê de qet mezin nebûya. Hejmara çapaYênî Hayat a li ba min, pêncî û şeş e. Bi  
hemû çapan ne pirr pirtûk hatine çapkirin û firotin. Lê li gor Tirkiyeyê gellek in û  
têra ku mezin bibe dikin.

Ez rewşa weşanên kurdan hinekî dizanim. Lê piştî ku min pêşgotina birêz Firat  
Cewerî a Nûdema 22.an xwend, ez baştir di rastiya di vî warî de gihîştim û ez dika-  
rim êşkere bibêjim ku ez bi xwe nikarim di vî warî de hêviyekê di dilê xwe de ava  
bikim û bibêjim ku rewşa kurdan dikare mecala mezinbûneke wilo bide hinên ku  
ji kurdan derkevin. Ji ber ku xwendin di nav kurdan de pirr sist e. Gellek caran sta-  
tîstîk mirov ditirînin û mirov digihîje bawerîya ku kurdan kîrîna berhemên bi  
kurdî û xwendina bi kurdî bojkot kirine. Otomatîk wek ku dewlet dixwaze bûye.

»Xwendin bi kurdî nabe«. »Kurdî ne zimanê xwendinê ye«. Rewş li gor dilê dewletê ye. Xwendin bi tirkî dibe. Li Tirkiyeyê, çend kesên wek F. Dilgeş ku wek Hektorê Prîamos bi dilêrî li hemberî xeterê radiwestin, tu serketinê nade kurdî. Ji ber ku partî û siyasetên kurdan ên li Tirkiyeyê, hindik tişt ne tê de, hemû înfomasyona xwe bi tirkî dikin. Kurdan bi vî awayî mecbûrî xwendina bi tirkî dikin. Eşkere ye ku ev yek, zimanê me bêtir têk dibe û kurdan bêtir fêrî tirkî dike. Tiştê ku dewlet dixwaze jî, ji xwe ev e. Gelo gava hin bibêjin ev yek hevkarîyeke bi dewletê re ye, tiştêkî gellekî şaş dibêjin?

Divê em kurd yek yek ji ser vê xeterê vekîşin. Divê em li zimanê xwe xwedî derkevin. Heger em îro wilo nekin, em ê sibe nikaribin ji nîşê nû re bibêjin va me zimanê bav û kalan ji dijminan parast, me anî û em diyarî we dikin, de hûn pê biaxivin.

Welatperwerî, îro me dixê bin barekî wilo. Divê em dereng nemînin. Divê em pê rabim û bigihîjin hewara zimanê xwe. Divê em pê bixwînin û biaxivin. Divê em tiştên bi kurdî bikirrin, bixwînin û belav bikin. Û her wilo tiştên ku kurd bi tirkî didin me boykot bikin.

Mirov gellek caran dibihîze ku tê gotin ku nivîskarên kurdan tiştên ne baş dinivîsin. Ne pirr ecêb e. Dibe. Tu kesên ku bikaribin baştir binivîsin tune ne. Hêza me kurdan ev e. Em hîna nikarin nivîskarên »baş« bigihînin. Em nikarin hinan ji deverin din deyn bikin. Divê em bi ên ku hene qail bibin.

Rastî ev e. Lê ez bi hêsanî karim bibêjim ku nexwendina kurdan ne ji ber vê yekê ye. Ên ku tên wergerandin jî nayên xwendin.

Gava em nikarin dused pirtûkên J. London, dusedên Pûşkîn, dusedên Dostoyevskî û dusedên Mayakovskî bikin, divê em baş di pêşeroja xwe û a zimanê xwe biramin.

Li vir divê mirov sê tiştan ji bîra neke:

- 1- Zimanê ku pê çand û lîteratur neyê afirandin, nikare bijî.
- 2- Çand û lîteratura ku tê çapkirin neyê kirîn û xwendin, nikare bijî.
- 3- Hêza mejiyê neteweyekî nikare ji hêza çand û lîteratura wî mezintir be. □

## Le xo gerran

Kesê be ballay xemim egrêr u  
 kesê leber gellarrêzanî pêkenîna cêyek  
 bo rohî tasawim ekatewe.  
 Kesê einbatewe bo satekanî pêş ledayikbûn u  
 destim enêre nêw destî firîştekanî mergewe.  
 le diyarî pakî xoşewîstiyim daebirrê u  
 be derbarî naaşinayanî diwênê u sibeynê espêrê.  
 Kesê dergayekî dillî xoy be rûy xewne lêllekanima  
 ekatewe u be bezeyî u sozey giryan,  
 matemînîm daepoşê.  
 Le sate mestekanî tenyayî u xobînînda,  
 kesê rûberûy tewijmi jîn u  
 gêjellûkey têkellbûnim ekatewe.  
 Kesê ebêre berdebazî rêm u  
 berew kenarekanî bêdengî u  
 nêw xêwetî tenyabûnim ebatewe.  
 Minîş lem tarîkistanî nebûn u hebûneda,  
 leduy Nakesê egerrêm,  
 ber peyekanim roşin ka u  
 tallê le nûri ciwanî xoy Leser çawanîm cê bêllê.  
 Kesê be ballay riqim egrêr u  
 kesê be ballay billindî xoşewîstî.

1996/7/25

## Gullistan

Ke baranî her ciwaniyek le rûm eda,  
gullî eşiqî lenêw cawima ekrêwewe u naxim  
ebê be gullistan.  
Rohîş be şîney berbeyan.

1996/5/7

## Gull!

Gullêk: bo qijî kallî to.  
Gullêk: bo nêw destekanî mallawayî.  
Gullêk: bo ew cêmaçaney lenêw çaw u larrûmetan,  
becêm hêştûn.

: bo bawêşî ew kollaney, êwareyek le girrî eşiqî girtîn u  
ta sûtanî ballindekanî evîni nêw laney dill,  
le pallmanewe dagîrsa.

: bo şîney ew nerme bayey simay pest u satekanî  
xeminî, le boy beharan egirtîn.

Gullêk: bo ew pepûlaney, be rengalley xewinekaniman,  
ballekanyan terr ekird u pelkezêrrîney şadyân,  
be sermana daebaran.

: bo gulldanî ew şewaney, ber lewey girrî cudayî  
kîspe le delliman hellsênê, awêzanî yek ebûyin u  
le rûbarî tînuv yekiman exwardewe.

Gullêk: bo nêw destekany mallawayî.

Gullêk: bo ew cêdestaney leser sing u  
lenew ranan becem hestun.

lenêw şewî dilla gullêk,  
bo birîskî çawekanit erriwênim u  
pencereyek bo sîmay pakaî ayînde,  
bo dîdarî kilûy xewne allekaniman,  
ekemewe.

Gullêk u to diwa gull u taqe gullî,  
ballat lenêw destekanima gewre bûbê,  
gewre bibê.

Gullêk: bo ballay to.

Gullêk bo nêw destekany mallawayî.

1992/3/21

# Sê kurteçîrok



HELÎM YÛSIV

**W**ê şevê hevalekî min ketibû derya bîranînên xwe, xwe di nav de winda kiribû. Pala xwe dabû dîwarê rojên çûyî û bi germî dest bi bûyerên jiyana xwe kir. Bûyerên jiyana xwendevanekî li Zanîngeha Helebê. Min jî nexwest ez peyvên wî bibirim. Xwe dirêj kiribû û di navbera Amûd û Helebê de, agir berdabû deh salên zuha û dirêj ji jiyana xwe. Bêhna şewata deh salan ji xewnên vala û hevalên ji tozê, rojên ji dûman û xewê û teqreqa ku emrê reqê pê çûbû xwê.

## Şoreşên odeya biçûk

**S**ala pêşî ez hatim Helebê, min ji bîlî hevalên birayê xwe yê mezin tu kes nasnedikir û ji ber ku ez bê cîh bûm û wan xaniyekî ji sê odeyan kirê kiribûn, ez bi wan re bi cîh bûm. Tevde xwendevann kevn bûn. Her yek çar, pênc û deh salên wî li zanîngehê derbas bibûn. Em çar bûn, mal jî sê ode bûn. Odeya herî biçûk dane min. Ode bi textekî bû û di quncikeke mirî de bû. Vê bicîhbûnê ji hêlekî ve hinekî ez rehet kirim ji ber ku min nizanibû tu xwarin çêbikira. Karê min kiribûn anîna

rojname û kovaran û hinekî bi min zor bû ku tevda bi çavekî biçûk li min dinêrîn û ditirsyan ku ez winda bibim. Ji bilî riya mal û zanîngehê min tu dever nasnedikir û ji pêvî siyasetê tu axaftin li ber min çênedibûn.

Rojekê xortekî ji wan ez kirim kêlekê û ji min re got:

– Ez dixwazim tu odeya xwe ji me re vala bikî.

Min serê xwe hejand û di cih de ez têgihîjim bê çî dixwaze. Dan û stendinên wan û birayê min ên li mala me li Amûdê hatin bîra min. Bi germî bi siyasetê mijûl dibûn. Ez jî hîn wê çaxê diçûm dibistanê. Navên mezin, qelew û biyanî li ber min dihatin gotin; Gîvara, Şêx Seîd, Lenîn, Barzanî, Stalîn û Batris Lumumba.... Mîn jî tim ji xwe re digot:

– Ya Rebî ezê kengî mezin bibim herim zanîngehê û van navan ji nêzikayî nas bikim!?

Ji ber vê min nepirsî odeya min çima ji min dixwazin, hew min pirsî:

– Ji çend heta çend?

– Dora pênc–şeş demjimêran.

Min roja xwe li kolanan qedand. Tê bîra min ez winda bûm û ez ketim deverekê ku ne pêjna mirovan û ne jî pêjna lawiran dihat. Tevde avayiyên bilind û dar û pelên weşyayî bûn, ez û ramanên xwe me bi hev re avjenî dikir. Xweşiyekê hinavê min digirt. Kêfxweşiya min ew bû ku hetanî wê meşa min î vala di ber welat û civî-nên xortan de ye. Ez pir ji xwe razî bûm ku pênc–şeş demjimêran ez li ser lingan şîpya digerim ji bo ku civîn li odeya min çêbibin. Ma çî ji wê xweştir e ku mala mirov têkeve xizmeta welatê mirov. Dawî ez bi taksiyekê vegeryam malê. Ez ji haw haw ketibûm dema min ji xwe re digot, nuha çî şerekî germ di odeya min de çêbû-ye li ser helwestên partiyan û siyasetê û navên biyanî û qelew nuha bi sedan hatine zimên.

Civîn qedya bû. Lê tiştê bala min kişand ku bêhneke xweş û xwedayî ji mitêl û doşeka min dihat. Ez wê şevê bi wê bêhnê serxweş ketim û ez nema zanim çawa ez di xew re çûm û ramanan serê min dikolan. Gelo bêhna berpîrsê partiyê ewqasî xweş e? Gelo di hemû civînan de wê bêhna xweş bi ser xwe dadikin û tîn civîne. Her ji du rojan carekê ji min dihat xwestin ku ez odeya xwe vala bikim. Min ji bo wan baweriyên û wê bêhna xweş ya ku bi doşeka min ve dima, min dixwest ez odeyê vala bikim. Hetanî ku rojekê ez zû vegeryam mal, dengê vebûna derî hat min û pişt re dengê lingê qîzekê hêdî hêdî li ber guhê min ket, wê gavê min nas kir ku ew civînen germ û dirj û ew bêhna xweş ji ku dihat û çima her tim doşeka min li dû xwe şil dihiştin. Ji wê gavê de çûna civînan li min bibû hesret. Min gazî Xwe-



dayê jor dikir:

– Xwedêyo tu riya civînan li ber min vekî!

Pîştî deh salan hevalekî min î kevn birayê xwe yê biçûk anî xaniyê me yê bi kirê û ji min re got:

– Ev birayê min xêşim e, sala yekê ye, hayê we jê hebe.

Min ji xwe re got, ji sedî sed berî deh salan birayê min jî wilo ji hevalên xwe re digot ku ez xêşim û bîra tiştêkî nabim.

Me odeya biçûçik dabû birayê hevalê xwe ê biçûçik û her ji du rojan carê me jê re digot:

– Ji kerema xwe re odeya xwe ji me re vala bik... civîna me heye!

## Çavên bavê min

Çavên bavê min pir qels bûn. Her ku ez diçûm malê giliyê xwe bi min dikir.

– Lawo ne textorên Helebê bin, çavên min rehet nabin. Textorên Amûdê nika-rin tiştêkî ji bavê te re bikin.

Carekê ji diya min re got:

– Karê xwe bike, ez û tu, emê bi lawê xwe re herin Helebê ser textorê çava.

Diya min kiras û xefranekî nû dirût, hûçkên xwe li ba kirin û da benda bavê min û bi min re berê xwe dan Helebê. Min jî li taxa Suryan xaniyek kirê kiribû. Li qatê çaran, nû min derî vekir, dê û bavê min bi hev re û helkehelk gotin:

– Lawo bi Xwedê ev derence pişta mirov ji mirov dixînin.

Havîn bû, min ji xwe re pencere vekirin, bavê min bi zorê xwest ku dakeve sûkê ji bo kirîna şîvê. Diya min got:

– Lawo li bavê xwe miqate be. Li Amûdê nema ber xwe didît.

Nû em daketin, çîmê keçeke ”derpêkin” –li gor gotina diya min– çavên bavê min pêl kirin. arçav li hawîrdora xwe dinerî, bi kêf ji min re digot:

– Lawo ji pêvî çîm û piyên tazî tiştêk li vir tuneye.

– Na yabo na! Tu ji pêvî çîmên tazî tiştêkî nabînî.

Pîştî vegeerê dengê bavê min zelaltir bibû:

– Lawo ez dibêm qey çavên min rehet dibin!

Min li diya xwe nerî.

– Yadê xuya ye wê çavên bavê min bê textor rehet bibin.

Roja din bavê min ji min bêtir tişt didîtin, her roj digot:

– Lawo em îro jî narin cem textor.

Li ber êvarê, her dem dixwest ew tenê dakeve sûkê. Şevêkê mala li hember me şahiyek li balkona we ya fireh çêkirin. Diya min mat mabû:

– Lawo li vê ecêbê! Tu ji xwe re li piştta wê ya tazî binêre, hema bi Xwedê ev ne misilman in!

Dema ku yên li hember me di nav çinge çinga piyaleyan re rabûn, sema û "slow dance" dest pê kir û dest li gerdên û qirikan geriyan. Devê diya min bi gazekê ji hev vebû û ji bilî gotina "wa weylê, wa weylê!" tiştê nedigot. Gava goştê sipî yên jinên spehî di tariya şevê de diçirisan, çavên bavê min sipî sax bûn û ji me bêtir didît bê çî li hember me dibe:

– Bi Xwedê min go qey ev tişt tenê di televîzyonê de hene.

Kenê bavê min bilind dibû:

– Ti dizanî diya te duh çî ji min dipirsî

– Çî?

– Em nû ketin nav bajarê Helebê, çav li turumbêlên rêzkirî ket, ji min pirsî "Hecî ev daweta lawê kê ye îro evqas turumbêl civandine, ev daweta law wezîrekî ye?"

Wê şevê berê sibehê ez bi bavê xwe hesyam ku çawa wek dizan li serê tilîkan meşiya û ket nav cihê diya min. Min jî xwe kerr kir û min xwe li xewê danî, tevî ku xewa min nedihat. Serê sibê piştî limêjê bibû xirtexirta bavê min:

– Lawo me tu xêr nedît ji temenê xwe. Bi Xwedê em bê mirad çûn çûn. Bi Xwedê tirên li me qelibî!

Bi dû gazinan de, di ber guhê min re diavêt:

– Lawo ka tu dostik mostikên te tunene lawo?

– Çima yabo?

– Ma dilê te bi bavê te naşewite lawo ku heta vî temenî hîn min xweşik û li beroniyê gewdeyê diya te nedîtiye.

Serê xwe li min dihejand:

– Min nuha naskir bê çima tu ji Helebê nayê malê heta ku pere bi te re xelas bin.

Min dikir nedikir ku bavê min bi min re here ser textorê çavan, nema diçû:

– Çavên min rehet bûne, bûne yazde ji dehan.

Rojekê ez ji zanîgehê vegeyriyam ku bavê min û diya min vegeyriyane Amûdê. Piştî çend rojan di telefonê de dengê diya min dihat:

– Lawo çavên bavê te xerabe ne, nema xweşik der xwe dibîne. Were ji bo tu û wî herin Helebê ser textorê çava.

– Erê yadê erê, ez dermanê çavê bavê xwe nas dikim!

## Sênika sincirî

**B**avê Nazê roj bi roj serê sibê derdiket li diya Nazê digeriya –li diya Nazê ya pêşerojê digeriya–, bibû sala dawî û çend meh mabûn ji qedandina salê re. Dixwest di van mehên hindik de xwe bi serî bike, berî ku bi girtina deriyê zanîngehê re deriyê jiyana wî jî bê girtin. Rojê carekê, her car yekê jê re digot: "Tu wek birayê min î!"

Êvarî westiyayî vedigeriya malê û dihejmartin:

– Heta nuha ez bûme birayê heftan. Xwedê zane hetanî sal here serî ezê bibim birayê hemû keçên zanîngehê.

Piştî demekê goreyên xwe yên sipî ji lingên xwe kirin û ew mîna alekê bilind kirin.

– Ez westiyam divê ku ez di vî şerî de stratejiya xwe biguherim...

Ev ramann germ her şev piştî diwazdeyê şevê di serê wî de dikeliyan.

– Ya baş ew e ku ez gotina diya xwe bînim bîra xwe.

Her ku vegeriya gund, ev pirsra diya wî li hêviya wî bû:

– Lawo ka te kes ji xwe re nedîtiye?

Cihokên ramanên wî diherikîn. Diya min digot "Lawo eger tu nêzîkî pîrekan bûyî divê tûrê te yan mişt pere bin yan jî mişt derew bin!" Vêca pee tunene, man derew. Ji bilî derd û bela û bextreşî û deriyên girtî û mala xerakirî, min tiştek ji rastiyê fêhm nekir. Tu ji dil nêzîkî kîjan qîzê bibî wê dil û canê te li ber lîngan bipengîze. Ya rast ew e ku yek xwar bimeşe. Ev zeman tiştê rast têde maye serê gopal. Ez nema zanim çî bikim ji vî dilê xwe yê ker. Ez nizanim kîjan hovî gotiye "Dil dil e, ne sênîk bulxur e!" Hema dilê min bûye teşte bulxurê belawela. Ya girîng ew e ku berî dawîya salê divê ez diyekê ji Nazê re bibînim. Eger nebînim ezê ji heryê çêkim, yan divê dunya xera bibe.

Bavê Nazê rojê zengila odeya keçekê dida. Keçik dadiket, roja pêşî gul bi rû dikietin, ya duduyan gula rû diçirmisîn ya sisiyan stîrî li şûnê derdiketin. Roja çaran dibû metka Nazê, ango Bavê Nazê dibû birayê wê. Roja pêncan nema dadiket, ji wê diçû yeke din. Her şev piştî vegeerê xwe li ser text dirêj dikir û digot:

– Aaaxxx, bi Xwedê hingî min îro derew li vê kirin ez westiyam, ez ji hev ketim, ev sê seetên min e ku ez derewan lê dikim, bêyî ku ez tu sûdê bigrim.

Dem bi ser nîvê şevê diket, germ dibû, hêrs dibû:

– Kuro ev bi yar in û nabêjin em girêdayî ne, dibêjin tu wek birayê min î!

Wê rojê ji nişkê ve Bavê Nazê xwe nas kir. Sênîka krom danîbû ser agir, di cih de sincirî û piştî danî erdê bi demeke kurt sênîk sar bû. Ji xwe re digot:

– Erê ez wek sênîka krom im, bi şev disincirim û bi ro sar dibim. Ev mîrata xeyala min wek agir e, hingî min germ dike, wê rojekê mala min li malan bigerîne.

Lê di bin ronîya rojê de xewn tevde tazî dibin û vedimirin.

Ji wê rojê de navê wî ma sênîka krom. Bavê Nazê mabû di wê rewşê de heranî sal çûbû serî.

Bi şev sincirandin, bi ro sarbûn.

Azmûnên zanîngehê qediyar û hîn Bavê Nazê li diya Nazê digeriya. Xwendevanan tevda karê xwe û vegera malê kirin. Lê pêjna Bavê Nazê nehat. Her yekî ji yê din dipirsî:

– Te Bavê Nazê nedîtiye?

Berê xwe dan odeya wî, derî girtîbû. Bi yek hêz derî vekirin. Tiştêk di bin mitêlê de bû. Yekî got:

– Ev hîn di xew de ye.

Gava mitêl hildan sênîkeke krom î sincirî di nav cihê wî de dîtin. □

# Kovareke xwerû bi Kirdkî (Dimilî): VATE



MAHMÛD LEWENDÎ

**D**estê wan ter be, xwedê ji wan razî be, axirkê li dawiya dawiyê Kurdan -bi derengî be jî- kovareke xwerû bi Kirdkî (Kirmanckî/Dimilî/Zazakî) derxistin. Pîroz be û bêvîdar im jiyana wê dirêj be.

\* \* \*

Di salên beftêyî de gava ku ji bo propagandayê em diçûn gundan, di nav gelek pirsên ecêb ecêb re carna gundiyan ji me dipirsîn: "Erê hevalno, pir baş, we Kurdistan ava kir lê hûnê mesela Dimilî û Kurmancî çawa çareser bikin?"

Ma ji vê hesantir! Bi wî heşê xwe yê bîst salî û tijî xeyal me yekser bersiva wan dida. Û li gor xwe me ew qan'î jî dikirin:

"Pir rehet e lo, ma Kurmancî ewê bibe zimanê resmî, ji xwe Dimilî jî wek folklor û ji bo lêkolînan emê li ser bixebitin!"

Yan jî:

"Ma ev jî problem e! Gava ku Kurdistan çêbe ewê komusyonên ziman werin ava kirin û ew komusyon wê di demeke gelek kurt de van herdu lehçeyan bikin yek!"

Çiqas hêsan û rehet e. Xwezîka welê ba! Bîst sal di ser wê pirsê re derbas bûn. Em hatin Ewrûpayê, bi xêra Ewrûpiyan me hin lehçeyên xwe yên din jî nas kirin: Soranî, Fêylî, Hewramî, Şêxbizînî...

Haya me ji gelek komusyonên ku ji salên pêncehî û vir de li Kurdistana Başûr ava bûne, bû. Ji gelek komusyonên ku li Awrûpayê ava bûne, bû û her weha me bi xwe jî gelek komusyon ava kirin ku xebata hin ji van komusyonan hê jî ber-dewam e. Û van komusyonan lehçeyên me nekirin yek.

Îcar ez nuha difikirim, gelo bîst sal berê haya wan gundiyên ku ew pirs ji me kirin ji van hemû lehçeyan heba û her eynî pirsxa xwe ji me bikirana gelo bersiva me ya wê demê ewê çawa ba?

Ya wê demê dibêjim, ji ber ku nuha hema hema di serê herkesê de bersiveke net yan jî ne-tarî heye ku ji realîteyekê peyda bûye.

Bersiva nuha ya pirsxa wan a wê demê bi a min bi kurtî weha ye:

Tu lehçeyeke Kurdî jî hevûdu ne kêma û ne zêde ye. Dixwaze bila 50 hezar, dixwaze bila 5 milyon kes bi wî lehçeyî qise bikin. Ji bo yê 5 milyonî çî heq hebe ji bo yê 50 hezarî jî di warê bikaranîna zimên de divê her eynî heq hebe.

\* \* \*

Belê ji ber vê yekê ye ku gava ku hevalên Kirdkîxêv (Dimilîxêv) kovara VATE derxistin, pêşî ji derketina wê re kêfa min hat, piştî ku min xwend ji naverok û kalîteya nivîsên wê re kêfa min hat.

Yanê ne kovareke ku "hema bila Dimilî be bila derkeve" ye.

Ji bilî nivîsên folklorîk, stran, bîranîn, werger, helbest, rexne û nivîsên gamedrî, di kovarê de hin fikrên nû yên li ser zimanê Kurdî jî hene.

Mesela yek ji wan ya Haydar Diljen e; "Nuştox, Ziwan û Şexsiyeto Neteweyî" (*Nivîskar, ziman û şexsiyeta neteweyî*). Nivîskar di vê gotara xwe de şexsiyeta neteweyî di zimên de dibîne.... Û dibêje ku bê ziman şexsiyeteke millî peyda nabe. Û divê ku mirov ji îro de bingeha karê sibehî bavêje. Yanê, ne ku mirov li hêviya avabûna Kurdistanekê an jî li benda bi destxistina hin mafên demokratîk bimîne.

Nivîsa din ji alî Cemîl Gundogan hatiye nivîsîn; "Tayê Problemê Standardîzekerdena Ziwanê Kurdî" (*Hin problemên standardîzekerîna zimanê Kurdî*). Nivîskar pêşî bi giştî qala yekîtiya zimanekî dike, piştî re hin nimûneyên hin welatan û milletan tîne ku di dema xwe de wan bi çî awayî yekîtiya zimanê xwe çêkirine. Di vir de gelek faktoran tîne ku ji wan tu yek jî nuha ji bo Kurdan derbas nabin. Ji ber ku ew dewra ku fersenda yekîtiya zimên hebû nema êdî bi dest kurdan dikeve. Yanê rewşa zimanê Kurdî ya ku îro em dibînin ne wek ya dewra zimanê Almanîya Luther e, ku Lutherêkî me jî rabe yekîtiya zimanê me çêbike.

Pişt re nivîskar piçekî qala rewşa zimanê Kurdî dike; lehçe û devokên lehçeyan. Di dawiyê de jî bi kurtî behsa yekkirina lehçe û devokan dike. Nivîskar herçendî piştî hewqas şirovekirinên dûr û dirêj, dibêje ji bo çareserkirinê ezê dîtina xwe bibêjim, lê ji nivîsa wî welê tê fêm kirin ku ew bi xwe jî ne zelal e. Çimkî ew jî çareserkirina meselê ji merheleya ku divê zimanek tê re derbas be re dihêle. Tişteki din î balkêş jî ew e ku Cemil Gundogan di vê nivîsa xwe de heta jê hatiye gotinên ku di Kurmancî û Dimilî de nêzî hev in pir bi kar aniye. Bi ya min jî ev metodeke rast e, ji bo ku di pêşerojê de, herçendî herdu lehçe nebin yek jî, bi kêmanî mirov bikaribe piçek be jî, ji hev fêm bike, riyeke baş e.

Di kovarê de nivîseke din ya balkêş ferhenga Celadet Bedirxan e ku di wexta xwe de bi Kurmancî û Fransî amade kiriye lê heta nuha nehatiye çapkirin. Ji mêj ve ye ku gelek kes qala vê ferhengê dikin, lê ev cara yekem e li vir derdikewe. Malmîsanij di nivîsa pêşkêşiyê ya vê ferhengê de piçekî behsa çîroka bi destxistina vê ferhengê dike ku wî bi xwe ji Şiyar stendiye û li gor gotina Şiyar, Şêx Seîd ev ferheng ji jina Celadet Bedirxan girtiye û teslîmî wî kiriye. Lê gelek heyf ku nivê pêşî yê ferhengê (ji A-K) tuneye. Tenê qismê ku ji herfa K (kone:) dest pê dike heta herfa Z bi dest wan ketiye. Di vê hejmara kovarê de gotinên ji K-L hatine çapkirin. Di ferhengê de gelek gotinên ku îro em di tekstên kurdî de lê rast nayên hene, yan hatine ji bîr kirin, an jî em pê nizanin. Mesela ji wan hinek ev in (tirkiya wan min nivîsiye-ML):

- kuribeşk: lynx (t. vaşak)
- kulang: pioche (t. kazma)
- kurîngan: tréfle (t. yonca)
- kuruşik: tension (t. gerilim, gerginlik)
- lalişîn (bilalije): supplier, implorer (t. yalvarmak)
- lasayî: imitation (t. taklid)
- lasayî kirin: imiter (t. taklid etmek)
- lewlewe: bavard (t. geveze)
- lîtav: marais (t. bataklîk)
- lovik: haricot (t. kuru fasulye)

Di kovarê de kêmasiya ku tê dîtina ew jî neliheviya devok û bin-devokên Kirdkî (Dimilî) ne. Herkesê ku meqaleyek nivîsîbe li gor devoka bajar an jî gundê xwe nivîsiye.

Her çendî di pêşgotina kovarê de hatiye nivîsîn:

"...No semed ra eke ewro nuştoxê ma tena şîweya xo bizanê yan zî ebi şîweya xo binûsê zî ma ganî verra verra giraniyê bidî hetanê muşterekan, formanê raştan û rastnuştana (îmlaya) muştereke ser ke ma bişiyî (biesşkê) lehçeya xo standardîze bikerî..."

"...*Ji ber vê semedê heke îro nivîskarên me tenê şîweya xwe bizanin yan jî bi şîweya xwe binivîsin jî gerek em bere bere giraniyê bidin ser aliyên muşterek, formên rast û rastnivîsîna muşterek ku em bişên(bikaribin) lehçeya xwe standardîze bikin...*"

Bêguman hin gotin hene ku di rewşa zimanê me yê îroyîn de mirov dikare wek devoka xwe binivîse. Lê bi a min di tewandina fîlan de, di zemîrên şexsî de û bi taybetî di telafûza hin gotinan de ne zehmet e ku mirov nikaribe li hev bike. Ne ku mirov rabe binivîse:

ez kena - ez kenû (*ez dikim*)  
almonya - almanya (*almanya*)  
zûn - zon - ziwan (*ziman*)  
umey nîştîş - amey nûştîş (*hatiye nivîsîn*)  
nîştêx - nuştox (*nivîskar*)  
wendêx - wendox (*xwendevan*)  
êrî - ewro (*îro*)  
bi - eve - ebe - ebi (*bi*)  
ciniyûnê kurdûn - ceniyanê kurdan (*jinên kurdan*)

Û dawiya van nimûneyan nayê, lê divê ku mirov bikaribe yekê hilbijêre. Ev yek jî dikeve ser milê civînên (\*) li ser vê lehçeyê.

Dîsa di kovarê de tevlihevîyêke din jî li ser navê vê lehçeyê ye. Her çendî di civîna duwemîn de biryar hatiye girtin ku ji vê û şûn de ewê ji vê lehçeyê re bibêjin "Kirmanckî", lê dîsa jî mirov di kovarê de rastî van navên han jî tê: Kirdkî, Dimilkî, Zazakî.

Lê bi giştî ji alî naverok û kalîteya xwe ve, kovareke biserketî ye. Ez hêvîdar im her berdewam be û ji vê û şûn de Kurmancên me jî bikaribin piçekî zorê bidin xwe daku bi riya xwendina wê hinekî fêrî vê lehçeya me bibin.





"Vate, Kovara Kulturî  
Hûmar: 1 (*hejmar 1, 112 rûpel*)  
Hamnan, 1997 (*Havîn 1997*)

Serredaktor: Malmîsanij

Redaksiyon: Haydar Diljen, J. Îhsan Espar, Cemil Gundogan, Malmîsanij, Mehmet Uzun

Adres: Î. Espar  
Odd Fellowvägen 29  
S-127 32 Skärholmen/Sweden"

Tede (*têde, naverok*)

—Wendoxan rê (*Ji xwendevanan re*)

—Roze ve Roze Pê Ma Xapit - Munzûr Çem (*Roj bo roj em xapiyan*)

—Sêwrega 25-30 Serran ra ver û Tanî Vîrameyinî - Nihat Elî (*Swêrega 25-30 sal berê û hin bîranîn*)

—Dante û Tradîsyonî Îdealîstan - Memo Darrêz

—Rojên bi Rûmet û Ziqnawitî - Çeko

—Veng, Pyec û Zimmeyîş ra Nomê û Fîl - Harun Turgut (*Ji deng û pêjn û zimezimê nav û fîl*)

—Game be Game - Kazim Temûrlenk (*Gav bi gav*)

—Wexto ki Merdim Kitabê Dr. Şivanî Waneno - Osman Aytar (*Wexta ku meriv kitêba Dr. Şivan dixwîne*)

—Çend Dêrî - Seyidxan Kurij (*Çend dûrik/stran*)

—Şewe - Robîn Rewşen (*Şev*)

—Çond Vatê Derbeq Kurdon Almonya di - Hûmanê Çiyan (*Çend gotin derheqê Kurdên Almanya de*)

—Zeynebî, Gulnarî - Sven Delblanc (*wergera ji Swêdî: J. Îhsan Espar*)

—Nuştox, Ziwan û Şexsiyeto Neteweyî - Haydar Diljen (*Nivîskar, ziman û şexsiyeta neteweyî*)

—Tayê Problemê Standardîzekerdena Ziwanê Kurdkî - Cemil Gundogan (*Hinek problemên standardîzekerina zimanê Kurdî*)

—Yew Şîr û Yew Antolojî - Mehmet Uzun (*Şîrek û antolojiyek*)

—Kirmanckî (Kirdkî) Di Suffiksî - Malmîsanij (*Di Kirmanckî/Dimilî de sûf-  
fîks*)

—Derheqê Ferhengê Celadet Alî Bedirxanî di - Malmîsanij

—Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Frensî - Celadet Alî Bedirxan

—Kitabê Kirmanckî (Zazakî)

(\*) Ev serê salekê ye ku platformeke Kirdkîtaxêfan (Dimilîtaxêf) hatiye çêkirin ku li ser lehçeya Kirdkî (Dimilî) kar dike. Hera nuha sê civîn çêkirine. Netîceyên civînan xwe jî wek broşur belav kirine. Kovara Vate jî berhemekê netîceya van civînan e.

ARIF ZÊREVAN

**Bingehên  
rastnivîsandina  
kurdîyê (kirmancî)**

NEFEL

**B**ingehên rastnivîsandinê kurdîyê berhema Arif Zêrevan ya pêşî ye. Zêrevan di vê berhema xwe de li ser bingehên rastnivîsandina kurdî radiweste û bi mînak bingehên rastnivîsandinê şirove dike.

Pirtûka ku bi pêşgotina Michael L. Chyet û ya nivîskêr dest pê dike, ji sê beşên sereke pêk hatiye: Raçandina tekstê, Nivîsandina navên kesan û Nîqteşanî. Nivîskar di "Raçandina tekstê" de li ser paragraf, jêgirtin û veguhostin, teksên xweser, nîşankirin di tekstê de û hwd. radiweste. Di beşa "Nivîsandina navên kesan" de li ser girdek û hûrek, hejmar, tewang, veqetandek û kurtekê tê rawestandî. Di beşa "Nîqteşanî" û ya dawî de jî, li ser valahî, niqte, niqtepirs, niqte-

bang, bihnok, niqtebihnok, niqtecot, xêzika axaftinê, bendik, kevanek û hwd. tê rawestandî. Ev pirtûka ku bi mizanpajekê spehî û bi çapeke bedew derketiye, dikare hem bi kêrî xwendevanên zimanê kurdî were, hem jî mîna pirtûkeke li ber destan bi kêrî herkesê ku bala wan li ser nivîsandinê heye, were. □

# Efûkirin ne karê herkesî ye

## ZINARÊ XAMO

Rast e roman ne dîrok e û meriv nikane wê wek kitêbeke dîrokê bixwîne. Lê li gel vê jî gelek roman hene ku, her çiqas ew ne romanên tarîxî ne, lê dîsa jî li hember civat û bûyerên di dema xwe de bi qasî kitêbeke dîrokê objektîf in. Dîroknas û sosyolog gelek çaran ji berhemên wiha feydeyê mezin dibînin. Ez bi dilekî rehet dikanim bibêjim ku romana Jan Frîdegord, "Porten Kallas Trång" (Derî Teng e) jî romaneke wiha ye. Lema jî ew kesê ku bixwaze jiyana gundiyên Swêd ya destpêka sedsala 1900'î fêr bibe dikane wê romanê wek wesîqeyê tarîxî, wek lêkolîneke sosyolojîk û antropolojîk bixwîne.

Di destpêka romanê de nivîskar întresa meriv qezenc dike. Meriv gav bi gav dide pê bûyer û qehremana romanê û çîroka wê meraq dike. Li hember qedera pîrê û tiştên tên serê wê geh diqehere geh kêfxweş dibe.

Têma romanê li ser jiyana kal û pîreke gundî ava bûye. Kalo û Pîrê wek piraniya gundiyên Swêd yên wê demê gelekî feqîr in, bê erd in û xaniyê wan jî bi kirê ye. Yanî li gund di xaniyê bi kirê de rûdinin. Bi çend mirîşk, mangakê û du-sê berazan bi zor debara xwe dikin. Zarokên wan mezin bûne û ji malê veqetiyane. Lawekî wan li Emerîka ye, keç û lawek jî li Swêd in. Wê demê li Swêd malbata ku yek du kes jê neçûbe Emerîka hema hema tuneye. Di nabêna 1850'î û 1920'î de zêdeyî milyon û nîvek însan ji ber sebêbên aborî koçî Emerîka kirine. Ji ber ku wê demê li Swêd feqîriyake bê hed û bê hesab heyê.

Pîrê sibehekê bi xwe dihese ku vaye kalo di nav nivînan de miriye. Pîrê berî ku şiyar bibe û bi mirina wî bihese xewnekê dibîne. Dibîne ku li qeraxa giravekê ye û mêrê wê (Johan) jî ber tena mîntanekî spî ve, (di rengê kefen de ye) di kelekekê de

ye û hêdî hêdî jê bi dûr dikeve. Pîrê ban dikê, dibêje tu dîn bûyî, çiyê! Tu bi ku de diherî?, vegere, tu'yê biqefilî. Lê Johan lê venagere, û hêdî hêdî di bahrê de ji ber çavên wê wenda dibe. Piştî vê xewnê Pîrê bi xwe dihesê, dibîne ku waye Johan li kêleka wê hişk bûye.

Nivîskarê romanê, Jan Frîdegard realîstekî dîndar e. Wî ev baweriya xwe kiriye baweriya Pîrê jî. Lema jî Pîrê di her biryara xwe de li gor vê baweriyê hereket dike. Lê Frîdegard vê dîndariyê bi hosteyî dixê qalibekî wiha ku her jineke di salên Pîrê de dikane wer bifikire.

Piştî mirina Johan cîran û gundî gotinan digerînin, dibêjin di bin wan de "perê Emerîka" hene. Ev yek dihere guhê Pîrê jî, Pîrê bi rastî jî li peran digere, lê nabîne, dibêje perê çî halê çî!

Pîrê Cenazê Johan ranake, li hêviya zarokên xwe dimîne. Zarokên wê tîn digihîjin ser cenaze. Cenaze radikin. Tiştê balkêş, şîn tuneke, hawar û qêrîn tuneke, kes li xwe naxe, kes porê xwe nakşîne, kes kilamên şînê li ser yê mirî nabêje. Wek merasimeke normal dibin gor dikin. Û piştî gorkirinê xwarinê dixun, şerabê vedixun. Yanî ew urf û adetên ku îro jî li ba me Kurdan hîn pirr xurt in, di destpêka salên 1900'î de em li ba gundiyên Swêd nabînin. Di vir de tiştê balkêş meriv rûbirûyî kultureke cihê dibe û bi hawakî gelek konkîret dibîne ku kultur û tradîsyonên cihê tîn çî maneyê.

Zarok li ser mîratê bi hev dikevin. Lê mîratek wer zêde jî tuneke, here were çend fera û folên malê ne, hewangeke û quryake zîvîn ya tutûnê ye. Xîre cira mezin li ser qutya tutûnê derdikeve, law dibêje ji min re, keç dibêje ji min re. Her yek li gor xwe sebebekî nîşan dide ku divê qutî ya wî ya jî ya wê be. Lê gava Pîrê ji wan re dibêje, qet bi hev nekevin, min qutî xist destê bavê we yê rastê û pêre gor kir, ew mit û mat dimînin. Pîrê dibêje çimkî wî ji qurya xwe pirr hez dikir. Li ser vê êdî ew jî dev ji hev berdidin, hetta dibêjin te baş kir. Diyar e ku ev babet qutî wê demê pirr bi qîmet bûne. Bi Swêdî jêre dibêjin "snusdosa" yanî qutya enfiyê, lê ne enfiya ku meriv dikşîne pozê xwe, enfiya ku meriv dike bin lêva xwe ya jorîn. Ev babet enfiyekêşî ya jî cixarekêşî îro jî li Swêd gelekî berfireh e.

Piştî mirina Johan jiyana pîrê bi renegekî dilşawar ji kok de tê guhertin. Piştî mirina Johan bi çendakî, xanî jî, mange û beraz jî, mirîşk jî dikevin mazatê û bi riya îhalê tîn firotin. Pîrê dibe şahida van bûyerên tahl. Lê îradeyeke mezin nîşan dide û xwe wenda nake. Di her qerara xwe de bi ruhê Johan dişewire, fikrê wî dipirse, destûra wî dixwaze.

Pîrê naxweze têkeve feqîrxanê. Lê perê wê jî tuneke ku xênî bikire. Di vir de tesa-

dufêke pîrr xerab dibe sebebê trajediya pîrê. Ku ew tesaduf nebe, Pîrê dikane xaniyê xwe bikire û neçe nekeve feqîrxanê.

Bi dû mirina kalo bi çend rojan, di bîsteke ku pîrê ne li mal e, mêrikekî cîranê wê dadigere hundur mala pîrê. Bi tesadufî radihîje Încîla li wir li ser masê. Gava rûpelan di ser hev re diqulubîne, 800 kron ji nav Încîlê de dikeve. Ev pere wê demê perakî pîrr e. Bi 500- 600 kronî Pîrê dikanîbû xaniyê têde ji xwe re bikiriya. Lê şansê Pîrê lê xerab digere, lema jî ewê qeder bi ruyê wê nekene û ewê peran nebîne.

Gava cîranê feqîr peran dibîne şaş dimîne, nizane ku gelo haya pîrê ji van peran heye ya tuneye. Lê digihîje wê qeneetê ku ewê haya wê jê tunebe, ewê Johan ji ber wê weşartibe. Dibêje, ku haya wê ji hewqas pere hebûya ewê ji xênê derneketa û neçuya neketa feqîrxanê. Mêrik demek kin du dil dimîne, bi ûjdanê xwe re dikeve muhasebê, dibê gelo ez bidimê ya na !

Lê pere şîrîn e, netîce riya ne durustiyê hildibijêre, perên xwe dike bêrîka xwe û diçe. Ew ji xwe re dibêje "hewcedariya min ji pîrê bêtir bi van peran heye." Çimkî ew jî wek pîrê gelekî feqîr e, di kirê de rûdine û komek zarok jî di hustu de ne. Dibêje Pîrê îro heye, sibe tuneye. Heta sax be, ezê tim dawetî malê bikim. Di dawiyê de roja ku xanî û heywanên Pîrê li mazatê tên firotin, ew, yanî dizê perê Pîrê, malê wê bi perê wê dikire. Gava mîlet dibêje te ev pere ji ku anî ?, dibêje min ji bûrayê xwe deyn kiriye. Pîrê jî ji mecbûrî dihere dikeve feqîrxanê. Zarokên wê ji alî exlaqî ve xwe mecbûr hîs nakin ku diya xwe bibin ba xwe. Ne ku zarokên wê însanin xerab in. Na, ev adet, ev mecbûriyetî, yanî divê zarok li dê û bavên xwe mêze bikin di kultura wan de tuneye; vê xwedîtîyê dewlet dike.

Pîştî demekê him Pîrê û him jî hin cîranên wê bi vê mesela diziyê dihesin. Hin cîran dixwazin ku Pîrê here li mêrik gilî bike û perê xwe jê bistîne. Lê Pîrê naçe gilî nake. Li gel ku di vê nabênê de Pîrê li ser çend pelên Încîlê rastî reqemên peran jî tê...

Diz jî pê dihesa ku Pîrê mesele bihîstîye, lema dihere ba Pîrê, xwe feqîr dike, gunehê wê bi xwe tîne, ji bo ku Pîrê neçe lê gilî neke û xênî jê nestîne.

Pîrê li vir mezinayîyeke pîrr mezin nîşan dide. Radibe wan pelên Încîlê yê ku reqemên peran li ser hatibûn nivîsîn dide diz û wî efû dike, xênî jê nastîne û sozê didê, dibêje ezê ji kesî re nebêjim. Lê diz di dema vegera malê de wan pelên Încîlê bi rê ve wenda dike û ev yek jî demeke dûr û dirêj dibe bela serê wî. Piştî gelek zahmetî bi zor wan rûpelan bi dest dixê û dişewitîne. Lê heta vê nuxtê di hundurê xwe de tim nerehet e, tim bê huzûr e, tim bi tirs e.

Netîce Pîrê di feqîrxanê de dimre.

Nivîskar li hember hemû şexsiyetên romanê, çi baş, çi xerab tim demokrat e, tim bi merhemet e. Îmkanê dide ku yê herî xerab jî ji xerabiya wî re sebebêkî wî yê maqûl hebe. Li alî din Frîdegard li hember jiyane û rastiyan wê jî realist e, ev rastî tal be jî, ne xweş be jî qebûl dike, dibêje dunya wiha ye, însan wiha ne. Carna dikanin baş bin, carna dikanin xerab bin; carna dikanin mezin bin, carna dikanin biçûk bin. Bi kurtî ew ne tenê xerab, ne tenê baş in. Ev her du alî jî tim di nav hev de ne.

Lê zimanê wî gelekî giran û meheli ye, bi kêmanî ji bo min pîrr giran bû.

Qehremana romanê Pîrê ye, dilê wê pîrr mezin e. Dilê wê mezin e, ji ber ku ew dikane însanê bûye sebebê trajediya wê jî efû bike. Min ji Pîrê pîrr hez kir û ez bawer nakim ku ez'ê tu carî mezinayî û dilfireyîya "Gumman"ê (Pîrê) ji bîr bikim. □



**Nejdîet Buldan**  
*Savaş'a Mektup*  
 Weşanên Mezopotamya

Pîştî salên 90'î, ji destpêka sala 1992'an û heta roja me, li gund û bajarên, bi hezaran kurd; karker, gundî, mele, mamosta, roj-namevan, nivîskar, siyasetvan, rewşenbîr û tacîr ji aliyê hêzên "nenas" ve hatin kuştin. Savaş Buldan yek ji wan kesan bû ku bi sê hevalên xwe re hatin kuştin. Mîna qasidê bi hezaran kurdan, qasidê Savaş Buldan jî derneket. Lê birayê wî Nejdîet Buldan, ku niha li derveyî welêt dijî û endamê Parlemantoya Kurdistanê ya surgunê ye, bi sernava "Savaş'a Mektup" (Ji Savaş re name) bi tirkî pirtûkek nivîsandîye. Nejdîet Buldan di vê pirtûka

xwe de bi belgan dide diyarkirin ku birayê wî ji aliyê hêzên dewletê ve hatiye kuştin.

Ev pirtûka ku bi forma nameyekê hatiye nivîsandin, behsa rewşa kurdan, rewşa gelê kurd, serhildana kurdan, dewlet û mafîya, sextekarên hundurîn û hwd. dike. Herweha di nameyê de şopên bîrîkirina birayekî kela dilê xwendevanan radike. □



**Celadet Ali Bedir-Xan**

"De Le Question Kurde" (Kürt Sorunu Üzerine)  
Tirkiya wê: Taylan Dogan  
Weşanên Avesta

**B**i sed salan e ku pirsgirêka kurdan heye û heta roja me jî ev pirsgirêk hê berde-wam e. Hebûna vê pirsgirêkê bala gelek ni-vîskar û lêkolînerên biyaniyan kişandiye û wan li ser dîrok, ziman û folklorê kurdan bi dehan pirtûk nivîsandine. Herçiqas di vê mijarê de hejmara rewşenbîrên kurdan kê-m be jî, dîsan hin navên mîna Celadet Alî Be-dir-Xan hemû jiyana xwe dane vê pirsgirê-kê. Ev pirtûka Celadet Alî Bedir-Xan "De Le Question Kurde" (Li ser pirsgirêka kur-dan) ku di bin navê Herekol Azîzan de bi

firansî nivîsandibû û di sala 1934'an de dabû çapê, dîsan li ser pirsgirêka kurdan e. Mîna tê zanîn, Celadet Alî Bedir-Xan bêtir wek figurekî edebî û zimanzanî tê naskirin, lê ew bêwestan li ser pirsgirêka kurdan jî ra-westiyaye. Ji bîlî vê xebata wî, wî nameyêke dirêj bi navê "Ji Mustafa Kemal Paşa re na-me" pirtûkek nivîsandiye.

Celadet Bedir-Xan ev pirtûka xwe "De Le Question Kurde" bi hinceta qanûneke surgunê ku di 5'ê Gulana 1932'an de ji aliyê karbidestiyê Tirkiyeyê ve hatibû îlankirin, nivîsandiye. Ew di vê xebatê de bi kurî behsa dîrok, kultur, ziman û rewşa kurdan ya siyasî û sosyolîkî dike. Celadet Alî Bedir-Xan di destpêka pirtûkê de balê dikişîne ser pirsgirêka kurdan û weha dinivîsîne: "Heta ku pirsgirêkeke kurdan hebe û kurd li ser vê gerestêra me kole bin, wê ev pirsgirêk hebû-na xwe berde-wam bike. Pirsgirêka kurdan ne pirsgirêkeke nû ye û ew ne di demeke nêzîk de derketiye holê. Ev pirsgirêk ne do û çend sal berê dest pê kiriye. Ev pirsgirêka ha qet nehatiye çareserkirin û bi sed salan e hebûna xwe berde-wam dike."

Zêdebûna berhemên weha û pîrbûna mi-rovên mîna Celadet Alî Bedir-Xan dikare pêvajoya çareserkirina pirsgirêka kurdan bi-leztir bike. Weşanxaneya Avesta di vî warî de xebatên hêja dike. Em wê pîroz dikin. □

# Rojnameyek û ronakbîrek



**MUSTAFA AYDOĞAN**

## Stockholmê dîsa şewq da

**R**oja şemiyê bû. Baranekê hûrik hûrik dest pê kir. Bi baranê re xwezaya ku ji ber germa îsal a me-zeloqî aciziya xwe nikarîbû veşarta jî, bi dilovanî bişirî û bêhna xwe ya ku mirovî mest dikir, li hawîrdorê belav kir.

Di bin tesîra vê guhertinê de, z "Enwer Karahan bi zorê li xwe hay bûn. Wê gavê, me berê xwe ji Alvikê, bi lez da Kistayê. Tarîx: 06.09.1997. Li bajarê Stockhol-mê li taxa ku navê wê Kista ye, civînek dihat amadekirin. Pirtûkek ku ji heyst hej-marên kovareke hêja pêk dihat, dê pêşkêşî xwendevanan bûbûya. Çirûskên ku ji belgeyeke dîrokî diçûn dê demeke dîroka me rohnî bikira.

Enwer Karahan dibe ku ji ber heyecana axavtina ku dê di civînê de bikira û ez jî bi heyecana vê berhevoka ku ez nizanim bê ji bo çi, lê min ew bi gellek awayan nê-zîkî xwe his dikir, bi lez ketin salona civînê.

Weşangerê vê berhevokê (Alî Çiftçi) dest bi axavtinê kir û bi axavtina xwe re jî berhevoka heyst hejmarên Dicle-Firatê bilind kir. Wê gavê, dilên beşdaran bi hev-du re û bi kêf lê xist.

Piştî weşanger, Malmîsanijê ku herheyst hejmarên vê kovarê berhev kiribûn û bi



pêşgotineke lêkolîner ve ji bo çapê amade kiribûn, li ser kovarê û edîtorê wê Edîp Karahan peyivî. Tesbîtên Malmîsanîjî yên di vî warî de ku di pêşgotinê de jî xuya dibin, pirr balkêş in. Xebatên Malmîsanîjî yên di warê derxistina belgeyên weha de, hêjayî pesinandinê ne.

Enwer Karahanê birayê Edîp Karahan, gava peyivî, di warê xwedîlêderketinê de, rexne hem li malbara xwe girt û hem jî li tevgera neteweyî girt û agahdarî da ku ji bo Edîp Karahan bi awayekî hîn firehtir û pirrhêltir bê nasîn, pirtûkek tê amadekirin. Eyup Alacabey û Mehdî Zana jî wek hevalên Edîp Karahan çend bîranînên xwe yên bi Edîp Karahan re pêşkêşî civînê kirin. Herduyan behsa dîwana wî ya alternatîva hukûmeta Tirkiyeyê, minaqeşeyên wî yên bi dadgir û dadgeran re, belavokên wî û hwd kir. Tiştên ku wan gotin, beşdar hem dan fikirandin û hem jî kenandin.

Di civînê de li ser tahde û zilma dewletê ya li ser Dîcle-Firatê hebû jî hat rawestîtin. Li gor wê agahdariyê, dewletê her xwestiyê wê rawestîne. Dû re gava min bi xwe jî lê nihêrî, min di du hejmarên wê de, li ser astengên ku ji aliyê dewletê hatine derxistin xwendin. Di hejmara heyştan de, xuya dibe ku hejmarên Dîcle-Firatê (hejmar 2, 3, 4, 5 û 6) li ser biryara Dadgeha Bîngolê ya Silhê li hemû Kurdistanê tîrî qedexekirin.

Dîsa di hejmara şeşan de, diyar dibe ku Dîcle-Firat ji hejmara duduyan û pê ve jî bajarê Cizîrê re jî tê şandin. Lê dadgirê Cizîrê rojnameyê li bajarê Cizîrê qedexe dike û ji bo ku rojnamefiroş hemû hejmarên Dîcle-Firatê yên ku ji wê rojê û pê ve, jê re bîr şandin, bêyî ku veke, teslîmî dadgiriya bike, wî tehdîd dike.

### **Dîcle-Firatê ez ber bi dema zaroktiyê birim**

Min Dîcle-Firatek ji Alî Çiftçiyî kirî û bi bêsebirî berê xwe da malê. Ev cara duyem bû ku min Dîcle-Firat didît. Cara yekem di 1981ê de bû. Wê gavê ez ji Libnanê nuh vegeyabûm. Xwediyê mala ku min xwe lê vedişart, çend hejmarên wê nîşanî min dabûn, lê wê gavê ji ber şertên dijwar, min firseta xwendinê jî nedîtibû. Min nuha, piştî şanzdeh salan, ancax bi saya Malmîsanîjî ev îmkan bi dest xist.

Her ku min rûpelên wê di ser hevdu re qulipandin, dilê min li bakurê dinyayê ket ber pêlên hesretê û geh bilind bû, geh daket. Dîcle-Firatê wek tunela zemên, ez jî surgûnê ber bi dema zaroktiyê birim. Gava jiyana Dîcle-Firatê ya weşanî qediya, hîn sê meh û niv mabûn ku ez dest bi "Ez Tirk im, rast im...." wê sînda ku min dû re pênc salan her serê sibehê bi hemû zarokên Kurd ên din re xwend, bikim.

Min bi çavên zaroktî, mamûrên boçikan dîtîn. Gundiyên ku qutiyên tûtina Xur-sê di bêrîkên wan de bûn û ji xafil de dihatin girtin dîtîn. Min tûtina li erdê belav- kirî û qutiyên pelixî dîtîn.

Min leşkerên ku çefî û fistanên zilaman diçirandin bi bîr anîn. Min mirovên ku kincên wan zîval zîvalî bûbûn û bi awayekî bêhêvî li dora xwe dinihêrîn, dîtîn.

Zarokên taxê hatin ber çavên min. Zarokên ku di tenefusê de bi Kurdî peyivî- bûn û navên wan di "lîsteya xwendekarên ku bi Kurdî peyivîne" de bûn, wek xew- nekê di ber çavên min re çûn û hatin.


### **Min Edîp Karahan cara yekem li bin dara tuyê dît**

Her ku ez daketim dinyaya Dicle-Firatê, û min navê Edîp Karahan û giraniya wî ya di kovarê de hebû bêtir dît, ez ber bi dema ku êdî zimanê Tirkî hêdî hêdî dibû zimanê min ê fikirê çûm. Dema ku min di jiyana xwe de, Edîp Karahan cara ye- kem dît, hat ber çavên min. Rojêke ji rojên havîna Qiziltepeya şewitî ya ku di dîro- kê de, navê wê geh bûye Dunaysir, geh bûye Tilermen, geh bûye Koçhîsar û geh bûye Yeşilova bû. Wê gavê Îlhamiyekî Çeçan hebû. Rojname digerland. Îlhamî mi- roveki girs bû, lê bejina wî ne pirr dirêj bû. Belkî jî ji ber girsbûnê dirêj xuya nedi- kir. Qayışa çenteyê wî yê çerm ê rengê qahweyî hertim di situyê wî de bû. Ji ber gi- raniya rojnameyan her bi tellekê dimeşîya û rojname digerlandin.

Min rojekê zilamek dît. Zilameki girs, bilind, birûqalind. Bin çengê wî tije rojna- me bû. Min got qey birayê Îlhamiyê Çeçan bû. Min digot, Îlhamî kal bûye û êdî nema dikare rojnameyan bigerîne û ji ber vê yekê, êdî birayê wî ji berdêla wî rojna- meyan digerîne.

Wê gavê dikana me nêzikî bîra Osmanê Nalbend û li kêleka dikana Xelefê Ber- ber (Ev Xelef, ew Xelefê ku Edîp Karahan di dadgehê de gotibû "bifire Xelef, bifi- re!")bû. Ber dikana me hertim meydana şerrê gundiyên ku li gundên xwe, xwe li hevdu radikişandin, fort li hevdu dikirin û digot ku "ma ne tu ê sibehê ji min re bê qezê!". Ew gundî an bi otobusa Biraşîm Helîmê an jî bi ya raqîbê wî Atayê mala Xelîl Avdalo dihatin Qezê (Qiziltepe) û bi pirranî jî li ber dikana me bi hevdu ve- dikirin. Ji ber ku sîgorteya dikanê tune bû û kesî tu tezmînat nedida, gellek caran fêda me di xisara me de dervediket.

Wê rojê bavê min dîsa ez li ber dikanê hiştibûm. Li hember dikana me dateke tuyê hebû. Piştî nîvrojê siya wê pirr xweş bû. Ew zilamê ku min digot qey rojna- mefiroş e, Xelefê berber û çend kesên din ji qahwexaneyê li hember dikana me,



Edip Karahan

kursî anîn û li bin siya darê rûniştin. Min dît ku ew ê min digot qey birayê Îlhamiyê Çeçan e, rojname danîn ser maseyê û ligel sohbetê, yek bi yek tev da. Wê gavê bi min pirr ecêb hatibû. Wî rojname nedifrotin, lê dixwendin. Di dema ku zêdeyî nêviyê civatê nexwende bû de, min cara yekem didît ku mirovek ew qas rojname bi hevdu re dixwendin. Piştî ku ew rabû û çû, cîranê min ê berber berê bi bihîstina gotina Îlhamî re têr kenîya û dû re got " Îlhamiyê çi malava, ma ronahiya çavên Îlhamiyê reben têra xwendina rojnameyan dike? Ev Edîp Karahan e û lawê xwediya dikana te bi xwe ye. Lawê Hecî Semoya ku tu her dawîya mehê ji ber wê dikeve tayê ye".

Min dû re bihîst ku Edîp Karahan çavên xwe bera firotina dikanên diya xwe ya pirr çavteng dabûn. Armanca wî ew bû ku dikanan bifiroşe û bi pereyên ku ji wan bân, li Qiziltepeyê an jî li Diyarbekirê çapxaneyekê veke û rojnameyekê derxîne. Lê dikir û nedikir, diya wî îqna nedibû.

### **Edîp Karahan kî ye?**

Edîp Karahan bi gellek xusûsiyetên xwe balkêş e. Ji ber vê yekê divê di pirtûka ku dê bête weşandin de, li ser wan xusûsiyetan pirr baş bê rawestin. Lê ez ê ji bo naskirina wî, bi çend rêzan be jî bi kurtî behsa jiyana wî û hin tiştên ku rola wî bêcir dikin, bikim.

Ew li gorî agahdariya ku ji cuzdanê wî yê nufûsê hatiye wergirtin, di 1930yî de li Dêrika Çiyayê Mazî çêbûye. Ji ber fikir û helwêstên xwe gellek caran tê girtin. Li Stenbûlê berê di beşa Felsefeyê de dixwîne, lê dû re qeyda xwe li Fakulteya Hiqûqê çêdike û heta sinifa talî dixwîne. Di sinifa talî de derseke wî dimîne û ji ber vê yekê tu carî vê dibistanê naqedîne. Di 1962an de Dicle-Firatê derdixîne. Di 1963an de, ji ber ku navê wî jî di wê daweya navdar "Daweya 23an" de hebû tê girtin. Di salên 60î de wek kadroyekî Partiya Karker a Tirkiyeyê serokriya şûbeya vê partiyê ya li Emînonuyê dike. Lê ew û Partiya Karker li ser pirsê Kurd li hevdu nakin û piştî minaqeşeyên di vî warî de, ji vê Partiyê vediqete. Di daweya DDKOyê de tê girtin û ew dîwana wî ya navdar ku hertim mijara sohbetên me yê qahwexaneyan bû, dibe malê dîrokê. Gava ji vê daweyê heşt sal ceza lê tê birrîn, di 1972yan de diçe Başûrê Kurdistanê. Li wê derê navê xwe dike Azad, lê gellek jê re dibêjin Mam Azad. Demekê di beşa raqîhandinê de dixebite. Dû re li Dadgeha Çomanê ya ku serokê wê Emer Debabe bû, dadgeriyê dike. Di sala 1973an de, dostekî wî yê ku navê wî Mualîm Hoste bû, jina wî û zarokên wî dibin ba wî. Li Başûrê Kurdistanê

keçeke wî çêdibe. Navê wê dikin Kurdistan. Lê Kurdistan di demeke pirr kurt de wefat dike û li wê derê tê veşartin. Edîp Karahan li wê derê carekê nexweş dikeve. Tevî Doktor Mahmûd Osmanî çend doktorên din jî wî muayene dikin, lê nexweşiya wî teşhîs nakin. Piştî ku bi qasî du salan li Başûrê welêt dimîne, ew û Eyup Alacabey di Îlona 1974an de vedigerin Bakurê welêt.

Di 1976an de, ji bo dersa xwe ya talî bide û Fakulteya Hiqûqê bi temamî biqedîne, diçe Stenbûlê. Li Stenbûlê li Aksarayê li "Bati Oteli" dimîne. Di Gulana 1976an de ji nişka ve nexweş dikeve û wê gavê wî dibin Hasekiyê û li Nexweşxaneyê Gurubayê radizînin. Wê gavê diyar dibe ku nexweşiya dilî pê re heye û ew nexweşiya li Başûrê welêt jî her eynî nexweşî bû. Beriya wefata wî bi çend saetan grûpeke ji Weşanxaneyê Yontemê ku Eyup Alacabey û Zeruh Vakifahmetoglu jî di nav wan de bûn, diçin serdana wî. Wê gavê razayê û Eyup Alacabey ji bo anîna dermanên wî reçeteyê ji doktorî werdigre û berê xwe dide Zeytînburnuyê, dermanxaneyê Osman Özçelîkî. Lê beriya ku Eyup Alacabey û Osman Özçelîk dermên bigihînin, ji krîza sêyem (yek li Başûr, yek li otêlê û ya din jî li nexweşxaneyê) xelas nabe û wefat dike. Eyup Alacabey bi tenê tabûta wî bi balafirê rîne Diyarbekirê û ji wê derê bi qelebalixeke mezin dibin Dêrikê. Û mirin bi vî awayî dadide vî ronakbîrê mêrxas û ji nav me dibe.

Edîp Karahan du caran zewicîye. Jina wî ya yekem, ji Tirkên Bûlgarîstanê bû. Ji wê tu zarok çênabe. Jina wî ya duyem jî Dêrikî bû. Gava wefat kir bi navê Tûrcel, Welat û Şiyar sê zarokên wî li dû wî man.

Wî bi du zaravayên Kurdî (Sorani û Kurmancî), Tirkî û Fransî dizanîbû. Ji derveyt wergerên nivcomayî, du çîrokên manzûmane yên La Fontaine jî wergerandine Kurmancî.

### **Dêrik û Mahmûdî**

Dêrika Çiyayê Mazî li ber dilên gellek kesên ku ne ji Dêrikê ne jî devereke pirr şêrîn e. Li rojhilatê wê Turcel, li rojavayê wê Êrge Baba, li bakurê wê Pozê Mancêla ku siya xwe bera ser Kulêbê daye... Cîhekî ewle û di himbêza Xab û Kulêbê de û di bin sitara çiyayên bilind de, cî û warekî Kurdan. Lê ez nizanim, bê ew ji bo çî li ber dilên gellekan weha şêrîn e. Dibe ku ji ber hêza ku ji Tûrcelê distîne û bi beriya bê ser û bin re dibişire; dibe ku ji ber darên wê yên zeytûnan û ava wê ya Xabê ye; dibe ku ji ber di helbesta Qedrî canî de bingeha hesreta dilê mişextiyar e; dibe ku ji ber kana îlhama helbestvanan e.

Li Dêrikê li gel gellek eşîrên bi nav û deng, eşîra Mahmûdan jî heye. Yê/ya ku ji wê eşîrê be, ji xwe re dibêje, Mahmûdî. Serokê wê eşîrê Reşo bû. Piştî Reşo, lawê wî Osman dikeve şûna wî. Ji xwe, piştî wî, êdî malbat wek "mala Osmanê Reşo" (Hecî Osmanê Reşo) tê nasîn. Ev Osman yek ji wan sê Osmanên ku li hember Bi-rahîm Paşayê Millî serî netewandine ye ku Ziya Gokalp di "Destana Ibrahîm Paşayê Eşqîya" de behsa wî jî dike.

Şeş lawên Osmên hebûn: Êlas (Êlas Efendî), Şêxmûs, Hecî Etman, Hecî Reşîd, Hecî Sînan, Seîd. Şêxmûsê ku min binê navê wî çixêz kir, kalikê Edîp Karahan e. Edîp Karahan lawê Cemîlê (Hecî Cemîl) Şêxmûs e. Ew (Hecî Cemîl) bi xwe hem beşdarî serîhildana Şêx Seîdî dibe û hem jî di nav wê grûpa ku ji Binya Xetê tê heta Çiyayê Mazî de bû. Lê hîn beriya ku Cemîlê bavê Edîp Karahan bê dinyayê, Şêxmûs wefat dike û ji ber vê yekê, gellek kes Cemîlî wek lawê Hecî Osmanê Reşo dizane.

Hecî Cemîl pênc caran zewiciye. Edîp Karahan ji jina wî ya yekem a ku dotma ma wî bû û navê wê Hecî Semo bû, çêdibe.

Ger hun bala xwe bidin navên ku Edîp Karahan di Dicle-Firatê de bi kar anîne, hun ê bibînin ku her nav bi zanebûn hatiye danîn: Reşo ji ber navê Reşoyê serokê êla wan; Edîp Osmanoglu ji ber navê Osmanê Reşo; Mahmut Bayraktar ji ber navê êlê; Hamit Mazidagli ji ber Çiyayê Mazî an Derika Çiyayê Mazî.

### **Mala Osmanê Reşo û serîhildana Şêx Seîd**

Êlas Efendî apê bavê Edîp Karahan e. Piştî Osmanê Reşo ew serokatiya êlê dike. Di Mekteba Ruşîyeyê de xwendiyê û dû re li Dêrikê dibe serokê Qulûba Kurd. Ew jî bi gellek eşîrên Dêrikê yê din re soza beşdariya serîhildana Şêx Seîd dide. Gava Şêx Seîd digre ser Diyarbekirê, eşîrên sozdayî yê Dêrikê jî berê xwe didin Diyarbekirê. Lê gava hîn ne gîhane Diyarbekirê, li Alîparê xebra têkçûna serîhildanê ji wan re tê. Ji wan re dibêjin ku bibêjin em Kuva-î Milliye ne û em hatine alîkariya dewletê. Eşîrên din hemû li gorî vê xeberê, helwêstên xwe diguherin û alaya Kuva-î Milliyyê bilind dikin û diçin Diyarbekirê. Lê Êlas Efendî li ser soza xwe dimîne û ji ber vê yekê jî piştî têkçûna serîhildanê, tê girtin. Lê dû re tê berdan û dewlet wî li Mêrdînê bi cih dike. Bi Mala CemîlPaşayî re pêwendiyên wî her berdewam e û ji bo beşdariya serîhildana Agiriyê, 1927an de bi hevdu re dadikevin Binya Xetê. Grûpa wan dû re ji bo destpêkirina şerrî heta Çiyayê Mazî jî tê û piştî çend rojan li wan çiyayan digerin û tê digihêjin ku eşîrên din bi wan re ranabin, bi

şûn de vedigerin Binya Xetê. Êlas Efendî di 1930yî de li Amûdê, wefat dike û malbat ancax bi efûya 1933an a ji ber dehsaliya Komarê hat derxistin, vedigere bakurê Kurdistanê. Wê gavê, ji nêviyê wan bêtir li Qiziltepeyê bi cîh dibin. (Min ev agahdarî hem ji Enwerê birayê Edîp Karahan, hem ji Eyup Alacabey û hem jî di 1982an de, gava ez ji Binya Xetê çûbûm Dêrikê, ji rehmetiyê bavê Eyup Alacabey Heciyê Qêsimê ku bi xwe jî ji bo beşdariya serhildanê berê xwe dabû Diyarbekirê wergirtine).

### **Mahmûdiyê ku rûpeleke nuh vekir**

Gava ku malbat ji Binya Xetê vedigere, xwe pirr distirîne. Xwe ji xebatên ku elaqe wan bi Kurdperweriyê heye, bi temamî bi dûr dixin. Ji wê tarîxê û vir de, ji wê malbatê cara yekem Edîp Karahan beşdarî têkoşîna neteweyî dibe. Ew jî diçe sedema ku mesafeyek têkeve navbera malbatê û Edîp Karahan. Ji ber ku çavên malbatê ji dewletê tirsiyane, heta ji wan tê, xwe dûrî Edîp Karahan dikin û heta wefata wî jî qet lê bi xwedî dernakevin.

Piştî efûya 1933an, di nav Mahmûdan de, yê ku cara yekem ji tirsî dewletê re meydan xwendiyê û ji bo ku nişên malbatê ên nuh bikaribin beşdarî nav xebata Kurdperweriyê bibin, rê vekiriyê, Edîp Karahan e. Ev xusûsiyeteke pirr girîng e. Wî bi vê helwêsta xwe rûpeleke nuh vekir.

Mirov dikare xusûsiyetên rewşa Mahmûdan û têkiliyên wan û Edîp Karahan, di dîroka me de, li ba gellek êlên Kurd ên ku beşdarî serhildanên bi ser neketine bûne, bibîne.

### **Gelo 1930 rast e?**

Her çî qas huwiyeta resmî dibêje ku Edîp Karahan di 1930yî de çêbûye jî di vî warî de şik hene. Ji ber ku ger Edîp Karahan di 1930yî de çêbûbe, divê wê gavê ne li Dêrikê lê li Kurdistana Sûriyeyê çêbûbe. Ji ber ku min li jorê jî diyar kir ku wê gavê malbara wan li wê derê bû. Li gorî agahdariya ku min ji birayê wî enwer Karahan û hem hevalê wî û hem jî zavayê wî Eyup Alacabey wergirt, divê Edîp Karahan beriya 1927an çêbûbe û dîsa li gorî wan, tarîxa çêbûna wî di navbera 1923-1927an de ye.

### **Dicle-Firat rûpeleke dîrokê**

Mirov dikare di gellek waran de, wek Edîp Karahan nefikire, an hin fikirên Dicle-Firatê neecibîne, lê xusûsiyeteke pirr êşkere heye ku divê mirov wê bibîne. Ew jî

pirrhêlbûna Edîp Karahan e. Gellek kes Edîp Karahan bi tenê wek mirovekî sert û sloganîst dizane. Bersiva vê şaştegiştinê, di rûpelên Dicle-Firatê de wek belgeyên dîrokî xuya dibin. Her ku mirov rûpelên Dicle-Firatê bi ser hevdu re diqulipîne, mirov vê rastiye baştir dibîne. Ew di Dicle-Firatê de, wek edîtorekî baş, sîyasetvanekî jîr û mêrxas, çîroknivîskarekî jêhatî, xwediyê Kurdîyeke xweş û paqij, parêzgerê hêjayiyên neteweyî û hevalbendekî kedkaran, bi kurta hî wek entellektuelekî pirrhêl derdikeve hemberî me.

Dicle-Firat numûneya rojeva Kurdan û musteweya minaqeşeya wê demê ye. Dicle-Firat ji bo rewşa Kurdan, kapasîteya entellektueliya Kurdan û musteweya şiyarbûna neteweyî ya wê demê, belgeyeke hêja ye.

Bêşik mirov dikare bi awayekî hîn firehtir li ser vê kovarê raweste, lê mebesta wê nivîsê ne berfirehiyeke weha ye. Tev wê jî ez ê hewil bidim ku hin hêlên vê kovarê bi kurtî bidim naskirin û hin tesbîtên di warê xusûyetên wê de binim zimên.

Divê mirov wê kovarê li gorî şertên 1962-63yan binixîne. Wê gavê girîngî û hêjayiya wê dê baştir bê dîtin. Mirov dikare li ser gellek xusûsiyetên wê kovarê raweste. Lê ligel gellek xusûsiyetan, sê xusûsiyetên wê kovarê yên li gorî baweriya min, hîn girîngtir û berbiçavtir hene ku Malmîsanijî jî di pêşgotina xwe ya ku ji bo berhevo-ka wê kovarê nivîsîbû de, ew diyar kirine: 1- Di nav kovarên salên 1960î de kovara herî emirdirêj e. 2- Heta wê gavê tu kovaran bi qasî wê cîh nedaye Kurdî. 3- Tu kovar bi qasî wê li ser pirsê Kurd ranewestiyaye.

Yek ji wan xusûsiyetên wê kovarê yên ku bala min piirê kişand jî ev e ku ligel gellek nivîskar û sîyasetmedarên bi nav û deng, herdu Seîdên (Sait Kirmizitoprak û Sait Elçî) ku têkiliyên di navbera wan de di tevgera neteweyî de roleke mezin leyzi-riye jî di eynî kovarê de nivîsandine. Ev xusûsiyeteke taybetî dide Dicle-Firatê. Wekî din jî min nivîsên Seîd Elçî cara yekem di wê kovarê de dît.

Bûyerek heye ku navê Dicle-Firatê bêtir derdixîne pêş. Ew jî bûyera 23an a ku piştî bûyera 49an bûyera girîng a duyem e. Girtina ji ber wê daweyê û ji aliyê dewletê ve qedexekirina weşandina Dicle-Firatê di eynî tarîxê de ye. Di wê daweyê de, berpirsiyarê Dicle-Firatê Edîp Karahan jî tê girtin û dewlet gava hîn hejmara nehan di çapê de bû, dest danî ser û rojnameyê bi yekcarî digire. Bi vî awayî, jiyana weşanî ya Dicle-Firata ku her diçû hejmara nivîskar û xwendevanên wê bêtir dibû û ber bi rojnameyêke panzdehrojî ve pêş de diçû, radiweste. Di wê daweya ku di 29ê Hezîrana 1963an de bû nûçeya rojnameyan a sereke û tarîxa îdîanemya wê 17ê Cotmeha 1963 bû de, ligel Edîp Karahan, Abdulsettar Hamavendî, Dogan Kiliç, Şêxhasenanli, Hasan Buluş, Îbrahîm Mam Xidir, Gazî Dizey, Nejat Remzî, Fûat





Derwiş, Talat Şerîf Muxtar, Seîd Abdurrahman, Cemal Alemdar, Firûz Felahat, Mûsa Anter, Ziya Şerefxanoglu, Enwer Aytekîn, Seîd Elçî, Medet Serhad, Yaşar Kaya, Ergun Kuyumcu, Alî Anagur, Kemal Bîngollu, Mehmet Bilgin, Fethullah Kakioglu hebûn.

Di Dicle-Firatê de, hin xusûsiyetên neyinî jî diyar dibin. Ji van yek heye ku divê behsa wê bête kirin. Ger ew an hin xusûsiyetên din ên bi vî rengî neyên zimên û bi tenê yên ku pozîtîv in bêne zimên, wê gavê Dicle-Firat dê baş neyê naskirin.

Ger hun bala xwe bidinê, hun ê di hejmara duyem de, sûretêkî Atatürk û nivîsa ku li binê sûretê wî hatiye ni-

vîsandin, bibîne. Ew jî ji aliyekî ve, ji bo tahde û zilma dewletê û ji aliyê din ve jî ji bo nezalalbûna Kurdan a di warê rola artêşa Tirkiyeyê û ya Kemalîzmê de numûneyek e. Her çî qas piştî demekê, fikirên di vî warî de jî bi alîkariya hin bûyerên ku ruyên herdu faktorên ku navên wan li jorê hatin diyarkirin bêtir eşkere dikin, hêdî hêdî ber bi zelalbûnekê diçin jî lê ji bo ji ortêrakirina hemû neyiniyan, têrê nake.

### Dicle-Firat 01.11.1962- 14.05.1963

Dicle-Firat wek rojnameyê fikrî ya mehane, di navbera 01.11.1962- 14.05.1963yan de hatiye weşandin. Ji wê gavê û heta ku jiyana xwe ya weşanî qedandiye, wek platformeke neteweyî fonksiyona xwe leyzitiye. Di hejmara xwe ya yekem de, dide diyarkirin ku rûpelên wê ji nivîsên hemû beşên civakê re vekiriye. Heyşt hejmarên Dicle-Firatê hatine weşandin. Hejmara nehan ji bo çapkirinê, teslîmî çapxaneyê bû, lê dewletê di çapxaneyê de dest danî ser wê û nehişt bigihêje destên xwendevanan.

Xwedî û berpirsiyarê wê yê fîlî Edîp Karahan; navnîşana wê; Fatih- Kiztaşi Binaemini sok. No.18- Istanbul; ebata wê: 28x42 û bihayê wê (hejmar:1-2-3) 50 quruş bû. Abonetiya wê (hejmar 1-3) ji bo 6 mehan bi 3 lîreyan û ji bo 12 mehan jî 6 lîre-

yan bû. Her hejmarek (hersê hejmarên destpêkê) çar rûpel in. Ji hejmara 4an û pê ve hejmara rûpelên kovarê dibe 8 rûpel, bihayê wê jî dibe 100 quruş û bihayê abonetiyê jî li gor berê dibe du qat.

### **Ji aliyê wextê ve kovareke bi rêk û pêk**

Ger mirov ji aliyê wextê ve bala xwe bide Dicle-Firatê, mirovê bibîne ku li gorî gel-lek kovarên dema me jî bi rêk û pêk derketiye. 3 hejmar di roja xwe de, hejmarek rojekê bi derengî, hejmarek du rojan bi derengî, hejmarek yanzdeh rojan bi derengî hatiye çapkirin. Tarîxa çapkirina du hejmaran jî ne diyar e.

Hejmara yekê: 01.10.1962 (Çapxaneya B. Kervan-01.10.1962)

Hejmara duduyan: 01.11.1962 (Navê çapxaneyê nehatiye nivîsîn)

Hejmara sisiyan: 01.12.1962 (Çapxaneya Dizerkonca-12.12.1962)

Hejmara çaran: 06.01.1963 (Çapxaneya Husnutabîatê-06.01.1963)

Hejmara pêncan: 01.02.1963 (navê çapxaneyê nehatiye nivîsîn)

Hejmara şeşan: 06.03.1963 (Çapxaneya Husnutabîatê- 08.03.1963)

Hejmara heftan: 04.04.1963 (Çapxaneya Husnutabîatê- 04.04.1963)

Hejmara heştan: 14.05.1963 (Çapxaneya Husnutabîatê- 15.05.1963)

### **Hin nivîskar û nivîsên Dicle-Firatê**

#### **Edîp Karahan**

Di Dicle-Firatê de yê ku herî pirr nivîsiye, Edîp Karahan e. Edîp Karahan di hemû hejmaran de û bi çar (4) navên cuda (Nivîsên edîtor bi navê Edîp Karahan û Edîp Osmanoglu; nivîsên li ser sîyaseta hundur bi navê Hamit Mazidaglı; li ser siyaseta derve bi navê Mahmut Bayraktar û edebiyat bi navê Reşo)li ser hevdu bîst u du (22)nivîs nivîsine.

Bi navê Edîp Karahan nivîsek (kirilan potlar)bi tenê heye, ew jî di hejmara heştan de hatiye nivîsîn.

Bi navê Edîp Osmanoglu heft (7) nivîs (hejmar 1: Em ji bo çî derdikevin; hejmar 2: Pêşketina Rojhilatê û lênerînên şaş; hejmar 3: Dewleta Hiqûqê; hejmar 4: Li ser Yekîtî û bihevrebûnê; hejmar 5: Rewşa Giştî; hejmar 6: Rewşa Giştî: Qedera rejîma demokratîk; hejmar 7: Eniya Demokratîk )hatine nivîsîn.

Bi navê Hamit Mazidaglı çar (4) nivîs (hejmar 5: Hiqûqşînasiya Muxbîrekî bi zorê; hejmar 6: Turkeş û Sosyalîzm; hejmar 7: Ka we'z bi Kudrî dihat kirin; hej-

mar 8: Hin niqte) hatine nivîsîn.

Bi navê Mahmut Bayraktar sê (3) nivîs (hejmar 5: Krîza Kongoyê; hejmar 6: Pêş-veçûnên nuh; hejmar 7: Têkoşîna Ben Belle neqediya) hatine nivîsîn.

Bi navê Reşo heft (7) nivîs (hejmar 2: Xaltîka Talê; hejmar 3: Xaltîka Seyro; hejmar 4: Xaltîka Fersê; hejmar 5: Dînê û Dîno; hejmar 6: Xecê û Siyamend; hejmar 7: Swaro; hejmar 8: Heydo û Ferho) hatine nivîsîn.

### **Mûsa Anter**

Mûsa Anter heta hejmara çaran nivîsiye û piştî hejmara çaran êdî di Dicle-Firatê de nenivîsiye. Lê tev vê jî di çar hejmaran de heyst nivîs nivîsîne. Wî sê (3) navên cuda bi kar anîne. Sê nivîs li ser siyaseta hundur bi navê Anter (hejmar 1: Caw pîs; hejmar 3: Falîh Rifki Atayê Reben; hejmar 4: Em şiyar bibin le!) û nivîsek jî bi navê M. Anter (hejmar 2: Celladê Rojhilatê); çar nivîs li ser edebiyatê bi navê Rahşan (hejmar 1: Melle Ahmedê Cizîrî; hejmar 2: Şêx Ahmedê Xanî; hejmar 3: Hecî Qadir Koyî; hejmar 4: Neqane) nivîsîne.

### **Dr. Saît Kirmizitoprak**

Dr. Saît Kirmizitoprak jî hew di herdu hejmarên pêşiyê de nenivîsiye, lê di hejmara sisiyan de, êdî wek nivîskarê kovarê yê berdewamî nivîsiye. Nivîsa wî ya bi navê "Dijmina Rojhilatê ya sereke Faşîzm" nivîseke dirêj e û di sê hejmarên kovarê (hejmar 3, 4, 5) de hatiye weşandin. Nivîsa wî ya bi navê "Le Gunehê Rojhilatiyan çi ye?" di hejmara şeşan de û ya bi navê "Şaşiyên di pirsra Rojhilatê de" di hejmara heft û heştan de hatiye weşandin.

### **Saît Elçî**

Saît Elçî di hejmara çaran de, bi navê "Dijminatiya Nîjadperestan a li hember Rojhilatê" û di hejmara pêncan de jî bi navê "Ma biryarên ecêb dê hertim li Rojhilatê bên tetrîqkirin?" du (2) nivîs nivîsîne.

Ligel Nazmî Balkaş (hejmar: 5, 6, 7), Ahmet Aras (hejmar: 6, 8), Şevket Epozdemir du helbest bi navê Dilbirînî (hejmar: 5, 8), Enwer Aytekîn (hejmar: 1, 2- bi navê Ahmet Botanli) Huseyîn Sagniç (hejmar: 7, 8) gellek kesên din jî di Dicle-Firatê de nivîsîne.

## Dicle-Firat û Kurdî

Yek ji wan xusûsiyetên Dicle-Firatê ew e ku wê di nav kovar û rojnameyên heta wê demê ku li Tirkîyeyê hatine weşandin de, ji derveyî xusûsiyeta xwe ya ku bêtir li ser pirsê Kurd nivîsandinê, ya herî pirr cîh daye zimanê Kurdî ye jî. Ji aliyê din ve jî gava mirov ber bi hejmarên talî ve tê, mirov pê dihise ku Dicle-Firat her diçe ber bi Kurdînivîsandinê ve tê guhertin. Her ku beşdarî û lêbixwedîderketin zêdetir dibê, berê wê yê ber bi xwerû Kurdîbûnê, hîn bêtir xuya dibê. Xuya ye ku di hundurê pêvajoya jiyana weşanî de, hem daxwazek ji aliyê xwendevanan zorê dide rojnameyê û hem rojname bi xwe jî di destpêkê de xwediyê perspektîveke weha ye. Dîsa xuya ye ku rojnameyê ji aliyê îmkanan ve, nîkarîbû li gor perspektîva xwe ya di vî warî de hebû, gav biavêta. Lê mirov li îşaretên amadekirina şertên ji bo li gor wê perspektîvê jiyana weşanî bê domandin, rast tê. Biryara di warê damezrandina Buroya Lêkolîna Folklorê û gavên berbiçav ên di vî warî de, nîşana vê yekê ye. Di hejmarê heştan de, daxuyaniya wê ya di warê berhevkirina çîrok, sitran, efsaneyên Kurdî de û biryara wê ya ji hejmarê nehan û pê ve amadekirina musabeqeyê pêkeniyên Kurdî, didin xuyakirin ku bê Dicle-Firat çawa ber bi Kurdînivîsîne bi lez tê guhertin.

Berpirsiyarê rojnameyê hîn di hejmarê çaran de, ji xwendevanên xwe re dibêje ku ger hejmarê xwendevanan zêdetir bibê, ew ê Dicle-Firatê di pêserojê de, bike rojnameyêke panzdehrojî. Di hejmarê heftan de ev fikir hîn zelaltir dibê û ji ber vê yekê her di eynî hejmarê de ji xwendevanên xwe re dibêje ku kadroya rojnameyê ya nivîskaran bi beşdarên ji Stenbûl, Ankara û bajarên din her diçe zêdetir dibê. Ji ber vê yekê, em ê di rojên pêş de, an hejmarê rûpelên wê zêdetir bikin, an jî wê ji her panzdeh rojan carekê derxîne.

Ji xwe, nivîskarên wê hîn di destpêkê de, gava kêysa wan lê hatiye, çend rêzên bi Kurdî di nav nivîsên bi Tirkî de bi cîh kirine. Edîp Karahan di nivîsa xwe ya ku navê "Swaro" ye de, vêya êdî eşkere dike. Di wê nivîsê de dibêje ku ji îro û pê ve her ku di warê îfadekirina bi zimanê Tirkî de zehmetî bê kişandin, em ê bi Kurdî binivîsîne.

Di warê bikaranîna alfabeyê de îstiqrarek tune ye, lê di hejmarê heştan de, alfabe ya Hawarê tê weşandin. Ev jî divê wek beşek ji xebata amadekirina şertên bi Kurdînivîsandinê bê nixandî.

Ligel hin helbestên bi Kurdî hatine nivîsîn, di nav gellek nivîsên bi zimanê Tirkî de, her carê çend rêzên bi Kurdî hatine bi cîh kirin. Di beşa Ziman-Edebiyat û

Folklorê de helbestên ku di nivîsên ku ji aliyê Mûsa Anterî hatine nivîsîn de, li gel wergera wan a bi Tirkî, bi Kurdî hatine weşandin. Di nivîsa Mûsa Anterî ya ku bi navê "Caw pîs" de, di yê Edîp Karahan ên bi navên "Xaltîka Talê, Xaltîka Seyro, Xaltîka Fersê, Dînê û Dîno, Xecê û Siyamend û Swaro" de, cîh bi cîh zimanê Kurdî hatiye bikaranîn. Lê mixabin tev hemû hewildanên Dicle-Firatê, nivîsa xwe-rû bi Kurdî, nivîsa Edîp Karahan a ku navê wê "Heydo û Ferho" bi tenê ye.


### **Rexneyek û hêviyek**

Em di warê lêbixwedîderketina hêjayiyên xwe de, tevî ku di van salên dawiyê de, hin xebatên ku hêviyên mirovî bêtir dikin jî zêde ne bi serkevtî xuya dikin. Ger ev rewşa me û helwêsta me ya ku di vî warî de heye, weha dewam bike, em ê nikaribin hêjayiyên xwe wek mîras ji nifşan dewrî nifşan bikin. Hêviya min ew e ku gavên rakeser ên ji bo berpirsiyariyên derengmayî bi cîh bînin tên avêtin, tesîrê li civata me bikin û şûûra lêbixwedîderketina hêjayiyan û bi vî awayî amadekirina şertên pêşerojê ewle û rohnî pêş de bibin.

Sala 1998an sedsaliya rojnamegeriya Kurdistanê ye. Ez hêvî dikim ku em ê bi minaqeşiyên xwe yê bi vî minasebetê ligel gellek hêjayiyên xwe yê tevnedayî, 36saliya Dicle-Firatê û berpirsiyarê wê Edîp Karahan jî bi gellek awayan minaqeşe bikin û bi bîr bînin.

Ji ber vî yekê, ez weşandina berhevoka herheyşt hejmarên Dicle-Firatê di rêya bicîhanîna berpirsiyariyê derengmayî de, wek gaveke hêja dinirxînim. □

# JI WEŞANÊN NÛDEMÊ SÊ PIRTÛKÊN NÛ



**Süleyman Demir**

*Sorê Gulê*


Roman



**Cemşid Bender**

*Keça kurd Zengê*

Kurteçirok



**Rehimê Qazi**

*Pêşmerge*

Roman



Xorro, wilo bixebite: An bi xwe çêke, an arîkariya  
xewan bike ko çêdikin, ava dikin... Di dinyayê de tu  
tişt nîne ko tekûz bit. Di her tiştî de, nemaze di karên nû  
destpekîrî de, pîrîcar, kêmanî hene. Heke te kêmanî dî-  
rin, hema dîrêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav  
wan, arîkariya daniyan bikê û wan kêmanîyan biedilînî.  
Hilweşandina stûneke hêsanî ye. Huner di rastkirina stû-  
na xwêl de ye.

*Celadet Ali Bedir-Xan*